



KÜRD ARAŞTIRMALARI DERGİSİ

DOSYA

KÜRT EDEBİYATI

Dosya Editörü
Mihemed Şarman

5

E-DERGİ
BAHAR 2021



künye

Kürd Arařtırmaları e-Dergi

Sayı: 5 • Bahar 2021

Yayın Kurulu

Cemal Özkahraman
Derya Bayır
Dr. Şahin Ranaie
Ekrem Malbat
Engin Sustam
Eyüp Kerimi
Fırat Aydınkaya
Hatice Kılıç

İbrahim Melezade
İrfan A. Azeez
İsmet Yüce
Janroj Yılmaz
Kamal Soleimani
Mesut Yeğen
Mihemed Şarman
Mukadder Bana

Mustafa Zengin
Mücahit Bilici
Nurdan Şarman
Ömer Paçal
Ramazan Kaya
Tahir Baykuşak
Tuncay Şur

Dosya Editörü

Mihemed Şarman

Mizanpaj

Ridwan Xelil

ridwanxelil@gmail.com

Kapak Tasarımı


GRAFİKURD

Yayın Türü

Sürelî Yayın e-Dergi

İletişim

kurdarastirmalari@gmail.com



içindekiler

Gelo Klasîkên Edebîyata Kurdî Hene?

Abdurrahman Adak.....8

“Diller ve Kùltürler Arasındaki Hiyerarşik İlişkilere Karşı Savaşıyorum”

Ngûgî wa Thiong’o ile Söyleşi

Röportajı Yapan: Tanuj Raut, İngilizce’den Çeviren: Nurdan Şarman.....38

Rexne, Wek Naverokeka Nûjeniyê

Li Ba Ronakbîrên Kurd ên Dewra Stenbolê Helwesta Rexneyî

Remezan Alan.....46

Melayê Cizîrî ve Medreselerde Dîwan Okuma Geleneği

Serdar Şengül.....67

Konserde Patlayan Tabanca: Edebiyattaki Politika

Ramazan Kaya.....101

“Ez tu carî naxwazim berhemên min bi nasnameya jinî were pênasekirin.”

Hevpeyvîn bi Yildiz Çakar Re

Röportajı Yapan: Kürd Araştırmaları.....121

Ji Edebîyata Kurdên Swêdê: Trîlojîya Mehmed Dehsîwar

Rohat Alakom.....128

Mem û Zîn û Memê Alan

Jan Dost.....144

“Sızlanan Edebiyattan Nefret Ediyorum” Şener Özmenle Röportaj

Röportajı Yapan: Mihemed Şarman.....148

Werger û Wêjeya Kurdî

Samî Hezil.....156

Weşangerîya Kurdî ya Tirkîya de Cayê Kirmanckî

Mutlu Can.....171

“Lanetlêhatiyên li Ser Rûyê Erdê Mecbûr in Polîtîk Bin”

Hevpeyvîn bi Serday Ay re

Bilal Ata Aktas.....181

Yazılı Kürt Edebiyatının Zenginliği

Nevzat Emînoğlu.....197

Karanlık Odaya Doğru: Yazar ve Güney Afrika (1986)

J.M. Coetzee, İngilizce'den Çeviren: Nurdan Şarman.....207

Dahûrîna Romana “Kurdê Rêwî” Ya Sehîdê Îbo

Mehmet Yıldırımçakar.....214

Uzun Bir Sürgün ve Yitirilen Bir Gelecek

Abdullah Aren Çelik.....226

خواوهندى (ميينه) ژن له ئەفسانهى كوردیدا

Şetav Naderi.....236

editörden

Kürt Edebiyatını Konuşmadan Önce

Kürtlerle ilgili hemen her alanda ele alınan konuyu bağlamından çok sapmadan konuşmak zor olduğundan edebiyat üzerine de edebi çerçevede kalarak konuşabilmek pek kabil değil. Bu minvalde bir çabanın içine girildiği anda çok geçmeden meselenin odağından saptığı, muhatapların yıllardır kangren olmuş birtakım sorunların içinde kalakaldığı görülür. Değinen sorunlarla bağlantılı olarak, edebiyat, müzik, sinema gibi sanatın bazı dallarında yapılan çalışmalar ve tartışmalarda da ibre hızla dilin (Kürtçe'nin) problemlerine ve dili çepeçevre saran tarihsel-politik meselelere kayar. Bundan hareketle şunu rahatlıkla iddia edebiliriz: Kürtler çoğu zaman sanatın herhangi bir dalı üzerine tartışıp düşünce üretirken o sanatın asıl çerçevesinin çok dışında kalırlar. Zira asıl konuya varmadan önce konunun etrafını çepeçevre kuşatmış, konu bakımından tali ama etkisi büyük meselelere çözüm üretmek zorundadırlar. Kürt edebiyatı kamusunun kanıksanmış olduğu bu durum edebiyata genellikle müstakil bir sanat alanından çok dil ve çeviri problemlerinin işlendiği, dilin kelime hazinesine katkı yapıldığı bir mecra olarak bakılmasına yol açmıştır. Kürt edebiyat eleştirisinde mezkûr bakışın somut yansımalarıyla sıkça karşılaşılır. Birçok eski/yeni Kürtçe eleştiri yazısı yahut kitap kritiği yazıya konu olmuş eserin edebi niteliğinden çok dil ve dilin sorunlarını vazetmek üzerinde ilerler. Edebiyatın izler çevresinin ekseri Kürtçe bir eseri, Kürtçeyi iyi kullanıp kullanmadığı, (daha çok dilin maddi yönden kullanım performansının baz alınması manasında) Kürtçenin egemen dillerin etkisinde kalıp kalmadığı (Kürtçe metinlerde Türkçenin kokusunu bulmak, bulmamak başat "edebi kriter" olmaya devam ediyor) içeriğinin birtakım tarihi politik mevzulara çare olup olmadığı, metnin ya da eserin folklorik unsurlar açısından zengin nüveler içerip içermediği üzerinde bir değerlendirme yapmaya meyildir. Konunun nesnesine ve çerçevesine bağlı kalarak konuşma imkânı en başından beri yitirilmiş gibidir. Bu elbette konuşulması ve geçilmesi gereken bir merhaledir. Doğrusu bu yönde ciddi, nitelikli, gayretler de mevcuttur. Ama bunlar şimdilik daha çok bireysel çabalardan ibarettir. Tüm bu sorunların çözülmesi için her şeyden önce doldurulması gereken hendekler, dösenmesi gereken yollar, yıkılması gereken duvarların olduğu gerçeği serinkanlılıkla kabul edilmelidir.

Kabul edilmelidir ki kendi imkan ve kriterleri içinde boy veren, güçlü bir edebiyat üretimine ulaşılabilinsin.

İkili Gündem

Yine Kürtlere ilgili birçok konuda olduğu gibi yukarıda kısmen değinilen nedenlerden ötürü birbirini dışlayan muhatabından farklı şeyler isteyen iki ayrı edebi gündemin varlığına da dikkat çekilebilir. Biri dünyanın hali hazırda bulunduğu merkezden dayattığı Dünya Edebiyatı Gündemi; diğeri de Kürtlerin özel gündemi. Kürt edebiyatçısı bu iki gündemin farklı talepleri arasında sıkça bocalıyor. Hatta aradaki makası kapatmak için canhıraş bir şekilde kimi zaman dilbilimci, kimi zaman akademisyen, hatta eylemci ve aydın kimliği/rolü üstlenmek durumunda kalabiliyor. Elbette bu rollerin her biri yeterli donanım, geniş bir zaman, özel bir çaba istediğinden, beklentiyi tamamıyla karşılamak da haliyle zor oluyor. Birçok sahada olduğu gibi sanatın tüm mecralarında işlerin hakkıyla yapılamamasının, ortaya çıkan ürünlerin iyi niyetli ama sarsak ve savruk olmasının biraz da bu zorluğun ve rol karmaşıklığının neticesi olduğunu söyleyebiliriz. Bundan hareketle çalışma odasındaki Kürt edebiyatçısının bu sorunlarla kafası karışık ve yorgun bir halde bir yandan kendi edebiyatını kalıcı ve büyük yapacak poetik talepler, öte yandan Kürtlüğün ve Kürtçenin beraberinde getirdiği genel yükümlülükler arasında yarılmış bir vaziyette kalakaldığını söylemek de aşırı yorum olmayacaktır.

Bu ikili gündem dayatması, her inceleme ve eleştiri metninde Kürtçe yazılmış edebi bir eser karşısında iki ayrı değerlendirme bagajını da zorunlu kılıyor. Bu iki bagajda duran kriterleri hakkaniyetle gözeterek bir esere yaklaşmak her zaman kolay olmadığı gibi bazen acımasız ya da tam tersi romantik, abartılı değerlendirmeler ortaya çıkabiliyor, maalesef.

Son on yılda alanında uzmanlaşmış onlarca yazar, araştırmacı ve akademisyenin yukarıda bahsi geçen engelleri aşım dar ve zorlu çemberi kırabilmek adına her şeye rağmen nitelikli metinler üretebildiğine şahit olmaksız son derece umut vericidir. Kürt edebiyatı üzerine onlarca özgün tez yazılıp basıldı. Akademik tez ve teorik kitapların basımının yanı sıra *Zarema*, *Wêje û Rexne*, *Nûbihar Akademi*, *Derwaze*, gibi dergilerde yüzlerce nitelikli makale yayınlandı. Belki bugün bize böylesine bir dosya hazırlama cesareti veren de sayıları az, çabaları büyük, metinleri yaratıcı, kalibreleri dünya yazınına denk birçok ismin varlığıdır.

Kürt Araştırmaları Dergisi “Kürt Edebiyatı” gibi kapsamlı bir isimle hazırlayacakları edebiyat dosyasında kendilerine katkı sunmak için şahsıma konuyu açtıklarında dosyanın nasıl olabileceğini değinilen sorunlar çerçevesinde düşünmeye koyuldum: *Hangi Kürt Edebiyatı, hangi konular, hangi dönemler, hangi soru(n)lar?* Böylesine geniş bir konuyu tek bir elden ve bir derginin yalnızca bir

sayısına sığdırmak mümkün olmadığı gibi buna niyet etmenin de hiç mantıklı olmayacağı ortadaydı. Ancak konuları ve tartışmaları çeşitli kılmak gibi bir çaba kesinlikle gerekliydi.

Kürt Edebiyatı kamusunda kırk kişiye yakın isimden dosyamıza katkı sunmalarını talep ettik. Çağrımıza ve özel taleplerimize cevap veren, yazısını zamanında yollayan, yazdığı yazıyı yetiştiremeyen herkese bu münasebetle buradan teşekkür etmek isterim. Üç aylık çalışmanın nihayetinde ortaya daha çok Kurmanci edebiyatının klasik, modern dönem ve türleri üzerine geniş bir yelpazede yazılmış metinler çıktı. Kimi yazıları bir bilgi boşluğunu doldurmak, kimi yazıları bazı mikro tartışmaların önünü açabilmek, kimi yazıları çokça konuşulan ama derinliğine inilmemiş bazı konuları etraflı ve özenli incelemesi, kimi yazı ve söyleşileri de yakın gündeme not düşebilecek nitelikte olması hasebiyle yayınlamayı uygun ve gerekli gördük. Yanı sıra tanıklık edebiyatına dair çarpıcı tespitler yapan J.M. Coetzee'nin *Karanlık Oda'ya Doğru* adlı makalesi ile postkolonyal teorinin tanınmış isimlerinden Ngũgĩ wa Thiong'o'nun bir söyleşisini de ilk defa çevirip dosyaya dahil ettik.

Son olarak dosya editörlüğüne beni layık gören ve her aşamada (makale temin etme, değerlendirme, öneri ve düzeltmelerde bulunma) beni yalnız bırakmayan dergi kurulundaki her isme teşekkürü borç bilirim. Editör hanesine onların isimleri yerine benim ismimin yazılmasının yayın kurulunun teveccühü olduğunu belirtmek isterim. Tüm okuyuculara iyi okumalar dileriz.

Mihemed Şarman
Sayı Editörü

Gelo Klasîkên Edebîyata Kurdî Hene?

Abdurrahman Adak¹

1. Destpêk

Di tarîxa şaristanîyên cîhanê de hin berhemên girîng, karîger û navdar ên hizrî, zanistî û hunerî hene ku ji malê miletekî û çandekê wêdetir malê cîhanê tevî ne. Ev berhêmen ku di esasê xwe de ji nav edebîyateke millî derdikevin bi rêya danûstandinên sîyasî, civakî û edebî li nav miletên cîran ên parzemînî û şaristanîyên di yên cîhanî belav dibin. Bi vî rengî ew berhem ne tenê xîtabî axêferên zimanê berhemê dikin, di heman demê de xîtabî şaristanîyên parzemînî û cîhanê jî dikin. Berhemên bi vî rengî ne berhemên ji rêzê ne û bi mebesta ku ji berhemên di bên cudakirin bi hin navên taybet tînin binavkirin ku di serî de têgeha “klasîk”ê tê. Dikare bê gotin ku “klasîk”a ku têgeheke Rojavayî ye (bi îmlaya orjînal: classique yan ji classic) di roja me de li nav hemû miletên cîhanê bi vî wateya xwe tê bikaranîn. Lêbelê li nav hin miletan hin têgehên di yên ku li kêleka wê bi heman wateyê tînin bikaranîn jî hene. Bo nimûne peyva şaheserê hem li nav Farisan hem jî li nav Kurd û Tirkan, peyva şahkarê li nav Farisan û peyva şakarê jî li nav Kurdan wek hemwateyên klasîkê tînin bikaranîn.

Bêguman klasîkên hemû miletan di heman pileyê de li cîhanê belav nebûne û pilebendîya nasyarîya wan jî ne wek hev e. Di dinyaya me ya îroyîn ya global de hevterîbê heza şaristanîya Rojavayê dema “berhemên klasîk”, bi taybetî jî “klasîkên edebîyatê” tê gotin pêşî ji şaristanîya Rojavayê hin berhemên tînin hişê mirovî. *Îlyada* û *Odyseiyaya* Homeros (Yewnanî), *Komedyaya Îlahî* ya Dante (Îtalyanî), *Romeo û Julieta* Shakespeare (Îngilîzî) û *Fausta* Goethe (Almanî) ji bo vî diyardeyê wek nimûne dikarin bînin dayîn. Bêguman kesên ku bi edebîyatê re mijûl in dê ji edebîyata Latînî *Aeneasa* Virgilius, ji ya Fransî ceribînen Montaigne

1 - Prof. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî, abdurrahmanadak@gmail.com.

ne, ji ya Erebi dîwana el-Mutenebbî (k.d. 965), ji ya Farisî dîwana Hafizê Şîrazî, ji ya Tirkî dîwana Fuzûlî, ji ya Hindê *Kelîle û Dimneya* Beydaba û gelek berhemên di bijimêrin.

Divê bê gotin ku li jorê ji edebîyatên cîhanê xişteyê nimûneyî û temsîlî ya klasîkên cîhanê hatiye dayîn û dibe ku hin ji van berheman di çavên hin pisporan de wek klasîkeke cîhanê neyên qebûlkin ku ev di çarçoveya mijara klasîkan de tiştekî asayî ye. Lêbelê ya girîng ew e ku di roja me de têgeha klasîkên cîhanê têgeheke bingehîn a edebîyata cîhanê ye û mijareke bingehîn a disiplîna edebîyata berwaridî ye. Ev berhem di nav bazareke cîhanî de cih bigirin jî jêdera wan a esasî ziman, edebîyat û çanda miletekî ye. Tu guman tune ye ku ev berhemên klasîk û danerên wan li cîhanê şaristanîya milletên xwe temsîl dikin û bivênevê di nav wê bazarê de îtibarekê jî bexşî milletê xwe dikin.

Li vê derê di çarçoveya armanca vê vekolînê de em ê werin ser edebîyata Kurdî û bi çendîn pirsîyaran dest bi mijarê bikin: Gelo di edebîyata Kurdî ya xwedî rabirdûyê dirêj de ku ev rabirdû ji ya piraniya milletên jorîn ne dirêjtir be ne kêmtir e jî, berhemeke ku di asta cîhanî de payeya klasîkê heq bike tune ye? Eger ev tunebe gelo di nav şakarên edebîyata Îslamî ya Rojhilatê de jî berhemeke edebîyata Kurdî cih nagire? Eger ev jî nebe gelo di çarçoveya edebîyata Kurdî bixwe de amadekirina xişteyê pêşnumayî ya klasîkên edebîyata Kurdî ne pêkan e? Yan gelo ji vê yekê re jî hêj gelekî wext maye?

Bi bawerîya me tiştekî gelekî asayî ye ku mirov li ser vê babetê bifikire, potansiyela edebîyata Kurdî destnîşan bike, aliyên erênî û nerênî derxe meydanê, edebîyata Kurdî bi edebîyatên cîhanê yên xwedî klasîk re muqayese bike û di vê mijarê de bîr û baweriyên xwe parve bike. Dema mirov bîna bîra xwe nîqaşên li ser babeta klasîkên cîhanê û yên edebîyata Tirkî hêj di sala 1897an de ketine rojê dewrûberên edebîyata Osmanî dê baştir bê fêmkirin ku di çarçoveya edebîyata Kurdî de jî rawestana li ser vê mijarê tiştekî girîng e û gelekî bimefa ye. Di esasê xwe de edebîyateke ku di rabirdûya wê de tarîxeke edebîyatê hebe dê klasîkên xwe jî hebe û eger mijara klasîkên edebîyata Kurdî ya ku xwedî tarîxeke kevin e neyê rojevê ev bixwe kêmasîyê mezîn e.

Hêjayî gotinê ye ku li nav Kurdan li ser vê mijarê hin nivîskar û rewşenbîrên ku hizrên xwe îfade kirine hene. Bi taybetî Celadet Alî Bedirxan di sala 1941ê de di Kovara Hawarê de bi sernavê “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” de nivîsarek nivîsîye û li gor tesbîtên me bi taybetî li nav Kurdên Bakur û Rojava kesê ku cara pêşî ev mijar bi nav kirîye Celadet Alî Bedirxan e. Bedirxan di vê nivîsara xwe de têgeha klasîkê pênase kirîye lêbelê li şûna ku nivîskar yan berhemên Kurdî yên ku dikevin kategorîya wê pênaseyê tesbît bike di çarçoveya zanebûna wê serdemê de hemû nivîskarên ku di çarçoveya edebîyata klasîk de

bi Kurdî berhem dane dane nasandin û tesbît û tesnîfa klasîkên Kurdî hiştîye bi hêvîya vekolerên piştî xwe. Di vê vekolînê de em dixwazin hewldana Celadet Berdirxan a di vê babetê de bi bîr bixin, ji cihê ku ew lê maye gaveke bi pêş ve bavêjin û piştî wî bi heştê salî (1941-2021) careke dî mijara klasîkan bixin rojeva dewrûberên edebîyata Kurdî.

Herçiqas hemû klasîk ne aîdê serdemên kevin in di çarçoveya edebîyata modern de jî li ser klasîkan dikare bê rawestan jî ji ber ku pêwendîyeke xurt a têgeha klasîkê bi rabirdûyê re heye tişekî asayî ye ku berî her tiştî mirov ji klasîkên ku bûne malê tarîxê dest bi mijarê bike. Ji ber vê yekê jî sînorenê ve vekolînê tenê de çarçoveya edebîyata Kurdî ya klasîk de be ku Celadet bixwe jî wisa kirîye.

Ji bo ku mirov bikare behsa klasîkên edebîyata Kurdî bike wek gava yekem divê mirov ji terma “klasîk”ê dest bi mijarê bike ku termeke aîdê şaristanîya Rojavayê ye û ji wê derê derbasî edebiyatên di yên cîhanê bûye. Lêbelê piştî vê gavê gava duyem dîsa dê ne babeta me ya esasî be. Lewra berî wê divê mirov ji aliyê klasîkan ve bi taybetî li edebiyatên Erebi, Farisî û Tirkî temaşe bike ku bi edebîyata Kurdî re di heman hewzeya edebî de (edebîyata Îslamî ya Rojhilatê) cih digirin. Piştî vê yekê mirov êdî dikare di çarçoveya krîterên Rojavayî ên ku berhemekê dixin klasîk û muqayeseya klasîkên edebîyata Îslamî de li ser babeta klasîkên edebîyata Kurdî analîzên xwe bike. Loma em ê di vekolînê de pêşî seyra tarîxî ya pênaseyên klasîkê û krîterên wê pêşkêş bikin, piştî li rewşa klasîkên Îslamî binêrin û herî dawî li ser van esasan derbasî mijara “klasîk”ên edebîyata Kurdî bibin. Li vê derê em ê li ser rabirdûya mijara klasîkê li nav Kurdan û bi taybetî jî wek pêşengekî ve mijarê li ser nivîsara Celadet Alî Bedirxan ya ku di vê biwarê de nivîsiye (Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin) rawestin, hebûna klasîkên Kurdî nîqaş bikin, xişteyeke pêşnumayî ya klasîkên bingehîn ên edebîyata Kurdî pêşkêşî dewrûberên edebîyata Kurdî bikin û herî dawî ji bo nasandina klasîkên Kurdî nexşerêyekê xêz bikin.

2. Têgeha Klasîkê

Herçiqas klasîk têgeheke vegir a Rojavayî ye ku ne tenê di hunera edebiyatê de di heman demê de ji hunerên bedew bi taybetî di peyker, avahîsazî û mûsiqiyê de tê bikaranîn jî² di vekolînê de em ê ji aliyê hunera edebiyatê ve li ser têgehê rawestin. Dema em li seyra tarîxî ya geşedana têgeha klasîkê dinêrin em dibînin ku ne bi heman peyvê be jî di serdema antîk a Grekê de (teqribî BZ500-PZ320) di biwara klasîkê de têgihîştinek heye. Di vê serdemê de li Atînayê berhemên hunerî bi dustûra “bedewîya bipîvan” hatine sazîkirin ku ev taybetîya sereke ya klasîkên

2 - Selçuk Mülayim, “Antikten bugüne Klasik Anlayışları”, Sanat ve Klasik, Klasik İst. 2006, r. 6.

wê serdemê ye. Di wê serdemê de têgeha “kanon”ê ku tê wateya pîvan û dustûrê di heman demê de klasîkê jî îfade dike.³ Wek têgeh bikaranîna peyva “klasîk”ê aîdê serdema împeratorîya Romaya antîk e (teqrîbî sedsal I-III). “Klasîk” di zimanê Latînî de yan ji “classise”ê tê ku wateya wê yekîneya keştîyan e, yan jî ji “classicus” tê ku wateya wê çîn e. Cara yekem nivîskarê Romayî Aulu-Gelle/ Aulus Gellius/ (k.d. 180) di sedsala duyem a zayînî de “classicus assiduusque scriptor” bi maneya nivîskarê xwedî nirx, navdar, maldar û ji xelkê dûr⁴; “scriptor classicus” bi wateya nivîsên çîna bilind û “proletarius scriptor” jî bi wateya nivîsên çîna proleter bi kar anîye ku di wê demê de civak ji şeş çînan pêk dihat.⁵ Bi vî awayî di wê serdemê de edebîyata ku ji destê çîna herî bilind derketiye wek klasîk hatîye binavkirin. Di vê serdemê de têgihîştina klasîkê li ser esasê klasîzma Grekê ava dibe.⁶ Romayîyan edebîyata Grekê wek klasîkên xwe qebûl kirine û hewl dane ku li pey şopa wan biçin. Di heman demê de Cicero û Vergiliusê ku edebîyatvanên girîng ên serdema zêrîn a edebîyata Romayê ne ji aliyê peyrewên xwe ve wek klasîkên Romayê hatine qebûlkirin.

Di edebîyata Latînî ya serdema navîn de -ji qebûlkirina dewleta Romayê ya Mesîhîtiyê (teqrîbî sedsal IV) heta bi hatina serdema Ronensansa edebî (teqrîbî sedsal XV)- ji têgihîştina klasîzma serdemên antîk ên Grek û Romayê dûrketinek çêbûye û ji aliyê pîvan û zewqa edebî ve edebîyateke lawaz derketiye meydanê. Bi hatina Ronensansê re hem dawî li serdestiya Latînî hatîye hem jî têgihîştina klasîzma serdemên antîk ji nû ve hatîye vejandin. Di vê serdemê de zimanên Ewropayê yên wek Îtalî, Frensî, Îspanî, Îngilîzî û Almanî digel vê têgihîştinê wek zimanên millî û edebî avabûna xwe temam kirine û klasîkên xwe derxistine meydanê.⁷ Li ser vê paşxanê di sedsala XVIIem de li Frensayê bizaveke edebî ya bi navê klasîzmê ava bûye ku nûnerên vê bizavê nivîskarên serdema klasîk a Grek û Romayê şopandine û estetîka berhemên wan model wergirtine. Ji bo vê jî nivîskarên klasîk ên sedsala XVIIem bi xwendin û tercumekirina berhemên serdema klasîk xwe perwerde kirine.⁸ Di vê serdemê de li Ewropayê berhemên ku di polan de ji bo fêrkirina zimanên Yewnanî û Latînî hatine bikaranîn wek “klasîk” hatine binavkirin.⁹ Ji vê serdemê şûnde têgeha “klasîk”ê ji bo berhemên Grek û Romaya antîk hatîye bikaranîn û serdemên ku ev berhem tê da hatîne dayîn jî wek “serdema klasîk” hatîye binavkirin. Çawa ku di “Encyclopaedia Britannica”yê de jî

3 - Mülayim, g.n., r. 4-5.

4 - Sainte Beuve, “Klasik Nedir”, *Pazartesi Konuşmaları I*, (wer. Fehmi Baldaş), MEB Yayınları, çapa duyem, İstanbul 1990, r. 316.

5 - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, Dezgay Wergêran, Hewlêr 2006, r. 15; Hêvî Berwarî, *Rêbazên Edebî*, Weşanên Êketiya Nivîserên Kurd (çapa yekem), Dihok 2010, r. 82.

6 - Mülayim, g.n., r. 4.

7 - Beuve, g.n., r. 316-317.

8 - Emel Kefeli, *Batî Edebîyatında Akımlar*, (çapa sêyem), Dergah, İstanbul 2017, r. 25-30.

9 - Kefeli, b.n., r. 25.

tê îfadekirin berhemên klasîk ên serdema klasîk bingeha edebiyata Rojavayê ne û ji bo wê di asta destpêkê de ne.¹⁰ Çawa tê dîtin “klasîk” xwedî seyroke tarîxî ya dûrûdirêj e ku ji klasîzma Grekê dest pê dike, ji wê derê digihîje Romaya antîk, ji wê derê xwe di ser serdema navîn re çengî klasîzma Ewropî dike û ji wê derê jî diherike roja me.

Heta bi vê derê taybetmendiyên klasîkê di sê xalan de dikarin bîn xulasekirin: Hunera bipîvan, dêrîni û aidiyeta çineke bilind. Jixwe pênaseyên klasîk ên klasîkê her di vê çarçoveyê de hatine kirin. Li gor pênaseya ku rexnegirê Frensî Sainte Beuve di sala 1850î de kirîye klasîk, helbestvanekî kevin e ku ji berê ve teqdîra herkesî heq kirîye û pisporiya wî ya di qada wî de hatiye pesendkirin.¹¹ Di vê çarçoveyê de berhema klasîk jî wek berhemên resen û mukemmel ku çiqas zemanekî zêde di ser wan re derbas bibe jî tiştêkî ji nixê xwe winda nakin dikare bê pênasekirin. Çawa ku Hilmi Yavuz jî îfade dike pîvana herî baş a ku berhemekê dike klasîk mayîndebûna berhemê ya li hemberî zeman e. Loma berhemên ku ji sedsalên rabirdûyê gihîştine roja me berhemên klasîk in.¹²

Ji aliyekî dî ve piştî derketina bizava klasîzmê dustûrên vê bizavê jî -qet nebe ji aliyê endamên vê bizavê ve- di nav taybetîyan klasîkan de hatine rêzîkirin. Çawa tê zanîn di klasîzmê de dustûrên zemanê berê yên ku wê demê jî, îro jî û sibe jî tu carî naguherin esas in.¹³ Loma di klasîzmê de têgihîştineke gerdûnî ya sitûnî heye ku hem zemanê berê hem jî paşerojê vedigire nav xwe. Hilmi Yavuz di vê çarçoveyê de berhemên klasîk wek berhemên ku di kîjan serdemê de bîn xwendin kêşe û problemên wê serdemê dibersivînin pênase dike û ji bo vê yekê balê dikişîne ser navê watedar a berhema Jan Kott (k.d. 2001) a ku di biwara şanoyên Shakespeareî de nivîsiye: *Shakespeare our Contemporary (Hevçaxê me Shakespeare)*.¹⁴ Peter Brookê ku ji bo vê berhemê pêşgotinek nivîsiye hevterîbê navê berhemê şîroveyeke weha dike ku aliyê gerdûnî yê Shakespeareî gelekî xweş hatiye îfadekirin: “Jan Kott tam mirovekî serdema Elizabethê ye. Shakespeare hevçaxê Kott e. Kott jî hevçaxê Shakespeare e. Ew di biwara Shakespeare de rasterast û wek ku di wê serdemê de jîyaye ji zimanê yekem diaxife”¹⁵ Ev perpektîf nîşan dide ku kesayetê klasîk ji heyama xwe tê heyama me û em jî ji heyama xwe diçin heyama wî. Ev gerdûnîbûna sitûnî jî wek taybetîyeke klasîkê derdikeve pêş.

10 - The Editors of Encyclopaedia Britannica, “Classical literature”, Encyclopaedia Britannica, <https://www.britannica.com/art/lyric> (21.03.2021).

11 - Beuve, g.n., r. 315.

12 - Hilmi Yavuz, “Bizim Klasiğimiz Var mı?”, *Denemeler*, Boyut yay., İstanbul 1996, r. 30.

13 - Kefeli, b.n., r. 25-30.

14 - Yavuz, g.n., r. 31.

15 - Peter Brook, “Pêşgotin”, *Jan Kott Çağdaşımız Shakespeare*, Mitos Boyut Yayınları, wer. Teoman Güney, İst. 1999, r. 8.

Gerdûnîbûna kesayetê klasîk/berhema klasîk ne tenê bi awayekî sitûnî ji zemanên berê heta bi roja me ye, ew di heman demê de bi awayekî asoyî di nav hemû milletên cîhanê de jî gerdûnî ye. Li gorî helbestvan û teorîseyenê edebîyatê T. S. Eliot (k.d. 1965) di berhema klasîk de şêwazeke hevpar a gerdûnî heye ku ev yek zêdetir ji aliyê naverok û hestên dînî yên hevpar ve xwe dide der. Ji ber ku Goethe behsa hin tiştên xwecihî û demkî yên Almanan dike ew nabe klasîkekî gerdûnî, ew tenê klasîkekî milletê Alman e û di çavê bîyanîyekî de şaristanîya Rojavayê tevî temsîl nake.¹⁶ Berhema klasîk a gerdûnî ne aîdê miletekî tenê ye, ew aîdê milletên cîhanê tevî ye. Li gor ku Kaplan vediguheze A. Rivarol (k.d. 1801) derheqê vê mijarê de weha difikire: Berhemên ku miletek pê şanazî dike klasîkên wî milletî ne û berhemên ku hemû millet pê şanazî dikin klasîkên herkesî ne.¹⁷ Loma dikare bê gotin ku eger berhemek çawa ku xîtabî axêferên zimanê xwe dike bi heman rengî xîtabî milletên bîyanî jî bike klasîkeke gerdûnî ye, eger xîtabî milletên bîyanî neke û tenê xîtabî axêferên zimanê xwe bike ew klasîkeke millî ye.

Li gor Encyclopaedia Britannicayê klasîk serdemeke edebî ya her zimanî destnîşan dike ku ew serdem bi berhemên edebî yên mukemmel û xwedî tesîreke mayînde derdikeve pêş. Di edebîyata Yewnana kevnar de maweya ku berî zayîne bi 500î dest pê dike û heta bi 320ê dewam dike serdemeke wisa ye. Serdema Zêrîn a Romayê berî zayîne bi 70yî dest pê kirîye û heta bi 18ê mîladî dom kirîye. Nîveka duyem a sedsala XVIIem ji bo edebîyata Frensî û maweya 1660-1714an jî ji bo ya Îngilîzî wek serdemên zêrîn ên klasîk tên qebûl kirin.¹⁸ Pênaseya Edmond Scherer (k.d. 1889) ya ku ji aliyê Kaplan ve tê veguhestin jî paralelî pênaseya Britannicayê ye: “Di tarîxa hemû milletan de ji aliyê ziman û hizrê ve serdemeke mezin a geşedanê heye ku berhemên vê serdemê klasîkên wî milletî ne.”¹⁹ Eliot jî dibêje ku klasîk tenê di dewrên kemalê yên medenîyeteke û ziman û edebîyateke de dikarin derkevin meydanê û di dewra piştî Elizabeth (1558-1603)ê de daketina asta edebî ya şanoya Îngilîzî ji bo vê yekê nîşaneyek e.²⁰ Ehmed Midhed (k.d. 1912) jî bi şîroveyên xwe mijarê zêdetir zelal dike: “Heta zimanek negihîje dewra xwe ya kemalê bi wî zimanî berhemên klasîk nayên nivîsîn. Loma berhemên van dewran wek berhemên klasîk nayên qebûl kirin. Serdema Perikles (BZ.446-431) a Yewnanê û serdema Augustos (BZ. 27-PZ.14) a Romayê heq didin vê hizrê. Heman tişt bo edebîyatên Erebi û Farisî jî wisa ye. Piştî klasîkên ku di van serdeman de hatine dayîn klasîkên nû nehatine dayîn û ji wê wêdetir nehatine teqlîd kirin

16 - T. S. Eliot, *Edebîyat Üzerine Düşünceler*, wer. Sevim Kantarcıoğlu, Paradigma, İstanbul 2007, r. 171, 175-176.

17 - Ramazan Kaplan, *Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*, Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, Ankara 1998, r. 23-24.

18 - The Editors of Encyclopaedia Britannica, “Classical literature”, Encyclopaedia Britannica, <https://www.britannica.com/art/lyric> (21.03.2021).

19 - Kaplan, b.n., r. 23-24.

20 - Eliot, b.n., r. 159.

jî.”²¹ Di encamê de derketina di serdemeke zêrîn a şaristanîyekê de wek taybetîyeke dî ya klasîkan derdikeve pêş. Serdemên bi vî rengî di jîyana miletan de guherîn û nûjenî ne. Di van serdeman de tiştên nû yên di jîyana miletan de berî her tiştî di zimanê wan de tê dîtin. Hizrên nû ku di encama vê guherîn û nûjenîyê de bi zimanekî nû tèn gotin klasîkan derdixin meydane. Danteyê ku zimanê Îtalî vejandîye ji bo vê diyardeyê nimûneyeke girîng e.²²

Taybetîyeke dî ya klasîkê jî sazîrîna tradîsyoneke edebî ye. Di dawîya sedsala XVIIem de di çarçoveya bizava klasîzmê de li Ewropayê klasîk ji wê edebiyat û hunera bilind re dihat gotin ku hêjayî şopandin û teqlîdê bû.²³ Sainte Beuve tam di vê çarçoveyê de ji bo têgeha klasîkê tiştêkî daîmî û rûniştî ku di nav miletekî de bi awayekî yekpare bibe tradîsyon, hêdî hêdî ava bibe û bînavber ji nifşekê derbasî nifşa dî bibe pêwîst dibîne. Li gor wî nivîskarekî jêhatî çiqas xwedî zeka û muxeyyîleyeke awarte be jî eger bi carekê ronî bide û tu tesîrekê li pey xwe nîşan nede ew nabe klasîk.²⁴ Li gor Calvino ku rexnegirekî girîng ê edebîyatê ye sedsala me ye klasîk şopên xwendinên ku berî me hatine kirin hildigirin û rengvedanên xwe yên li ser çandên ku tê re derbas bûne digihînin me.²⁵ Bi awayekî siruştî tradîsyona edebî ya ku klasîk saz dike hem bi edebîyata millî hem jî bi edebîyatên cîhanê re pêwendîdar e. Klasîk bi vê mîrasa xwe pêşî di avakirina edebîyata millî de û piştî jî di avakirina edebîyata cîhanê de roleke girîng dilîzin.

Çawa tê dîtin heta bi vê derê hunera bi pîvan, dêrînîbûn, gerdûnîbûn, mayîndebûn, serdemeke zêrîn û avakirina tradîsyonekê wek taybetmendiyên berhema klasîk derdikevin pêş. Li vê derê bi armanca ku pirsên wek; “Gelo berhemek çawa dikare ji zemanên berê heta bi roja me mayînde bimîne?”, yan jî “Gelo berhemek çawa dikare van taybetîyan tevan hilgire?” bî bersivandin divê aliyê hunerî ye klasîkan bi taybetî bê dupatkirin. Li gor me krîtera herî girîng ku van taybetîyan bexşî berhema edebî dikin aliyê wan ên edebî ye. Tu guman tune ye ku berhemên berê yên mayînde bi saya vî aliyê xwe ye edebî digihîjin roja me û tradîsyoneke edebî ava dikin. Tiştêkî pîr asayî ye ku berhema edebî bi qasî hêza xwe ya edebî bikare mayînde bimîne. Bêguman ev yek ji siruştî edebîyatê neşet dike ku esasen beşek ji hunerên bedew e.

Bêguman ji bo derketina vê hunerê divê nivîskarê berhema klasîk bixwe kesayetekî gihîştî û xwedî şîyan be. Nicolas Boileau (k.d.1711) ku wek damezirînerêkî bizava klasîzmê tê qebûl kirin edebîyatê wek pîşeyekê dijwar li qelem dide û ji bo serkeftina di edebîyatê de hebûna qabilîyeteke ku bi çêbûna mirovî re tê dayîn

21 - Kaplan, b.n., r. 28-29.

22 - Kaplan, b.n., r. 29.

23 - Kefeli, b.n., r. 25-30.

24 - Beuve, g.n., r. 317.

25 - Italo Calvino, *Klasikleri Niçin Okumalı?*, wer. Kemal Atakay, YKY Yayınları, İstanbul 2008, r. 11-17.

şert dibîne. Li gor wî eger ev qabilîyet tunebe nivîskar dê bibe hêsîrê hizrên xwe.²⁶ Eliotê ku bi taybetî li ser vê mijarê radiweste ji derketina klasîkekê hebûna zihnekî kamil bi nivîskarî/ê re şert dibîne.²⁷ Bi kurtî qabilîyet hunera bilind, ew jî mayîndebûn û taybetmendiyên dî yên klasîkê encam dide.

Ji ber ku di klasîkan de edebîbûn roleke girîng dilîze divê mirov hinekî jî li ser pirsra “Gelo krîterên ku berhemekê dixin berhemeke edebî çi ne?” raweste. Gelo di Grek û Romaya antîk û di bizava klasîzmê de têgeha ku bi şeweya “hunera bipîvan” derbas bû di nav xwe de çi dihevine? Kefeli di çarçoveya edebîyata Rojavayê de sedemê temendirêjîya berhema klasîk bi zimanê wê yê esîl û mukemmel ve girê dide.²⁸ Di esasê xwe de di klasîkan de dupatkirina li ser hunerê taybetîyeke bizava klasîzmê ye. Li gor ku Beuve Akademîya Frensî (Academie Française) di bin tesîra bizava klasîzmê de û bi dijayetîya romantîzmê pîvana esasî ya klasîkan kirine huner. Di edîsyona sala 1835ê ya ferhenga Akademîyê de klasîk wek nivîskarê ku di zimanekî de bûye nimûne/model hatîye pênasekirin û nimûnebûn jî di çarçoveya rêzikên hunerî yên vegotinê yên guhernebar de hatîye destnîşankirin. Zewqa saf, îfadeyên xweser, hevokên nûjen û hessasîyeta li ser vegotina hizran wek taybetmendiyên hunerî yên klasîkan hatine qebûl kirin. Hêjayî gotinê ye ku li gor Beuve pênaseya klasîkê ya di çarçoveya hunerê de nêrîneke subjektîf a klasîzmê ya li dijî romantîzmê ye. Beuve vê têgihîştinê berteng dibîne û pênaseyeke berfirehtir a klasîkê jî dide.²⁹ Di sahaya Osmanî ya serdema Tenzîmatê de Ehmed Mîdhedê ku jêderên Ewropî etud kirîye xeyal û belaxetê wek du taybetmendiyên klasîkê destnîşan dike ku her du jî du esasên bingehîn ê edebîbûnê ne. Li gor wî eger berhemek ji van alîyan ve ji emsalên xwe ne pêşdetir be ew nabe klasîk.³⁰ Mîdhed di dewamê de ji bo klasîkbûna berhemê gelek xalên dî yên bi îfade û naveroka berhemê re têkildar jî dijimêre. Li gor wî ji bo ku berhemek bibe klasîk divê; di çarçoveya rêzikên ziman, bedî’ û beyanê de be, mijara wê pak û dirust be, ji aliyê şewaza nivîsînê ve spehî û vekirî be, armanca wê fêambar be, mesaja wê bi nirx be, ne li dijî nirxên dînî-tarîxî-exlaqî be, bi awayekî mayînde bigihîje nîfşên paşerojê û mirov bicibînin, bi kêf bixwînin û tamekê jê bistînin.³¹

Tam li vê derê divê mirov li ser tam û lezzeta ku ji edebîbûnê tê standin raweste. Lewra tamstandina ji berhema klasîk û xwendina wê ya bi kêf jî wesfekî girîng ê klasîkê ye û wek pîvaneke klasîkbûnê hatîye destnîşankirin. Li gor veguestina

26 - Nedim Doğan O’Runeer, Nicolas Boileau ve Yazma Sanatı Adlı Eseri Üzerine, 2019, https://www.academia.edu/40789142/Nicolas_Boileau_ve_Yazma_Sanatı_Adlı_Eseri_Üzerine

27 - Eliot, b.n., r. 159.

28 - Kefeli, b.n., r. 25-30.

29 - Beuve, g.n., r. 319-321. Hêjayî gotinê ye ku di edîsyona nehem a ferhenga Akademîya Frensî de ku niha li ber destan e maddeya klasîkê bi manayên nû hatîye berfirehkirin. Bnr. <http://www.dictionnaire-academie.fr/article/A9C2532> (02.04.2021).

30 - Kaplan, b.n., r. 13.

31 - Kaplan, b.n., r. 25-26.

Durmuş, Boileau klasîkê di vê çarçoveyê de pênase dike: “Berhema ku bi awayekî giştî li xweşîya herkesî biçe û herkes tam û lezzetê jê bistîne klasîk e. Ev heyê ku ev tam û lezzeta tam nayê îfadekirin, tê hîskirin. Lêbelê ev yek bi hizr û îfadeyên dirust saz dibe. Ew hizreke wisa ye ku herkes pesend dike lêbelê cara pêşî tê îfadekirin.”³² Bi awayekî siruştî metnekî ku li gor krîterên estetîka edebîyatê hatibe nivîsîn dê vê tam û lezzetê bide xwînerê xwe ku ev yek hêmaneke bingehîn a pênase û mahîyeta edebîyatê ye.

Xaleke dî ya ku di mijara klasîkan de divê mirov li ser raweste xwendina wan e. Pir aşkera ye ku rêjeya xwendina klasîkeke cihanê ya ku bi taybetmendiyên xwe yê newaze tam û lezzetekê dide xwînerê di asteke pir bilind de be. Edebîyatvanê Îtalyan Calvino ku wek teorisyenekî hevçax ê mijara klasîkê tê qebûl kirin di berhema xwe ya bi navê “Klasîk Çima Divê Bê Xwendin?” de li ser xwendina klasîkan tesbîtên ku zihne mirovî vedikin rêz dike ku puxteya wan weha dikare bêîfadekirin:³³

- » Klasîk ew berhem in ku ji bo wan ji îfadeya “ez dixwînim” zêdetir îfadeya “ez ji nû ve dixwînim” tê bikaranîn.
- » Nexwendina klasîkan di ciwanîyê de ne kêmasîyek e. Dema berhemên klasîk piştî ciwanîyê di temenê kemalê de tên xwedî tameke cuda ya xarîqulade tê wergirtin. Loma klasîk ew berhem in ku çî yê duyem bin çî yê yekem bin di hemû xwendinên temenê kemalê de dewlemendî û tameke taybet didin.
- » Di xwendina ciwanîyê de ji ber sedemên wek bêtecrubîyê ji klasîkan tam sûd neyê wergirtin ji dirûvekî didin rûdanên dahatûyê û werin jibîrkirin ji vê rola xwe her dilîzin. Îcar dema ji nû ve tên xwendin ev mekanîzmaya navekî xwe dide der. Klasîk xwe bide jibîrkirin ji li hundirê mirovî dendikekê direşîne. Loma klasîk ew berhem in ku çî di esnayê jibîrkirinê de be çî di dirûvê derhişî de bi mekanîzmaya xwe ya navekî be her dem hebûna xwe didin nîşandan.
- » Klasîk ew berhem in ku dema di temenê kemalê de ji nû ve tên xwendin xwînerê di guherîye û ew xwendin dibe xwendineke nû.
- » Her xwendineke nû wek xwendina yekem ji bo keşîfkirina klasîkê ye.
- » Klasîk çî demê bê xwendin tu carî dawî li mesajên wan nayê. Derheqê klasîkan de her dem hin tiştên gotin, danasîn, analîz û rexneyên wan tên nivîsîn lêbelê ev ne mayende ne. Klasîk xwe ji wan paqij dikin û wek xwe dimînin.
- » Di klasîkan de gelek caran tiştên ku tên zanîn cih digirin lêbelê dema mirov wan dixwîne mirov dibîne ku ew tiştên gelekî nû, derî hevîyan û bêmanend in.
- » Saîqa xwendina klasîkan ne erke e heskirin e. Di navbera gerdûn û berhema klasîkê de hevsengîyek heye. Hemû rûdan bi klasîkê ve tên girêdan û tevahîya gerdûnê dirûvê klasîkê werdigire.

32 - Tuba İsen Durmuş, “Türk Edebiyatında Klasik Algısı Üzerine Düşünceler”, *Millî Folklor*, 2011, sal 23, j. 90, r. 38.

33 - Calvino, b.n., r. 11-17.

- » Dijayetîya mirov bi mesaja klasîkê re hebe jî mirov nikare laqeydî wê bimîne û bêyî wê -digel dijayetîya wê- xwe pênase bike.
- » Klasîka mirovî li pêşîya klasîkên dî ye. Lêbelê mirovê ku berî klasîka xwe yên dî xwendibin dema ya xwe dixwîne demilsdest cihê ya xwe di nav şecereya klasîkan de ferq dike.
- » Berhemên rojane li hemberî klasîkan wek dengê keşmekeşîya trafikê ya derveyî pencereyê ne; divê mirov nekeve nav wê keşmekeşîyê lêbelê bê wê jî tev-negere û klasîkan ji nav rûdanên rojane analîz bike. Mijûliyên rojane çiqas ne li rê bin jî klasîk wek wî dengê piştî pencereyê her mayînde ye.”

Calvino di xala dawîn de li ser sazkirina hevsengîyekê di navbera berhemên klasîk û yên rojane de disekine. Lêbelê ev xal jî daxil hemû xalên ku nivîskar behsa wan dike di esasê xwe de bi xwendina klasîkan re pêwendîdar in ku navê berhema wî jî vê derê tê. Bi awayeki siruştî klasîka ku evqas zêde bê xwendin di wê astê de dê bê çapkirin jî. Tam li vê derê pêwendîya klasîkê ya bi kanonê re tê rojevê. Lewra berhema klasîk a ku zêde bê xwendin û bi caran bê çapkirin rê li ber vedibe ku bibe kanon.³⁴ Kanona ku wateya wê ya ferhengî cedwel e û jêcudakirina rastî û şaşîyê îfade dike, wek têgeheke dêrê tê maneya xiştêya berhemên pîroz ya ku kes nikare dest bidîyê û tiştêkî lê zêde yan jî kêmkî bike. Di sedsala XVIem de têgeha kanonê jî bo edebîyatê jî hatîye bikaranîn. Kanona edebîyatê normên sabit ên edebîyatê ne ku bi wan norman berhemên baş jî yên nebaş tînen cudakirin. Berhemên ku dibin kanon êdî wek berhemên pîroz tînen qebûlkin; kes nikare dest bide wan û di biwara nivîskar yan jî berhemê de gengeşeyeke nerênî bike. Tiştên ku ew nîşanî mirovan didin dibin qanûnên qetî. Klasîkek dikare bibe kanoneke bi vî rengî lêbelê di navbera klasîk û kanonê de cudahiyeke bingehîn heye. Di klasîkê de berhemên ku ne klasîk in wek berhemên bînxayî qebûlkin lêbelê di kanonê de berhemên ku li derve tînen hiştin biçûk tînen dîtin û tune tînen qebûlkin.³⁵

Mirov dikare di çarçoveya vê cudahiya klasîk û kanonê de jî di biwara klasîkê de hin taybetmendiyên destnîşan bike. Ya yekem berhemên klasîk dikevin nav hîyerarşîyê û wek klasîkên asta yekem û yên asta duyem yan jî klasîkên cîhanî û klasîkên millî dikarin bînen dabeşkin. Ya dî jî klasîkek dikare di kategoriya kanonê de jî bê nirxandin. Bo nimûne nivîskarên ku Harold Bloom (k.d.2019) dixwe nav kanona Rojavayê di heman demê de klasîkên Rojavayê ne ku Shakespeare di serê wan de tê.³⁶ Li alîyekî dî lo gorî Eliot (k.d. 1965) klasîkên edebîyata Îngilîzî tunene³⁷ lêbelê li gorî Bloom Shakespeare serê kanona Rojavayê ye. Bêguman nêrînen van her du rexnegirên girîng ên edebîyatê jî bo ku di biwara klasîkbûna

34 - Durmuş, g.n., r. 42.

35 - Turgay Anar, "Türk Edebiyatında Edebiyat Kanonu", *FSM İlmî Araştırmalar ve İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi*, 1 (2013) Bihâr, r. 56-58.

36 - Harold, Bloom, *Batı Kanonu*, wer. Çiğdem Pala Mull, İthaki, İst. 2014, r. 53-82.

37 - Eliot, b.n., r. 166, 173.

berhemekê de asayîbûna gihîştina darazên ji binî ve dijiyek nişanî me didin gelekî balkêş in. Çawa ku hiyerarşî û pilebendîya klasîkan tiştêkî asayî ye di biwara klasîkbûna berhemekê de hebûna darazên dijiyek jî tiştêkî asayî ye.

Herçiqas dema klasîk tê gotin zêdetir berhemên ku di çarçoveya dustûrên bizava klasîzmê de li ser esasên klasîzma antîk hatine nivîsîn tîne fêmkirin jî ne lazim e hemû berhemên klasîk jî nav bizava klasîzmê derkevin. Bêguman berhemên bizavên di jî bi dêrîni, xweserî, şêwaza edebî û tesîra xwe dikarin bibin berhemên klasîk. Lêbelê ev heye ku krîterên ku payeya klasîkê didin berhemekê, bi awayekî tradîsyonel, di çarçoveya dustûrên bizava klasîzmê de ne ku paşxana wê ya tarîxî vedigere heta bi serdema klasîk a antîk. Hêjayî gotinê ye ku di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî bizavên cuda hene. Bêguman di edebîyata Kurdî de bizavên edebî yê ku li pey hev beramberî klasîzm, romantîzm û realîzm bîne tunene. Taybetmendiyên van bizavan di edebîyata Kurdî de pêkve tîne dîtin. Herweha di edebîyata Kurdî de bizavên edebî yê Îranî û yê xwemalî jî tîne dîtin ku ev mijareke derî sînore vê vekolinê ye.

Em ê vê beşê bi xulasekirina krîterên ku berhemekê dikin klasîk bi dawî binin û van krîteran di deh xalan de rêz bikin:

1. Dêrînbûn
2. Aîdiyeta çîneke bilind
3. Şîyana nivîskarî
4. Asta bilind a hunerî
5. Derketina jî nav şaristaniyeke mezin yan serdemeke zêrîn
6. Gerdûnbûn
7. Mayîndebûn
8. Sazkirina tradîsyoneke edebî
9. Xwendin û çapkirin
10. Wergirtina tam û lezzeta derûnî

3. Mijara Klasîkan ji Pencereya Edebîyatên Îslamî ve

Herçiqas dema klasîkên cîhanê tê gotin berî hemûyan yê Rojavayî tîne bîra mirovî jî bêguman li cîhanê klasîkên şaristaniyên di jî hene. Bi taybetî edebîyata Rojhilatê ya Îslamî di nav edebîyata cîhanê de cihekî xwe yê girîng heye ku edebîyata Kurdî ya klasîk jî beşek jê ye. Ji ber vê pêwendiyê jî analîza klasîkên Kurdî bîyî analîza klasîkên Îslamî ne pêkan e. Heta mirov rewşa edebîyatên Erebî û Farisî ku jêderên edebîyata Kurdî ne û rewşa edebîyata Tirkî ku cîranê edebîyata Kurdî ye baş fêm neke mirov dê nikaribe di biwara edebîyata Kurdî de jî bigihîje daraz û encameke dirust.

Dema mirov ji aliyê klasîkan ve li edebîyata Îslamî dinêre³⁸ tê dîtin ku di nav endamên vê hewzeya edebîyatê de edebîyatên Erebi û Farisî derfeta derxistina klasîkên cihanê bi dest xistine. Ev her du edebîyatên ku ev derfet bi dest xistine çawa ku damezirînerên edebîyata Îslamî ne di heman demê de ji edebîyatên di yê Îslamî yê wek Kurdî, Tirk û Urdu re jî bûne jêderên esasî. Çawa ku edebîyatên millî yê miletên Ewropî li ser esasê edebîyatên antik ên Grek û Romayê ava bûne bi heman rengî edebîyatên miletên Misilman jî li ser esasên edebîyatên Erebi û Farisî ava bûne. Hevterîbê vê rewşê çawa ku wek edebîyatên jêder ji Yewnanî û Latîni klasîkên cihanê derketine ji Erebi û Farisî jî derketine ku ev tiştêkî fêmbar e. Dikare bê gotin ku edebîyatên ku damezirînerên şaristanîyekê, yan jî hewzeyekê ne bi awayekî siruştî klasîkên xwe jî derxistine.

Ji aliyekî di ve jî edebîyatên Erebi û Farisî xwedî zimanekî standart ê edebî û serdemeke zêrîn a desthilatdarîyê ne, di encama van de edebîyateke wan a bihêz ava bûye û derketina klasîkan jî di encama van tevan de pêk hatîye. Dema em li edebîyatên di yê Îslamî yê wek Kurdî, Tirkî û Urdu ku li ser esasê edebîyatên Erebi û Farisî ava bûne dinêrin em dibînin ku di babeta klasîkan de rewşeke dilxweşker a van edebîyatan tune ye û ji van edebîyatan berhemên klasîk ên ku bûne malê cihanê derketine. Bêguman di çarçoveya edebîyatên millî de klasîkên van edebîyatan hene. Lêbelê klasîkên van edebîyatan di bin siha jêderên xwe de mane û edebîyatên cihanê li aliyekî di nav edebîyatên Erebi û Farisî bi xwe de jî tam belav nebûne.

Di vê mijarê de edebîyatên Ewropî ku jêderên wan Yewnanî û Latîni ne û yê Rojhilatî ku jêderên wan Erebi û Farisî ne di xaleke esasî de ji hev cuda dibin. Dema miletên Ewropî edebîyatên Gerek û Romayê esas digirtin şaristanîya Ewropî ji her aliyê ve ketibû nav geşedaneke hizrî, civakî û zanistî. Lêbelê dema miletên Misilman edebîyatên Erebi û Farisî esas digirtin şaristanîya Îslamî ketibû nav lawazî û paşveçûnê. Ji ber vê yekê jî edebîyatên Ewropî di bi siha jêderên xwe de neman û klasîkên xwe derxistin lêbelê yê Îslamî nekarîn vê derfetê bi dest bixin. Sedemêkî di jî ew e ku edebîyatên Kurdî, Tirkî û Urdu nekarîne wek edebîyatên Erebi û Farisî zimanekî millî ê standart ava bikin. Wan seyrra xwe ya edebî di zeman û mekanên cuda de di çarçoveya diyalektên edebî yê cuda de domandine. Li şûna ku hemû potansiyela edebî ya van miletan di forma zimanekî standart de derkeve meydanê ev potansiyel di nav çendin formên cuda de belawela bûye û derketina edebîyateke bihêz a xwedî klasîk ji dest çûye.

Bêguman em ê li vê derê jî van edebîyatan re cihekî zêde veneqetînin. Ji ber ku edebîyata Farisî lutkeya edebîyata Îslamî temsîl dike û ji aliyê coxrafi û çandî ve Farisî û Kurdî jî hev nayên cudakirin edebîyata Farisî û jî ber ku edebîyatên Tirkî

38 - Ji bo perspektîfêke giştî di biwara klasîkên Îslamî de bnr. Yusuf Çetindağ, "Şark Klasikleri ve Özellikleri", *Dergâh*, b. 16, j. 191, 2006, r. 9-15.

û Kurdî cîran in û di navbera wan de pêwendîyeke xurt a îdarî heye edebîyata Tirkî ji bo me pir girîng in. Dema em li edebîyata Farisî dinêrin em dibînin ku gelek klasîkên wê yên ku bo zimanên Rojavayî hatine wergêran hene û van klasîkan bi rastî jî di nav zimanên Ewropî de şopeke mezin hiştine. Hêj di sedsala XVIem de *Gulistana* Se'dîyê Şîrazî bi rêya wergêranê bo zimanên sereke yên Ewropî hatiye veguhestin (wergêrana Frensî: 1634, ya Almanî: 1635 û ya Latînî: 1651) û ji wê rojê heta bi roja me bo piranîya zimanên Ewropî bi dehê caran wergêranên wê hatine kirin.³⁹ Se'dî di nav edebîyatvanên Ewropî de tesîreke wisa ava kirîye ku bi navê "Se'dîşinasî"yê qadeke serbixwe a zanistî ava bûye.⁴⁰ Ruba'iyên Omer Xeyyam jî hêj di sedsala XVIIIem de bo zimanê Latînî hatine wergêran.⁴¹ Ji bilî Se'dî û Xeyyam bi taybetî Mewlana, Hafiz û Nîzamî jî bi rêya wergêranê li Ewropayê hatine naskirin û li ser edebîyatên Rojavayê tesîreke mezin nişan dane.

Li vê derê em dixwazin ji bo rengvedana klasîkên edebîyata Farisî ya li ser edebîyata Ewropî jî Hafiz û Nîzamî du nimûneyan bidin. Bi rastî jî tesîra Hafiz ya li ser Goethe ji baştirîn nimûneyên vê diyardeyê ye ku divê di serî de bê dayîn. Dehayekî wek Goethe di wê dereceyê de di bin tesîra dîwana Hafiz de maye ku di serdemeke zêrîn a edebîyata Ewropî de ku bizavên klasîzm û romantîzmê di lutkeya hêza xwe de ne, bi rêya wergêrana dîwana Hafiz ya ku ji aliyê Hammer ve bo Almanî hatibû kirin, bûye şogerekî nûawer ê dîwana Hafiz. Di encamê de Goethe wek berhemeke xwe ya temenê kemalê bi navê *Dîwana Rojava û Rojhilatê* dîwanek nivîsiye, bi vê dîwanê di helbesta Ewropî de nûawerîyeke mezin kirîye û bi awayekî pir balkêş jî saqî heta bi muxennîyê û ji evîna mecazî heta bi evîna heqîqî piranîya têgeh, mezmûn û mijarên helbesta klasîk a Îslamî veguhestine nav edebîyata Almanî.⁴²

Klasîka duyem ku ji edebîyata Îranê em ê li ser rawestîna *Heft Peykera* Nîzamî ye. Rexnegirê navdar ê Îtalyan Italo Calvino *Heft Peykera* ku li Îtalyayê jî aliyê weşanxaneyê Rizzoli ve di nav rêzepirtûkên Biblioteca Universale Rizzoli (Pirtûkxaneyê Rizzoli ya Gerdûnî) de derketîye wek klasîkeke xwe ya bijarte di berhema xwe ya navdar "Klasîk Çima Divê Bê Xwendin?" de daye nasandin û xistiye nav çend klasîkên pêşîn ên xîştîya xwe. *Heft Peyker* cara pêşî di sala 1924ê de bi wergêraneke ne serkeftî bo zimanê Ingilîzî, piştî bi wergêraneke serbest bo zimanê Almanî hatiye veguhestin. Herî dawî Alessandro Bausani û Giovanna Calasso wergêraneke berhemê ya sade bo zimanê Îtalî kirine û berhem di

39 - Tahsin Yazıcı, "Gülîstân", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/gulistan> (29.03.2021).

40 - Ebdulxefûr Rewanê Ferhadî, "Se Qern û Nîmê Se' dîşinasî der Xerb ez Rûyê Tercumehayê Gulistan û Bostan", *Zikrê Cemîlê Se'dî*, Tehran 1364, II, 175-196; Herweha bnr. Ahmed Midhat, "Mûsabaka-i Kalemîyye İkrâm-ı Aklam", *Ramazan Kaplan, Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*, Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, Ankara 1998, r. 129.

41 - Yavuz Unat, "Ömer Hayyâm", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/omer-hayyam#1> (28.03.2021).

42 - Ji bo wergêrana Tirkî bnr. Johann Wolfgang Goethe, *Batı Doğu Divanı*, wer. Gürsel Aytaç, Hece Yayınları, İst. 2021.

weşanxaneya Leonardo da Vinci de dane weşandin. Piştêre bi veguhestina hemû mecazan bo zimanê Îtalî -digel dayîna peyvên Farisî yê orjînal di nav kevanekane de-, bi tîbînîyên dewlemend, bi pêşekî û kelûpelên dîtbarî xebateke pir baş li ser berhemê kirine û vê carê jî di nav weşanxaneya Rizzoli de dane weşandin. Calvino jî mijarên dînî yê dîbaceyê heta bi evîna Behram a bo heft prensesan taybetmendîyên curbicur ên mesnewîya evîni wek taybetmendîyên çandeke dûr bi nav dîke û bi taybetî mijarên evîni yê ku di bin rengvedana çanda Rojhilata Îslamî de dirûv girtine bi motif û epîzotên evîni yê edebîyata Rojavayê re muqayese dîke û li ser wergêrana berhemê ya bo zimanê Îtalî kêfxweşîya xwe weha tîne zimên: “Bi zêdekirina şakareke edebîyata cîhanê ya bikêf û xweser li nav refên pirtûkxaneya xwe em [Îtalî] bi siûdeke ku nabe nesîbê herkesî sîudemend bûne.” Hêjayî gotinê ye ku dema Calvino Nizamî dide nasandin û dibêje ew xelkê Genceyê ye di nav kevanekê de şîroveyekê dîke û weha dibêje: Li gor ku jî Genceyê ye wî di nav civakeke tîkel de ku jî Fars, Kurd û Tirkan pêk tî jîyana xwe bûrandîye.”⁴³

Çawa jî van her du nimûneyan tî fêmkirin edebîyata Farisî di nav bazara edebîyata cîhanê de dezgeheke xwe ya mezin vedaye. Guman tune ye ku dersên ku edebîyata Kurdî jî vî serborîya edebîyata Farisî wegire dê hebin. Lêbelê em niha nakevin nav vî mijarê û em ê li edebîyata Tirkî ya ku cîranê edebîyata Kurdî ye binêrin. Berî her tiştî divê bê gotin ku edebîyata Tirkî, di mijara klasîkan de, jî ber sedemên ku li jorê behsa wan hat kirin, wek edebîyata Farisî ne bi siûde e. Bêguman jî edebîyata Tirkî berhemên edebî yê ku bo zimanên Ewropîyan hatine wergêran gelek in. Bo nimûne *Leyla û Mecnûna* Fuzûlî bi rêya wergêranê bo zimanên Almanî, Îngilîzî û Îspanyolî hatiye veguhestin.⁴⁴ Lêbelê çawa ku di xebatên hevçax ên akademîsyenên Tirkan de jî tî ifadekirin di roja me de di çavçoveya edebîyata cîhanê de berhemên edebîyata Tirkî wek klasîk nayên qebûl kirin.⁴⁵ Mijara klasîkan cara pêşî di serdema Tenzîmatê de, di sala 1897ê de, bi nivîsareke Ehmed Mîdhedî ketîye rojeva dewrûberên edebîyata Tirkî. Li gor nêrîna Mîdhedî di edebîyata Tirkî de serdemeke klasîk tune ye û ne mimkin e di vî edebîyatê de berhemên wek *Faust*, *Le Cid*, *Andromaque* û *Romeo û Juliet* derkevin meydanê. Loma divê ev berhem qet nebe bi rêya wergeranê bo Tirkî bî veguhestin.⁴⁶ Dîsa li gor wî derbasbûna dewreke klasîk a edebîyata Tirkî deynin alîyekî dewreke bi vî rengî ya edebîyata Tirkî heta niha hêj nehatiye⁴⁷. Lêbelê li gorî Ehmed Cewdet her zimanekî medenî xwedan berhemên klasîk e û çawa ku klasîkên Yewnan, Roma, Ereba, Ecem (Fars), Frensîz, Alman û Îngilîzan hene

43 - Calvino, b.n., r. 57-63.

44 - Abdülkadir Karahan, “Fuzûlî”, TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/fuzuli> (29.03.2021).

45 - Durmuş, g.n., r. 37.

46 - Midhat, g.n., r. 68.

47 - Midhat, g.n., r. 67.

klasîkên Tirkân jî hene. Cewdet di vê çarçoveyê de berhemên Suleyman Çelebî, Sinan Paşa, Nefî, Bakî, Na'ima, Cevdet Paşa û Mu'ellim Nacî wek klasîkên edebîyata Tirkî nîşan dide.⁴⁸ Li gor Hilmi Yavuz jî qebûlkirina nebûna klasîkên Tirkî ji bo kesên wek Yunus Emre, Bakî Efendi, Karacaoğlan, Evliya Çelebî û Şeyh Galip dê bibe neheqîyek. Lewra muheqqeq tişteki ku ew ji bo me bibêjin heye. Qebûlkirina nebûna klasîkan tişteki xetere ye. Lewra ev bi nebûna rabirdû û çandêke mayînde re tê heman wateyê. Çandêke bê klasîk ne mimkin e. Di roja me ya ku mîtolojîya çandên bedewî jî ji bo mirovên roja me watedar tîne qebûlkirin qebûlkirina çanda Tirkî wek çandêke bê klasîk darazeke ji insafê xalî ye. Mesele ne ew e ku di rabirdûyê de şaheser nehatine dayîn mesele ew e ku ew şaheser di peywenda çareserkirina problemên hevçax de nayên xwendin û şîrovekirin.⁴⁹

Esasen Yavuz ji aliyê hebûna klasîkên millî yê edebîyata Tirkî ve mafdar e. Bêguman di vê çarçoveyê de klasîkên edebîyata Tirkî hene û hin ji van klasîkan bi rêya wergêranê bo zimanên biyanî jî hatine veguhestin. Lêbelê pîrsa ku divê bê bersivandin ev e: Gelo van klasîkan wek yê Farisî di edebîyata Rojavayê de, ji wê wêdetir di edebîyatên Erebi û Farisî de jî şopek li pey xwe hiştine? Em ê nîqaşa hebûna klasîkên Tirkî yê cihanî deynin aliyekî û li ser mijareke di ya ku bi klasîkên millî yê edebîyata Tirkî ve pêwendîdar e rawestin ku ev mijar dê ji bo edebîyata Kurdî jî gelekî mefadar be: Di sedsala XXem de bi avabûna dewleta Tirkîyeyê re di çarçoveya siyaseta resmî ya wezareta perwerdeyê de girîngîyeke mezin bo klasîkên cihanê hatîye nîşandan û di salên 1940î de wergêrana van klasîkan bo zimanê Tirkî wek armanceke mezin a perwerdeya millî ya dewletê hatîye cîbicîkirin. Ji wê demê ve li Tirkîyeyê serê çend salan carekê çî ji aliyê dezgehên fermî ve be çî ji aliyê dezgehên sivil ve be, çendî xîştayên klasîkan bo raya giştî ya Tirkîyeyê hatine pêşkêşkirin û bo xwendekaran hatine tewsîyekirin.⁵⁰ Herî dawîn di sala 2005an de ji aliyê wezareta perwerdeyê ve li ser klasîkan komxebatek hatîye kirin û ji nav klasîkên edebîyata Tirkî û yê cihanê ji bo qedemeya navîn a xwendîngehan 100 berhem (70 berhem ji edebîyata Tirkî û 30 berhem jî ji edebîyatên cihanê) û ji bo qedemeya bilind (lîse) jî 100 berhem (73 berhem ji edebîyata Tirkî û 27 berhem ji edebîyatên cihanê) hatîne tewsîyekirin.⁵¹

Esasen di sedsala me de li Rojavayê li Rojhilatê ji bo ku di prosesa perwerdeya bingehîn de di dersên edebîyatê de cih bigirin hin xîştayên klasîkan tîne amadekirin û tê hêvîkirin ku xwendekar hêj di temenê xwendekariyê de klasîkên cihanê nas bikin û dest bi xwendina wan bikin.⁵² Dikare bê gotin ku pêşniyazkiri-

48 - Kaplan, b.n., r. 34.

49 - Yavuz, g.n., r. 32-33.

50 - D. Mehmet Doğan, *Neden Klasiklerimiz Yok?*, Yazar Yay. İst. 2016, r. 97-100.

51 - Doğan, b.n., r. 167-174.

52 - Ji bo xîştayeke ku bo Emerîkiyan hatîye amadekirin bnr. Durmuş, g.n., r. 40-41; Ji bo yê Tirkî bnr. Doğan, b.n., r. 165-269.

na xişteyên klasîkan di çarçoveya sîyaseta resmî ya wezaretên perwerdeyê de wek taybetîyeke bingehîn a dewletên modern derdikeve pêş. Calvino tewsiyekirina klasîkan wek wezîfeyeke siruştî ya xwendingehan dibîne û îfade dike ku mirov piştî perwerdeyê ji nav wan klasîkan yan jî bi îlhama wan derfeta dîtina klasîka xwe bi dest dixê.⁵³

Bi vî awayî, bi qasî ku perspektîfeke giştî bide me, me cihê klasîkên edebîyatên Farisî û Tirkî di nav klasîkên cîhanê de dîyar kir û wek polîtîkayeke perwerdeyê ya dewletên modern mijara amadekirina xişteyên klasîkan anî rojevê. Bêguman dema em li jêrê li ser klasîkên edebîyata Kurdî analizên xwe bikin em ê ji woneyan sûd wergerin. Niha em dikarin berê xwe bidin klasîkên edebîyata Kurdî û pêşî ji rabirdûya mijara klasîkan di nav edebîyata Kurdî de dest bi mijarê bikin.

4. Rabirdûya Mijara Klasîkan li Nav Kurdan

Bi qasî ku tê dîtîn, di edebîyata Kurdî de seyra tarîxî ya mijara klasîkan zêde ne kevin e. Dikare bê gotin ku ev mijar heta niha -bi taybetî li nav Kurdên Bakur- bi awayekî rasterast, şênber û berfireh neketîye rojeva dewrûberên edebîyata Kurdî. Lêbelê digel vê jî nivîskarên ku bi awayekî ji awayan destê xwe li derîyê mijara klasîkan xistine hene. Bêguman ji bo ku mirov bikare li ser mijara klasîkên Kurdî analîzeke dirust bike divê mirov têngihîştina Kurdan a li ser mijarê bizane. Loma em ê niha bi kurtî di çarçoveya pîrsa “Gelo heta niha di edebîyata Kurdî de li ser mijara klasîkan çi hatîye îfadekirin?” de li ser mijarê rawestin û ji sê nûnerên edebîyata Kurdî ku her yek ji wan qonaxê kronolojîk tesmîl dike (Hemzeyê Miksî ji serdemawîya Osmanîyan, Mela Ehmedê Zivingî ji nîveka sedesala XXem û M. Emin Bozarslan ji dawîya sedesala XXem) nimûneyan pêşkêş bikin:

Hemzeyê Miksî (k.d.1958) yek ji nivîskarên pêşîn ên Kurdan e ku peyva “klasîk”ê bi lêv nekiribe jî li ser vê mijarê rawestîyaye. Miksî ji bo çapa yekem a *Mem û Zînê* ya ku di sala 1335 (1919)an de li Stenbolê li ser navê “Kürd Te’mîmî Me’arif ve Neşriyat Cem’iyeti”yê hatîye çapkirin, di bin sernavê “Edebîyat û Asarê Edebî” de dibaceyek (pêşgotinek) nivîsîye û di vê pêşgotinê de hizrên xwe yê di biwara klasîkan de weha îfade kirine:⁵⁴

“Edebîyat û Asarê Edebî

Ji bo her qewm û miletekî edebîyat û asarê edebî wek xîmê qewî ne ji bo serayêt ‘alî. Miletê xweyî edebîyat çi qeder bikevit, serayê seltene wî yê maddî biherivit dîsa bi himmetekê tete te’mîrkin.

53 - Calvino, b.n., r. 14-15.

54 - Hemzeyê [Miksî], “Dibace”, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Necm-i İstikbal Matbaası, İstanbul 1335 (1919), r. 138-139.

Milletê Yewnan digel hindikî û bêqewetîya xwe çend ‘esran mewcûdîyeta xwe winda kir, bû wîlayetekî Osmanîyan, emma edebîyat û asarê Yewnanî di Ewropayê de terefdar peyda kirin, xweyîyê xwe ji destê Osmanîyan derêxistin.

Îran maddeten mehwa bû, bû esîrê ‘Ereban, piştî wê kete binê esareta Tirkan. Feqet lîsan û edebîyatê Farisî dîsa Îran îna wicûdê, digel wê qasê ku Furs wek heyûlayê navê wî heye bixwe nîne.

Ereb, heşt-neh ‘esr e selteneta xwe winda kirîye. Feqet lîsan, edebîyat û asarê Erebi li Şerqê û Xerbê hakim e; behemehal tê sahibê xwe binine wicûdê, çawan tînin.

Bîna li vê heqîqetê her qewm û milletê ku arzûya mewcûdîyet û selteneta xwe ya millî bikin, lazim e ji ewwel emir ve îhtîmamekî qewî bidine edebîyat û asarê xwe yê edebî. Ev heqîqeta han di pêşîya çar esran de Hezretê Ehmedê Xanî derk kirîye û ji bo wê xebitîye....

Xasma di vê esrê da di alema medenîyetê da huccet û berata milletan lîsan û edebîyatê wan e. Yê bêhuccet, bêberat, de’wa wî nayête sehkirin, kes guhê xwe nadetê. Meger me’lûm bibit ku berata wî jê hatîye standin....”

Çawa ku tê dîtin Miksî behsa sê milletên xwedî edebîyateke bihêz kirîye ku ew jî Yewnan, Fars û Erebi in û serxwebûna wan bi berhemên wan en edebî yên ku li cîhanê tînin naskirin ve girê daye û Mem û Zîn jî di wê kategorîyê de nîrxandîye. Pir aşkera ye ku Miksî di vê nivîsara xwe de bêyî ku peyva klasîkê bi nav bike behsa klasîkên cîhanê kirîye, girîngîya wan anîye ziman û li ser rola wan a ku di qada navneteweyî de dilîzin sekinîye. Li gor nêrîna wî klasîkên milletekî yên ku li cîhanê tînin naskirin, di guherîna qedera wî milletî de roleke heyatî dilîzin. Bêguman wî *Mem û Zîna* Xanî wek berhemeke edebîyata Kurdî di vê peywendê de jimartîye û bi awayekî siruştî Mem û Zîn wek klasîkeke edebîyata Kurdî qebûl kirîye.

Şarihê navdar ê dîwana Melayê Cizîrî Mela Ehmedê Zivingî (k.d. 1971) jî ji aliyê asta bilind a edebî ve cihê dîwana Melayê Cizîrî di edebîyata Kurdî de wek cihên dîwanên Hafîzê Şîrazî û Mela Camî di edebîyata Farisî, dîwana Îbn Farîd di edebîyata Erebi û dîwana Fuzûlî di edebîyata Tirkî de destnîşan kirîye.⁵⁵ Di esasê xwe de Zivingî jî wek Miksî bêyî ku peyva klasîkê bi kar bîne behsa klasîkan kirîye û dîwana Melayê Cizîrî bi klasîkên edebîyatên Erebi, Farisî û Tirkî re hevyeke kirîye.

M. Emîn Bozarslan jî wek Miksî û Zivingî bêyî ku peyva klasîkê bi kar bîne, pêşgotina wergêrana xwe ya *Mem û Zînê* bi mijara klasîkan daye destpêkirin :

55 - Mela Ehmedê Zivingî, *el-‘Iqdu’l-Cewherî fî Şerhî Dîwanî eş-Şeyxî’l-Cezerî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

“Mem û Zîn di nava pirtûkên bêjeyî yên dinyayê ên nemir da li qora pêşîn cîh girtîye. Ev pirtûka gewre bi babetê xwe hevtayê Romeo û Júllyet’a Şekspîr û Leyla û Mecnûn’a Fizûlî’ye.”⁵⁶ Bozarlan herçiqas peyva klasîkê bi kar neanîbe jî dema mirov wî bi Miksî û Zivingî re muqayese dike mirov dibîne ku wî ji bo klasîkan pênasayek jî pêşkêş kirîye (“pirtûkên bêjeyî yên dinyayê ên nemir”) û yek jî Rojhilatê û yek jî ji Rojavayê navên du klasîkan jî wek nimûne dane.

Çawa tê dîtin kesayetên jorîn klasîkên edebîyata Kurdî li kêleka klasîkên cîhanê zikir kirine lêbelê ne peyva klasîkê bi lêv kirine ne jî li ser mahîyeta wê rawestîyane. Esasen ev yek ne tenê taybetîyeke edebîyatvanên navborî ye ku bi çanda klasîk a Kurdan perwerde bûne. Balkêş e ku dema wergêrana *Mem û Zînê* bo Îngilîzî hatîye kirin jî di pêşgotina ku wergêr nivîsîye de bi awayekî şênber mijara klasîkan nehatîye nîqaşkirin.⁵⁷

Bi qasî ku tê dîtin di edebîyata Kurdî de kesê ku têgeha klasîkê bi nav kirîye û rasterast li ser vê mijarê nivîsarek weşandîye Celadet Alî Bedirxan e. Bedirxan ev nivîsara xwe di sala 1941ê de di kovara Hawarê de bi mexlesa Herekol Azîzan di bin sernavê “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” de weşandiye (Hawar, 1941, hej. 33, r. 6). Berdixan di nivîsarê de têgeha klasîkê bi awayekî berfireh îzah dike û piştî derheqê 26 helbestvan û nivîskarên edebîyata Kurdî ya klasîk de zanyariyên giştî yên biyografîk û bîbliyografîk rêz dike. Ji ber girîngîya wê em beşa yekem ê vê nivîsarê ku di biwara têgeha klasîkê de ye li jêrê pêşkêş dikin:⁵⁸

“Em dikin qala klasîkên xwe bikin. Lê berî ewilî divêt em li bêjeya “klasîk”ê hûr bibin. Ji ber ko ew bêje bi me ne nas e. Di edebîyata milletên ewropayî de heyamek heye jê re heyama klasîkan dibêjin. Ew heyama ko tê de şahir û edîbên klasîk rabûne. Ji wan edîb û şahiran bi xwe re jî klasîk dibêjin. Ewan edîbên ha teqlidî edîb û şahirên yewnan û latînî dikirin û li gora usûl û qeydeyên wan dinivîsandin; gelek bala xwe didan wan isûl û qeydan, yanî gelek isûl û şikilperest bûn. Ji edebîyatê pê ve ji her tiştî re ko di wextê kevin de û bi islûbeke bijarte hate çêkirin klasîk dibêjin. Di warê mûsîqiyê de jî klasîzm heye. Herçî bestekarên wê heyamê ne ji wan re jî klasîk dibêjin. Mîmarîya klasîk jî heye. Xulase herçî fen û sinhetên ko bi wê rêzîkê ve çûne ji wan re klasîk dibêjin.

Gelo di edebîyatê de klasîkên kurdmancan kî ne? Ew kengê rabûne û bi paş xwe ve çî eser hiştine?

Bersiva vê pirsîyariyê ne hêsanî ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe jî eserên beriya islamiyetê hesêb tişteke ne maye. Piştî islamiyetê ji nav Kurdan gelek şahir,

56 - M. Emîn Bozarlan, “Pêşgotin”, *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Gün yay., İst. 1968, r. 8.

57 - Salah Saadalla, “Preface”, *Ahmed Khani, Mem Zin*, wer. Salah Saadalla, Avesta, Istanbul, 2008, r. 9-13.

58 - Herekol Azîzan, “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998, r. 813.

edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivîsandine; û ji wan mîlet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahirên tirkan ên mezin yên ko serê tirkan bilind dikin Nabî, Nefhî û Fuzûlî her sê jî kurdmanç in. Yên ko bi kurdmançî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe ne daye zimên û çêtir kêfa xwe ji pirsên erebî û farisî re anîne. Digel vê hindê ev çend eserên ko pêşyan ji me re hiştine edebiyata me a klasîk dîtînin pê û di nav wan de eserine kûr û hêja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî diekve rêza pêşîn. Di rohelatê nizing de folklorê tu milletî negihaştîye dereca folklorê me.

Herçî klasîkên me, herwekî me got ew behseke dirêj û zehmet e û jê re wextekî fireh divêt. Ev ne işê bendekê an du bendan e. Heke îro em vê bendê dinivîsînin mexseda me ne ew e ko em li vê behsê hûr bibin û klasîkên xwe bisenifînin. Bi tenê em dixwazin vê behsê vekin; bi hêviya ko hinên din pê mijûl bibin û tiştê tekûz bi ser xin.

Di vê bendê de em ê bê awerteyî qala hemî şahir û edîbên kurdmanç bikin yên ko bi kurdmançî nivîsandine. Heye ko, hinekê wan bi tenê şahirê dîwanê ne û ne klasîk in. Bila misenîfê klasîkan bi wan mijûl bibe û klasîkan ji neklasîkan bibijêre; û heqê herkesî li gora hêjabûna wî bidiyê...”

Berdîrxan di vê xebatê de, bêyî ku referansan bide, têgeha klasîkê bi wateya xwe ya cihanî di çarçoveya klasîkên serdemên zêrîn ên Ewropî, bizava klasîzmê û klasîkên Yewnan û Latînî de pênase û şîrove kirîye. Di esasê xwe de nivîsara wî li ser du beşan dikare bê dabeşkirin. Beşa yekem danasîna têgeha klasîkê ye, beşa duyem jî bi şeweya tezkîreyên berê yan jî bi şeweya ferhengeke ansîklopedîk danasîna hemû edebiyatvanên Kurd e ku wî navên wan bihîstine. Beşa yekem wek mijareke teorîk, beşa duyem wek vekolîneke qada tarîxa edebiyata Kurdî derdikeve pêş. Esasen dikare bê gotin ku Celadet di sernavê vekolînê de (Klasîkên Me an Şair û Edîbên Me ên Kevin) îşaretî van her du beşan kirîye. Li vê derê îfadeya “klasîkên me” beşa yekem a nivîsarê (têgeha klasîkê) û îfadeya “şair û edîbên me ên kevin” jî beşa duyem a gotarê (tarîxa edebiyata Kurdî) nîşan dide.

Bêguman beşa duyem a nivîsara Bedîrxan jî ji aliyê tarîxa edebiyata Kurdî ve girîngîyeke xwe ya gelekî zêde heye.⁵⁹ Lêbelê beşa yekem a nivîsarê jî di çarçoveya mijara me de gelekî girîng e. Bi qasî ku tê dîtin kesê ku cara pêşî klasîkên ede-

59 - Di qada tarîxa edebiyata Kurdî de yekemîn xebata ku li Sûriyeyê hatîye kirin ev nivîsar e. Ev xebat piştî rîsaleya A. Jaba duyemîn xebata tarîxa edebiyatê ye ku bi Kurdîya Kurmançî hatîye nivîsîn. Digel ku berî berhema Qenatê Kurdo ye jî, ji aliyê himjara helbestvan û nivîskarên Kurmanç ve ji berhema Kurdo dewlemendtir e. Helbestvan û peşannûsên ku di vê nivîsa Bedîrxan de cih girtine ev 26 kes in: Elîyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Batê, Axayê Bêdarî, Ehmedê Xanî, Simailê Bazîdî, Şerefxan, Miradxan, Siyahpoş, Axaok, Mewlana Xalid, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Nalî, Şêx Rîza, Hacî Qadirê Koyî, Şêx Nûredînê Birîfkî, Evdîrehmanê Axtepi, Elîyê Teremaxî, Mela Ünîsê Erqetînî, Melayê Erwasî.

bîyata Kurdî di peywenda klasîkên cîhanê de anîye rojevê Celadet Alî Bedirxan e. Lêbelê ev heye ku Celadet ne behsa krîterên ku berhemekê/nivîskarekî dikin klasîkeke cîhanê kirîye, ne jî di biwara berhemên edebîyata Kurdî yên ku wesfê klasîkê heq dikin de tesnîfek pêşkêş kirîye ku wî bixwe jî ev yek bi dilnîyayî îfade kirîye. Celadet wek rewşenbîrekî ku di ferqa zehmetî û firehîya mijara klasîkê de ye tenê mijar xistîye rojevê û analiz û tesnîfên li ser klasîkên Kurdî hewaleyê xebatên paşerojê kirine. Mixabin digel ku Bedirxan bingeha mijara klasîkan avêtîye û pêxistina mijarê hiştîye bi hêvîya nîfşên pey xwe re jî, bi qasî ku tê dîtin, piştî wî li ser bingeha wî tiştek nehatiye avakirin.

Di roja me de li nav Kurdan girîngîya mijara klasîkên edebîyata cîhanê û klasîkên edebîyata Kurdî li gorî berê zêdetir tê fêmkirin. Gelek weşanxaneyên Kurdan hene ku rêzertûkên klasîkên Kurdî diweşînin. Ji alîyekî dî ve heta niha wergêrana tibabek klasîkên edebîyata cîhanê bi taybetî bo Kurdîya Soranî û Kurmançî û hinek klasîkên edebîyata Kurdî bo zimanên cîhanê hatîye kirin. Eger em bibêjin di roja me ya îroyîn de mijara klasîkan zêdetir bi rêya çapkirina klasîkên Kurdî û wergêranên klasîkên cîhanê bo zimanê Kurdî dikeve rojeva dewrûberên edebîyata Kurdî dê ne darazeke şaş be. Lêbelê vekolînên teorîk û rexneyî yên li ser klasîkên edebîyata Kurdî ku li ser dustûrên klasîkên cîhanê bîn avakirin kêm in. Heta niha bi taybetî li Başûr di çarçoveya edebîyata berawirdî de hin xebat hatine kirin ku bi rastî jî pesnê heq dikin ku ev her du xebatên jêrîn ji bo vê yekê wek nimûne dikarin bîn dayîn: Ezîz Gerdî, *Romeo & Juliet and Mam & Zîn* (weş. Kembrîç) û Azad Tofîq Xeyat, *Nalî & Dantê Wêkçûnêkî Firerehend*, (Înstîtûtî Kelepûrî Kurd, 2017).

5. Gelo Klasîkên Edebîyata Kurdî Hene?

Piştî ku me li jorê di çarçoveya edebîyata Rojavayê de mahîyet û dustûrên klasîkan dîyar kir, rewşa klasîkan di nav edebîyatên Îslamî de tesbît kir û rabirdûya klasîkan li nav Kurdan pêşkêş kir, em ê niha werin ser xala heyatî ya vekolînê ku ew jî hebûn yan jî nebûna klasîkên edebîyata Kurdî ye. Bi rastî jî di vê mijarê de tibabek pirs zihnê mirovî mijûl dikin: Gelo klasîkên edebîyata Kurdî hene? Gelo di edebîyata Kurdî de jî hin berhemên ku bikarin bikevin nav klasîkên cîhanê hene? Gelo ji alîyê klasîkan ve rewşa edebîyata Kurdî li hemberî edebîyatên Erebbî, Farisî û Tirkî ku hem cîranên edebîyata Kurdî ne hem jî digel Kurdî di hewzeya edebîyata Îslamî de cih digirin çawa ye? Gelo mirov dikare xişteyêke klasîkên edebîyata Kurdî pêşkêşî edebîyatvan û xwendekarên edebîyata Kurdî bike?

Bi bawerîya me di vê mijarê de tişta ku berî her tiştî bê gotin ev e: Eger edebîyata ku di peywenda klasîkên cîhanê de behsa wê tê kirin tarîxeke xwe, qonaxên xwe, tradîsyoneke xwe, bizavên xwe, cureyên xwe, estetîkeke xwe û hwd. hebe bi awayekî siruştî serhostayên xwe yên edebî û berhemên xwe yên şakar jî dê hebin. Di biwara edebîyata Kurdî de tişteke heye ku qet ne cihê nîqaşê ye: Edebîyata Kurdî edebîyateke xwedî tarîx, qonax, tradîsyon, bizav, cure, estetîk û hwd. ye. Bêguman eger edebîyata Kurdî ji van alîyan ve bi edebîyatên milletên di re bê muqayesekirin dê ji hin alîyan ve ji hinan baştir, ji hin alîyan ve jî ji hinan kêmtir be. Lêbelê ya girîng ew e ku edebîyata Kurdî bi hemû yeke û taybetmendiyên xwe yên navborî, digel ku ji ber sedemên curbicur hêj di bazara edebî ya cîhanî de tam nehatîye naskirin jî, di nav edebîyatên cîhanê yên serekî de cihekî xwe heye. Loma di edebîyata Kurdî ya xwedî rabirdûyeke dirêj de, wek edebîyatên di, hebûna hin serhostayên edebîyatê tişteki gelekî asayî ye. Bi heman rengî di edebîyata Kurdî de jî, wek edebîyatên di, şakarine ku li hemberî zeman mayînde mabin û tradîsyonek ava kiribin jî dê hebin. Qet nebe di çarçoveya edebîyata millî de kesayet û berhemên wê yên ku wesfê klasîkê heq dikin gelek in.

Eger klasîkên edebîyata Kurdî yên millî hebin bi awayekî siruştî senifandîna wan û amadekirina xiştayên pêşnumayî jî tişteki asayî ye. Lewra mahîyeta klasîkê ya elastîkî rê li ber me vedike ku em hin berhemên edebîyata Kurdî wek klasîkên asta yekem û hin berhemên di jî wek klasîkên asta duyem li qelem bidin. Ji aliyê teorîk ve klasîk di çarçoveya hîyerarşiyekê de dikarin li bin hev bînin rêzkirin û berevajîyê kanonê, berhemên ne klasîk wek berhemên bînxir nayên qebûlîkirin. Dikare bê gotin ku hemû berhemên edebîyata klasîk, bi şertê ku hilgirên krîterên esxerî bin, qîmetekî xwe yê klasîkbûnê hene. Jixwe di berhemên tarîxên edebîyatê de senifandîna helbestvanan wek helbestvanên pileye yekem û yên pileya duyem rêbazeke berbelav e ku ev yek di berhemên tarîxa edebîyata Kurdî de jî tê dîtin. Di esasê xwe de di van berhemên de tişta ku tê kirin senifandîna klasîkên edebîyatên millî ye.

Eger em bi çavê krîterên klasîkên cîhanê li klasîkên edebîyata Kurdî yên millî binêrin gelo dê rewşeke çawa derkeve meydanê? Çawa ku li jorê hatibû gotin, geşedana edebîyatên Erebî û Farsî bi awayekî giştî beramberî geşedaneke hizrî, sîyasî û civakî ya şaristanîya Îslamê, lêbelê ya Kurdî beramberî lawazî û paşveçûna vê şaristanîyê tê. Loma tişteki siruştî ye ku edebîyata Kurdî di mijara klasîkan de ne di asta edebîyatên Erebî û Farsî de be. Ji aliyekî di ve, çawa ku li jorê hatibû gotin, di roja me de di çarçoveya edebîyata cîhanê de berhemên edebîyata Tirkî wek klasîk nayên qebûlîkirin. Gelo li cihekî ku hebûna klasîkên edebîyata Tirkî bûbe cihê nîqaşê em ê bikarin behsa klasîkên edebîyata Kurdî bikin? Bi bawerîya me eger edebîyateke wek edebîyata Tirkîya Osmanî ku bi qasî şeş sedeyan di coxrafyayeke fireh de li ser pîyan maye klasîkên cîhanê dernexisti-

bin, ev yek mesajê dide me: Derxistina klasîkên cîhanê ji hêza desthilatdarîyê, dirêjbûna zamanî û firehîya mekanî wêdetir bi nirx û pîvanên edebî ve girêdayî ye. Loma divê mijar di çarçoveya edebîbûnê de bê nirxandin.

Me di beşa yekem a vê vekolînê de behsa krîterên ku berhemekê dikin klasîkeke cîhanê kiribû. Li vê derê em dixwazin di çarçoveya van krîteran de nirxandinekê li ser edebîyata Kurdî bikin û ji bo destnîşankirina cihê edebîyata Kurdî di nav edebîyata cîhanê, bi taybetî jî di nav edebîyatên Îslamî de bikevin nav hewldanekê. Dema mirov ji pencereya krîteran ve li edebîyata Kurdî binêre dê bê dîtîna ku dêrînîbûn, aîdiyeta çîneke bilind û derketina ji nav şaristanîyeke mezin/serdemeke zêrîn ne di nav de hemû krîterên dî (şîyana nivîskarî, asta bilind a hunerî, gerdûnîbûn, mayîndebûn, sazîkirina tradîsyoneke edebî, xwendin û çapîkirin, wergirtina tam û lezzeta derûnî) bi nivîskar û berhema edebî bixwe ve girêdayî ne. Li gor ku edebîyata Kurdî tarîxeke xwe ya edebîyatê ya xwedî nivîskar û metnên edebî heye hebûna van taybetîyan jî tişteki asayî ye. Di esasê xwe de dêrînîbûn jî bi tarîxa edebîyatê re pêwendîdar e. Madem tarîxeke edebîyata Kurdî ya kevin heye di wê dereceyê de berhemên wê yên dêrîn jî hene. Çawa ku di nimûneyên Baba Tahir û Mela Perîşan de jî tê dîtîna edebîyata Kurdî ji aliyê dêrînîyê ve gelekî avantaj e. Hetta ji vî aliyê ve tenê edebîyata Kurmancî hevsengî edebîyatên Rojavayê ye. Loma eger dêrînîbûn wesfeke bingehîn a klasîkê be naxwe edebîyata Kurdî xwedî berhemên klasîk e jî. Çîna bilind taybetîyeke civaka Romayê ye û jixwe hebûna çîneke bi vî rengî di edebîyata Kurdî de ne mewzûbehs e. Lêbelê ev heye ku nûnerên edebîyata Kurdî ya klasîk ên ku di medreseyan de perwerdeyeke bilind didîtin di nav xwe de wek çîneke bilind a perwerdebûyî dikarin bèn qebûlîkin.

Di nav van krîteran de ya herî hessas hebûna şaristanîyeke mezin/serdemeke zêrîn e ku ew rasterast bi tarîxa sîyasî ve girêdayî ye. Bi rastî jî edebîyata Kurdî di tarîxa xwe de di asta edebîyatên Erebbî, Farisî û Tirkî de nebûye edebîyateke xwedî serdemeke zêrîn. Bêguman hebûna desthilateke bihêz û domdar dê jimara helbestvanan, berhemdarîyê û çalakîyên edebî zêdetir bike. Lewra di desthilatdarîyên serdemên navîn ên patrîmonyal de helbestvanan ji ber piştgirîya maddî û xweparastina ji metirsîyên jîyanê berê xwe didan qesrên desthilatdaran, desthilatdaran jî ji bo ku pesnê wan bê dayîn û navê wan li dinyayê belav bibe piştgirî didan helbestvanan. Bivênevê di nav vê sîtemê de hejmara helbestvanan û berhemên edebî zêde dibûn. Ji vî aliyê ve hebûna cudahîyekê di navbera edebîyata Kurdî û edebîyatên Erebbî, Farisî û Tirkî de tişteki asayî ye. Lêbelê nebûna sîstemeke bi vî rengî di nav edebîyata Kurdî de aliyekî xwe yê erênî jî heye: Ji ber nebûna vê sîstemê rengvedanên nerênî yên seltenet û desthilatdarîyê li ser edebîyata Kurdî çêbûne. Helbestvanên Kurdan hêz û şîyana xwe ya edebî bi nivîsîna medhîye û mersîyeyên desthilatdaran re xerc nekirine. Çawa tê zanîn

helbestên bi vî terzî di her sê edebîyatên Îslamî yên navborî de gelek in. Mesela di edebîyata Tirkî ya Osmanî de di wê dereceyê de metnên edebî yên ku derheqê Sultan Selim û Sultan Suleyman de hatine nivîsîn hene ku koma yekem bi navê “selimname” û ya duyem jî bi navê “suleymanname”yê cureyên edebî saz kirine. Dîsa di edebîyata Osmanî de gelek cureyên edebî hene ku tenê bi rêwresmên îdareya dewletê re pêwendîdar in (xezewatname, xezaname, sefername, sefaretname, sîyasetname, sûrîyye, sûrname, culûsiye, fethîye, fetihname, û zefername).⁶⁰ Eger di çarçoveya dustûrên klasîzmê de nirxandinek bê kirin, berhemên ku di van mijaran de hatine nivîsîn wek berhemên klasîk ên cîhanê nayên qebûl kirin. Lewra milletên bîyanî ne mecbûr in ji coşa millî û çanda xwemalî ya miletekî heman tam û lezzetê wergirin. Li vê derê tişta ku em dixwazin bibêjin ew e ku qewareya zêde ya metnên edebî yên ku di encama desthilatdarîyê de derketine meydana û zêdebûna helbestvanên vî terzî her dem di asta cîhanî ne meqbûl in. Rast e di edebîyata Kurdî de metnên bi vî rengî pir kêman in. Lêbelê ev tunebûn ji aliyê krîterên gerdûnî ên klasîzmê ve kêmasîyekê naîne ser edebîyata Kurdî. Bêguman di edebîyata Kurdî de jî mijarên dînî yên ku tenê xîtabî Misilmanan dikin hene (wek mewlûdnameyan), lêbelê em dixwazin bibêjin ku nebûna mijarên ku rasterast bi desthilatdarîyê ve girêdayî ne kêmasîyekê naîne ser edebîyata Kurdî.

Esasen dema mirov li tarîxa edebîyata cîhanê binêre dê bê dîtîna ku desthilatdarîyeke bihêz (seltenet, împeratori) ji bo asteke bilind a edebî her dem nebûye şertekî jê neger. Helbesta Erebi ya berî Îslamîyetê ku jêdera edebîyata klasîk a Erebi, Farisî û milletên di yên Misilman e ji bo vê yekê wek nimûne dikare bê dayîn. Loma lokal be jî û di çarçoveya bajar-dewletan de be jî hebûna desthilatdarîyeke ku bikare xwe ji êriş û metirsîyên derve biparêze û bi taybetî sazîyên xwe yên perwerdeyê ava bike ji bo derketina edebîyatekê zemîneke guncaw saz dike. Eger ev zemîn hebe û helbestvan jî xwedî qabiliyet be ji bo derketina edebîyateke bihêz tu astengî namîne ku Melayê Cizîrî û gelek edebîyatvanên di yên Kurdan nimûneyên şênber a vê diyardeyê ye.

Ji aliyekî di ve di encama nebûna desthilatdarîyeke yekgirtî de di edebîyata Kurdî de zimanekî edebî yê standart jî ava nebûye. Pirdiyalektî taybetîyeke bingehîn a edebîyata Kurdî ye. Ji ber vî jî li şûna ku hemû potansiyela edebî ya Kurdan bo zimanekî standart û yekgirtî bê xerckirin ev potansiyel li nav diyalektên cuda belawela bûye û di encamê de edebîyata Kurdî ji avantajên zimanekî standart bêpar maye. Lêbelê ev heye ku nebûna zimanekî standart di heman demê de rê li ber statîkbûn û monotonîya edebîyatê jî girtîye. Dema em li edebîyata Osmanî ya ku demeke dirêj di coxrafyayeke berfireh de li ser piyan maye dinêrin, em dibînin ku ew edebîyat bi piranî li ser heman dustûrên poetîk û estetîkê ava bûye. Bizavên cuda yên wek Sebkê Iraqî û Sebkê Hindî jî li ser heman poetîka

60 - Ji bo van cureyên edebîyata Osmanî bnr. Rıdvan Canım, *Divan Edebiyatında Türler*, Grafiker, Ankara 2014.

û retorîka Îranê meşîne. Lêbelê di edebîyata Kurdî de di encama pirdiyalektîyê de rewşeke cuda heye. Bi taybetî edebîyata Kurdîya Goranî ya sahaya Îranê di mijarên poetîk û estetik de ji standarta edebîyata Îslamî ku di edebîyatên Erebi, Farisî, Tirkî û Kurdîya Kurmancî, Soranî û Zazakî de hatîye şopandin pir cuda ye. Herweha di Kurdîya Goranî de hebûna dastanên tarîxî, epîk û mîtolojîk jî her di vê çarçoveyê de ye. Jêdera van taybetmendîyên edebîyata Kurdîya Goranî edebîyata Kurdî ya xwemalî ye. Wisa dixuye ku eger di nav Kurdan tevan de zimanekî edebî yê standart hebûya di edebîyata Kurdî de dê ev xweserîya navborî jî têk biçûya. Avantajeke di ya pirdiyalektîyê jî di her diyalektekê de bi berhemêke damezirîner vejandina edebîyata wê diyalektê ye. Çawa ku di beşa yekem a vekolînê de hatibû diyarkirin berhemên ku di serdemên guherîn û nûjenîyê de bi zimanekî nû dihatin nivîsîn dibûn berhemên klasîk.

Wek encam; ji bo ku klasîkên millî yên edebîyata Kurdî payeya klasîkên cîhanê bi dest bixin çawa ku dezavantajên edebîyata Kurdî hene gelek avantajên wê jî hene. Li vê derê em dixwazin di çarçoveya krîterên klasîkên cîhanê de xişteyekê bo berhemên asta yekem ên edebîyata Kurdî ya klasîk pêşniyaz bikin û ji bo destnîşankirina van berheman wek klasîkên cîhanî bikevin nav hewldanekê. Bêguman ji bo vê jî divê mirov serî li krîterên ku berhemêke dikin klasîk bide ku di destpêka vekolînê de bi berfirehî li ser wan hatibû rawestan. Lê ji bo ku em berhemêke bineqînin hilgirtina hemû krîteran ne lazim e û ne pêkan e jî. Dibe ku alîyekî berhemêke ewqas bihêz be ku ew alî di dayîna wesfê klasîkê de roleke mezin bilîze. Di vê xişteyê de di nav berhemên edebîyata Kurdî de yên ku herî zêde krîteran hildigirin dê bîn hilbijartin. Bi taybetî divê bê gotin ku em ê vê hilbijartinê di çarçoveya hemû diyalektên edebî yên Kurdî de bikin. Eger di çarçoveya diyalektekê tenê de be bêguman xişte dê biguhere. Armanca me ew e ku di çarçoveya edebîyata Kurdî ya klasîk tevî de xiştaya berhemên ku pêşaniyê heq dikin derkeve meydanê. Li gor me berhemên ku di vê xişteyê de cih digirin ne tenê di çarçoveya edebîyata Kurdî de di çarçoveya edebîyata cîhanê de jî namzed in ku wek klasîk bîn qebûlkin. Di esasê xwe de em li vê derê ji bo wê tesnîfa ku Celadet bi hêviya vekoleran hiştibû dikevin nav hewldanekê. Lêbelê ev heye ku em di vê xişteyê de tenê klasîkên pileya yekem didin û behsa yên pileya duyem nakin û wê dihêlin bo xebatên paşerojê. Di çarçoveya krîterên navborî de ji berhemên edebîyata Kurdî ya klasîk yên ku wek namzedên klasîkên cîhanê derdikevin pêş ev in:

- | | |
|----------------------------------------|--------------------|
| » Dubeytîyên Baba Tahir (937-1010) | : Kurdiya Lorî |
| » Perîşannameya Mela Perîşanê Dînewerî | : Kurdiya Goranî |
| » Dîwana Mela (1567-1640) | : Kurdiya Kurmancî |
| » Mem û Zîna Xanî (1651-1709) | : Kurdiya Kurmancî |
| » Dîwana Nalî (1800-1877) | : Kurdiya Soranî |

Ji ber ku di vê vekolînê de ne pêkan e em ê analîza van berhemana ji aliyê krîterên klasîkbûnê ve taloqî paşerojê bikin. Dîsa divê di paşerojê de ji bo amadekirina xîşteyê gîştî ya edebîyata Kurdî ji bo her dîyalektekê berhemên asta yekem û yên asta duyem bîn tesbîtkirin û di çarçoveya hemû xîşteyan de xîşteyê gîştî ya edebîyata Kurdî bê amadekirin.

6. Veguhestina Klasîkên Kurdî bo Bazara Cîhanê

Bêguman edebîyata Kurdî ya klasîk digel klasîkên xwe êdî malê tarîxê ye. Em nikarin li mîrasa heyî tiştêkî zêde bikin û ji nû ve klasîkan îcad bikin, lêbelê qet nebe em dikarin ji bo danasîna klasîkên edebîyata Kurdî û veguhestina wan bo bazara cîhanê nexşerêyêkê amade bikin û di wê rêyê de bi baldarî bimeşin. Di vê nexşerêyê de qonaxa yekem û ya herî girîng wergêran e. Çawa tê zanîn klasîkên cîhanê di avakirina edebîyata cîhanê de roleke girîng dilîzin. Ji bo ku ev berhemê wê rola xwe bilîzin, yan divê kesên bîyanî fêrî zimanê berhemê bibin û berhemê ji zimanê wê yê resen bixwînin ku ev rêbaz zêde ne berbelav e, yan jî divê berhem bi rêya wergêranê bo zimanên bîyanî bê veguhestin ku rêbaza herî zêde berbelav ev e. Dikare bê gotin ku berhemek çiqas bo zimanên bîyanî bê wergêran û çî bi zimanê resen be çî bi zimanê wergêranê be çiqas zêde bê çapkirin ew berhem di wê astê de dibe berhemek klasîk a cîhanî. Guman tune ku di nîşandana nîrxê edebî yê wê berhemê de ev ne nîşaneyekê tekane be jî nîşaneyekê pir girîng e. Herweha di tesbîtkirina klasîkên cîhanê de herî zêde krîtera wergêranê li ber çavan tê girtin. Lêbelê digel wê jî hin berhemên ku qet wergêrana wan nehatîye kirin û navên wan nehatîye bihîstin jî ji aliyê taybetmendiyên xwe ve dikarin wek berhemên klasîk bîn nirxandin. Ji bo ku berhemên bi vî rengî bikevin nav bazara cîhanê, çare nîne, divê wergêrana wan bê kirin. Berhemên ku taybetmendiyên klasîkan hilgirin heta bi rêya wergêranê bo zimanên cîhanê neyên veguhestin ew mehkûm in ku wek klasîkên millî û xwemalî bimînin.

Çawa tê zanîn heta niha wergêrana hin klasîkên Kurdî bo zimanên bîyanî hatîye encamdan. Ji van klasîkan *Dubeytîyên* Baba Tahir bo Frensî, Îngilîzî, Almanî, Rûsî, Îtalî, Çekî, Tirkî, Ermenî, Urdu û Gurcî; Mem û Zîna Xanî bo Tirkî, Erebî, Farsî, Azerî, Rûsî, Elmanî, Îngilîzî, Frensî û Flemenkî, dîwana Melayê Cizîrî jî bo Rûsî, Erebî û Tirkî hatîye wergêran. Lêbelê çihê gumanê ye ku ev wergêran ji refên pirtûkxane û akademîsyenan derbasî nav bazara edebîyatê bûbin. Ji aliyêkî di ve gelek ji van wergêranan tenê di çarçoveya zimanên wergêranê de roleke bi sînor dilîzin. Loma di dinyaya me ya hevçax de ji bo bidestxistina mefaya azamî ya ku ji wergêranê tê hêvîkirin ji aliyê pisporan ve li ser girîngîya wergêranên bo zimanê Ingilîzî gelekî tê rawestan. Li vê derê em dixwazin guh bidin tesbîtên girîng ên Erkman ku di vê babetê de îfade dike:

“Herçiqas ji ber sedemên wek cîrantî, kolonyalîzm û cihgirtina di nav dewletên ku di asta geşedanê de ne, zêdetir tesîra edebîyata Rojavayê li ser edebîyatên milletên di yê cîhanê çê dibe û di navbera wan de danûstandineke yekalî ya di lehê Rojavayê de rû dide jî, êdî di demên dawîn de bi rêya çalakîyên zêde yê wergêranê milletên cîhanê ji edebîyatên hev agahdar dibin. Lê ev heye ku ji ber zêdehiya metnên edebî û zimanên cîhanê cîbicîkirina vekolînên vegir û dîtina cîhanê têvî hema bibêje ne pêkan e.”⁶¹

Li vê derê Erkman, bi awayekî mafdar, balê dikişîne ser wergêranên ku bo zimanên neberbelav ên dinyaya hevçax tînin kirin. Bi awayekî siruştî, ji ber ku herkes zimanên bi vî rengî nizane, di vê rewşê de tesîra berhemê ya ku tê hêvîkirin bi sînor e. Erkman ji bo çareserîya vê kêşeyê dibêje ku “ji bo metnên aîdê edebîyatên millî di pîyasayên cîhanê de cih bigirin ji bilî wergêrana wan bo Îngilîzî rêyeke di tuneye. Mesela metnên aîdê Çînê yan jî Portekîzê pêşî bi rêya Îngilîzî dikevin bazara cîhanê û piştê bi rêya Îngilîzî wergêrana wan bo Tirkî tê kirin. Bi kurtî Îngilîzî di asta cîhanê de zimanê desthilatdar e.”⁶² Erkman herî dawî balê dikişîne ser mijareke di ku ew jî dezgeha weşanê ye: “Herweha biryardayîna li ser berhemên ku dê bînin wergêran jî di bin inhîsara weşanxaneyan de ye.”⁶³

Eger em tesbîten Erkman li klasîkên edebîyata Kurdî tetbîq bikin, di roja me de ji bo ku klasîkên Kurdî bikevin bazara cîhanê rêya herî kurt û karîger wergêrana wan bo zimanê Ingilîzî ye. Lêbelê ev jî têrê nake, divê ev wergêran bikarin ji nav weşanxaneyên xwedî prestîj derkevin. Erkman behsa inhîsara weşanxaneyan bike jî, bi bawerîya me eger wergêran bi xebateke baş û şewazeke gerdûnî ya ku di klasîkên cîhanê de tê şopandin bi pêşekî, tîbînî, ferheng û wêneyan bê dewlemendkirin (wek wergêrana *Heft Peykerê* ya bo Îtalî ku tesîreke mezin li ser Calvino kiribû) ev inhîsar jî dikare bê şikandin.

Gelo di roja me de di nav edebîyatvan û wergêrên Kurd de ev rola Ingilîzî baş hatîye fêmkirin? Farangis Ghaderi û Clémence Scalbert Yücel di xebata xwe ya ku hêj nû hat weşandin de tam li ser vê babetê rawestîyane û di biwara bersiva wê pirsê de hin encamên balkêş bi dest xistine:

“Endîşeyên wisa bandoreke mezin kirîye li ser hîlbijartin û pêşkeşkirina metnên bi Kurdî. Bi vî rengî, tenê beşeke wêjeyê ya ku bi tama xwînerê Anglophone re lihevhatî xuya dike ji bo wergerandinê tê hîlbijartin û dewlemendiya kevneşopîya klasîk û formên wê yê helbestkî cih nagirin. Ji ber vê yekê, berevajî mupteleya bi nivîsarên xwedî prestîj ên edebî û dîrokî yê çalakîyên wergêranê li Irlandayê (Cronin 1998, 155), di wergêranên wêjeya Kurdî de nivîsên klasîk hema bêje tu-

61 - Fatma Erkman-Akerson, *Edebiyat ve Kuramlar*, İthaki, İst. 2015, r. 40-41.

62 - Erkman-Akerson, h.b., r. 41.

63 - Erkman-Akerson, h.c.

nene. Sedemek din a tunebûna metnên klasîk ji nebûna aktorên akademisyen di warê wergêranê de û kêmbûna xebatên akademîk ên li ser edebîyata klasîk a Kurdî ne li gorî wêjeyên din ên Rojhilata Navîn wek edebîyatên Erebi an Farisî ku pir berfireh hatine vekolan û wergêran. Di rastiyê de, tenha metna klasîk a ku hatiye wergêran, Mem û Zîn, wekî mînakeke neteweperwerîya Kurdî hate rêzkirin û têkilîya wê bi serdema nûjen re di dermetnan (paratext) de hêj bêtir tê tekez kirin. Wêjeya devkî û gelêrî jî bi rengê berbiçav tune ye. Ev bi dîtina Cronin re li hev tê ku zimanek hindîkahî dikare li ser berxwedana sembolîk bisekine û wergêranan bi tekstên çanda bilind re bisînor bike, hemî warên din ên ezmûna mirovî paşguh bike yên ku çandekê saz dikin... Bi armanca ku ji bo xwînerên Ingilîz guncawtir bin meyla wergêrana metnên modern ên nû ku ji teşe û sembolîzma helbesta klasîk dûr in tê kirin.”⁶⁴

Çawa tê dîtîn di roja me de wergêrana edebîyata Kurdî ya klasîk bo zimanê Ingilîzî ne di asteke baş û dilxweşker de ye. Pisporek edebîyata Kurdî ya klasîk kêma in û dema wergêrên Kurdî ji bo wergêrana Ingilîzî metnên edebî yên Kurdî hildibijêrin xwe bi taybetî ji metnên edebîyata klasîk dûr dixin. Loma di vê babetê kêşedar de tiştên ku bînin kirin gelek in. Berî her tiştî divê berhemên ku heta niha wergêrana wan nehatine kirin bi şewazeke taybet bo Ingilîzî bînin veguhestin. Berhemên ku wergêranên wan hatine kirin jî divê bi awayekî xweştir ji nû ve bînin amadekirin (*Dubeytîyên Baba Tahir û Mem û Zîna Xanî*). Herweha di xebatên antolojîk de jî divê nimûneyên baş ên helbesta klasîk bînin bicihkirin. Bi bawerîya me eger antolojîke helbestên bijarte digel têbînîyên pêdivî di Ingilîzî de bê amadekirin dê bala pisporên helbesta klasîk bikişîne. Bêguman ji bo ku di van karan de serkeftinek bê bidestxistin divê pisporên edebîyata Kurdî ya klasîk roleke aktîf bilîzin.

Di nexşerêya veguhestina klasîkên Kurdî bo bazara cîhanê de qonaxe di ya serrekî jî vekolînên akademîk ên li ser klasîkên Kurdî ne. Bi taybetî eger ev vekolîn bi zimanê Ingilîzî û bi rêbazên edebîyata berawirdî bînin kirin mirov dê zûtir bigihîje bazara cîhanê. Heta niha kêma be jî hin klasîkên Kurdî bi hin klasîkên cîhanê re hatine berawirdkirin ku xebata Ezîz Gerdî ya bi navê *Romeo & Juliet and Mam & Zîn* (bi Ingilîzî) û ya Azad Toftîq Xeyat ya bi navê *Nalî & Dantê Wêkûnêkî Firerhend* (bi Kurdî) du nimûneyên girîng in. Bêguman ji bo ku mirov bikare van vekolînan bike divê mirov hem jî teorî, termînolojî û lîteratura klasîzmê haydar be hem jî xweserî û taybetmendîyên klasîkên Rojavayê û Rojhilatê nas bike. Ji bo vê jî divê mirov krîtrên ku Vergilius, Shakspeare, Malherbe, Goethe, Se’îdî, Hafîz, Mewlana û Nîzamî dikin klasîkên cîhanê bizane. Dema mirov xwedîyê van zanarîyan be mirov dê fêma bike ka ew krîter heta bi çi astê, bo nimûne, di dîwana

64 - Farangis Ghaderi & Clémence Scalbert Yücel (2021): An etat présent of the kurdish literature in english translation, The Translator, <https://www.tandfonline.com/doi/full/10.1080/13556509.2021.1872196>, r. 10.

Mela yan jî *Mem û Zîna* Xanî de cih digirin. Eger klasîkên Kurdî bi vê şewazê di bazara cihanê de bèn nasandin bêguman dê reweşeke dilxweşker bê bidestxistin.

Bêguman ji bo ku Kurd bikarin van qonaxan derbas bikin û bigihîjin bazara cihanê divê putepêdaneke taybet bo edebîyata Kurdî ya klasîk nîşan bidin. Divê edebîyatvanên Kurd formasyoneke baş û xwendekarên edebîyata Kurdî perwerdeyeke baş a zanista edebîyata klasîk wergirin. Çawa ku Jan Kott bûbû hevçaxê Shakespeareî (*Shakespeare our Contemporary*) divê vekolerên edebîyata klasîk jî bibin hevçaxê Melayê Cizîrî.

Encam

Hemû tesbît û nîqaşên ku di vê vekolînê de hatine kirin me digihînin wê encamê ku edebîyata Kurdî ya klasîk bi potansiyela xwe ya ku ji hezar sal berê bi dîyalekt, serdem, qonax, navend û bizavên edebî yên curbicur gihîştîye roja me ji serhostayên xwe yên edebî û berhemên xwe yên şakar jî ne bêbehre ye. Lêbelê ji ber ku akademîya Kurdî ev potansiyel heta niha bi awayekî zanistî û metodolojîk dernexistîye meydanê îmkana danasîna qumaşê xwe yê binirx di bazara cihanê de bi dest nexistîye. Îro firotîna wî qumaşî di dezgehên herî biprestîj ên cihanê de berpirsiyarîyeke mezin e ku dikeve ser milê me. Em di wê bawerîyê de ne ku eger em vê berpirsiyarîyê binin cih rojekê bi destê Goetheyekî modern alaya dîwana Melayê Cizîrî û bi destê Calvinoyekî nû jî alaya *Mem û Zîna* Xanî li banê gerdûnê dê bê çikandin. Esas wê demê utupyaya Xanî dê bibe rastîyek û ruhê Xanî jî û pêşîneyên wî yên Kurmanc jî û hempîşeyên wî yên Goran, Soran û Zaza jî dê kêfxweş bibe. Dîsa wê demê li xîştaya temsîlî ya klasîkên her miletekî ya ku di destpêka vê vekolînê de hatibû pêşkêşkirin klasîkekî wek Melayê Cizîrî jî dê bê zêdekirin.

Di vê vekolînê de hewl hat dayîn ku piştî gava ku Celadet Alî Bedirxan berî niha bi heştê salî di mijara klasîkan de avêtibû gaveke nû bê avêtin. Bêguman meşa li pey şopa vê mijarê li vê derê dê neqede. Ji ber ku di encama vê meşê de fêkîyek bê xwarin divê gelek gavên dî bèn avêtin. Li ser navê xwe, eger bibe nesîb, di vekolîneke/vekolînine dî de divê analîza her pênc klasîkên ku li vê derê ji alîyê me ve hatine hîlbijartin bê kirin. Dibe ku piştî jî klasîkên edebîyata Kurdî bèn senifandin û di çarçoveya dîyalektên edebî yên Kurdî de xîştayên pêşnumayî bèn amadekirin.

Jêder

Jêderên Çapkiri:

- Adak, Abdurrahman , *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasik*, Nûbihar, İstanbul, 2014.
- Anar, Turgay, Türk Edebiyatında Edebiyat Kanonu, FSM İlmi Araştırmalar ve İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi, 1 (2013) Bihar.
- Azîzan, Herekol, “Klasikên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998.
- Berwarî, Hêvî *Rêbazên Edebî*, Weşanên Êketiya Nivîserên Kurd (çapa yekem), Dihok 2010.
- Beuve, Sainte, “Klâsik Nedir?”, Pazartesi Konuşmaları I, (wer. Fehmi Baldaş), MEB Yayınları, çapa duyem, İstanbul 1990, r. 315-336.
- Bloom, Harold, *Batî Kanonu*, wer. Çiğdem Pala Mull, İthaki, İst. 2014.
- Bozarıslan, M. Emîn, “Pêşgotin”, *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Gün yay., İst. 1968.
- Brook, Peter, “Pêşgotin”, *Jan Kott Çağdaşımız Shakespeare*, Mitos Boyut Yayınları, wer. Teoman Güney, İst. 1999.
- Calvino, Italo, *Klasikleri Niçin Okumalı?*, wer. Kemal Atakay, YKY Yayınları, İstanbul 2008.
- Canım, Rıdvan, *Divan Edebiyatında Türler*, Grafiker, Ankara 2014.
- Çetindağ, Yusuf, “Şark Klasikleri ve Özellikleri”, *Dergâh*, b. 16, j. 191, 2006, r. 9-15.
- Doğan, D. Mehmet, *Neden Klasiklerimiz Yok?*, Yazar Yay. İst. 2016.
- Durmuş, Tuba İsen, “Türk Edebiyatında Klasik Algısı Üzerine Düşünceler”, *Millî Folklor*, 2011, sal 23, j. 90.
- Eliot, T. S., *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, wer. Sevim Kantarcıoğlu, Paradigma, İstanbul 2007.
- Erkman-Akerson, Fatma, *Edebiyat ve Kuramlar*, İthaki, İst. 2015.
- Ferhadî, Ebdulxefûr Rewan, “Se Qern û Nîmê Se’ dîşînâsî der Xerb ez Rûyê Tercumehayê Gulistan û Bostan”, *Zikrê Cemîlê Se’ dî*, Tehran 1364, II, r. 175-196.
- Goethe, Johann Wolfgang, *Batî Doğu Divanı*, wer. Gürsel Aytaç, Hece Yayınları, İst. 2021.
- Hemze [yê Miksî], “Dîbace”, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Necm-i İstikbal Matbaası, İstanbul 1335 (1919).
- Kaplan, Ramazan. *Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*. Ankara: Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, 1998.
- Midhat, Ahmed, “Müsabaka-i Kalemîyye İkrâm-ı Aklam”, *Ramazan Kaplan, Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*, Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, Ankara 1998.

Pîrbal, Ferhad, *Rêbaze Edebiyekan*, Dezgay Wergêran, Hewlêr 2006.

Saadalla, Salah, "Preface", *Ahmed Khani, Mem Zin*, wer. Salah Saadalla, Avesta, Istanbul, 2008.

The Editors of Encyclopaedia Britannica, "Classical literature", Encyclopaedia Britannica, <https://www.britannica.com/art/lyric> (21.03.2021).

Yavuz, Hilmi, "Bizim Klasiğimiz Var mı?", *Denemeler*, Boyut Yay., İstanbul 1996, r. 30-33.

Zivingî, Mela Ehmedê, *el-'Iqdu'l-Cewherî fi Şerhî Dîwanî eş-Şeyxi'l-Cezerî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

Jêderên Dijîtal:

Ghaderi, Farangis & Yücel, Clémence Scalbert, "An etat présent of the kurdish literature in english translation", *The Translator*, 2021, <https://www.tandfonline.com/doi/full/10.1080/13556509.2021.1872196>

Karahan, Abdülkadir, "Fuzûlî", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/fuzuli> (29.03.2021).

O'Runeer, Nedim Doğan, Nicolas Boileau ve Yazma Sanatı Adlı Eseri Üzerine, 2019, https://www.academia.edu/40789142/Nicolas_Boileau_ve_Yazma_Sanatı_Adlı_Eseri_Üzerine, (02.04.2021).

Unat, Yavuz, "Ömer Hayyâm", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/omer-hayyam#1> (28.03.2021).

Yazıcı, Tahsin, "Gülistân", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/gulistan> (29.03.2021).

<http://www.dictionnaire-academie.fr/article/A9C2532> (02.04.2021)

“Diller ve Kùltürler Arasındaki Hiyerarşik İliřkilere Karşı Savaşıyorum” Ngũgĩ wa Thiong’o ile Söyleři

Röportajı Yapan: Tanuj Raut

İngilizce’den Çeviren: Nurdan řarman

Yunan mitolojisinin Afrika, İskandinav, Norveç, İzlanda ve Asya mitolojileriyle karşılařtırmalı olarak öğretilmesi gerektiğini düşünüyorum. Hepsi de yeterince heyecan verici olan bu mitolojiler arasında hiyerarşik bir ilişki kurulmasına gerek olmayıp bunların birbirleriyle bağ kurmalarına izin verilmelidir.

Tanuj Raut: İngiliz edebiyatıyla ilgili problem, onun “İngilizliliğinin” edebiyatı öncelemesi ve şekillendirmesidir. İngiliz Edebiyatı çalışmamızda bu güç dinamiğine katkıda bulunan belirli faktörler olduğunu düşünüyor musunuz?

Ngũgĩ wa Thiong’o: Dil meselesi, özellikle de *Decolonizing the Mind and Something Torn and New*’de çalışmalarımın merkezinde yer almaktadır. İngilizce’nin bir dil olarak bu küresel gücü nasıl elde ettiğini anlamamız önemlidir. İngiliz dili, dünyaya İngiliz fetihleri ile yayıldı ve emperyal gücün dili olarak hâkimiyet kazandı. Zamanla, zorla ve kurnazlıkla, toplumun hâkimiyet altındaki elit gücünün dili oldu. Dolayısıyla, emperyal iktidar dili olan İngilizceyle hâkimiyet

altındaki kültürlerin elit iktidarının dili olan İngilizce arasında huzursuz bir ittifak vardır. Kolonileştirici tüm diller hükmedilen dillere şiddet aracılığıyla empoz edildi. Fethedilen dillerin payına aşağılama ve negatifiklik, fetih dilinin payına ise saygınlık ve pozitiflik düştü. Model her sömürge durumunda aynıdır: fethetmeye ihtişam, mağlubiyete korkunçluk. Tüm erdemler, fetih diline tüm ahlaksızlıklar da yerli dile yüklendi. Sömürgeci diller her daim hâkimiyet altındaki kültürlerin aleyhine olacak şekilde yüceltildi. Bu, insanların zaten bildiği dillere başka bir dil eklemek şeklinde basit bir mesele değil. İngilizce, hükmedilen dillerin mezarları üzerinde yükseldi, bir güç, zekâ ve entelektüel üretim dili olarak normalleşti ve bu süreçte de bir dil hapishanesi haline geldi. Bazen İngiliz edebiyatının bir güç ve tahakküm dili olan İngilizce tarafından hapsedildiğini hissediyorum. Örneğin Shakespeare sömürge topraklarına, harikulade oyunlar yazan bir yazar olarak değil İngiliz İmparatorluğu gücünün vücut bulmuş hali olarak ihraç edildi. Shakespeare, bu anlamda, İngilizcenin birçok ihraç edilme biçimiyle hapsedildi. İngiliz edebiyatının kendisi bir emperyal iktidar edebiyatı olarak karşımıza çıktı. Sorun asla edebiyat olarak İngiliz Edebiyatı veya Shakespeare, Keats, George Eliot ve T.S. Eliot gibi yazarların çalışmaları olmadı. Bu yazarlar harika eserler ürettiler – bunu inkâr edemem – ancak onları doğaları gereği diğer yazarlardan, örneğin Tolstoy veya Dostoyevski'den veya Sanskrit Hintli yazarlar Maharshi Veda Vyasa ve Maharshi Valmiki'den, Mahabharata ve Ramayana'nın ünlü yazarlarından, daha fazla yazar yapan hiçbir şey yoktur.

İngiliz Edebiyatını İngilizce öğretmenin bu güç dinamikleri Amerikan bağlamında, yani eski bir kolonide İngiliz Edebiyatı öğretirken, nasıl değişir?

Amerikan bağlamı karmaşık ama çok ilginçtir. Başlangıçta Amerika (yani ABD) İngiliz sömürge sisteminin bir parçasıydı. Doğal olarak, eğitim kurumlarının çoğu İngilizler üzerinden modellendi. Bu nedenle Amerikan üniversitelerinde postkolonyal bir durum söz konusudur. İngilizce bölümü beşeri bilimlerde en baskın bölümdür. Ve çoğu durumda, hepsinde olmasa da, sanki Amerika'ya özgü bir edebi gelenek yokmuş gibi, İngiliz milli edebiyatı öğretiliyor. Oysa Amerika'nın canlı bir geleneği var: yerli Amerikalı, Afrika kökenli Amerikalı, Asyalı-Amerikalı ve Avrupa-Amerikalı. Bütün bu akımların birlikte Amerikan Edebiyatını oluşturması gerekir. Bu kapsayıcı Amerikan Edebiyatı'nın Amerika'da merkez sahneyi işgal edeceğini düşünürsünüz. Ancak İngilizce bölümü hala edebiyat çalışmalarının baş mücevheri, İngiliz edebiyatı da edebi piramidin tepesindedir.

Yani Amerika sadece üniversitelerinin dışında bir eritme potası gibi...

Amerikan Üniversiteleri, fakülte ve öğrenciler açısından muhtemelen dünyadaki diğer üniversitelerden daha çeşitlidir. Ve bir bütün olarak üniversitede bir

dizi inanılmaz çalışma, hatta edebi çalışmalar, verilmektedir. Bu ABD'nin çeşitliliğini yansıtıyor. Muhtemelen Amerika'da temsil edilmeyen dünyada herhangi bir etnik köken veya din yoktur. İngiliz ve Avrupalı olana, Afrikalı, Asyalı ve hatta Amerikan yerlisi olandan daha yüksek bir mertebede muamele edilmesindeki hiyerarşik ilişkiyi düşünüyorum. Amerikan İmparatorluğu'nun hala bir İngiliz dili imparatorluğu olduğu hatırlanmalıdır. Emperyal bir güç olarak Amerika, İngilizlerin hiyerarşik gücünün yayılmasına yardımcı oldu.

New York Üniversitesi'nde birkaç yıl ders verdiniz. Şimdi de Irvine'de ders veriyorsunuz. Amerikan üniversitelerindeki deneyimlerinizi öğrenmek isterim. Bölümlerde sömürge sonrası (post-kolonyal) unsurlar olmasına rağmen İngiliz edebiyatına 'standart' edebiyat olarak katılıyormu?

Post-kolonyalite, eski imparatorluk ülkesinde üretilenin standart norm olduğu şeklinde bir düşünme, varsayma ve hareket etme biçimini alabilir. Eski emperyal güce ait literatürün normallik, mükemmellik literatürü olduğu varsayıdır. Ulusal İngiliz edebiyatı, İngilizce bir bölümün özünü oluşturur ve bu bölüm, diğer edebiyat bölümlerinden daha yüksekte görülmektedir. Ama dediğim gibi, bir bütün olarak Amerikan üniversitelerinde çeşitli edebi çalışmalar var. Yani gerçek edebi sahne çok daha canlıdır. Örneğin, burada, UCI'de, İngilizce bölümünün yanı sıra Karşılaştırmalı Edebiyat, Doğu Asya çalışmaları ve Afrika-Amerika, İspanyolca ve diğer Avrupa dilleri bölümleri de mevcut. Ve İngilizce Bölümünde, örneğin sömürge sonrası teoriler gibi, pek çok başka kurs da var. Yale'nin ve New York Üniversitesi'nin çok çeşitli kurslara ve alan araştırmalarına açık olduğunu gördüm. Ancak İngiliz Edebiyatı her zaman daha baskındı. Ve bu, İngilizce edebiyat değil, İngiliz ulusal edebiyatının oluşturduğu şekliyle İngilizceydi. Aslında, İngilizcenin küresel erişimi göz önüne alındığında, İngilizce Edebiyat bölümü olsa çok küresel ve çok kapsayıcı olurdu.

Post-kolonyal bir durumun İngiliz Edebiyatı eğitimini nasıl etkilediğinden bahsetmiştik. Birleşik Krallık'taki Leeds'de İngiliz Edebiyatı öğrencisi olarak deneyimleriniz nelerdi?

Son anı kitabımda (Birth of a DreamWeaver) ele aldığım 1960'lardan bahsediyoruz. İngiliz edebiyatı üzerine temel eğitimim Uganda'daki Makerere Üniversitesi'nde başladı. Ancak Makerere, Nijerya, Gana, Batı Hint Adaları, Malezya'dakilerle birlikte Londra Üniversitesi'nin de bir parçasıydı. Bu üniversite kolejleri 1940'lar ve 50'ler civarında ortaya çıktı. Her kolejde, İngilizce bölümü belki de en prestijli bölümdü. Gerçekten de tüm entelektüel çalışmaların "en de-

ğerli mücevheri”ydi. Makerere’de müfredat, İbadan’daki bazı öğrencilerin dediği gibi, Spenser’den Spender’a kadar utanmaz bir şekilde İngiliz ulusal edebiyatıydı. Ama yine de ondan çok şey öğrendim. İlk iki romanımı (*The River and Weep Not Child*) yazdığım yerin Makerere olduğunu hatırlatayım. Leeds’de de işler aynıydı. Ancak Leeds kendisini Cambridge ve Oxford’dan farklı konumlandırıyordu. Dünyada yeni ortaya çıkan post-kolonyala daha açıktı. Bu nedenle, Leeds’te, “milletler topluluğu edebiyatı” dedikleri şeyi ortaya koydular. Zaman zaman Kanada, Karayipler, Avustralya veya Afrika Edebiyatı’ndan misafir profesörler geliyordu. Bu durum, ara sıra olmakla ve bölümdeki derslerin merkezini oluşturmamakla birlikte yine de, Avrupa-Amerikan da dahil olmak üzere, İngilizce yazılan diğer edebiyatlara kısa bir bakış edinmemizi sağladı. Bu sebeple Leeds benim için önemli bir yere sahiptir. *Moving the Center* adlı kitabımın başlığı Leeds’teki günlerimde kaleme aldığım bir makaleden geliyor. Fanon’un “Yeryüzü’nün Lanetlileri”yle orada temasa geçtim. Bunun düşünceme çok büyük etkisi oldu. Başka düşünürler de devreye girdi: Örneğin Marx, benim düşüncemde çok çok büyük bir rol oynuyor. Üçüncü romanımı, yani *Bir Buğday Tanesi*’ni, Leeds’te yazdım.

Yani bölüm bir anlamda dekolonizasyon süreciyle yüzleşti.

Kanada ve Karayip edebiyatında misafir profesörler veya milletler topluluğu edebiyatı diyelim, İngilizce bölümünün şemsiyesi altına girdiler. Ama bir İngiliz Edebiyatı tarihi olan ana çizginin periferisindeydiler. Ben buna dekolonizasyon demedim, ancak benim zamanımdaki Leeds, daha önce sömürgeleştirilmiş dünyanın bu bölgelerinde ortaya çıkan, İngilizce diğer edebiyatların varlığına en erken başını sallayanlar arasındaydı.

Geriye dönüp baktığında, Leeds’teki üniversitelerde veya Makerere’de okutulması hoşunuza gidecek kitaplar var mıydı?

Unutma, o zamana kadar, İngilizce yapılan Afrika edebiyatı daha görünür olmaya başlamıştı. 20. yüzyılın ikinci yarısından bahsediyorum. Güney Afrikalı Peter Abrahams, ilk kitabını 1942’de yayınladı. Chinua Achebe 1958’de ilk romanı *Things Fall Apart*’ı (Parçalanma) yayınladığında, Abrahams kredisine, 1946’da yayınlanmış olan en ünlü eseri *Mine Boy*’un da aralarında olduğu, sekiz roman eklemişti. Fransızca konuşan ve yazan Afrikalı yazarların da bu süreçteki eserleri şu şekildeydi: Sembene Ousmane, ilk romanını 1956’da yayınlamıştı, en büyük eseri olan *Gods Bits of Wood*, 1960’da çıkmıştı; Ferdinand Oyono *Houseboy* ve *The Old Man and the Medal*’da 1956’da ortaya çıktı.

Karayip adalarında 50'li yıllarda ortaya çıkan harika yazarlar vardı. George Lamming (*In the Castle of My Skin*, 1953), V.S. Naipaul (*A House for Mr. Biswas*, 1961) bunların arasındaydı. Afro-Amerikan edebiyatı geliyordu. Bunlar ve dünyada ortaya çıkan diğer edebi eserler benim için önemliydi. Leeds'de Karayip edebiyatına yoğunlaştım, onları kendi başıma inceledim. George Lamming ve diğerleri bana yepyeni bir dünyanın kapılarını açtı. Bunları ve daha fazlasını incelemeyi çok istedim: Latin Amerika Edebiyatı, Asya Edebiyatı mesela. Dünyadaki tüm literatüre sahip olmak istiyorum. Sahiplenmeyi vurguluyorum çünkü şu anda düzenlendiği şekliyle İngilizce Bölümlerini çok eleştirmeme rağmen, İngiliz Edebiyatı ve yazarlarını seviyorum. Shakespeare'im her zaman yanımda. Dickens, yaratabildiği karakter yelpazesi açısından inanılmazdır. Shakespeare de aynı şekilde. Artık yazar olduğuma göre onların yapmaya çalıştıklarını daha iyi anlıyorum. Dolayısıyla eleştirimin İngiliz Edebiyatının kalitesi ve değeri ile hiçbir ilgisi yok. Benim sorunum, diller ve edebiyatlar arasındaki hiyerarşik güç ilişkileriyle, hiyerarşinin tepesini işgal eden İngilizce'yle ve diğer Avrupa dilleriyledir. Hiyerarşiyi yıkıp onu iletişim ağıyla dönüştürdüğünüzde, farklı dillerdeki kültürler oksijen üretir. Çapraz döllenirler. Kültürler birbirlerine hayat üflüyor. Her kültür, diğer kültürlere selam vererek öğretilmelidir. Yunan mitolojisi örneğini ele alalım. Genellikle tüm mitolojilerin anasıymış gibi öğretilirdi. Yunan mitolojisinin Afrika, İskandinav, Norveç, İzlanda ve Asya mitolojileriyle karşılaştırmalı olarak öğretilmesi gerektiğini düşünüyorum. Hepsisi de yeterince heyecan verici olan bu mitolojiler arasında hiyerarşik bir ilişki kurulmasına gerek olmayıp bunların birbirleriyle bağ kurmalarına izin verilmelidir.

Çeviriler, edebiyatlara erişim şeklini değiştiriyor gibi görünüyor.

Çeviriyi dillerin dili olarak tanımlıyorum. 19. yüzyıl Rus Edebiyatının tüm şaheserlerini, Tolstoy, Turgenev, Chekhov, Dostoyevski'yi çok okuduğum bir zaman dilimi vardı. Fakat onları çeviri olarak okudum. Çeviri, kültürler, dinler ve düşünce tarihinde çok önemli bir rol oynamıştır. İncil ve Kuran, birçok kültürü, tarihi ve insanı ancak çeviri yoluyla etkiledi. Dünyada devrimleri ateşleyen Marx'ı insanlar mutlaka Almanca orijinalinden okumak zorunda değil.

Bengalce, Svahilice veya Guceratça eser üreten yazarlar var. Çeviri ve bu süreçte kaybolan şey hakkında ne düşünüyorsunuz?

İncil'in çevrilirken ne kaybettiğini bilmiyorum. Tek bildiğim, İncil'in Kral James versiyonunun İngiliz edebiyatını ve dilini etkilediğidir. Çeviriler, orijinal dilin tüm nüanslarını muhafaza etmeyebilir, ancak orijinalin temel fikrini birçok insana dokunacak düzeyde fazlasıyla taşıyabilirler. Yunan ve Mısır entelektüel geleneği, çeviri yoluyla Avrupa'ya ulaştı. Aeschylus, Sophocles oyunlarını Yu-

nanca orijinleriyle değil çevirileriyle inceliyoruz. Mahabharata'yı Sanskritçe okumayı çok isterdim, ancak ona erişmek için Sanskritçe'de uzmanlaşmak kadar beklememe gerek yok. Çeviri, Hint edebiyatının şaşırtıcı zenginliğini hissetmemi sağladı.

Çevirilerde nüans fikrinden bahsettiniz. Bir dilin edebiyatını en iyi ana dili bu dil olanlar mı öğretebilir sizce?

Şart değil. Sadece belli bir edebi kültüre mensup insanların bu edebiyatı öğretebileceğini düşünmüyorum. Misyonerlerin durumunu ele alalım; Afrika dilini konuşmuyorlardı. Ama Afrika dillerini incelediler ve bir yazı dili yaratmaya yardımcı oldular. Daha sonra da İncil'i bu dillere uyarladılar. İncil'deki bazı hikâyeleri Afrika dillerine de dahil ettiler. Bu, Afrika dillerini çok zenginleştirdi. Dolayısıyla, bir dili yalnızca o dili konuşanların öğretebileceğini söyleyemeyiz. Benim çok rahatsız edici bulduğum şey, «edebiyatım sizin edebiyatınızdan daha iyidir», «benim dilim diğer tüm dillerden daha iyidir» şeklindeki hiyerarşik düşüncedir. Hint edebiyatının Bengal edebiyatından daha iyi olduğunu söylemek bile, aynı hiyerarşik ilişkileri yeniden üretir. Diller ve kültürler arasındaki hiyerarşiye ve hiyerarşik ilişkilere karşı gerçekten savaşıyorum. Aime Cesaire 'Sömürgecilik Üzerine Söylev'de bunu çok güzel ortaya koymuştur. Cesaire sömürgeciliği eleştirirken, sömürgeciliğin kültürlerin teması değil, kültürlerin bir tür yıkımı olduğunu savunur. Benim çok beğendiğim bir şekilde kültür temasının medeniyetlerin oksijeni olduğunu söyler. Çeviriler bu teması aktifleştirir.

Derslerde “sanatın hayal gücünün besini” olduğundan söz etmişsiniz. Bu, eğitimde sanat üzerine düşünmek için son derece kullanışlı bir metafor. Bu açıdan bakınca Batı üniversiteleri öğrencilerine çok dengeli bir diyet sunmuyor gibi görünüyor. Bunun bir okuyucu üzerinde metafizik veya kültürel düzeyde nasıl bir etkisi olduğunu düşünüyorsunuz?

Sanat, hayal gücünün bir ürünüdür ama aynı zamanda hayal gücünü de besler. Hayal gücü, insan olarak anayasamızın merkezinde yer alır. Bilimde, teknolojiye vb. alanlarda hayal gücü her şeydir. Yani şimdi yetkililer üniversitelerdeki beşeri bilimler öğretimini daha az önemsemekle veya gözden düşürmekle çok korkunç bir şey yapmış oluyorlar. Sanat bilimlerinde ve teknolojiye hayal gücünü ve dolayısıyla yaratıcılığı aç bırakmaya çalışıyorlar.

Zaman ayırdığınız için çok teşekkürler. Edinburgh ve diğer üniversitelerdeki okurlarımıza (çoğunlukla öğrenciler) mesajınız var mı?

Verecek bir mesajım varsa o da şudur: Birleştir ama diyalektik olarak birleştir. *Globalectics: Theory and Politics of Knowing* adlı kitabımın gerçek mesajıdır bu. Irk, sınıf, cinsiyet, kültürler ve diller hiyerarşisine karşı çıkın; insanların, kültürlerin ve dillerin alışveriş ağını kucaklayın. İnsanların bu hiyerarşileri birbirleriyle ilişki kurmanın yolu olarak kabul etmelerini istemiyorum. İnsanların on milyon yoksulun sırtında on milyonerler yaratılmasını doğal görmesini istemiyorum. Hiyerarşiye karşı ağı/ilişkiyi savunuyorum. Ağ, bir verme ve alma sürecidir. Küçük veya büyük her kültür, diğer kültürlerden öğrenebilir. Afrika kültürünün Avrupa kültürlerinden bir şeyler öğrenebileceğine eminim. Aynı şekilde Avrupa kültürleri de Asya ve Afrika kültürlerinden bir şeyler öğrenebilir. Dolayısıyla yeterli zihninizi açın! Dünyanın bize verecek çok şeyi var. Ortak insanlığımızın bir ürünü olan dünyayı keşfetmede keyif verici bir şey var.

(Ngũgĩ wa Thiong'o, Kenyalı romancı, aktivist ve postkolonyal bir edebiyat kuramcısıdır. Modern Afrika edebiyatının öncü isimlerinden olan Thiong'o İngilizce ve son zamanlarda da Giküyu (Kikuyu) dilinde eserler vermektedir. 1967'de, Nairobi Üniversitesi'nde İngiliz Edebiyatı alanında öğretim görevlisi olarak çalışır. Nairobi'deki görev süresi boyunca Ngugi, dünya edebiyatının Afrika ve Üçüncü Dünya edebiyatlarıyla daha fazla yansıtılması çağrısında bulunur. Taban Lo Liyong ve Awuor Anyumba ile birlikte 'İngiliz Bölümünün Kaldırılması Üzerine' adlı polemikli bildiri yazar ve daha sonra postkolonyal teorileri etkileyen anıtsal bir tartışma başlatır. Ngũgĩ wa Miri ile birlikte kaleme almış olduğu *I Will Marry When I Want* adlı oyunu nedeniyle 1977'de tutuklanır. Hapishane sürecindeyken yazarlık kariyerine İngilizce olarak değil, kendi anadili olan Giküyu (Kikuyu) dilinde devam etme kararı alır. Yoğun bir uluslararası kampanyanın da etkisiyle bir yıl sonra serbest bırakılır. Hapishaneden çıktıktan sonra, ülkesindeki diktatörlük rejimi üniversitelerde ders vermesine engel olur. Yaşamı da tehdit altındadır. Böylece, 1982 yılında İngiltere'ye gider ve sürgün yılları başlar. 1989 yılında ise bugün halen yaşamakta olduğu ABD'ye göç eder. Yale ve New York Üniversiteleri'nde uzun yıllar ders verir. Şu anda ABD Kaliforniya Üniversitesi, Irvine'de İngiliz Edebiyatı ve Karşılaştırmalı Edebiyat Profesörüdür. Çalışmaları arasında romanlar, oyunlar, kısa öyküler, denemeler, eleştiriler ve çocuk öyküleri bulunan yazarın, bir kısmı Türkçeye de çevrilmiş olan, başlıca eserleri şunlardır: *Homecoming* (1969), *Writers in Politics* (1981 ve 1997), *Moving the Center* (1994); ve *Penpoints, Gunpoints and Dreams* (1998), *Petals of Blood* (Kan Çiçekleri, Çev. Seda Açar, Ayrıntı Yayınları, 2019), *Detained: A Writer's Prison Diary*, *Devil on the Cross* (1982), *Wizard of the Crow* (Kargalar Büyücüsü, Çev. Seda Açar, Ayrıntı Yayınları, 2021), *A Grain of Wheat* (Bir Buğday Tanesi, Çev. Gül Korkmaz, Ayrıntı Yayınları, 2014), *The River Between* (Aradaki Nehir, Çev. Bora Korkmaz, Ayrıntı Yayınları, 2016), *Decolonizing The Mind* (Zihni Sömür-

geden Azad, Afrika Edebiyatında Dil Politikası, Çev. Şebnem Nantu, Hece Yayınları, 2017). Otuzdan fazla dile çevrilen Ngũgĩ'nin eserleri, kitapların, eleştirel monografilerin ve tezlerin konusu olmaya devam etmektedir.).

Rexne, Wek Naverokeka Nûjenîyê¹ Li Ba Ronakbîrên Kurd ên Dewra Stenbolê Helwesta Rexneyî

Remezan Alan

1. Destpêk

Di navbera “serdema nû” û “rexne”yê de têkilîyeka nêzik heye. Heta hin xebat di wê îddiyê de ne ku nûjenîyên vê serdemê bi xêra helwesteka rexneyî rû dane. Nerazîbûna ji dinyaya heyî gava di warên dîn, exlaq, sîyaset, huqûq, huner, felsefe, edebîyata kevin hwd. de bûne helwestek, jê dinyayeka nû çêbûye. Bo nimûne ji van xebatan *Childiren of the Mire* ² di mehneya fireh de ji bo edebîyatê û di ya teng de ji bo helbestê îddia dike ku li ber tradîsyonên heyî, ew tebîetê “reddê mîrasê”, ji bo tradîsyon û meylên nû yên edebîyatê bûye faktorekî mezin.³ Li gor Octavio Paz redkirin, zîrweya îhtirasên modernbûnê ye, ferqa serdema modern jî ji serdemên dîtir, di vê gavê de derdikeve meydana, ji ber ku modern, ji rexnekirina rabirdûya nêzik diweliye, bi vî awayî hunera modern tenê nabe zaroka serdema modern, di heman demê de dibe rexnegirê bi xwe jî.⁴ Jixwe bi vê riwan-

1 - Ev gotar, ji notên semînera me ya Akademîya Payîzê ya li Weqfa Îsmail Beşikçi ya Stenbolê (14.12. 2019) û ji hin notên teza me ya doktorayê hatîye hilberandin.

2 - Bnr. Octavio Paz, *Çamurdan Doğanlar*, wer. Kemal Atakay, (İstanbul: Can Yay. 1996).

Ev xebat ji bo tirkî wek *Çamurdan Doğanlar* hatîye wergerandin, lê bi kurdî mirov jê re bibêje „Zarokên Herîyê“ dê şaş nebe.

3 - Ev fikir xasma di ceribîna ewil a bi navê „Kendisine Karşı Bir Gelenek“ [Nerîteka Li Dijî Xwe] de (13-27) tê ziman.

4 - O. Paz, hb., r. 13, 14, 15.

gehê Paz ji romantîkan bigre heta avangardan, xwendineka hûr dike ser helbestê û wan rê û ekolên cûda yên helbesta modern, bi dîyardeya vê reddê mîrasê re têkildar dibîne.

Dîsa xebata *Critique de la Modernité*⁵ cihekî navendî dide rexneyê. Gava ew serborîya modernîteyê ji aliyê dîroka çandî ve êwr bi êwr destnîşan dike, bi awayekî rasterast nebe jî di kêşeya newekhevî, bêdaletî, pûçbûna dêr, despotîzma monarşiyê, amraz û awayên hilberînê, rûdana şoreşan, çêbûna rêkeftinên civakî (makezagon) hwd. de rola îtirazên rexneya civakî û siyasî teslîm dike. Li gor Alain Touraine fikra modern, encameka redkirina huqûqa berê, redkirina adet, bawerî, rêveberî û bi kurtî dinyaya maddî û manewî ya kevin bû.⁶

Ger ji bo kurdan serê sedsala 20an, zemanê peydabûn û guftûgokirina fikr û meylên modern be, ku wisa ye, divê di nav ronakbîrên kurd de helwesteka ku ji dinyaya berê ne razî ye, hebe. Bi bawerîya me rexneyeka wisa li ba qelemşûr û ronakbîrên kurd ên sedsala 20an heye û armanca gê gotarê jî destnîşankirina vê yekê ye. Em ê ji vê helwesta wan çend mînakên (rexneyên wan ên ji bo ulema û umeraya kurd; perwerde û elifbaya heyî; sîstema merkezî û ceberrût; bêkêrîya edebiyata berê) destnîşan û guftûgo bikin.

2. Cih û Serdema Vê Rexneyê

Ger ji bo kurdan behsa serdemeka modern bê kirin, dê ew serê sedsala 20an be û dê cihê wê jî Stenbol be. Seba ku me bi xebatên cuda cuda çendîn caran vê dewrê û û vî mekanî teswîr û pênase kirîye,⁷ em ê cardin nekevin nav agahiyên hûr û ji bo mijara xwe niha bi kurtî wiha bibêjin:

Belê serdema modern ji bo kurdan -hinek derengmayî jî be- serê sedsala 20an e. Ji ber ku tezahûrên wê yên ketine nav rûpelên kaxêzan, bi çapemenîya kurdan re berbiçav dibe û dirûvê gotarekê (discourse) werdigire. Xwediyê vê gotarê jî “ronakbîr” in. Yanî ew kes in ku bi mearîfê/perwerdeyê hiş û bîra wî “ronî” bûye.⁸ Em dizanin ku di nav kurdan de ev kes berê “arîstokratên xwenda” û “ehlê medreseyê” bûn. Lê bi “mektebên cedîd”, yanî bi dibistanên nû re (wek harbîye, tibbîye, mulkiye, darûmuellîmîn) hinekên dî li vê zumreyê zêde bûn û wan xwest ku li ber “esrêkî mutereqqî” (serdemeka pêşketî) miletê xwe hişyar bikin. Ji ber

5 - Bnr. Alain Touraine, *Modernliğin Eleştirisi*, wer. Hülya Tufan, ç. 5, (İstanbul: YKY, 2004).

6 - Mirov dikare bibêje ku hevokên jorîn, kurteya beşên „Yıldızlı Parlayan Modernlik” [Modernîteya Stêrgeş] (23-105) û „Modernliğin Bunalımı” [Qeyrana Modernîteyê] (109-222) ya xebata Touraine in.

7 - Bnr. Remezan Alan, “Qonaxa Stenbolê di Edebiyata Kurdî ya Modern de”, *Nûbihar Akademî* 3, (2017): 41-63; Remezan Alan, *Keşkül*, (Stenbol: Peywend, 2019), 19, 20, 118, 119, 120.

8 - Jixwe “ronakbîr” an “rewşenbîr” a kurdî wekî têgehên “enlightened” a inglîzî, “éclairé” ya frensî, “munewwer” a erebî û “aydın” a tirkî li ser heman bingeha hevpar (ron/rewşen, light, éclair, nûr, aydinlik) e. Bi heman ferasetê ji wan jî têgehên wek “Ronakgerî”, “Enlightenment”, “Tenwîr”, “Aydinlanma” hatine dariştin.

ku bi raya wan dem, dema hişyarbûna miletan bû. Belê ihtiyatek heye di rengê “aman ji bo *uxûwweta millî* (biratîya neteweyî), biratîya dinî ji dest neçe” an “pêşî misilmanî, piştire ereb, tirk, kurd an ecembûn” de...⁹ Lêbelê di nav vê ihtiyatê de dengên ku aîdiyetê, yanî hîssa millî, dikirin nav xîmê pêşketineka teknîkî ya ewrûpî jî hebûn. Bo nimûne kesê ku înzeya Xarpûtî H.B. bi kar dianî, digot ku pêşverûbûna Protestanîyê û fikra azad a Voltaire şikle daye fikra netewetîyê û her ku li Frense û Almanyayê *hîssên frensî* û *elmanî* rû dane, di zanist, teknîka şer, senayî û ticaretê de reqabet û pêşketineka mezin çêbûye di vana miletan de û niha ev hesta millî belavî nav mesihîyên Şerqê bûye û ber bi alema îslamê vê jî tê û eve li ba ‘erebên Misirê, teterên Rûsyayê guhertinên mezin çêdike û hevî ew e ku ev hîssên han di nav kurdan de jî bibe sebebê hişyarîyekê.¹⁰

Di nava van “hişyarker” an de lewma piştî demekê naşîr û mesûlê rojnameyan (wek Suleymanîyelî Tewfîq/Pîremêrd, Ahmed Ramîz û Huznî Mukrîyanî, Mewlanzade Rifat, Hemzeyê Muksî); doktorê tîbbê (Abdullah Cewdet, Şukrî Sekban, Fuad Berxo, Mustafa Şewqî); ji mulkiye û huqûqê mezûn (Babanzade İsmail Haqqî, Ahmed Cemîl, Suleymanîyelî Mes’ûd, Silêmanî ‘Ebdulkerîm, Suleymanîyelî Tewfîq, Mewlanzade Rifat, Emîn Alî Bedirxan); herbîyyeyî (wek Memduh Selîm Beg, İhsan Nûrî, Ekrem Cemîlpaşa); muhessîb û mamoste (wek Xelîl Xeyalî û Hemzeyê Muksî)... peyda bûn. Û van kesan jî ji bo pêdivîyên serdemê (bi gotina wan *ihtiyacât-ı asriyye*) komele ava kirin, rojname û kovar derxistin. Ji kengê heta kengê? Ji derketina rojnameya *Kurdistanê* (1898) û heta şikestina Serhildana Şêx Seîd û qedexekirina hemû faalîyetên kurdan (1925).

Belkî sebeb pirr bûn ku ev kes li Stenbolê li hev kom bûbûn, lê dê jê du sebebên sereke têrî me bikin: Ya pêşî polîtîkayên merkezîperest in ku ji dewra Mehmûdê Duyem dest pê kiribû û heta Meşrûtiyeta Duyem hatibû. Gava Dewleta Osmanî di warê îdarî û aborî de merkezîbûnê kir polîtîkayek, ji bo reformên Tenzîmatê, çav berda dahata erdên kurdan û bi demê re zemîna huqûqî ya navbera kurdan û tirkan (rêkeftina İdrîsê Bedlîsî û Sultan Selîm) ji nav bir. Mîr û begên kurdan nerazîbûna xwe bi serhildanên lokal nîşan dan, lêbelê di tevan de jî kurd şikestin. Li Silêmanî mîrên Baban; li Rewandûzê, Soran; li Colemêrgê, Hekarî; li Amêdîyê, Behdînan, li Cizîrê, Azîzî ji holê rabûn... Pîraniya van mîrektîyan tevî malbatên xwe sirgûnî Stenbolê bûn. Di encamê de ji wan û zarokên wan re meaşek hat girêdan, lê bi hemû dahatên xwe ve teserrûfa erdên wan ên otonom derbasî xezîneya osmanî bû. Bi vî awayî hem mekanê arîstokrasîya kurdî guherî û hem jî li Kurdistanê bajarek nema ku ew ji daxwazên îdarî û edebî re bibe navendek.

9 - Bnr. Babanzade İsmail Haqqî, “Kürdlerin Tealisi”, *Rojî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/1913): 3, 4; Lutfî Fikrî, “Kürd Milliyeti”, *Rojî Kurd* 4 (30 Ağustos 1329/1913): 3,5; Kerkûklî Necmedîn, “Kurd Ulemasina”, *Hetawî Kurd* 1 (11 Teşrin-î Evvel 1329/ 1913):13.

10 - Xarpûtî H. B. “Garbla Şark, Milliyet Cereyanları”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran1329/1913): 8-9.

Sebebê duyem jî ew bû Stenbol mîna paytexteka emperyal, cihê çapemenî, dibistanên nû, ticaret, moda, nîqaşên fikrî, hemû elîtên kêmar û heta stargeha sirgûnên bîyanî bû. Cihên wisa dibin derîyê îqbalê şexsî û edebî jî. Hatina kesên wekî Koyî, Nalî, Mehwî, Suleymanîyelî Tewfîq, Keyfî ji bo Stenbolê, di vê çarçoveyê de dikare bê dîtîna û şîrovekirin.

Em niha dikarin derbasî nav çend aliyên wê helwesta rexneyî bibin.

3. Çend Aliyên Vê Rexneyê

3. 1. Di Paşmayîna Kurdan de Rola Ulema û Umeraya Kurdan

Nerazîbûna ji dinyaya berê, xwe û kirinên xwe jî dihewîne. Lewma beşeka rexneyên kurdan derbarê wan bi xwe de ye. Cehalet sebebê paşmayîna demê ye û di vê yekê de rola kurdan çi ye? Ev yek bi awayekî eşkere û reel ketîye nav ferhenga ronakbîran. Ji wan gelek kesan, cehaleta heyî bi kurdan ve girê dane, ya rast bi hinek zumreyên wan ve têkildar dîtine. Ev zumre, mîna du girseyên tradîsyonel, ulema û umera ne. Bi gotineka dî muxatebên van rexneyan, şêx û mela û mîr û begên kurdan in. Ev herdu zumre, heta destpêka sedsala 20an jî xwenda, xwedî û mesûlên mîletê kurd dihatin dîtîna û pênasakirin. Ewe ev zumre, ji aliyê komek xwendayên nû ve, ji aliyê ronakbîrên demê ve, ku ew bi perwerdeyeka “esrî” rabûbûn, di dereceya tawanbarkirinê de dihatin rexnekirin. Lêbelê “derbasok”ek jî heye berîya vê rexneyê. Mirov dibêje wek rengekî muxalefeta dewra Abdulhemîd û helwestekî tîpîk ê dewra Meşrûtiyetê, sebebê cehaleta nav kurdan diçû dibû para îstîdadê û îhmal û nîyetxirabîya bürokraşiya osmanî jî. Şopa vê rexneyê bêtir di rojnemeyên vê derbasokê de (*Kurdistan* û *Kurd Teawûn* û *Teraqqî*) tê dîtîna.

Bo nimûne, Suleyman Nazîfê ku piştî bûye îttihatçîyek, di vê dewrê de bi dengê gelek sert digot ku roja ku kurd bi terciha xwe (çarsed sal berê) tevî osmanîyan bûne, çend îstisna ne tê de, tu car rûyekî dilovan nedîtine, ji xeynî zilm û heqaretê tiştê neketîye destê wan, hal ew e ku wan ji bo Dewleta Osmanî ne tenê ked dane, xwîdan û xwîn rijandine, serpêhatîyên herba ûris, cenazeyên wan ên li binê sûrên Wienayê û keleha Girîdê îsbata vê yekê ne, de bila êdî Hikumeta Osmanî wezîfeya xwe bîne cî, mafên wan ên insanî û ihtiyacên wan ên medenî dabîn bike.¹¹

Bi raya Bedîuzzeman Saîdê Kurdî (ji nivîs û bîranînên wî yê rojnameya *Kurd Teawûn* û *Teraqqî* û ji hinek rîsaleyên wî yê wek *Nutuk*-1910-) kurd herî zêde ji îstîdadê zirarê dîtine; cehalet û wehşeta li nav wan, qebehetê hikumetê ye û ger li Kurdistanê ew medreseyên wêranbûyî cardin îhya nebin, dê ev yek berdewam

11 - Suleyman Nazîf, “Kürd ve Kürdistan”, *Kürd Teawûn ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 9.

be.¹² Seîdê Kurdî ji ber axaftin û daxwazên xwe yên ser vê istîqametê, ji aliyê rê-
weberîya demê ve wekî meczûbek sewqî tîmarxaneyê jî bûbû.

Dîsa bi raya Xelîl Xeyalî sebebê wêranbûna welat, sefaleta welatîyan û têkçû-
na şahî û bextyariyê, tev îstibdad bû. Îdareya mustebîd kurd ji xwendinê, ticaret
û zîraetê mehrûm hiştibû û wan eşqîya nîşanî dinyayê dabû.¹³

Li gor Seyyah Ahmed Şewqî zeîfbûna dîn û karên dewletê, perîşanî û feqîrî,
tunebûna perwerde û xwendinê, hindikîya sen'et û ticaretê, hebûna zordestî û
bêtifaqîyê, tev para îstibdadê bû.¹⁴

Lê ji bo texrîbatên îstibdadê û burokrasiya osmanî, gotinên Babanzade İsmail
Haqqî (ku demekê bûbû wezîrê perwerdeyê) gelek teswîrker in. Li gor wî hati-
na meşrûtiyetê ji bo kurdan jî “berhemekî nûbûnê” (bir eser-i teceddûd) anîbû
meydanê û divê kurd bi şev û roj bixebitîna. Dê ji kû dest bi xebatê bikirana?
İsmail Haqqî vê girîngîyê wiha dianî ziman: “Pêşî perwerde, piştî dîsa perwer-
de. Piştî? Elbet dîsa perwerde, dîsa perwerde, dîsa perwerde.”¹⁵ Lê berî bigihîje
vê encamê destnîşan dikir ku dewra îstibdadê ji her kesî re, lê bêtir ji kurdan
re xerabî anîbû; wan hem cahil û bêziman hiştibû û hem jî gelek îsnadên xirab
li wan bar kiribû; îstibdad hem bûbû dijminê fikra kurdî û hem jî dijminê zi-
manê wan; vê rêweberîyê hewil dida ku pêşî zimanê kurdan û piştî jî serê wan
jê bike. Bi vê guvaşê li hemû Kurdistanê cehaletka bêhesab/fahiş rû dabû, gelek
kurd ji insanîyetê derketibûn; ji ber wehşet, cehalet, bênesîbîya rêgezên mezheb
û bawerîyê, ne tenê hebûna wan biketa metirsîyê, hindik mabû şeref, heysîyet û
namûsa wan a millî jî lekedar bûbûya.¹⁶

Lê piştî di weşanên wekî *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Jîn*, *Serbestî*, *Kurdistan*
(kovar) de em dibînin ku tîrên van rexneyan berê xwe dane ulema û umeraya
kurdan. Gerçî berîya gotarên van rojname û kovarên kurdî, divê îstidradek ji bo
naveroka hin helbestên Hacî Qadirê Koyî bê danîn. Lewra çî helbestên wî yên
ku bi awayekî serbixwe çap bûne û çî yên ku di nav gotarên hinek ronakbîran
de mîna referans cih girtine (Xelîl Xeyalî, M. Midhat Bedirxan) rexneyeka wiha
dihewînin. Belkî Koyî hêj li Koyê dest bi rexnekirina vê zumreyê kiribû, lê wisa
dixuye hatina wî ya li Stenbolê, dîtina pêşketina dinyayeka nû, di vê pêşketinê
de pêşengîya zumreyên xwenda û gewremalan, dereceya rexneyên wî diwartir
kiriye. Em ji bo wan helbestan dikarin bibêjin ku Koyî di çarvoyeka teng de (ne-
teweyî) gava li pratîka hinek şêx û melayên kurdan dinihêrî, didît ku xwedîyê

12 - Ji bo hûrgilîyên van agahîyên giştî bnr. gotar û bîranînen wî yên rojnameya navborî (wek “Bediuzzaman Molla Saîd-i Kurdînin Nasayîhu”, “Kürdler Neye Muhtac?”, “İfade-i Meram”, “Nutk-ı Sabıkın Neticesi”, “Molla Saîd-i Kürdînin Tîmarhane Hatıratı”) û “Nutuk”, dnd. *İçtimai Dersler*, (İstanbul: Zehra Yayıncılık, 2006), 9-35.

13 - Xelîl Xeyalî, “Weten û İttifaqa Kurmanca”, *Kürd Teaviin ve Terakkî Gazetesî* 8 (10 Kanun-u Sanî 1324/1909): 69.

14 - Seyyah Ahmed Şewqî, “Gelî Welatîyan”, *Kürd Teaviin ve Terakkî Gazetesî* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 16.

15 - Babanzade İsmail Haqqî, „Kürdler ve Kürdistan“, *Teaviin ve Terakkî Gazetesî* 1 (22 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 3.

16 - Babanzade İsmail Haqqî, heman nivîs, 3, 4.

fitüyên şaş û sûdperest bûn; çavbirçî, nezan, kedxwir û doxînsist bûn; aşê wan bi ava xelkê digeriya û ji alîyê ilm û merîfet û sermayeya kurdî ve reş û rût bûn. Alimên çak ji zû de bûbûn mêvanê mewtê, yê sax jî ustadên farisî û tazî/erebî bûn, heta hinek jê ghiştibûnn şan û asta Razi, lêbelê seba ku sermayeya wan malê xelkê bû, wextê mirin çûn, ew sermaye jî bi wan re hiç û pûç bû çû.¹⁷ Di çarçoveya fireh de (ummetî) jî Koyî pratîka vê zumreyê musteheqî rexnekirinê didît. Ji ber ku bi vê halê xwe, ew ne tenê bûbûn felaketa qewmê xwe, ji bêferasetîya wan xaka îslamê jî tarûmar bûbû ku di serdema heyî de Hindistan, Buxara, Daxistan, Qazan û Qirim û ehlê van bajaran ji barê kafiran re bûbûn ker.¹⁸

Herçî umeraya kurd, yanî mîr û begên kurdan bûn, ew jî di behsa milletî de gunehkar bûn li gor Koyî. Çinku ew ji pêşengîya milletê xwe dût ketibûn, cewherê wan kor bûbû. Hal ew e ku serdem, serdema hişyarbûna milletan bû, heta çend milletên ku ji alîyê kemîyetê ve bi qasî du sê eşîrên kurdan ancax hebûn, ji bo serxwebûna milletê xwe karên mezin kiribûn, lê umereya kurd di xeweka giran de bû. Tenê di vê meseleyê de wisa bûn? Nexêr sermayeya “kitêb û deftera kurdî” de jî têk çûbûn, lewra mîna ku me niha gotî ew jî wekî ulemaya kurd ummîyê zimanê xwe bûn. Dîrok bi mînakên kurdên mezin tije bû lêbelê ji ber “bêdefterîya zimanê xwe” eynî dîrok wan li goşeyekî winda û fanî qeyd kiribû, hal ew e ku şêx û mela jî tê de, wan mîr û emîran bi zimanê xwe mistûemel bikirana, heta roja mehşerê nav û nîşanê wan dima.¹⁹

Bêguman rexnekirina ulema û umeraya kurdan, ji vê destpêkê heta roja me di nav xeteka domdar û seqamgîr de hatîye. Li vir ne wext têrî dike û ne jî peywenda me destûr dide ku em tevan destnîşan bikin. Lewma ez ê çend libên dî yê temsîlkar û destpêkê, bînin ziman û vê behsê tamam bikim.

Mirov dikare bibêje piştî mirina Koyî du sal şûnde vê carê di rojnameya *Kurdistanê* de şopa vê rexneyê xuya dike. Xwediyê van rexneyan vê carê Midhat Bedirxan e. Li gor wî ulema û umeraya kurd, ji pêşketinên dinyayê bêxeber in, nizanin ka di serdema wan de çerxa dinyayê çawa digere, li dinyayê çî dibe. Bi ser de ew pere xerc nakin ku li gund û navçeyan ji bo zarokên wan û feqîran dibistan û medrese vebibin. Li gund û bajarên misilmanên dî “mekteb, medrese û cerîde” hene, lê kurd ji vê yekê bêpar in, nikarin rojnameyekê bixwînin. Sebebê nezanîya nav kurdan, sersarî û bêxemiya mîr û axayên wan in. Tu qusûr tune ku zarokên wan hem xwendina mishefa şerîf û hem jî ya rojnameyan bizanibin.²⁰

17 - Ji bo halê têkûz ê çapa helbestên Koyî, bnr. Hacî Qadirî Koyî, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, (amd.) Serdar Hemîd Mîran&Kerîm Mustefa Şareza, (Sine: Întîşaratî Kurdistan, 2012). Ji bo naveroka destnîşankirî bnr. 238.

18 - Bnr. Hacî Qadirî Koyî, heman berhem, 203, 204.

19 - Koyî, hb.152, 153.

20 - Mîqdad Midhat Bedirxan «Bîsmilâhîrrehmanîrrehîm», *Kurdistan* 1 (9 Nîsan 1314/1898): 1-4.

Kerkûklî Necmedîn bi du gotarên ku rasterast bangî ulemaya kurd dîke, tev li vê rexneyê dibe. Di ya pêşîn de dibêje ku ulema gava ji bo qewmê xwe bişixulin bi ser dikevin, çinku gava mirov waqîfî cografya, temayûlên siruştî û îtiqadên qewmê xwe be, xizmet çêdibe. Dê misilmanekî Bexdayî çawa halê yekî Buxarayî bizanibe? Ew bi delîlên neqlî û ‘eqlî ji bo bextewarîya milletê xwe bişixule, çêtir e. Eve xort û ronakbîrên kurdan bi vê hesîyane, bila ulemaya kurd jî bizanibe ku serdem, serdema medenîyetê ye. Madem ew dibêjin em “warisê nebîyan” in, bila doza wezîfeya rizgarkerîyê bikin, bila teblîxê bikin. Ger li Kurdistanê bi hemû mehneya xwe evîna neteweyî ava bûbûya, li nav xelkê şer û pevçûn çenedibûn û kurd ji alîyê aborî û ilmî ve ewqas bêpişt nediman.²¹

Rexneya Kerkûklî di gotara duyem de tûjtir e. Lewra dibêje ku ger mirov ji kurdan bipirse ka li Kurdistanê çi xizmeta aliman çêbûye, dê bersiva wan “qet” be! Lewra yên herî jîr dema tehsîla xwe tamam dikin berê xwe didin Stenbolê ji bo meaşekî, her wekî xizmeta wan tenê bi pereyan çêbibe. Dema roja ezabê hat, dê ew ji vî gunehî bîn pirsîyarkirin. Dê ew jî poşman bibin ka çima xizmeta milletê xwe nekirine, lêbelê dê poşmanî fayde neke. Dîn dibêje pêşî xizmeta xism û eqrebayên xwe bikin, lê alimên kurdan vîya şaş fêm dikin. Tênağihin ku milletê wan jî eqrebayên wan e.²²

Li gor Qazîzade Mistefa Şewqî jî qet ne zehmet e ku reîs, ulema û dewlemendên kurdan bo mindalan mekteb ava bikin. Ger dewlemendên bajarê Seblaxê (Mahabad) her yekî salê du tûmen bida, di nav salekê de bi wî pereyî dibistanek dirist dibû, mamosteyekî çak peyda dibû û kare xwendinê jî diçû serî, lêbelê ew reîs, ulema û dewlemend wisa nakin.²³

Xelil Xeyalî jî di wê bawerîyê de ye ku gunehê paşmayîn û cehaleta kurdan, di stûyê ulema û umeraya kurdan de ye. Di *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurd* de bi nasnavên Modanî X. û M. X. nêzikî heft gotarên wî li ser vê şopê ne.²⁴ Di van herdu kovaran de, piçek jî di bin tesîra fikrên Hacî Qadirê Koyî de, Xeyalî rasterast berê xwe dida van her du zumreyan. Ji ber peywenda sînorkirî em naveroka gotara yekê, mesela ya “Bextreşî û Mehrûmîya Kurdan” neqil bikin meqsed hasil dibe. Li gor Xeyalî şêx, mela, feqe, mîr, serek û rîspîyên kurdan, nabînin ku îro agirekî çar alîyê kurdan girtîye, qenc û xirab herkesî dişewitîne, lê kes di hewara kurdan de nayê. Ewên ku kurdan xelas bikin dê dîsa pêşîyên kurdan bin ku ji milletê xwe re “medrese”yan çêdikin. Jixwe li ser rûyê erdê çiqas dewlet û millet hene hemî yekdil û yekrû, yekziman, bi şev û roj ji bo pêşçûna milletê xwe kar dikin. Di vê

21 - Kerkûklî Necmedîn, “Kurd Ulemasına”, *Hetawî Kurd* 1 (11 Teşrîn-î Evvel 1329/1913): 10-13.

22 - Kerkûklî Necmedîn, „Kurd Ulemasına-2”, *Hetawî Kurd* 2 (21 Teşrîn-î Sanî 1329/1913): 12.

23 - Qazîzade Mistefa Şewqî, “Mekteb Çi ye?”, *Hetawî Kurd* 3 (29 Kanun-u Evvel 1329/1914): 30, 31.

24 - Xeyalî di *Hetawî Kurd* de bi „Ji Mezinê Kurdan Ra Ye”, „Derdê Kurdan”, „Ji Qesîdeyê Hacî Rehmetî Têne Zanîn Ku” ev rexne û mijar domandîye. Heta navê du gotaran eynî ye. Seba ku nebe dubare me behsa yên *Hetawî Kurd* nekir. Di *Jînê* de jî bi navê Kurdîyê Bitlîsî li ser dîrok, mîtolojî û standardkirina ziman gotar nivîsîne.

rêyê de ji bo milletên xwe rojnameyan derdixin û tê de îhtiyacên milletê xwe dest-nîşan dikin. Dê dîrok navê van qeyd bike û ji bîr neke. Her ku kurdan misilmanî qebûl kirîye û heta niha ji nav wan bi hezaran şêx û mela û mîr rabûne, ji bo dîn û dewletê, xizmetên mezin kirine, kitêbên qenc çêkirine, lêbelê bi qasî serê zilekê jî faydeya wan negihîştîye qewmê wan. Lewma ew tev bînav çûne. Hal ew e ku van kesan ji bo kurdan xizmet bikirana, kitêb û dîwan bi zimanê kurdî binivîsîna, îro nav û kitêbên wan winda nedibû. Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî mînakên vê yekê ne.²⁵

Ne tenê di kêşeya perwerde, dibistan û sersarîya ji bo zimanê xwe de ev zumre xwedî-qebehet e, bi bawerîya M. Salih Bedirxan tunebûna rojnameyeka sîyasî jî îhmalkarîya wan e: Digel şeş mîlyon nifûsa xwe ger îro li dinê navekî kurdan tunebe, kes ne hayedar be ka ji bo îslamê çî xizmet kirine; sebebê vê yekê tunebûna “cerîde”yên kurdî ne. Îro her qewm xwedîyê pazdeh, bîst cerîdeyan e û qewmê bê cerîde mîna mirovekî lal e, kerr e, nikare derdê xwe beje. Belê cerîdeyên mîna *Rojî Kurd* hene lê ew cerîdeya ‘ilm û merîfetê ye, ew nikare behsa sîyasetê bike. Li gor qanûna dewletê, ji bo *cerîdeyeka sîyasî*, lazim e mirov pênzed zêr emanet deyne. Mixabin kurd ji tedarîka vî pereyî acîz in.²⁶

Elbet di nav kurdan de, bi vê tûndîyê rexnekirina zumreyeka xwedî-prestîj, ji meyla serdemê ne xafil e. Dîyar e ku serdema nû, asoyeka wêrek çêdikir ku xwendayên ku bi perwerdeyeka nû rabûne, van kevnezumreyan rexne bikin, ji bo pêdiviyên demê wan bînin ser rêyeka rast û acîl.

3.2. Daxwaza Perwerdeyeka Nû û Islehkirina Elifbaya Erebi

Tam bi vê xalê re têkildar, kêşeya perwerde û elifbayê jî hatîye rojevê. Ji ber ku xwende û ronakbîrên kurdan wisa bawer dikirin ku cehaleta heyî, bi “mektebên cedîd” ji holê radibe, hêskirina elifbaya erebî ji bo kurdî, kêşeya xwendin û fêrbûna nivîsandinê berteref dike. Ev yek di gotarên şeşsan û beyannameyên komeleyên sîyasî û çandî de her gav tê ziman. Li gor naveroka van gotar û beyanan, zarokên kurdan zîrek in û xwedî-behre ne, lê li ber destê wan kitêbên zanist û teknîkê tunene, ji tirkî fêm nakin û elifbaya heyî jî gelek zor e û li kurdî nayê, sebebên paşmayîn û dereng-kemilîna wan ew in.

Li ser vê xetê mesela Midhat Bedirxan gava di rojnameya *Kurdistanê* de pesnê gule, top û tifengên emerîkî, freng, rûs û japonan dia, digot divê kurd jî çekên vî zemanî bizanibin çekin û biemilînin û ji bo vê yekê jî ji wan re «medreseyên wisa şert in, divê ew medrese li gor «ilm û merîfeteka esrî bin ku zarokên kurdan ji şivantî û rênçberîyê xelas bibin.²⁷

25 - M. X. “Bextreşî û Mehrûmîya Kurdan”, *Rojî Kurd* 3 (1 Ağuştos 1329/1913): 29-31.

26 - M. S. Azîzî, “Hişyar Bîn”, *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz sene 1329/1913): 23, 24.

27 - Midhat Bedirxan, bnr. „Bismîlahîrrehmanîrrehîm“, *Kurdistan* 1 (9 Nîsan 1314/1898): 1-4; „Bismîlahîrrehmanîr-

Dîyarbekirlî Fikrî Necdet şertê pêşketina çandinîyê (zîraet) di vekirina dibistanên esrî de didît. Digot herçend erdê kurdan pir e, axa wê baş û ava wê boş e jî kurd bi qasî frengan dexil hîlnaynin; ji ber ku frenk erdê xwe bi makîneyan cot dikin; yek diavêjin çil hiltînin û îro ji nav wan gelek arvan, cil û pêdivî tên nav memleketê osmanî; ewên dibêjin şixulandina makîneyên gawiran guneh e, derewan dikin û bila ew ji halê xwe şerm bikin. Divê eşîrên kurdan zarokên xwe ji bo hînbûna vê cotyarîyê bişînin dibistanan, dema erd bi makîneyan baş hat kolan, dê bender mezin û paşil tije bibin.²⁸

Li gor Babanzade İsmail Haqqî, “ziman” di vê perwerdeyê de xwedîyê roleka kilîdî ye. Ji ber ku ziman ne tenê amraza ragihandinê ye, bidestxistina ‘ilm û fennê, pêşketin û medenîyetê bi wî çêdibe. Miletê ku ji nivîsandinê mehrûm be, “bêziman” e. Mixabin ji ber karên neqenc ên hikumeta mustebîd wekî pêkhatiyên misliman (çerkez, laz û arnawûd) kurd jî bûbûn qewmekî zimankuşti. Lewma îro ne kitêbên wan ên rêzimanê, ne matbaa û ne jî berhemên wan ên çapbûyî hene. Wisa ji edebîyatê, rêbazên zanist û teknîkê, berhemên zanistî û hunerî jî mehrûm mane. Hêz û hikumranî di perwerdeyê de ye, perwerde jî bi ziman li ser pîya dimîne. Kurdên ku sitûna herî girîng a osmanî ne, ger ne qewîn be, Dewleta Osmanî ya ku pala xwe dide vê sitûnê jî dê li ser pîya nemîne! Çare ne *tirkîkirin* an *erebkirina* kurd, laz û arnawûdan e. Çare ew e ku her qewm bi zimanê xwe perwerde bibîne. Erê di gundekî kurdîaxivê de mirov pile bi pile dikare tirkî hinî zarokêkî kurd bike û ew zarok jî di dawîyê de bi jîrbûna xwe dê were asteka baş, lê di ber vê hînbûnê de ew zarok dê ji ‘emrê xwe yê biqîmet çend salan winda bike. Li ber destê vî kurdî ger bi kurdî çend berhemên derbarê zanist û teknîkê de hebûna û ew biçûya dibistaneka kurdî şik tune ye ku dê zûtir bikemilîya û perwerdeyeka bênoqsan wergirta. Hasilî bîngeha yekem a selameta milletî, perwerde ye, mifteya perwerdeyê jî ziman e, derîyê medenîyetê jî bi vî zimanî vedibe.²⁹

Bi raya Seyyîd Muhammed İsmetullah (ku ji nivîsa wî dîyar dibe ew yekî ereb e û li Kurdistanê heft sal nefî maye), osmanîyan her milletî jî zanîn û perwerdeyê mehrûm hiştîye, nehiştîye ew bi feyza zanîn û tekamûlê bijîn. Fezîletên heyî yên kurdan, bi xîret û xebata wan çêbûne, tê de tu para osmanîyan tune. Ew dibistanên ku li Kurdistanê vedibin ne faydeyekê didin kurdan û ne jî ji pêdivîyên wan re dibin derman. Heta ku dersê wan dibistanan ne li gorî pêdivîyên herêmî û serdemî bin, pûç in. Kurd divê li gor zeka û behreyên xwe perwerdeyekê bibînin.³⁰

rehîm”, *Kurdistan* 2 (23 Nisan 1314/1898): 1-4; û „Fazilet’ul ‘Ilm”, *Kurdistan* 4 (21 Mayıs sene 1314/1898): 3-4.

28 - Fikrî Necdet “Cotkarî”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/1913): 24-25.

29 - Babanzade İsmail Haqqî, „Kürdceye Dair”, *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesî* 3 (6 Kanûn-ı Evvel 1324/1908): 18-19.

30 - Seyyîd Muhammed İsmetullah, “Kurdistanda Maarif”, *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesî* 9 (17 Kanun-u Sanî 1324/1909): 79.

Herçend li gor pêdivîyên serdemê vekirina dibistanan, di wan dibistanan de îmkana perwerdeya bi kurdî û çareserkirina materyalên dersê (wekî rêziman, ferheng) ji dewra meşrûtîyetê heta destpêka şerê cîhanê di nav ronakbîrên kurdan de bûye cihê nîqaşê jî, ji ber şertên neguncaw, ji xeynî du carên emirkin, ev mesele ji quwweyê derbasî pratîkê nebûye. Belê kurd cara pêşî di dewra meşrûtîyetê de, li Stenbolê, di asta seretayî de be jî, bi navê wê “Kurd Meşrûtîyet Mektebî” bûn xwedîyê dibistaneka nû. Ev dibistan ji alîyê komeleya Kurd Neşrî Maarîf Cemîyetî ve di 1910an de, pîranî bi alîkarîya kurdên dewlemend hat damezrandin. Ji beyannameya komeleya wê diyar dibû ku di pêşerojê de ji bo dibistanên Kurdistanê dê bûbûya mîna keka tetbîqî (pîlot). Lêbelê ji ber zêdebûna tacîz û meylên tirkperest ên îttihadçîyan, ew heft heşt meh şûnde hatîye girtin.³¹

Cara duyem li Xoyê komeleya Gehandinî, bi heman navî dibistaneka nû vekirîye. Mebesta wê avakirina matbaayekê, derxistina rojnameyeka heftane û vekirina dibistanên sin’et û zîraetê bû. Ev dibistana ku pol, dispanser, mifredat û cilûbergên wê “bi terzeka ewrûpî” hatibûn saz kirin, ji bo “neslê nû yê kurd” bû.³² Lêbelê ew jî bi destpêkirina şerê cîhanê re, di sala 1914an de belav bû.

Eve di van salan de, di ber behsa dibistanên nû, zû-xwendin û nivîsandinê de islehkirina elifbayê tê rojevê. Gotara ku agirê vê nîqaşê geş kirîye, aîdî Abdullah Cewdet e. Cewdet di wê bawerîyê de ye ku ji bo pêşveçûna kurdan, şertek jî ew e ku di nav wan de rêjeya kesên xwenda bilindî ji %40an bibe, ji bo vê yekê jî divê “herfên nû” bên qebûl kirin da ku kurd di mehekê de bi wan herfan zarokên xwe yên 7-8 salî hînî xwendin û nivîsandinê bikin.³³

Derhal kesên wek Suleymanîyelî Mes’ûd, M. S. Azîzî (M. Salih Bedirxan), Silêmanî Ebdulkerîm, Modanî X. (Xelîl Xeyalî) û Babanzade İsmail Haqqî tevî vê nîqaşê dibin. Me got li rexê vekirina dibistanan ji bo zarokên kurdan, hêsankirina elifbaya heyî jî mîna karekî elzem dihat dîtin. Li gor xwedîyê van nivîsan, sebebê sereke yê paşmayîna zarokên kurdan, elifbaya heyî bû. Bo nimûne Suleymanîyelî Mes’ûd di wê genaetê de bû ku ilmên dînî ne tê de, di hemû warên zanistên serdemî de tekane sebebê paşmana alema îslamê, curbecurîya şiklên herfan ên elifbayê bû. Ji ber ku ji bo hînbûna 6 tîpan divê mirov 80 şiklên cuda hîn bûbûya. Mesela şiklên tîpên bê, (ب), tê (ت), sê (ث), nûn (ن), yê (ی) û tîya sitûr (ط) herdem diguherîn. Ji bo 32 tîpan, hînbûna 200 şiklên bêhereke, hem xwendekaran û hem jî mamosteyan bêşewq dikir. Eve cehaleta heyî ji vir dest pê dikir. Çare çi bû? Çare ew bû ku di dibistanên seretayî de ji bo her herfê mirov tenê yek şiklî hilbijarta û wê bi kar bîna.³⁴

31 - Bo agahîyên berfirehtir bnr. Bahattin Demir, “Kürd Meşrutiyet Mektebi”, *Toplumsal Tarih* 200 (Ağustos 2010): 72-78.

32 - Bo agahîyên berfirehtir bnr. Celîlê Celîl, *Kürtü Aydınlanması*, (wer.) Arif Karabağ, ç. 2, (İstanbul: Avesta, 2013), 122, 124.

33 - Abdullah Cewdet, “Bir Xitab”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran sene 1329 /913): 3-4.

34 - Suleymanîyelî Mes’ûd, „Hurûfumuz ve Teshîl-i Kirâatî“, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran sene 1329/1913): 18.

Li gor M. S. Azîzî (M. Salih Bedirxan) ger elifbaya ‘erebî bihata islehkirin, dê ji her qewmî bêtir kurd jê fayde bidîtana. Belkî kesê herî cahil û bêqabiliyet jî di sê çar mehan de xwendin û nivîsandinê hîn bûbûya. Piştî islehkirina elifbayê, karê nivîsandina rêzimana kurdî û pêdiviyên di hêsantir dibû.³⁵

Gotarên Modanî X. (Xelîl Xeyalî) û Silêmanî Ebdulkerîm, li ser ferqên navbera zarokên kurdan û ewrûpiyan, “berawirdkirinek” tîne nav vê nîqaşê. Bo nimûne Xelîl Xeyalî di wê baweriyê de ye ku zarokên îngilîz, frensîz, elman, rûs û îtalyanan di nava şeş heyvan de xwendin û nivîsandinê hîn dibin lêbelê yê kurdan di nava deh salan de du herfan jî hîn nabin. Sebebê vê yekê ne jîrbûna zarokên ewrûpî û ne jî bêxîretî û kêma-aqilîya zarokên kurdan e. Di “zûxwendin” û “zûnivîsandin”ê de kêşeyek heye. Lewma divê kurd ji şêx û melayên Mûsil, Dîyarbekir, Bi(t)lîs, Wan, Erzerom, Bexdad, Sinê, Silêmanî, Kerkûk û Xarpûtê bipirsin ka li ser vê behsê çi difikirin, belkî piştî sê-çar mehan ji bo xwendin û nivîsandinê çareyekêbe.³⁶

Silêmanî Ebdulkerîm bi şêwazeka mizahî hem kêşeya elifbayê û hem jî rêbaz û helwesta mamosteyan rexne dike. Li gor wî ji ber elifba û rêbaza hînkirinê mindalên kurd zû hînî xwendin û nûsînê nabin û hewesdarîya wan a bo tehsîlê zû vedimire. Ji ber ku piştî çend salên xwendinê mindalên kurd nû hîn dibe ka “dal” a (د) Zeyd bi çi bûr e, “ra” ya (ر) Omer bi çi mensû ye, “we” (و) bi çi û xulamê Bekir bi çi meksûr e, ta ku ev hemû piştî bîst salan bi kêrî xwendina *Babul-Ferra* îdê bêt. Îcar gava li dibistan û hucreyên medreseyan feleqe, lêdan û sîleya muellim û melayan jî dikeve ser vê bobelatê, bêhewesî zêdetir dibe. Axir mindal di heft salan de Qur’anê xetim dike. Qebebet elbet ne yê wî ye, ger ew mindalê frengêkî bûya, di heft salan de dibû musteşarê nazirê xaricîyê. Lewra mamosteyê wan hiş û fikrê zarokan bi elif ser a, hê zenne eh, mîm ser ma, dal zenne med, ku dibe “Ehmed” meşxûl nake. Tîpan nîşan dide, paşê ji şekir tîpan dirist dike, bang dike mindal, were navê xwe, ku Ehmed e, peyda bike, ger te peyda kir, ev şekirên ha ji bo te, dibêjê. Ew mindal wisa tê reqs û semayê, di maweyê du deqîqan de ji wan şekiran navê xwe dirist dike, yanî hem navê xwe dixwîne û hem jî dinivîsîne. Mamosteyê kurdan feqîro bi du saetan de encax “elif ser a” hîn dike. Freng du rojên hefteyê, zarokan dibin çolê, fêrî ilmê çandinê (zîraet) dikin ka ji du ribe genim çawa sed ribe genim tê hilanîn. Mixabin yên kurd û osmanîyan ji ‘ilm û feneka wisa jî mehrûm in.³⁷

Li gor Babanzade I. Haqqî di vê rêyê de wezîfeya pêşîn ew e ku mirov kurdî bike zimanekî rasteqîn ê nivîsê. Ev ziman jî dê “bi tîpên nû yên ‘erebî” çêbibe. Jixwe di vê behsê de çend teşebîs çêbûne ku divê ji nav wan mirov ya herî baş bi-

35 - M. S. Azîzî, “Hurûfumuz ve Teshîl-i Kirâat” *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/1913):13.

36 - Modanî, X., “Ziman û Nezanîya Kurdan”, *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/1913): 29-30.

37 - Silêmanî Ebdulkerîm, “Tal û Şîrîn”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/1913): 21, 23.

neqîne û li gor pêdiviyên kurdî bêteredût wan bi kar bîne. Dê tîpên kurdî bi ‘erebî bin. Bes bila elifbaya nû, ji ya berê ne tevlihevtir be, bila ji tîpên basît pêkhatî be. Lewra di dawîya dawîn de kurd aîdî malbata Şerqê ne, bila nedin pey arnawûdên latînpêrêz.³⁸

Di nav van guftûgoyan de çareserkirina kêşeya elifbayê, carina digihîje navrokên balkêş. Ji bo vê yekê nivîseka Mewlanzade Rifat temsîlkar e. Li gor wî gava kurd şîyar bû û ketin ser rêya teraqqîyê, dor tê ser ziman. Ji ber ku ji bo hemû pêşketinan ziman lazim e. Islehkirin û pertkirina (ta’mîm) ziman jî bi nivîsandinê çêdibe. Ji bo ku mirov bi heq kurdî binivîse û bi hêsanî fêhm bike û bide fêmkirin, vejandin û islehkirina tîpên wî yê qedîm şert e. Kurd wekî ermenîyan qewmekî “urdû”yî ye û jê re tîpên “urdûyî” divê. Bi tîpên heyî zeptkirina zimanê kurdî ne mimkûn e. Ger kurd bikaribin tîpên xwe yê qedîm vejînin û isleh bikin, bi wan qewmê xwe bînin nav daîreya şewazeka nû û pê kitêbên xwendin û rêziman û herwiha ferhengê binivîsin, dê armanca wan biçê serî.³⁹

Ev cure lêgerîna elifbayekê li gor taybetiyên zimanê xwe, heta nîfşê Hawarê jî didome. Ji ber daxwaz û pratîkên cuda bî amadekirin jî *Elifbayê Kurmançîya Xeyalî*, (1909), *Hînkere Zimanê Kurdîya komeleya Hêvîyê* (1921), parçeyekî vê lêgerînê ne. Herçend piştî şerê cihanê (1918) bala kurdan bêtir dikeve ser “huqûqa millî” jî di vê maweyê de hebûna du gotarên Kamiran Alî Bedirxan, diyar dike ku çareserkirina kêşeya hêsanîkirina elifbayê berdewam e. Di gotara *Serbestîyê* de Bedirxan eyan dike ku demeka nêzik de xebata Kurd Neşrî Maarif Cemîyetî dê semereya xwe bide, wek gava pêşîn dê ev komele kitêbên elifba û rêzimana kurdî saz û çap bike.⁴⁰ Di gotara *Jînê* de jî Bedirxan dibêje qencîya elifbayeka sivik û hêsan pirr e; ew milletên ku zimanê xwe isleh dikin, qadêyên zimanê xwe sererast dikin, tîpên sade û sivik bi kar tînin, astengiyên li pêşîya serxwebûna xwe jî radikin. Lewma elifbaya ku tê amadekirin, divê di demeka kin de xwendin û nivîsandinê hînî gundîyan jî bike. Di vê rêyê de «bi feraseteka nû» mirov tevbigere, dev ji wan bawerî û îctihadên batil berde çêtir e. Bi şertê ku ne li dijî hukmê îlahî be, li gor pêdiviyên demê divê mirov elifbayekê (yeka ji milê rastê ber bi milê çepê ve an yeka ji milê çepê ber bi yê rastê ve tê nivîsin) peyda bike ji bo kurdan.⁴¹

Bi rastî jî heman rojan elifbaya cemîyeta ku Kamiran Bedirxan behsê dike, di jimarên 17, 18, 19, 20 û 22an a *Jînê* de çap dibe. Heta ji bo pratîkê, di jimara 23an a kovarê de helbesteka Nalî bi vê elifbayê tê weşandin. Elifba wekî «herfên sewtî-

38 - Babanzade İsmail Haqqî, „Kürdlerin Tealisi“, *Roşî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/1913): 3-4.

39 - Mewlanzade Rifat, “Muhterem ‘Hetawî Kurd’ Gazetesi Muessislerine”, *Hetawî Kurd* 2 (21 Teşrîn-î Sanî 1329/1913): 3.

40 - Kamiran Alî Bedirxan, „Kürd Lisânının Tedvini“, *Serbestî* 480, (29 Nîsan 1919): 1.

41 - Kamiran Alî Bedirxan, „Kürd Lisânı“, *Serbestî* 486 (5 Mayıs 1919): 1.

ye» û «herfên sabite» hatiye dabeşkirin, lê jê dîyar dibe ku bêtir ji bo çareserkirina kêşeya dengdêrên kurdî (a, e, ê, i, î, o, u û) hewl û xîretek heye.⁴² Halê hazir bi vê elifbayê kurdan çiqas mistûemel kir em nizanin lê em dizanin ku îmkanê elifbaya *ji milê çepê ve tê nivîsîn*, di sala 1932an de bi kovara *Hawarê* pratîze bû.

3.3. Rexne Li Rêveberîya Berê û Merkezîperestîyê

Em dibinin ku elametekî mezin ê dewra modern, qebûlkirina makezagonekê, yanî rêkeftineka civakî (social du contrat) ye û bi vê rêkeftinê sînorkirina hikumranîya keyfî ye. Li ser vê behsê Touraine dibêje ku sînorkirina hikmê hikumdar û bi şoreşeka neteweyî (mîna Şoreşa Frensî) dewirkirina vî hukmî bi temamî ji bo gel, rewşeka dewrên nû ye. Ji aliyên cuda cuda ve tesîra fikrên Descartes, Locke, Rousseau, Voltaire, Diderot çêbûye heta ku “di şûna qanûna îlahî de faydeya civakî binecî bûbe”. Li ser vê yeke mesela li Îngilîztanê îlankirina Danezana Mafan/Bill of Rights (1689) û li Frenseyê Danezana Mafên Mirov û Welatîyan/La Déclaration des droits de l’Homme et du citoyen (1789), bûne xîmên qanûnên huqûqî yê rejîmên wek meşrûtiyet û cumhuriyetê, bi van rejîman re rûdana *meclîs* û *qanûna esasî* jî bûne temsîla îradeya gel li hemberê rêvebir û dewletê.⁴³

Navê rengvedana vê dîyardeyê ji bo Dewleta Osmanî jî -du carên emirkin-çêbûna rejîma Meşrûtiyetê (1876 û 1908) û qebûlkirina Qanûna Esasî ye. Li taxa kurdan bi kêf û çuşeka mezin pêşwazîkirina van herdu dîyardeyan, fikrek dide me ka ronakbîrên kurdan çiqas meyyalê dinyayeka nû ne. Ji bo dîtina vê yeke, çavlêgerîneka basît li çend nivîsên rojnameya *Kurd Teavûn û Teraqqîyê* têra me dike. Bo nimûne Dîyarbekirî Ahmed Cemîl ji bo Meşrûtiyeta Duyem digot *şahîya yekem a bûka hakimîyeta millet û cejna mezin a azadîya millet*, ji bo betalkirina Meşrûtiyeta Yekem jî digot *têkçûna mafên welatîyan û ketina taca azadîyê*.⁴⁴ Seîdê Kurdî wesfekî pêşketî dida rêveberîya meşrûti û digot meşrûtiyet cinsekî meşwereta îslamî ye, bi vê îdareyê re êdî hikim ne ya kesekî ye û madem meşrûtiyet ji ruhê îslamê ne dûr e, nexwe ji bo ku gunehên îstibdadê û demên borî dîn û şerî’etê lekedar neke, zarûret e ku mirov Meşrûtiyetê di libasê şerî’etê de nîşan bide û tetbîq bike. Awrûpayê jî esas bi xêra vê hêzê ji xwe re pêşketin û perwerdeyeka harîqulade ava kirîye.⁴⁵ Bi raya Xelîl Xeyalî bi Meşrûtiyet û Qanûna Esasî re ew karên xirab (cehalet, sefalet, feqîrî, pevçûn û îxtilaf) tev pûç û betal dibûn.⁴⁶ Seyyah Ahmed Şewqî digot madem bi Meşrûtiyet û Qanûna Esasî re ji bo her kesî wekhewî, azadî û biratî dabîn bûye, divê di navbera gel û pekhatyên dewletê de tu îxtilaf nemînin. Meşrûtiyet rûdana azadîyê, pêşketinê,

42 - Bnr. Jimara 23an a kovara *Jînê*, helbeta Nalî ya ku bi peyvên „Em taqime“ dest pê dike.

43 - A. Touraine, hb. r. 51-73.

44 - Bnr. Ahmed Cemîl, „Milletin İlk Şehrayîn-i Arûs-ı Hakimiyeti“, *Kürd Teavûn ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 11; „Milletin İd-i Ekber-i Hürriyeti“, *Kürd Teavûn ve Terakkî Gazetesi* 3,(6 Kanun-u Evvel 1324/1908): 17.

45 - Said-i Kurdî, „İfade-i Meram“, *Kürd Teavûn ve Terakkî Gazetesi*, 6, (27 Kanun-u Evvel 1324/1909): 43, 44.

46 - Xelîl Xeyalî, „Weten û İttifaqa Kurmanca“, *Kürd Teavûn ve Terakkî Gazetesi* 8 (10 Kanun-u Sanî 1324/1909): 69, 70.

hînbûna sen'et û pîşeyên demê, geşbûna perwerde û xwendinê ye û dê ew bi xwe re xweşderbaskirina welatîyan û azadîyê bîne. Îstibdad li dijî şerî'etê bû, ji ber wê tebaya osmanî paş ma û lêbelê niha bi saya azadîyê dê hemû xirabî def' bibin.⁴⁷ Di heman rojnameyê de Mihemed Tahir Cezerî ji bo Qanûna Esasî digot ew xwedîyê çar ruknên bingehîn e: *Hurrîyet* (azadî), *edalet* (dadî), *uxuwwet* (biratî) û *mu-sawet* (wekhevî) û ev rûkin li gor emrê Xwedê û şerî'eta pêxember e...⁴⁸

kurdên Swêdê pêk anîne. Hejmara wan her çûye zêde bû, ji her derê Kurdistanê hatine. Di dawiyê da hejmara wan îro gîhiştiye qasî 100 hezar kesan.

Piraniya wan penaber û koçberan ji bakûrê Kurdistanê ne. Komeke mezin ya kesên politik, ronakbîr, nivîskar û kesên xwendî jî berê xwe dan Swêdê. Wan bi îmkânên dewleta Swêdî pêşengiya xebat û çalakîyên çandî kirine. Bajarê Stockholmê bûye paytextê çandî û edebî yê kurdan.² Bi vî tehrî em dibin şahidê têkiliyên çandî û edebî jî. Di navbera salên 1980-2000an da gelek rojname û kovar, bi sedan pirtûkên kurdî hatine weşandin. Rojname û kovarên wek Pale, Armanc, Berbang, Çîra, Nûdem, Roja Nû, Bîrnebûn û gelekên din di vê pêşketina edebî da roleke mezin lîstine. Dema em berhemên ku wek pirtûk derketine û berhemên ku di nav van weşanên periyodîk da hatine weşandin tînin bal hev, em wê demê dikarin baştir bibînin ka edebîyata kurdên Swêdê ji kîjan qonaxan ra derbas bûye. Ji van weşanên periyodîk wek mînak kovara Bîrnebûn ku di sala 1997an da ji aliyê kurdên Anatoliya Navîn da hatiye weşandin, heta niha jî hê derdikeve (qasî 80 hejmar).³ Di nav rûpelên Bîrnebûnê da bi sedan helbest, kurteçîrok û nimûneyên zargotina kurdî hatine weşandin. Bi kurtî edebîyata kurdên Anatoliya Navîn ne li vê coğrafyayê, tiştêkî balkêş e ji vir bi hezaran kîlometre dûr li Swêdê dest pê kiriye pêşda çûye! Edebîyata kurd li welatê ku ew jê hatine qedexeyê, lê belê welatê ku hatinê bi salan e serbest e.⁴

Îfadeya “Kurdên Swêdê” ev demeke dirêj e ku li vî welatê Bakûrê/Îskandînavyê bûye nîşana pêşketina ziman û edebîyata kurdî. Ev geşedan û gulvedana edebîyata kurdî li Ewrûpayê di van salan da tenê li Swêdê pêk hat. Kurd li Swêdê di nav komên biyanî da û di warê ziman û edebîyatê da koma herî aktîv û jîr hatine hesibîn. Hebûn û pêşketina edebîyata kurdî li Swêdê bala nivîskar, lêkolêr, dezgeh û medya swêdî jî kişandiyê. Ango edebîyata kurdî ne tenê hatiye nivîsîn, herwiha bi salan hatiye nîqaşkirin û lêkolandin jî. Yek ji wan lêkolera çanda biyaniyan, Satu Gröndahl e ku di Unîversîta Uppsalayê, di beşa *Navenda Lêkolînên Pîrmeteweyî* (Centrum för multietnisk forskning) da kar dike, di derbara pêşketina edebîyata

2 - Rohat Alakom, *Kurdên Swêdê*, Serkland, 2006, rûp.191-196.

3 - Weşanxaneya APECê ku di sala 1988an da ji aliyê kurdekî ji Anatoliya Navîn da saz bûye jî xebatên xwe hê her didomîne. Ev weşanxane “Weşanxaneya herî mezin li Ewrûpayê” tê nasîn. Him organa Bîrnebûnê û him jî APECê di warê pêşketina edebîyata kurdê Anatoliya Navîn da roleke mezin lîstiyê/dilîze.

4 - Bi salan ziman û edebîyata kurdî di Unîversîteya Uppsalayê da bûye mijara lêkolîn û dersdayîne. Îranîst û rohilatzanê swêdî Stig Wikander wek mînak hê di salên 1950yî da diçe Kurdîstana Suriyê, li wir gelek tekstên edebî yên bi zaravayê kurmançî berhev dike. Ew, van tekstan paş li bajarê Uppsalayê diweşîne (Stig Wikander, *Recueil de textes Kurmanji*, Uppsala Universitets Arsskrift, 1959). Piştî ku hejmara kurdan li Swêdê zêde bû û swêdîyan kurd nas kirin êdî qiymetê ziman û edebîyata kurdî zêdetir bû. Di eynî unîversîteyê da hînbûna ziman û edebîyata kurdî dest pê kir. Vê perwerdeyê bi salan ajot. Ferhad Şakelî di navbera salên 1988-2017an da ders daye. Niha li şuna wî, Haşim Ahmedzade di sala 2021an da dest pê kir vî karî dike. Lêkolêrê kurd Hashem Ahmadzadeh ku di Unîversîteya Uppsalayê da kar kiriye, di sala 2011an da teza xwe ya doktorayê da bala lêkolêran kişandiyê ser edebîyata kurd bi taybetî jî romana kurd. Mijarên wek tîkiliyên herdu edebîyatên (kurdî-farîsî), mijara roman û netewetî di vê xebatê da tînin nîqaşkirin û rûberîhevkirin. Angorî agahiyên nû kesên ku bixwazînin dikarin di vê unîversîteyê da dest pê bikin bi rêya qursan edebîyata kurdî fêr bibin (2021-2022).

kurdî li Swêdê hin lêkolînên wê hene.⁵ Di gelek nivîsan da tê gotin ku ev zimanê qedexkirî li Swêdê bi xwe ve hatiye, zindî û jîndar bûye.⁶ Ji ber vê jî giringiya Swêdê bo ziman û edebîyata kurdî mezin e. Nivîsek dîyar dike ku ne tenê Swêd divê Ewrûpa bi giştî li vî zimanê qedexkirî xweyî derkeve, berpîrsiyariya xwe bîne cîh.⁷ Swêdê ji nivîskarên gelên bindest ra bûye starekê. Nivîskarên wek kurdan ku welatên xwe winda kirine, lê li Swêdê gîhiştine zimanê xwe.⁸ Gelek caran em di çapemeniya swêdî rastî îfadeyên wek “zarokên kurd zimanê xwe li Swêdê şunda girtin”. Mijara ziman û edebîyata kurdî ev çil sal e her li Swêdê tê nîqaşkirin, wek mijareke giring tê dîtin. Wek mînak çawa em dibînin Encûmena Çandî ya Dewletê hejmareke kovara xwe ya înfomasyonê (1996) ji çanda kurdî ra veqetandîye.⁹ Edebîyata kurdî wek edebîyateke kevin hatiye dîtin. Di derbarê dîroka edebîyata kurdî û koka wê da ya kevin da nîqaş tîn kirin, dan-standinên kêrhatî pêk tîn. Dîrok û danasîna edebîyata kurdî mijareke din e ku carina hatiye rojevê. Wek mînak antolojiyên çîrokên modern bi zimanê kurdî¹⁰ û swêdî¹¹ hatin weşandin.

Yek ji wan sedemên girîng ku alîkariya pêşketina edebîyata kurdî kirîye bêguman sîyaseta dewletê ya di derbarê ziman û çandên cihê ne. Wek mînak Encûmana Çandî ya Dewletê (Statens kulturråd) û Fonda Nivîskarên Swêdê (Sveriges Författarfonden) bi comerdî hertim (bêyî guhartina hukimetan) alîkariya abori bo weşanxane û nivîskarên kurd kirine.¹² Kurdan jî saziyên xwe yên çandî û edebî jî saz kirine. Komela Nivîskarên Kurd li Swêdê alîkarî daye van hewldanan.¹³ Hejmara Weşanxaneyên kurdî her çûne zêde bûne. Kitêbxaneya Kurd ku di sala 1997an da hat avakirin, bi dirêjaya salan bû ocaxeke çand û edebîyata kurdî. Heta niha bi sedan civîn, konferans û panel li wir pêk hatine. Kitêbxaneya Kurdî îro xweyê qasî 13 hezar pirtûk bi sî zimanî û sedan koleksiyonên kovar û rojnameyên kurdî yan jî li ser kurdan e. Nivîskarên kurd îro endamên Komela Nivîskarên Kurd li Swêdê yan jî endamên Yekitiya Nivîskarên Swêdê ne.

5 - Satu Gröndahl, Kurdisk litteratur i Sverige. Den föreställda nationen i svensk kontext. I: *Multiethnica. Meddelande från Centrum för multietnisk forskning*. Uppsala universitet, nr 26-27/2000. Satu Gröndahl (redaktör), *Litteraturens gränsland: Invandrar- och minoritetslitteratur i nordiskt perspektiv*, Uppsala Universitet, 2002, rûp.333-364.

6 - Anneli Jordahl, Det litterära kurdspråket-Ett underkuvat minoritetspråk väcks till livet i Sverige, *Dagens Nyheter*, 18/10 1997.

7 - Erik Östling Kurdisk kultur är ett europeiskt ansvar, *Arbetet Nyheter*, 14/1 1999.

8 - Anneli Jordahl, Förlorade sitt land-men vann ett språk, *Göteborgs Posten*, 18/9 1994.

9 - *Kulturrådet Informerar*, nr 1-2/1996. Tema vê hejmarê; çanda kurdî ye, cîhekî fireh jî dide edebîyata kurdî.

10 - Antolojiya Çîrokên Kurdî I-II, amadekar: Firat Cewerî, Weşanên Nûdem, 2003.

11 - *Kurdistan berättar: Fåglaorna återvänder till bergen - tjugotre noveller*, amadekar: Ferhad Şakelî, Tranan, 2011.

12 - M. Tayfun, *Kurdiskt författarskap och Kurdisk bokutgivning*, APEC, 1998.

13 - Nivîskarên kurd di nav xwe de rêxistina xwe ya pêşeyî (meslekî), *Yekitiya Nivîskarên Kurd* di sala 1989an de saz kirine. Qasî 26 kes beşdarî kongra yekem a vê rêxistinê bûn. Ji aliyê vê rêxistinê de bi navê *Wan* kovarek der çû. Ev rêxistina di sala 1994an de belav bû. Li cîhê wê di sala 1995an de *Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê* hate saz kirin. Piraniya nivîskarên kurd ku ji Kurdistanê Tirkîyê tîn, endamên *Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê* ne. Qasî 40 endamên wê hene. Ji aliyê vê komeleyê de bi navê Çira kovarek bi kurdî hatiye weşandin. Qasî 18 hejmarên wê der çûne, hejmara pêşîn di sala 1995an de derketiye.

Nivîskarên ku pêşiyê hatin Swêdê wek Mahmud Baksî (1971), Mehmed Uzun (1977), M. Emîn Bozarslan (1978), Cegerxwîn (1979) bi keda xwe alîkarîke mezin dan geşedan û gulvedana edebîyata kurdî li Swêdê. Mahmud Baksî ku di sala 1971an da hatiye Swêdê piştî çend mehan tevî greveke xwebirçîhiştinê dibe, çape-meniya swêdî qala wî dike û wî wek “nivîskarê kurd” dide nasîn. Mahmud Baksî bi pirtûkên xwe yê zarok û xortan navdar bûye. Berhema kurdî ya pêşîn di sala 1978an bi navê *Zarokên Îhsan* ji aliyê Mahmut Baksî de wek pirtûkeke zarokan hatiye weşandin. Mehmed Uzun bi nivîsa rêzek romanên dîrokî alîkarîke mezin da pêşketina romana kurdî. Uzun zêdetir bi romana Sîya Evînê hate nasîn. M. Emîn Bozarslan ew alfebeyaya ku li Tirkîyê weşandibû û hatibû qedexekirin, ji nû ve li Swêdê derxist. Koleksiyonên kovar û rojnameyên kevin ku berî sedsalî hatibûn weşandin û nedihatî dîtî, ji nû ve bi çapên gelek xweşik gîhandin xwendevanan.¹⁴ Bi taybetî weşandina kovara *Jîn* (5 cild) di nav kurdan da gelek deng da, ji bo ji nû ve nivîsandina dîroka edebîyata kurdî bû çavkaniyeke gelek kêrhatî. Ew tekstên rojnamegeriyê û pexşanê (nesîr) edebîyata kurdî dewlemend kirin. Ji bo edebîyata kurdî bû xezîneke mezin. Bi dehan nimûneyên edebîyata devkî amade kir û wek pirtûk weşand. Zeynelabîdîn Zinar ji nimûneyên zargotina kurdî gelek tekst weşandin, herwiha beşek berhemên edebîyata kurdî ya klasîk amade kirin. Di vî warî da keda Zinarê Xemo û hin kesên din jî derbas bûye. Bi hatina Cegerxwîn cara pêşîn peyvên kurdî û edebîyat evqas zêde li Swêdê bi hev ra hatin bikaranîn, edebîyat û jîyana rojane nêzî hev bibûn. Bi hatina Cegerxwîn em dikarin bêjin ku edebîyata kurdî Swêdê bû xweyê kesayetîkî giranbiha. Wefata wî bo edebîyata kurdî Swêdê bû windakirineke mezin. Cenazeyê wî birin Qamişliyê. Sernivîsa nûçeyekê gelek bala me dikşîne: “*Helbestvanek berbi çiyayên xwe veşeriya*”.¹⁵

Yek ji wan beşên edebîyata kurdî ku li Swêdê pêşda çûye bêguman edebîyata zaroka ye. Wek mînak bi dehan pirtûkên zarokan yê nivîskarê swêdî Ulf Löfgren (1931-2011) ku bi adaptasyona kurdî û bi navê Rindo hatina weşandin ji aliyê zarokan da gelek hatine hezkirin. Weşanxaneya Apec bi destûra nivîskar navê lehengê van pirtûkan Ludde kiriye Rindo.¹⁶ Ne tenê serpêhatî û macerayên Rindo, çapên wan yê xweşik jî hêjayî pesindayinê ye. Ulf Löfgren heta niha 34 heb pirtûkên Ludde wek rêzepirtûk weşandine (1984-2006). Wêneyên van pirtûkan jî nivîskar bi xwe amade kirine. Bi dehan ji wan kurdî bi hersê zaravayan derketine. Carina kurmancî-soranî, carina jî bi kurmancî-zazakî wek tekstên paralel bi hevra hatine weşandin.

Beşeke edebîyata kurdî li Swêdê jî xebatên wergerê pêk tînin. Nivîskarên wek Serdar Rojan, Hesênê Metê, Firat Cewerî, Mistefa Aydoxan, Mehmed Dehsîwar

14 - Rohat Alakom, Dildarekî gotina nivîskî, Mehmed Emîn Bozarslan, *Nûbihar*, nr 123/2013, rûp.64-66.

15 - Elin Clason, En poet återvänder till sina berg, *Aftonbladet*, 12/3 1984.

16 - Gorî Elî Çiftçi (xudanê Weşanxaneya APECê) navê Rindo dîya wî daniye.

û hin nivîskarên din gelek berhem wergerandine kurdî. Serdar Rojan romana *Don Quijote* ya Cervantes (Doz, 2007) û romana Anna Karenina ya Lev Tolstoy (Apec, 2019) wergerande kurdî. Hin nivîskarên kurd gelek berhem ji zimanê swêdî û ji zimanên din wergerandin zimanê kurdî. Van çalakîyên wergerê bêgûman alîkarîyeke mezin da zimanê kurdî, ev zimanê ku bi salan li Tirkîyê qedex bû. Dîroka edebîyata kurdên Swêdê hê nehatiye nivîsîn, lê belê kingê hate nivîsîn, em ê wê demê bibînin ku çi hatine efrandin.¹⁷

Piraniya nivîskarên kurd ku bi kurmancî nivîsîne/dinivîsin ji bakûrê Kurdistanê hatine Swêdê. Lê çend kes hene ku ji Sovyeta Berê û herêma Badînan tên wek Têmûrê Xelîl, Sidqî Hiror û Xelîl Dihokî. Beşek ji van nivîskaran berê gelek salan dest pê kirin bi kurmancî roman nivîsîn, ew heta niha jî her dinivîsin. Piştî 2000an hinek berhemên wan vê carê li Tirkîyê û li Kurdistanê hatin weşandin, hin ji wan jî bi wergera zimanên biyanî derketin. Di edebîyata kurdên Swêdê da kesen romannivîs ev in: Mahmûd Baksî, Hesenê Metê, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Mehmed Dehsîwar, Enver Karahan, Mîstefa Aydoxan, Silêman Demir, Lokman Polat, Bubê Eser, Laleş Qaso, Brûsk Serkan. Ev kes li Swêdê dimînin, weşanên xwe li wir weşandine û beşeke bûyerên romanên wan jî li vî welatî derbas dibin. Ev xalan bêgûman di pêşketina edebîyata kurdî da rola Swêdê jî derdixe pêş yan jî nîşan dide. Dema dîroka edebîyata kurdî li Swêdê hate nivîsîn wê demê em yan jî zarokên me dê bibînin ku vî welatê bakûrî di vî warî da çi roleke mezin lîstîye.

II

Nivîskar û wergêr Mehmed Dehsîwar ku niha li Stockholmê dijî romaneke hacimfireh ji sê cildan pêkhatî di nav van salên çûyî da weşand. Ev romana polîsî wek trîlojîkê (berhema sêromanî) dikare bê hesibibîn: Şopa Xeterê (378 rûp. 2017), Çepera Giran (426 rûp. 2018) û *Berbanga Şevînê* (506 rûp. 2020). Ev hemû cild ji aliyê Weşanxaneyê APECê li Swêdê hatine weşandin. Nivîskar Mehmed Dehsîwar di sala 1959an da li Êlîhê (Batman) hatiye dinê û niha li Stockholmê karên xwe yê edebî û hunerî dimeşîne. Beşek bûyerên vê trîlojiya Mehmed Dehsîwar li Swêdê derbas dibin. Berhemên kurdî ku qala Swêdê dikin û mijara wan Swêd e hertim bala min kişandiye/dikişîne. Bi saya van çavkaniyên edebî

17 - Nivîskarên ku bi koka xwe kurd in û li dinê gelek hatine nasîn, lê bi zimanekî din dinivîsin (tirkî û erebî) wek Yaşar Kemal û Selîm Bereket jî bala me dikşînin. Yaşar Kemal dem dem li Swêdê maye, Selîm Bereket ji sala 1999an vir da li Swêdê dijî. Piraniya berhemên van herdu nivîskaran jî bi wergera zimanê swêdî hatine weşandin. Bi saya van berheman, swêdîyan kurd baştir nas kirine. Herdu nivîskaran kurdan wek mijar û tema di nexşên edebî da cîwar kirine. Wan bi van berhem û romanên xwe bêgûman alîkarîke mezin danasîna kurdan, dîrok û çanda wan. Wan bi vî tehrî niqaş û geşeyên edebî bi erîni gur û germ kirine. Mijara Yaşar Kemal û Selîm Bereket nîşan daye ku gelek nivîskar jî ber qedexebûna zimanê kurdî û tunebûna sîstema perwerdeya zimanê dayîkê mecbûr mane bi zimanekî din nivîsîne.

ez dixwazim fêr bibim ka gelo wêneyê (îmaj) vî welatê ku kurdan ji xwe ra wek welatê duyem hîlbijartine di van berhemana da çawa xuya dike. Temaya kurdên Swêdê ne tenê bala nivîskarên kurd, herwiha bala nivîskarên swêdî jî kişandiyê.¹⁸ Ji ber çar sedeman min romana Mehmed Dehsiwar wek mînak bo danasîn û nîrxandinê hîlbijart:

- 1) mezinbûna romanê (sê cild),
- 2) şewekî teze (romana polîsî),
- 3) roman yek ji wan mînakên here dawîn ya edebîyata kurdî li Swêdê ye,
- 4) beşeke bûyeran li Swêdê derbas dibe.

Şopa Xeterê (cildê I)

Dema cuntaya leşkerî (1980) li Tirkîyê hatiye ser text ewrên reş û tarî dagirtine ser Tirkîyê û Kurdistanê, kurdên reben mêze kirine ku ti star êdî ji wan ra nemaya, dev ji welatê xwe berdidin wek koçber, penaber dikevîne rêyan, diçin bajarên mezin wek Stembolê. Di dawiyê da beşek ji wan jî tîn derdikevine welatê Bakûrê, Swêdê. Yek ji van lehengê romanê Merdan Jîyan e ku di romanê da tenê wek Merdan derbas dibe. Merdan berê di tevgerê çepên tirkan da kar kiriye. Paşê ew tê girtin. Ew jî qedera bi deh hezaran kesên ku bûne goriyên zindana Dîyarbekirê û ezîyet û lédanan mezin dîtine, parve dike. Dema ji girtîgeha Amedê derdikeve, ew pêşiyê tê Stembolê, demekê li wir dimîne. Hevalê wî Behrî ku berî wî hatiye Stembolê gelek alîkariya Merdan dike, bi karên wî yên derketina derve mijûl dibe. Tê gotin ku bavê Behrî bi bazirganiya malê qaçaxtiyê mijûl bûye, paşê îmkanên mezin ketine destê malbatê. Behrî li Stembolê gelek têkilî pêk anîne û karê wî her çûye mezin bûye. Dema Merdan li Stembolê ye hevalê wî Behrî wî dişîne taxeke Stembolê, Bakirkoyê bona li wir li bal fîzyoterapistekî ji êşên xwe ra çarekê bibîne.

Piştî vê hevdu dîtîna dema Merdan dixwaze vegere here aliyê cîhê hevalê xwe Behrî nişkêva dibe şahidê gulebaran û teqînan. Merdan xwe davêje erdê. Dema bêdengî peyda dibe, radibe ser pêyan û dibîne ku pîrejî û keçek di hembêza hev da li erdê dirêj bûne û birîndar in. Merdan gelek hewl dide bo alîkariya wan bike. Paşê bi vê pîrejî û keçikê ra têkiliyan nêzîktir datîne û wan nas dike. Ew, vê alîkariya Merdan ji bîr nakin. Derdikeve holê ku ev pîrejîna bi navê Nezîre bi koka xwe ermen e, di zarokatiya xwe da bûye ewledê malbateke kurd û li bal wan mezin bûye. Navê bavê wê Elî û navê dayîka wê Xezal bûye. Merdan dibîne ku çend

18 - Rohat Alakom, Di Romana Swêdî da Koçberiya Kurdan, *Nûbihar*, nr 144/2018, rûp.6-14.

çirokên vê pîrejinê hene ku hêjayî guhdarkirinê ne. Ev pîrejin di cîhekî da dibêje ku dema ordiyên tirk di sala 1915an da ermen ji cî û meskenên xwe leqandin, ew nefî kirine û koka wan anîne. Hin zabitên tirk gelek caran sîmsar şandine nav gel bo peydakirina mêran ku bixwazin bi jinên ermen ra bi berdêla pereyan bizewicin. Gelek zabitan bi saya vê sîmsariyê pereyekî mezin ji xwe ra berhev kirine. Dema Nezîre mezin dibe, kesekî bi navê Xalid ra dizewice. Lê belê zarokên Nezîre û Xalid çênabin. Di sala 1966an da dema erdhejîn (zelzele) li bajarê Gimgimê (Varto) çêdibe, gelek kes dimrin û bi hezaran zarok bêdê û bêbav sêwî dimînin. Carekê dema rêya Xalid li Gimgimê dikeve ew li wir rastî keçeke piçûk tê ku navê wê Şanaz e. Xalid vê keçikê tîne ji xwe ra dike ewled. Xalid zû dimire. Şanaz heta salên 1980yî li bal Nezîrê dimîne. Ew, keça malê ya xama ku li Stembolê parêzgeriyê dixwîne, bi bedewî û xweşikbûna xwe bala Merdan jî dikişîne. Merdan bi baldarî vê xanima ermen guhdar dike. Wek dedektîfan dixwaze serboriya wan fêr bibe. Bi saya vê naskirin û hevdudîtîne mijara komkujiya ermenan, zordestî û zilma ku hatiye serê wan di romanê da derdikeve pêş. Nezîre dema qala serboriya xwe dike, gotinê tîne ser dostayetiya di navbera kurd û ermenan jî. Di cîhekî da dîyar dike wek mînak Muhtila Begê Muksî bi hezaran ermen ji vê zilmê xelas kirine, derbasî aliyê din yê sînor kirine.¹⁹ Bi zanetî nîn be jî divê em li vir nîşan bidin ku kirinên wî û navê wî gelek li hev tîne.

Merdan êdî tivdarekê xwe dike bona sefera xwe ya Swêdê. Ew qasî 5 salan li wir dimîne. Bi saya tîkîlî û zîrekiya xwe ew rewşa xwe ya aborî baştir dike. Di nav demeke kurt dibe xweyê mal û milk. Ber ra diçe unîversîteyê û li wir beşa dîrokê dixwîne. Pêşiya wî hertim vekiriye. Ew dixwaze destê tengezaran bigre, ji wan ra bibe alîkar. Demekê şunda hevlekî Merdan bi navê Serdar ji welêt tê Swêdê. Bi serê xwe wek penaber dijî. Jin û zarokên wî li welêt mane. Bîna wî gelek teng dibe. Hin tengasiyan li xerîbîstanê dikişîne. Ew û Merdan gelek ji hev hez dikin, rûmeta hev digrin. Derketina destûra mayîn û kar li Swêdê bona wî dereng dikeve. Ew wek qaçax li Swêdê dijî. Carekê dema rêya wî di nav daristanê ra derbas dibe dengê teqînekê tê guhê wî. Paşê Serdar du kesên çekdar dibîne ku li pey kesekî din ketine. Serdar berdewam dike ji xwe ra digere. Vê carê nalîna kesekî tê guhê wî, nêzî wî dibe û dibîne ku mirovek birîndar bûye, dinale. Serdar naxwaze wî tenê bihêle dixwaze alîkariya wî bike. Paşê wî dibe mala xwe, hewl dide birîna wî qenc bike. Ji vê yekê ew Merdan agahdar dike. Ev kirina Serdar hêjayî besinandîne ye, di nav van mercên xwe yên gelek xirab da mirovahiya xwe ji bîr nake, dilê wî wê demê tenê bona vî swêdiyê birîndar, nenas lêdide! Paşê derdikeve holê ku di esasê xwe da ev polês jî mirovekî qenc û pak e. Piştî demekê Anîta xwîşka vî polêsî ku bi xwe rojnamevan e destê xwe yê alîkariyê dirêjî Serdar bike. Di derbarê rewşa Serdar da nivîsekê di rojnameyan da belav dike. Piştî vê

19 - Rohat Alakom, Muhtila Begê Moksî, *Bîrnebûn*, nr 45/2010, rûp.10-20.

nivîsê destûra mayîn û kar ji Serdar ra derdikeve. Kêfa Serdar tê cîh. Wisa xuya dibe ku qencî tu car nayê jibîrkirin. Paşê derdikeve holê ku ev kesê birîndar berê komîserê polês bûye û navê wî bi kurtî Lasse ye (Lars-Åke Stevenson). Lasse di derbarê kuştina serekwezîrê Swêdê Olof Palme da li pey hin rastiyan ketiye û xwestiye van rastiyan wek rapor eşkere bike. Vê carê ew dibe neyarê hevkarên xwe (polêsên ku naxwazin rastî eşkere bibin). Ji vir şunda gelek bûyer li pey hev bi lez di romanê da diqewimin. Malbata Lasse dibe dostê kurdan, di navbera wan da nêzikayî û hevkarîyek peyda dibe. Lasse û xwîşka wî ya rojnamevan Anîta, Merdan, Serdar û Fermanê kurd bi tevayî li hemberî wan hêzên tarî ku di nav polêsê swêdî da hene disekin. Carekê Hans Holmer (Serekê emniyeta Stockholmê) ku di bûyera kuştina Olof Palme da kurd suçdar derxistibûn dibe hedefê operasyoneke Merdan û hevalên wî! Bûyera kuştina Olof Palme kurdên li Swêdê gelek diêşîne. Kurd dibin hedefê komên nijadperest û xêrnexwazên kurd. Di derbara bûyera kuştina Olof Palme da heta niha (1986-2020) qasi 149 pirtûk hatine weşandin. Beşek ji wan berhemên edebî ne. Mijara kurdî kê-m-zêde beşekî van çavkaniyan pêk anîye. Nivîskar Mehmed Dehsiwar ev mijara giring dîtiye û di romana xwe da cîh dayê.

Di beşa dawî ya romanê da Merdan piştî pênc salan vedigere Tirkîyê, diçe Stembolê. Merdan û Şanaz bêsebir hêviya hev in, dixwazin hev bibînin. Piştî demekê Merdan fêr dibe ku dayîka Şanazê miriye û Şanazê ligel doxtorekî hevaltî daniye. Her çiqas ev çend sal in Şanaz û Merdan hev nabînin jî ji dûrve dibin heyranê hev. Lê belê dema mirov bi çavan ji hev dûr dikevin, bi dilan jî ji hev dûr dimînin. Ev jî rastiyeke e. Herdu jî dixwazin hev bibînin, herdu jî di navbera du avan da dimînin. Di serê her yekî/yekê ra ev pirsê derbas dibe: *Gelo mirov dikare du kesan di carekê da hez bike?* Şanaz gelek ditirse bona Merdan vê carê here Swêdê êdî qet venegere. Ji ber vê yekê jî hîs û aqilê Şanazê daîm her şerê hev dikin. Carina peyvên gelek şîrîn ji devên wan derdikevin. Dema carekê Şanaz telefonê vedike, Merdan wiha deng dike: *"Di vê xirecirê da dengê te wek melhema ser birînê hat"*. Keça swêdî Anîta jî hertim di hişê Merdan da ye. Wisa xuya dibe ku evîn wek derdê dilan hişê Merdan jî tevlihev dike. Dema Merdan li Stembolê ye carekê dixwaze bi telefonê hal û hewalê Şanazê bipirse: *"Berî ku li Şanazê bigere, bîryar da ku ji Anîtayê ra telefon veke"* (rûp. 345). Hemû ev serêşî îfadeya "dilê rezil" tîne bîra xwendevanan.

Wext derbas dibe carekê dema Merdan û Şanaz diçin aliyê Behrî ew dinêrin ku karker û personelê Behrî li hev civiyane, panîkeke mezin li cîhê karê wî heye. Hin kesan li Behrî xistiye, ew kuştîye. Ev yeka Merdan gelek bêhizûr dike. Ne li pey hev be jî di paragrafêkê da êdî em peyvên şop û xeter di eynî cîhê da dibînin ku navê romanê pêk tînin (rûp.329). Di gelek cîhên din da jî xwendevan rastî peyva xeterê tê, roman êdî dibe romana xeterê. Merdan vê carê bi pirs û pirsiyar

li pey şopa kujer yan jî kujeran dikeve, kes nizane kê Behrî kuştiye. Lê belê dîsa jî ew dixwaze bûyer ronî bibe. Gelek kesan dibîne, wan guhdar dike. Yek ji wan jî Sêrdî Beg e, kurdekî ji aliyê Qersê ye ku li Stembolê dimîne. Ew wek “Sêrdiyê kurd” tê nasîn, hevalê hunermend Yılmaz Guney û heyranekî mûzîka kurdî bûye. Ew dostekî Behrî bûye, gelek jê hez kiriye.

Merdan dema ji Stembolê tê Swêdê, birayekî xwe û birayekî Behrî dide ser karê Behriyê ku berî demekê ji aliyê kujerên nediyar da hatibû kuştin. Di dawiyê da Merdan tê Swêdê. Anîta, birayê wê Lasse, Serdar tên pêşiya Merdan. Jin û zarokê Serdar jî ligel Merdan di eynî rojê ji Stembolê tên Swêdê. Ew dibin gelek kes, di texsiyekê da cîh nabin. Bi du texsiyan siyar dibin berê xwe didin Stockholme. Lasse, Serdar û zarokên wî li texsiyekê siyar dibin, Anîta û Merdan jî dikevin hundurê texsiyêke din bi marka volvo ku Anîta dajo. Anîta raste-rast Merdan dibe mala xwe. Dema dikevîne hundirê malê Anîta tavilê bi lezo-bezo wî berbi oda razanê dibe.

Nivîskar Mehmed Dewsiwar di vê romana xwe da wek mînak xwestiyê bi saya mînaka Nezirê li Stembolê û bi saya mînaka Hasse li Stockholme hin mekanîzmayên mirovî bide bikaranînê, aktîf bike bona çend mijarên nemirovî rûreş û sosret bike. Lehengê yekem Merdan wek “lehengê xelaskar” heyranîyêke mezin di romanê da peyda dike. Nivîskar Mehmed Dehsiwar ne tenê xwestiyê bi kuştin, teqîn û dilopên xwîne kelecana xwendevanan bilind bike. Ew zane ew çî dike. Wî herwiha xwestiyê çend mijarên ku mirovahî gelek hewcedarî wan e derxe pêş yan jî xwendevanên xwe di vê rê da seferber bike. Nivîskara swêdî Åsa Schwarz jî di romanêke polêsî da wek Mehmed Dehsiwar xwestiyê çend pirsgirêkên mirovahiyê mîna hawirdor, jîngeh niqaş bike. Piraniya bûyerên vê romana bi navê *Firîşteyek Mirî* (En död ängel) li Serhedê li hêla Agirî, Îdir, Qers û Aniyê derbas dibin.²⁰ Bi kurtî dikarim bêjim ku ev berhema Mehmed Dehsiwar gelek balkêş e. Dema min dest pê kir ez vê romanê bixwînim min gelek caran nedixwast ji dest berdim. Min di nav du-sê rojan da bi hewaskarî ew xwend. Ne tenê ev hewaskariya min, romanê bi xwe jî bi zimanekî edebî û bi mijarên kelecana xwe dida xwendinê.

Çepera Giran (cildê II)

Romana Çepera Giran bi gereke Merdan ligel dilketiya wî xanimeke swêdî Anîtayê dest pê dike. Vê carê em lehengê romanê Merdan li Swîsreyê dibînin (Nivîskar navê Swîs bi kar tîne). Ew dibe mêvanê hevalekî xwe yê bi navê Dîyar û keçka hevala wî Angelîka. Dîyar mihendisê teknîkê ye, ev du sal in di dikaneke

20 - Rohat Alakom, Åsa Schwarz li Welatê Serhedê, *Basnews*, 24-30 Tîrmeh 2017.

ku amûren teknîkî difroşe da kar dike. Merdan dixwaze ligel wî karê bazirganiyê bike û gotinên xwe dikin yek. Dema hevalê Merdan, Behrî berî demekê li Stembolê tê kuştin di kaseya wî da nifteyek tê dîtin. Nifte, nifteye kasaya ku Behrî li bankeyeke Swîsrê da vekirîbû ye. Merdan dema diçe kaseyê vedike dibîne ku nameyek û defterek tê da heye. Li ser zerfa nameyê navê Merdan xuya dike. Behrî di vê nameyê da dîyar dike ku hemû sermaye û milkê wî ji Merdan ra maye. Piştî vê gera Swîsrê Merdan tê Swêdê û demekê şunda berê xwe dide Stembolê. Gelek pirsgirêk, qeza û bela li benda wî ne. Lê belê ew natirse û bi cesaret û bi zanîn diçe ser van diwariyan.

Çawa tê zanîn piştî cuntaya leşkerî (1980) rewşa Tirkîyê her berbi xirabiyê ve diçe. Yek ji wan pirsgirêkên here mezin jî tekoşîn û serhildana kurdan, çareserkirina pirsgirêka kurd e. Lê belê hêzên fermî yên dewletê yên ku di nav dewletê da dewlet pêk anîne, bi êrişên çaralî berê xwe didin kurdan, bo ku bazîrgan û karmendên kurd nebîbin xwedîyê sermaye û karên xwe bi pêş ve bibin. Di romana Çepera Giran da çawa xwendevan dibîne lehengê romanê Merdan hatiye Tirkîyê û dixwaze ku pergalekê bide karên şîirketên xwe yên ku berbi hilweşînî ve diçin û hatine ber iflasê. Hêzên tarî êrişên xwe yên li hemberî kurdan li bajarên mezin zêdetir kirine/dikin. Kuştina heval û dostê wî Behrî hertim di romanê da tê peyivîn û tê bi bîr anîn. Niha Merdan û çend hevalên xwe divê çareyekê li hemberî wan êrişên nîv-mîlîter û nîv-fermî bibînin. Di hişê Merdan da "şerekî modern û nihênî" heye. Wek metodên ku dijmin bi kar tîne ew jî dixwaze bi heman zimanî bersivê bide wan. Çawa ev hêz bi alîkarîya ajan û sixûrên xwe karê casûsiyê dimeşînin Merdan jî ligel hevalên xwe dest bi çalakiyên kontra-casûsiyê dike. Di wî warî da biserketi karê xwe dimeşînin. Di dawiyê da ew xwe digihîne hin agahî û zanyariyên gelek nihênî, dokuman û kasetan. Eger ew, van agahiyên giring bighîne raya giştî û medyayê hingê mala van komên dewletê yên nîv-mîlîter dişewite. Merdan vê yekê wek mesaj ji wan ra radigihîne. Niha şerê Merdan û "nemerdan" dikeve pêvajoyeke nû. Mirov di romanê da dibîne ku Merdan û koma dora wî pozîsyona xwe xurt kirine.

Di romanê da gelek bûyer diqewimin. Yek ji wan jî serpêhatiya Delîl e. Delîl xortekî ji devera Dîlokê (Entep) ye. Ew carekê ligel duwanzdeh hevalên xwe dibin hedefê êrişên helîkoptereke tirk. Ew di cîh da can didin, tenê Delîl bi birîndarî xelas dibe. Birînen wî gelek giran in. Nikare zêde bilive. Xwe bi erdê ra dikşîne û bi zorê xwe digihîne gundekî nêzîk. Lê belê ew gund jî gundekî kurdên ku nêzî dewletê ne. Gelek kurdên ku bi navê "parêzgerê gundan" (cerdevan) hatine nasîn û ji dewletê maeş distînin li wî gundî dijîn. Delîl diçe li ber maleke hinekî dûrî gund disekîne û alîkariyê dixwaze. Xwedîyê malê dema dibîne yekî birîndar li ber deriyê wî melisiye û di nav xwîna da ye, tavilê şîkê dibe ser şervanên kurd "terorîstan". Ew yekser hewil dide ku wî bikuje, lê jin û keça parêzgerê gund ji vê

yekê razî nabin. Mêrê malê bêhizûr e. Hişê wî tevlihev dibe, dikeve nav streseke mezin. Tiştêkî ku bikaribe bike jî tune ye. Piştî ku li gor îmkana xwe birînên wî paqij dike û bi paçekî ser wan digire, dilezîne ku zûtirekê wî ji mala xwe bi dûr bixe ku dewlet şikê nebe ser wî. *"Zû here ku tu di mala min da nemirî"* ew dibêje. Di dawiyê da xwedîyê malê ji ber neçariyê wî bi traktora xwe dibe li kêleka bajêr cîhekî datîne û vedigere tê gundê xwe.

Çima hemû hevalên wî mirine, şehîd ketine, lê ew xelas bûye? Beşeke ber-sîvên vê pîrsê şik û gumanên ne di cî da jî ji teref hevalên wî ve peyda dibin. Ev gîlî û gotin diçin guhê Delîl jî. Hezar tişt di hişê Delîl ra derbas dibin. Divê ew vê carê bersîva gelek pîrsan bide. Hîsa sucdariyê serê wî gelek mijûl dike. Nivîskar li vir naxwaze rûhiyeta mirovan û hîsên ku di hundirê wan ra derbas dibin bavêje alîyekî, wan jî derdixe pêş. Çawa em di romanê dibînin ku Delîl paşê tê Stembolê, Merdan wî hildide ser kar. Delîl yek ji wan kesan tê hesibîn ku Merdan zêdetir di romanê da baweriya xwe pê tîne.

Serpêhatiya Delîl rewşa Sadî jî tîne bîra me. Ew ji destpêkê ve ligel şîrketa Merdan kar dike. Paşê dema eşkere dibe ku ew suçdar tê dîtin û sixûriyê wî diyar dibe, barê li ser wî yekcar giran dibe. Ew li ber çavên dost û hevalan û endamên malbata xwe rûreş bibe. Berî ku xwe bikuje Sadî ji Merdan û hevalên wî ra bi eşkere diyar kiriye ku wî bi hemdê xwe û bi zanetî ev karê ajaniyê nekiriye. Xuya dibe ku Husem Bînbaşî bi nîyeta ku êrişî jin û zarokên wî bike ew çavtirsandî kiriye. Çendî ku Sadî li xwe mûkir hatiye û Merdan jî ew hinekî efû kiriye, dîsa jî Sadî biryar dide û di dawiyê da xwe dîkuje. Berî kuştina xwe spasiya xwe bi telefonê digihîne Ezîz, yek ji hevalên Merdan û ricayekê ji wî dike: *"Ger tiştêk bi serê min ve were, xweyîti li malbata min bike"*. Sadî rojekê berî ku Husam Bînbaşî û xwe bikuje diçe taxa Mahmudpaşayê û li wir demançeyekê distîne. Bo ku bizanibe ka demançeya wî baş kar dike yan na, ew diçe taxeka Stembolê ya bi navê Daristanên Belgradê û çend destan demançeya xwe diceribîne. Rojtira din ew berê xwe dide taxa Eyubê. Li wir lêdixe Husem Bînbaşî dîkuje û pişt ra guleyekê jî berî mêjiyê xwe dide. Zilma ku Husem Bînbaşî li jin û zarokên wî kirine ne bese, vê carê mecbûr dimîne ew jî zilma here mezin li xwe dike! Mînakên Delîl û Sadî bi vekirî nîşan didin ku biryarên di mehkûmkirina mirovan da dema bêbingeh bin an jî zûzûka bîn dayîn, wê çaxê ew dikarin di civatê da bibin sedemên bêdadiyên gelek mezin.

Di nav vê pevçûn, şer, xirecir û qelebalixê da carina em di romanê da rastî şopên evîn û evîndariyê jî tînin. Bahoz û Merdan havînê dema bona karekî diçin devera Sîlvîrîyê çend rojan di maleke kevin da dimînin. Li wir ber avê rastî du keçan tînin. Navên wan Zerîn û Nesrîn in. Keçik dixwazin wan nas bikin û bi wan ra bibin heval. Ev romansa (serpêhatiya evînê) ku bi serê wan ra derbas dibe, gelek kurt diajo. Paşê xatir ji hev dixwazin.

Di romanê da jina ku herî zêdetir bala me dikşîne Şanaz e. Navê lehenga jinîn Şanazê di pirtûka yekem a vê rêzeromanê da jî derbas dibe. Dilê Merdan wê demê zêdetir bi evîneke platonîk ketibû Şanazê. Lê belê di romana Çepera Giran da Merdan û Şanaz dema hev dibînin, devê wan her di devên hev da ye û ji maçan têr nabin. Tenê peyvên şîrîn ji devên herdu dilketiyan dibarin. Herçendî ji ber zêdebûna karên Merdan hevdudîtînen wan kêr dibin jî, lê bona careke din hev bibînin gelek bêsebir dibin. Bona ku serê Şanazê nekeve belayê, heta ji destê Merdan tê bi fesal tevdigere. Şanaz gelek dixwaze pê ra bizewice û herdu jîyana xwe bikin yek. Miroveke ku her kesê xwe winda kiriye, naxwazê vê carê Merdan jî winda bike. Merdan jî gelek ji Şanazê hez dike. Ew zane û hîs dike ku dilê wî ketiyê û êdî çare nabe. Carekê bêyî ku bifikire û plan bike lingên Merdan wî dibin dikana zêrfiroşekî. Li wir gustîleke zêr distîne û berê xwe dide mala Şanazê ku li taxa Sariyerê dimîne. Dema taştê dixwin, Merdan vê gustîlê dixwe binê fîncana Şanazê. Heman demê da karekî Merdan derdikeve û ew bi lez diçe derva. Dema Şanaz fîncanê hildide, ew dibîneke ku di binê fîncanê da gustîleke zêrîn şewq û şemal dide, dibiriqe. Şabûna wê bêsinor e. Di jîyana xwe da ew rastî surprîza here mezin tê. Paşê Merdan dergehê dilê xwe bi temamî ji Şanazê ra vedike. Ew dixwaze di nav demeke kurt da ligel Şanazê herin Amedê, mala bavê xwe û bi şahiyêke piçûk nîşana xwe bikin. Wisa jî dikin.

Dema vegera Stembolê herdu dilketî fikrê xwe dikin yek ku herin paytextê Swêdê, Stockholmê. Bi vî tehrî Merdan heta demekê be jî ji derd û kulên dinê, xeterên mezin xelas dibe. Nas û hevalên wî yên nêz jî xwestibûn ew demekê ji ber çavan winda bibe. Şanaz heta çendekî ji cîhê karê destûrê distîne. Ew di taxa Galatasarayê di buroyekê da kar dike. Roman bi vê sefera Stockholmê diqede. Bahozê hevalê wî jî ligel wan rêwitiyê dike, berî ku bê Stembolê ew li Swêdê bi karê erebetemîrkerin, kirîn û firotina wan ve mijûl bûye. Kurdekî ji Çewlikê ye. Bahoz jî di salên 1980yî da wek bi hezaran kurdên din koçberî Swêdê kiriye. Çawa xuya dibe bûyerên ku di romanê da derbas dibin li ser coxrafyake gelek berfireh pêk tên.

Berbanga Şevînê (Cild III)

Ev romana bi navê Berbanga Şevînê beşa sêyem û dawî ya rêzeromana nivîskar Mehmed Dehsîwar pêk tîne. Piraniya bûyerên ku di vî cilda sêyem ya romanê ra derbas dibin li çend paytextên îroyîn, dîrokî û niv-fermî da diqewimin, wek Stockholm, Enqere, Stembol û Dîyarbekir. Li her serbajarekî bîranîneke lehengê romanê yê bi navê Merdan heye. Di romana Berbanga Şevînê da panoramayeke fireh ya rewşa siyasîya bi giştî li Tirkîyê û bi taybetî li Kurdistanê li ber çavan tê raxistin (salên 1990-2000). Mirovên mafîyayê, komeke kujeran, hêzên tarî û ve-

şartî di nav dewletê da dewleteke din saz kirine. Di çapemeniyê da ev hêza binerd bi salan wek “dewleta kûr” hatiye nasîn. Vê dewleta kûr bi taybetî berê xwe daye kurdan, gelek kurdên welatparêz bi destê kujerên nedîyar da hatine kuştin. Di van salan da herkesî herkes şopandiye. Hewa û rewşa polîtîk ya van salan wek tê zanîn gelek sert bûye, tirs û xofeke mezin li welêt hakim bûye.

Romana Berbanga Şevînê bi aramî, bêdengî, xweşî û bedewiya ku li Stockholmê heye dest pê dike. Bi kurtî li vir lehengê romanê Merdan jî tê nasandin, çawa bûye perçeyekî vî bajarî, çawa bûye xweyê mal û îmkanan. Ji aliyê din ew jî welatê kal û bavên dîr maye: “*Mîna ku mirov ji himêza dêya xwe bi dîr bikeve, ew bêwar mabû*”. Çawa em di romanê da dibînin wek hemû koçberan, penaber û tengezaran Merdan jî bûye xweyê du welatan, du çand û pir-zimanan. Evîndara Merdan ya bi salan Şanaz jî êdî hatiye Stockholmê, li wir cîwar bûye û gihiştîye dilketiyê xwe. Ew demekê derdikevin tûreke Ewrûpayê, diçin li çend welatan digerin. Lê belê ji ber zêdebûna karên xwe, lingekî Merdan li Stockholmê, lingekî wî jî li Tirkîyê û Kurdîstanê ye. Gelek demên dirêj ew hev nabînin. Piştî hatin û cîwarbûna Stockholmê jî tenêmayîna Şanazê dîsa berdewam dike. Tenêmayîn demekê dirêj dirûv û formekê dide jîyana wê. Merdan vê carê diçe Tirkîyê, bi rojan deng jê dernakeve, Şanaz gelek meraq dike gelo tiştek hate serê wî. Carekê Merdan tê girtin, hêzên polês û dewletê wî bernadin. Çend caran herdu birayên Merdan jî tînin girtin.

Serê Merdan hertim di belayê da ye. Ev yek bîna Şanazê teng dike, nizane çi bike. Têlefônên wê bêbersiv dimînin. Biryar digre û bi serê xwe tenê diçe Tirkîyê bona xeberekê ji Merdan bigre, gelo ew heye, tune ye. Di dawiyê da Şanaz jî tê girtin. Hêzên ku Merdan girtine, bi girtina Şanazê dixwazin zêdetir li ser Merdan bandûra xwe nîşan bidin. Lê belê çi dikin jî devê Merdan tu gotin dernakeve. Di vê rewşa xerab da bêgûman hevalên Merdan jî vala namînin. Li ser planên rizgarkirina Merdan û Şanazê serê xwe diêşînin. Bi opererasyoneke biserketî ev lehengên romanê di dawiyê da tînin xelaskirin. Piştî vê bûyerê êdî Şanaz ne dixwaze û ne jî dikare li Stockholmê tenê bimîne. Carekê pêşneyarekê li ber guhê Merdan dixwe. Şanaz dixwaze xwişkê Merdan ya bi navê Zeyneb, dê û bavê wî jî bînin Stockholmê bona ew jî vê tenêmayîna xelas bibe. Merdan vê dîtîna jî dîrûv aqilan nabîne, piştî demekê em van endamên malbatê jî li Stockholmê dibînin. Êdî him endamên malbata Merdan, him jî nifûsê kurdan Swêdê piçek be jî zêde dibe.

Koma Merdan ya ku bi salan e li hemberî hêzên çekdar û tarî tekoşîneke mezin dide, di vî cildê romanê da jî li ser karê xwe ye. Merdan û hevalên xwe di warê wergirtina îstîxbaratê da xweyê îmkanên mezin in. Hin kesên wek Akif Beg (di îstîxbarata polês da kar kiriye), Deniz (di îstîxbarata jendirme da xebitiye) û Xelîl Îbrahîm (zabitekî dewletê yê kevin) gelek alîkariya Merdan dikin bona wan kesên bêgune jî wê zilma mezin xelas bikin. Destên van kesan dirêj in. Ew her-

gav hevkarîya Merdan dîkin. Di romanê da çend beşên gelek dirêj hene ku qala van hewldayîn û seferên Merdan û hevalên wî dîkin ku li hemberî van hêzên tarî hatine pêkanîn. Hemû bi serfirazî bi dawî hatine. Di romanê da kesê herî nêzîkî Merdan bêgûman Bahoz e, gelek ji hev hez dîkin. Peyva Bahoz di romanê da wek “paşnava” Merdan xuya dike. Dema operasyonan Merdan hertim Bahoz hildide bal xwe. Jina Merdan ya bi navê Şanzaz gelek dixwaze Zeyneba xwişka Merdan bi Bahoz ra bizewice. Şanzazê çend caran ev mijar ji Zeynebê ra vekirîye. Zeynebê di destpêkê da ev yek qebûl nekirîye, paşê êdî dengê xwe jî nekirîye.

Di romanê da hin tîp hene ku gelek bala xwendevanan dikşînin, yek ji wan jî Celîl e. Xortekî bi nezanî ketiye nav komên fanatik yê oldar û bûye dijminê cinsê xwe, bi çek û sîlah êriş birine ser gelek kurdên bêgune. Demek tê hevalên wî dixwazin ku ew xalê xwe jî bikuje. Celîl çî dike nikare biryar bide ku bi destê xwe xalê xwe bikuje. Celîl hê ji bîr nekirîye dema bavê wî dimre, ev xalê wî lê xweyî derketiye, ew mezin kirîye û şandiye medreseyê. Celîl di dawiyê da dev ji van hevalên xwe berdide, bi alîkariya nas û dostan paşê xwe dighîne refên kurdan. Celîl di romanê da xwe rexne dike, poşmaniya xwe tîne ziman û berê xwe dide pêşerojê. Her çi qas zor be jî dixwaze careke din li jîyanê vegere. Merdan jî şanseki dide Celîl û li vî xortê kurd xweyî derdikeve.

Di vê romanê da tenê sîyaset tune, mijara evîn û hezkirinê jî heye. Merdan dema ciwan bûye cara pêşîn li Dîyarbekirê li dora keçeke kurd geriyaye, dilê xwe berdaye wê. Wî tu car êşa vê evîna pêşîn ji bîr nekirîye. Di cildê duwemê de vê rêzomanê da (Çepera Giran) Merdan û Bahoz rastî tu keçên stembolî tîne, navê yekê Nesrîn, navê ya din Zerîn bûye. Ev romans hê nehatiye jibîrkirin. Di vî cildê dawîn da jî ew hev dibînin. Dilê Nesrînê ketiye Merdan, dilê Bahoz jî di Zerînê da ye. Nesrîn di vî cildê sêwem da carekê dema qala mijara mirina xwe dike, ji Merdan ra “Tu qevdek gulên kesk, sor û zer bîne, deyne ber serê min”. Merdan hinekî difikire gelo Nesrînê ew navên ku rengên ala kurdî tînin bîra mirovan çima li vir bi du hev rêz kirin? Paşê derdikeve holê ku koka malbata wê jî kurd e. Angorî gotinên bavê Nesrînê koka malbata wan diçe dighêje kurdan. Ew berî gelek salan wek sirgûn hatine vir û ji ber zordestiyan û tirsê bi dirêjahiya salan qet qala vê pirsê nekirine, xwe weke “tirk” nîşan dane yan jî hesabandine.

Di dawîya romanê da xuya dibe ku du xort nişkêva wînda dibin. Ji ber vê yekê navbera du malbatan jî xirab dibe. Ji Merdan alîkarî tê xwestin. Piştî lêkolîn û pirsîyaran derdikeve holê ku hin hêzên tarî ew xort revandine ji bo bi rêya tehdîdan peren ji malbatên wan peyda bikin. Merdanê ku hatiye Dîyarbekirê li pey şopa wan ketiye paşê van xortan xelas dike û wan dighîne dê û bavên wan. Ev çalakî û hewldana Merdan ya dawî ye ku bi serketin û serfirazî xelas dibe. Ew xortên xelaskirî bi dilşahî diçin dighêjin malbatên xwe. Êdî Merdan û Bahoz jî hazirîya xwe dîkin bona herin Swêdê bighêjin hezkiriyên xwe.

Mesaja romanê berbi dawiya vê berhemê, di rûpelê 500î da hêdî hêdî zelal dibe. Vê mesajê mirov bi sê peyvên efsûnkirî jî dikare bîne zimîn: *rizgarî, azadî û dilşahî*. Merdan û Bahoz êdî berê xwe didin pêşerojê nûjen û dilşa. Dilezînin ku ji “*wî welatê ku mirov nizanibû bê sibê çi lê diqewimî, veqetin*”. Di dawiya romanê da Merdan tê Stockholmê, digihêje jin, dê-bav û xwişka xwe Zeyneb. Merdan hê nizane jina wî Şanaz ducan (hemle) ye. Şanaz ji ber vê şabûn û dilşahiye nizane çawa û kingê vê xebera xêrê ji Merdan ra bêje. Demekê şunda Merdan bi kêfxweşî fêr dibe ku ew êdî dibe bav, zarokek ê jê ra çêbibe!

Encam

Romana Mehmed Dehsiwar ya ku ji sê cildan pêkhatî, yek ji wan romanên bi zaravê kurmançî ya here dirêj pêk tîne (Qasî 1310 rûpel: 378+426+506). Wek rêzeroman hatiye nivîsîn. Ev romana ku di navbera salên 2017-2020an da li Swêdê hatiye weşandin, qasî ku ez zanim berhema hê li wê coxrafya ku piraniya bûyerên romanê lê qewimîne, ango li bakûrê Kurdistanê û li Tirkîyê nehatiye weşandin. Dema cildê yekem Şopa Xeterê di sala 2017an da derket, min ew bi nivîsekê dabû nasandin.²¹ Di hersê cildan da jî lehengê romanê yê sereke Merdan edaletê belav dike. Li dijî nepakan, xiraban, kujer û celatan disekine. Navê lehengê romanê Merdan di eslê xwe da ji peyva merd çêbûye ku tê wateya egîd, dilêr, mêrxas. Merdan di romanê da bi “merdane” diçe ser kujer û zaliman. Belkî jî nivîskar ev nav bi zanetî li lehengê xwe kiriye. Ji ber vê min sernivîsa danasîneke cildê duwem danîbû: Şerê Merdan û “Namerdan”. Li vir min peyva merd (pirhejmar bixwîne) ya kurdî bi peyva namerd ve kiriye têkiliyê, ango min xwestiye bi vê îfadeyê şerê pakan û nepakan bînim zêmin. Belê di hersê romanên da jî her ev şerê mirovahiye yê qedîm heye. Navê Merdan gotineke pêşiyar ya kurdî jî tîne bîra me: “Meriv bikeve tora merdan, nekeve tora namerdan”. Merdan ji bo kesên ku ketine tengasiyê xelas bike hertim di rê da ye. Ew ji tecrûbeyên xwe jî zane ku kesên tengezar hertim hewcedarî alîkarî û piştgiriyê ne. Piştî ku mirov hemû romanê dixwîne, mirov dixwaze romanê “Romana Merdan” bi nav bike! Merdan xirabiye nizane, hertim bi erênî difikire. Wek mînak tiştêkî balkêş, lehengê romanê Merdan şansekî dide kesên wek Delîl, Sadî (cild II) û Celîl (cild III) ku bêhemdî xwe, ji nezaniyê yan jî ji ber sedemên din ketine tengasiyê, rewşa wan şaş hatiye famkirin. Delîl û Celîl bi saya hewldan û nêrînên Merdan yê erênî tên dikevin nav hevalên Merdan. Yek ji mijarên romanê jî êş û jana kesên ku ji welatê xwe dûrketî ye. Nivîskar bi kesayetîya Şanazê xwestiye di vê romanê da têgehên windakirin, qûtakirin, xerîbî û dûrmayînê jî niqaş bike, derx pêş. Şanaz, dema hatiye Swêdê gelek xerîbî kişandiye, xwe tena hîs kiriye. Ew ji koka xwe qetiyaye

21 - Rohat Alakom, Romaneke Polêsî: Şopa Xeterê, *Bîrnebûn*, nr 70/2018, rûp.80-84.

hatiye welatekî dereke, ew difetise. Nivîskar bi hin vegeran carina xwendevanan dibe berî sedalî li wan herêmên ku ermen lê mabûn digêrîne. Mirov dibîne tu kes ji wan nemaye, tenê çend kesên din, nav, nasname guhartine, mane. Di vê romanê da mijareke din jî hebûna kurdên Swêdê ye. Ev romana dîrokî ku rewşa kurdan li bakûrê Kurdistanê, li Tirkîyê û Swêdê ya van sî salên dawîn bi zimanekî edebî û sade radixe ber çavan. Kurdên Swêdê êdî bûne mijara edebîyata swêdî jî, çawa em dibînin di gelek romanên polîsî da navên kurdan derbas dibin.²² Raberîhevkirina van herdu edebîyatan bêguman dikare encamên balkêş derxe holê.

22 - Rohat Alakom, Di Romana Swêdî da Koçberiya Kurdan, *Nûbihar*, nr 144/2018, rûp.6-14.

Mem û Zîn û Memê Alan

Jan Dost

*Mûyekî ez ji te nadim bi du sed Zîn û Şirînan
Çi dibit ger tu hesêb kî min bi Ferhad û Memê?!
Melayê Cizîrî*

Mem û Zîn wekî destanekê ji mêj ve di nav kurdan de hebû. Lê em nizanin ku di dema Xanî de gihştibû heta Bazîdê û Serhedan yan na? Dengbêjan Memê Alan bi vê forma ku em dinasin distira yan na? Gelo ev çîrok tenê di herêma Cizîrê û derdorên wê de bû yan jî li herêmên kurdan yê din jî belav bûbû! Tu belge di destê me de nîn in ku ev çîrok gihştibû deverin mîna Bazîdê. Tenê em dikarin xeyal bikin ku hin dengbêjan bi taybetî yê gerok yan jî yê koçeran ew destan bi xwe re birine deverên ku ew lê geriyane. Lê ya ku em qenc dizanin ew e ku beriya Mem û Zîna Ehmedê Xanî ev çîrok hebû. Wî jî bêguman li Cizîrê di dema xwendina xwe de yan jî li devereke din ji devê dengbêjekî bihîstiye û xwestiye wê bi şeweyekî wêjeyî ku şopa hunera wî ya bilind û dewsa xeyalê wî yê veketî li ser hebe binivîse. Wî jî vê çîrokê qencîr û sezatir nedît ku bibe bargira bîr û bawerî û raman û derd û kulên dilê wî.

Xanî di çend deveran de piştrast dike ku yekî jê re ev destan gotiye û çîroka evîndaran li ber destê wî raxistiye. Geh ji wî kesî re dibêje: Neqqaşê rûpelên çîrokê! Geh jî Rawî ango çîrokbêj. Geh jî dibêje: zanayê pirrsal. Geh jî nav lê dike: nêçîrvanê xweşxeberan! Geh jî seh hafê cildê mecazî. geh jî: pîr û tevdirgerê aqilmend. Geh jî nav lê dike: matemî ango kesê ku şîn li ser miriyekî girêdaye! geh jî: agahdarê ji dewarana dinê!

Di van destnîşankirinên Xanî de em tê digihin ku ew kes kalemêrekî jîr û zana û hayê wî ji çîrokên berê û serpehatî û destanan hebû lê kî bû û ji ku bû? Xanî tu agahiyên din nade me! Em ji Xanî bawer dikin ku yekî jê re destana Mem û Zînê gotiye. Lê gelo ew destan heta kîjan radeyê nêzikî destana Memê Alan ya dema me ya îro ye? Em bê bersiv in.

Em veşerî destana Memê Alan ku ew bûye bingeha Mem û Zînê.

Hin lêkolîner vê destanê vedigerînin çaxin gelekî dûr di mējûyê de û bi hinek çîrokên grîkî û Îranî re didin ber hev. Her wisa wateya paşnavê Memê (yanî Alan) bi gelek rûyan şirove dikin. Dibêjin ku ew ji peyva Alonî hatiye wergirtin. Ew jî hozeke li çiyayên Rewandizê, di navbera welatê Aşûr û Medan de nişteci bûbû! yan jî hin dibêjin ku ji peyva Alîn-Alans hatiye ku ew jî navê milletekî li Qafqas-yayê bû¹. Di tarîxa Kurd û Kurdistan ya Mihemed Emîn Zekî de di nav eşîrên Sine yên ku wî destnîşan kirine de çavê me bi êla Alan dikeve, ku ew jî tîreke ji tîrên hoza Sosinî û di navçeya di navbera Serdeşt û çiyayê Qendîl de bi cih dibe.²

Teoriyeke din ji bo ravekirina paşnavê Mem heye ku dibêje: ev nav piştî Mem û Zîna Ehmedê Xanî li destanê zêde bûye. ew ji peyva: Al- Ala yanî beyreq hatiye, çiku bavê Memê beyreqdarê mîr bû!³

Em hîç nikarin bibêjin ku çîrok yan destana Memê Alan gelekî kevn e yan jî ji ber hin çîrokên Grîkiyan yan Farisan hatiye wergirtin. Heta em nikarin bibêjin ku ew ji çîrokên welatê medan bû! ev hemû teoriyên ku ne li ser bingehên lêwkolîne yên zanistî hatine avakirin. Xwediyên wan tu belgeyên berçav raberî me nakin. Divê em zanibin ku çîrokên milletan pîrr yan hindik dişibihin hev. Hema di çîrokên hezar û yek şev de, û di çîroka Şemseddîn û Nûreddîn de em dixwînin ku periyeye cinnan çav li Bedreddînê kurê Nûreddîn dikeve ku li goristanekê di xew de ye. Li ber ciwaniya wî gelekî mat dimîne û paşê difirre heta pêrgî dêwekî dibe. Ew dêw jê re behsa ciwaniya keça Şemseddîn dike. Lê herdu perî û dêw dikevî qirika hev û her yek ji wan ciwaniya hevalê kesê/a dîtîye bêtir dibîne. Radibin herdu jî wan li welatê Misrê digihînin hevdû û li wan temaşe dikin da bizanibin ka kî ciwantir e!

Ev dîmenê efsaneyî di hezar û yek şev de, bi her aliyên xwe mîna dîmenê di Memê Alan de ye ku dibêje Tavbano, Hîvbano û Stêrbano her sê periyên cinnan ku xûşkên hev bûn xwe di kaniyekê de dişon. Ji nişkê ve xûşka biçûk dertê û cilên herdu xûşkên xwe dide aliyekî da ku wan tazî bibîne û ji xwe re li ciwaniya wan temaşe bike. Lê herdu xûşk dibêjine wê ka cilê me bîne yên ji me ciwantir jî hene ew jî Memê Alan û Zîna Zêdan in. Hersê difirrin û diçin Zînê di xew de tînin li ba Memo datînin.

1 - Memê Alan. Weşanên Avesta 1997 Stenbol. Rûpel. 10

2 - محمد أمين زكي - تاريخ الكرد و كردستان. Dîroka Kurd û Kurdistanê. Mihemed Emîn Zekî

Werger bingeheke danûstandinê di nav civakê de çêdike. Her wekî Venuti dest nîşan dike werger, çî rasterast çî jî bi awayekî nerasterast, çalakiyeke ragihanê ava dikin. Li dora metna ku hatiye wergerandin eleqeyek çêdibe û kesên ku dibin wergirên vê metna wergerandî bi awayên cihê û metnê bi kar tînin. Carinan eleqeya xwîneran bi weşandina wergerê re bi awayekî jixweber çêdibe, lê carinan jî têkildarî kargîniyên wergerê yên wek akademîk, dînî, çandî, siyasî û ticarî jî eleqeyek nav saziyekê jî çêdibe ji bo berhema wergerandî. Venuti di heman demê de diyar dike ku civakên ku bi rêya wergerê çêdibin civakên ji hêla ziman, nasname û pozîsyona civakî ve homojen nînin. Tiştên ku civakeke wergerê bi hev ve girê dide bi tenê xasyeta berhema jêder nîne, belkû ji wê bêtir nix û temsîlên nû ne ku wergêr daxilî nav berhema wergerandî dike. Li gor awayê bikaranînê werger dikare sînorên hîyerarşik ên navbera wergiran rabike û bibe bingeha kombûnên enetelektuelî û heta dikare helwesteke hevpar a edebî û çandî biafirîne (Venuti, 2013: 20-21).

Di wêjeya nûjen a Kurdî de wergera metnên edebî yên wêjeyên cîhanê li bakkur, bi taybetî piştî salên 2000'an, wek çalakiyeke edebî zêdetir tûşî eleqeya civakê xwîneran bû. Li salên 1980 û 90'an nimûneyên wergeran wek destpêşxeriyên şexsî, bi azweriyên romantîk û bi helwesteke ceribîner û bi hêsankirin û kurtkirinên li ser metnan derdikevin pêş me. Li wan salan ji ber kêmaniya derfetên danasîn û belavkirinê berhemên werger zêde nehatin zanîn û negihîştin komên xwîneran da ku bi xwe re eleqeyek girseyî çêbikin. Lê her wekî Vanderauvera wek şert datîne holê, divê berhem xwe bigihîne hawirdora wêjeyî û bersivê jî xwîner wergire, û xwîner bi rêyên cuda bertekan nîşanî berhema wergerandî bidin (Vanderauvera: 198).

Di salên 2000'an de komên xwîneran li dor wergêr û berhemên wergerandî ava bûn. Di vê proseya de handan û destegên weşanxaneyan jî sîdewer bûn. Wergêrên ku klasîkên navdar wergerandin Kurmancî rastî eleqeyên xwîneran hatin û para xwe ya populerîteya wek wergêr ji navdariya wan berheman û navdariya nivîskarên wan wergirtin. Heta di hin mînakên de eleqeya li dor wergêran û şopînerên xebatên wan sermestîyeke wisa çêkir ku qaydeya bingehîn hat jibîrkirin, ew qaydeya ku Jorge Iglesias wek "wergêr ji berhema ku werdigerîne girîngtir nîne" destnîşan dike. Dînamîzma ku li dor berhemên werger û wergêrên populer çêbû, ku mirov serxweşiya wergêran a demdemî û helwesta xwînerên pêgir ên perestîşî dayne aliyekê, ji bo wêjeya Kurdî bi awayekî erênî kartêker bû û bi berhemên wêjeyên netewên din sînordar nema û ber bi keşifkirina berhemên kurdên ji parçeyên din jî berbelav bû.

Bandora wergerê bi giştî li ser poetîkayê jî tê tê dîtin, lewre werger bi hemû xasyetên poetîkaya wêjeyekê ve têkildar dibe. Werger piştî ku proseya wergerandinê timam dibe û digihîje xwîneran û rastî eleqeya civaka edebî tê, hîngê daxilî nav rojeva poetîk jî dibe. Li gor ravekirina Lefevere poetîka ji du hêmanan pêk tê: yek ji wan navgînên edebî ne, yên wek cure, motif, karakter û rewşên prototîpîk, û sembol; ya din jî konseptên têkildarî vê pirsê ye bê ka rola wêjeyê çî ye /an jî divê çî be di nav sistemeke civakî de. Lewre dema di wêjeyekê de kodên poetîk tên sazîkirin du hêman dibin xwedî girîngî. Yek ji wan, her wekî li jor hat diyarkirin, amrazên edebî ye û ya din jî nêrîna kargînî ye ku di sistemeke edebî de hilberîna edebî diyar dike (Lefevere, 1992: 26). Her wisa di avabûna hêmanên fonksiyonel ên poetîkayekê de Lefevere kartêkeriya îdeolojîyê û bandora hêzên îdeolojîk jî wek faktorên diyarker destnîşan dike (27).

Vêca di vê çarçoveyê de lêhûrbûna li ser pozîsyona wergerê ya di poetîkaya Kurdî de girîng dibe bes wek mijar û problematîk ew babet ji sînore wê gotarê wêdetir e. Di vir de em ancax dikarin rêçên dahûrînê amaje bikin ku pêwîstî bi lêkolînên berfireh dibînin. Yek ji wan pirsan ew e ku mirov bipirse bê ka têkiliya hevbandor a wergerê û navgînên edebî di rastiya wêjeya Kurdî de çawa pêk tê. Cureyên nû, şewazên nû, ceribandînan nû yên vegotinên cihê ku bi rêya wergerê daxilî nav wêjeya Kurdî dibin bertekên çawa werdigirin? Ev pirs jî lêkolîneke serbixwe heq dike bê guman. Û her wisa bandora wergerê ya li ser diyarbûna rola wêjeyê ya di nav civaka Kurd de jî bi xebat û daneyên qadê dikare zelaltir bibe. Wek angaşteke girêdar mirov dikare bibêje ku têkiliya wergerê û poetîkaya Kurdî hêjayî lêkolînên berfireh e û tê de şik nîne ku dê encamên balkêş û kêrhatî ji bo nîqaşên edebî derxînin holê.

4. Rexneya Wergerê

Helwesta rexneyî ya ber bi deqên wergerê di sedsala borî de û bi taybetî jî piştî salên 1970'yan tûşî guherînan girîng bû. Di wan guherînan de bandora nîqaşên têkildarî têgeha *vegara çandî* girîng bû ku ji hêla Susan Bassnett û Andre Lefevere hatin pêşkêşkirin. Wan her duyan berê lêkolîn û xebatên wergernasiyê ji qalibên şid ên zimannasiyê zivirandin ber bi hêla kontekst, çand û dîrokê û girîngî dan kargîniya civakî ya proseya wergerandinê. Wegera ku di sînore zimanzaniyê de û bêtir jî wek pratîkeke formel dihat nixandî, bi bandora nêrînan jêder-çandî û fonksiyonel êdî bi peywendiyên berfirehtir tê lêkolînkirin. Di qada xebatên wergernasiyê de bi amajayên cihêreng ên dîsîplîner têkiliya wergerê û biwarên din tên nîqaşkirin. Bassnett û Lefevere her wisa bal kişandin ser pêvajoya wergerê ku tê de faktorên girîng hene da ku ji bo nixandîna wergeran li ber çav bên girtin. Wek nimûne, vebijartina wergêr a berhemeke edebî, rola edîtor û weşan-

ger a di pêvajoya wergerandinê de, biryara li ser bikaranîna stratejî û taktîkên wergerê û pêşbînî û biryarên derbarê helwesta xwîner ji wan faktoran in ku di dahûrîna berhemên werger de xwedî girîngî ne (Bassnett, Lefevere, 1990: 123).

Rexneya wergerê mijareke berfireh e û nirxandina wê ya bi fokûsên ji hev cuda rêya nêrînên cihêreng vedike. Ria Vanderauwera di gotareke xwe de ji hêla bendewariyên xwîner/rexnegir ve nêzikî mijara rexneyê dibe. Li gor wê rexneyên derbarê wergerên wêjeyî pîranî têkildarî hêsani/dijwariya xwendina deqa wergerandî ne. Xwîner û rexnegir berî her tiştî lê dinêrin bê ka werger bi awayekî hêsan û têgîner tên xwendin an jî na. Gelek caran xwîner û her wisa rexnegir jî derbarê guherînên zimanî û derbarê qalibên ku li zimanê armanc nayên pir hasas in û li hember tiştên nestandart û edetî bertekan nîşan didin (Vanderauwera: 202).

Mirov dikare bibêje ku îro di rojê wêjeya Kurdî de xebatên wergerê balê dikişîne ser xwe. Gelek kesayetên ku wergerê dikin di heman demê de nivîskar in û bi navûdengîya wan eleqeyek ji bo berhemên ku ew werdigerînin jî çêdibe. Sedemeke din ji ew e ku metnên werger jixwe berhemên navdar in û daxwaza xwendina wan a bi zimanê kurdî kelecaneke çêdike. Sedemek jî helwesta welatparêzî ye ku vê hestiyariyê Yildirimçakar bi tespîteke cîgirtî rave dike. Li gor wî rewşa wergera Kurdî dişibe vê yekê ku çawa Kurd hewl didin li mala xwe kurdî bi axîfîn ji bo ku kurdî ji holê ranebe, bi heman awayî jî di hewlekê de ne ku berhemên wergerînin kurdî ji bo ku zimanê Kurdî bijî, xurt be û bigihêje nîşên nû û zimanên pîrîneyî wekî tirkî nekeve dewsê. Bi vî awayî jî armanca wergerê ya sereke ya wergerandina berhemekê ku em nikarin di zimanekî din de bixwînin diguhere û roleke parastina zimên, îtirazek li hember zimanên din hildigire ser xwe (Yildirimçakar: 81-82).

Digel vê eleqeya xwîneran, nêrîn û rexneyên derbarê wergeran ji paşxaneyên teorîk bêpar in û piştî xwe nadin lêkolînên berfireh. Fîkr û angaş zêde caran xav dimînin û bi xebatên pratîkî nayên çespendin. Fikarek ew e ku tê gotin wergera nebaş dikare zirarê bide zimanê resen û kodên biyanî li ser zimên ferz bike an jî bide bicihkirin. Bingeha vê helwestê ji pêdiviya bi parastina çandî û zimanî tê û tiştêkî maqûl jî xuya dike, lê pîrî caran wek hestiyariyeke bi radêya bilind de xwe didê nîşan. Her çiqas berhem bandorê li ser zimanê bikarîneran bike jî, divê bê zanîn ku nivîs û axaftin zirarê nade sîstema bingehîn a zimên. Her wiha zirara wergerê nebaş û bi kêmasî ya çîrok an jî helbestekê ancax bi qasî zirara çîrok an helbesteke nebaş a bi Kurdî nivîsandî dibe. Di qada wêjeyê de cudakirina ji hev a berhem/zimanê baş û nebaş çawa karekî hêsan nebe bi heman awayî diyarkirina wergera edebî ya baş û nebaş ne hêsan e.

Xwînerên wergeran bi bendewariyên metneke resen berhemên werger dixwînin û ji ber vê yekê jî rexneya wek 'tahma wergerê jê tê' gelek tê îfadekirin. Ew

îfade her çiqas ji bo gelek berheman rastiyeke heyî jî nişan bide, bi tena serê xwe nabe qusûrek ji bo wergerekê. Ji ber ku ji bo gelek wergeran em dikarin bibêjin ku eger tahma wergerê ji wergerekê neyê hîngê şikberiyên naverokî û şêwazî yên mafdar tên hişê mirov. Wergêr xwedî mafê tercîhkirinê ye ku biryara wergereke biyanihiştî an jî kedîkirî bide. Ev mesele wek nîqaşeke teorîk di dîroka wergerê her tim di rojevê de bûye û pir tişt li ser hatine gotin. Alîgirên jêder-navend û armanc navend ji bo helwesta xwe ya têkildarî wergerê gelek fikr û têgehên girîng pêşkêş kirine. Her wergera Kurdî ancax li gor taybetiya tekstê, pêşekiyên fonksiyonel û tercîhên wergêr di çarçoveyê teorîk de bê nirxandin, hîngê mirov dê bikare behsa rexneyê saxlem bike.

5. Etik, Teqlîd û Afirînerî di Wergera Kurdî de

Etik, teqlîd û afirînerî wek têgehên girîng di dîroka wergerê de bi berfirehî hatine nîqaşkirin. Etik di wergerê de berî her tiştî bi babetên wek têkiliya wergêr û metna ku werdigerîne, dilsoziya wergêr a bi nivîskar û metna resen, venêrîn û nirxandina karê ku wergêr dike, rola edîtoriyê ya ji bo misogerkirina transfera naverokeke tam û rast, cudatiya wergera ji zimanê resen û ji zimanekî navbeynkar û rewabûna wê û bi mijarên din ên manendî wan mijûl dibe. Teqlîd û afirînerî jî bêtir bi şewaza wergêr û bi tercîhên wergêr ên derbarê bikaranîna hin stratejiyan û bi şiyar û hunera wergêr re têkildar in.

Di mijara dilsoziyê de wergera ji zimanê resen û ji zimanê sêyem di rojê wergera Kurdî de car caran tê nîqaşkirin ji ber ku hejmara wergerên ji zimanên alîkar zêde dixuye. Wergera ji zimanê sêyem bi xwe re nîqaşên têkilhev derdixîne holê. Her wekî tê zanîn werger wek çalakî di navbera du zimanan de, zimanê jêder û zimanê armanc, pêk tê û têkiliyê rasterê ye. Dîsa jî her çiqas navbera du zimanan û bi awayekî rasterê be jî werger bi awayekî mekanîk raguestin û ve-bicîhkirina peyv û hevokan nîne û di pêvajoya wergerê de gelek arîşe derdikevin holê. Vêca dema ku zimanê sêyem jî dikeve nav pêvajoya wergerandinê pirsgirêkên heyî du car zêde dibin û derfetên berawirdkirina zimanê jêder û zimanê armanc namîne. Berhem bi referansên zimanê sêyem, bi kod û hêmanên çandî yên zimanê sêyem tê raguestin û bi gelek awayan edî bi kêrî nirxandin û rexneya wergerî bi kêr nayê. Di gel wan hêlên neyînî, dîsa jî di hin şert û mercan de wergera ji zimanê sêyem dibe pêwîstî û kareke rewa. Hin berhem hene ku bi zimanên dêrîn ên ku bi tenê li ser metnan dijîn hatine nivîsîn, an jî di hin şert û mercên siyasî de xwe-gihandina bi metnên resen pêkan nabe an jî wergêrên pispor ên hin zimanan peyde nabin. Di wan şert û mercên awarte de rewabûna wergera ji zimanê sêyem derdikeve holê.

Di wergera Kurdî de toleransa xwîner û rexnegiran a têkildarî teqlîd û afirîneriyê û bi heman awayî jî serbestiya wergerê ne zêde ye. Metnên wêjeyê bêyî çarçoveyên xwe yên çandî û zimanekî nikarin bên sêwirandin. Lê rastiyeke heye ku di nav demê re helwest û têgihîştina ber bi metnê tûşî guherînan tê. Li gor Göktürk xasyetên çandî û zimanî yên metneke edebî taybetiyên qonaxeke dîrokî nîşan didin û bi derbasbûna demê û bi guherînan çandî re xwînerên wan metnan jî êdî bi şeweyên cuda nêzikî wan metnan dibin. Di vir de jî peywireke din ji wergerê re çêdibe, an ku divê wergerê wek xwînerê çanda jêder metnê bixwîne, haya wê bi guherînan têgihîştinê çêbe û bi wê re jî di nav çarçoveya çand û zimanê xwe de têgihîştineke nû ava bike (Göktürk: 45).

Wergêr û weşangerên Kurd ji ber sedemên cihê, bi taybetî jî ji ber mafên telîfê û sert û mercên bazarê wergerên berhemên bê telîf dikin. Ew berhem jî piranî metnên kevn in û ji ber vê çendê jî ji ziman bigire ta trend û helwestên edebî bi gelek awayan li rewşa edebî ya îro nayên. Helbet berhemên klasîk xwedî qîmetên mayinde ne û temayên wan ên edebî bi giştî binas in ji xwînerên çar aliyên cihanê re. Dîsa jî ziman, tercîhên edebî, guherînan nisbî yên cureyan, guherînan têkildarî xasyetên vegotinê û hunerên edebî wek xwe namînin. Di vê niqteyê de afirînerî û teqlîda edebî di rojanekirina berhemên de girîngtir dibe. Lewre wergerê hem paşxaneya edebî û dîrokî ya metnê li ber çav digire û hem jî hewl dide ku metnê bi xasyetên hemdem rojane bike da ku çêja wê ya edebî li gor pîvanên heyî yên çanda xwendinê bê.

Wergêrên Kurd ên ku dixwazin berhemên giranbûna yên wêjeya cihanê wergerînin Kurdî, bi niyeta xwe ya saf û îdealîzma ku hêjayî pesndayîne, rastî arîşeyên giran ên wergerê tînan ku hem şîyanên wan dide zorê û hem jî dibe ezmûneke dijwar a dilsoziyê. Di wergerê de pêkanîna hevtayîya metna jêder û metna armanc dijwar e û di gelek mînakên de şemitînan kategorîk çêdibin. Hin metn xwedî arîşeyên xweserê xwe ne ku wek arîşeyên tekst-spesîfîk tînan binavkirin. Ji bilî vê, arîşeyên çandî û zimanî yên cur bi cur jî suprîzên nexweş ji wergêran re çêdikin. Di vê babetê de tînan ku wergêrên Kurd wek rêbazeke binas serî li arkaîzmê didin, an ku ji bo ku bikarin hevtayê peyv an gotina jêder di ya armanc de peyde bikin peyvên kevn, qedîm û ferhengî bi kar tînin. Carinan metaforên mirî û hin caran jî bêjeyên devokî ku yekser wateya daxwazkirî nadin jî tînan tercîhkirin.

Di wergerên Kurdî de teqlîda şewazgerî ya ku bi helwesteke armanc-navend pêk tê di gelek nimûneyan de tînan. Yek ji sedemên herî girîng ê vê yekê nivîskariya wergêr e. Piraniya wergêrên Kurd di heman demê de berhemên edebî jî dinivîsin. Teqlîd bi giştî bi du awayan tê raçavkirin. Wergêrên nivîskar şewaza xwe ya nivîsinê dikin bingeha wergera xwe û bi helwesteke armanc-navend û bi stratejîya kedîkirina metnê wergerê dikin. Carinan jî şewaza metna jêder bandorê li ser nivîsên wan dike ku ew bandor rasterast nabe mijara wergerê bi xwe lê dibe ku di nixandina tîkiliya wergerê û nivîskariyê de li ber çav bê girtin.

Encam

Wêjeya Kurdî bi rêya wergerê, rastî berhem û hêmanên çandî-zimanî yên cuda tê û di encama vê rasthatinê de bivê nevê bandor û hevbandoreke piralî jî pêk tê. Di rabirdû de wergera ku zêdetir ji zimanên gelên cîran dihat kirin îro bi wergera ji ziman û çandên dûtî Kurdan hîn berfirehtir bûye. Werger wek qasîdek, wek peyamnêrek di navbera zimanê Kurdî û zimanên din diçe û tê lê piranî peyamên ji zimanên din ber bi civaka Kurdan tîne ji ber rastiya wergera berpê Kurdî. Her çiqas werger rasterê be jî, an ku ji zimanê jêder dest pê bike û ber bi zimanê armanc biçe jî, an ku tişta ku pêk tê wek transfereke yek alî xuya bike jî, derfetên danûstandina çandî û zimanî ya bi rêya wergerê gelek in. Transfer ji zimanê jêder bo zimanê armanc pêk tê lê tişta ku tê transferkirin û di proseya wergerê de tûşî guherînan dibe û bi hin awayan dîsa li xwedanê xwe vedigere.

Wergera Kurdî faktoreke girîng e di girêdana wêjeya Kurdî ya bi wêjeya cîhanê de. Derfetên ku werger bi xwe re derdixîne holê, nîqaşên ku di nav komên entelektuel ên civakê de bi rêya wergerê çêdibin, bandora wergerê ya guherînan û helwesta parastinî ya endamên civakê tev wek diyardeyên dînamîk ji bo wêjeya Kurdî dikarin îmkânên nû çêbikin. Eger ku werger ji bandorên yekalî xilas bibe, di bin hîyerarşîyê tund a çandî û zimanî de pêk neyê û wergêr bi awayekî bêtir pîsporane wergeran bikin û xwîner jî bi helwestên objektîf û rexneyî eleqeya xwe sergîhayî bikin, vê çaxê gelek fikarên li derûdora çalakiya wergerê dê bê wate bimînin.

Di xebatên wergera Kurdî ya edebî de berî her tiştî pêwîstî bi lêkolînên berfireh ên derbarê dîroka wergera Kurdî hene. Bi lêkolînên bi vî rengî re jî divê bê armanckirin ku bîblîyografyayek têkûz derbikeve holê. Bi rêya tomarkirina nusxeyên wergeran ên ku di arşîv û koleksiyonên berbelav de cih digirin bingeheke xurt dê ji bo wergera Kurdî çêbe. Her wisa da ku zincîra dîrokî ya zanyariyên wergera Kurdî bê timamkirin, divê rexneyên teorîk li ser berhemên werger ên roja îro pêk werin û lêkolînên ku werger-wergêr-xwîner armanc dikin bèn meşandin. Her wiha xebatên li ser berawirdkirina stratejî û teknîkên wergerê, derfetên perwerdehiya wergêran û zelalkirina çarçoveya teorîk a nixandina kalîteya wergeran jî mijarên girîng in ku pêdivî bi lêkolînê dibînin.

Ji nixandinên vê nivîsarê de hat dîtin ku werger di wêjeya Kurdî de hem bi problematikên giştî yên cîhanî re rû bi rû ye û hem jî ji ber taybetiyên xwe

yên çandî û dîrokî xwedî rojevên xweserê xwe ye. Wergera Kurdî wek sîstemek dikare bibe faktoreke çalak ji bo rapirsînên fikrî yên tevahiya sîstemên çanda Kurdî. Bi lêkolînên berfireh, tespîten cihgirtî û avakirina angaşten xurt ên teorîk –û heta yên teorî-wêdetir– firsetek heye li pêş Kurdî/Kurdan da ku wergerê bikin hokareke xurtkirina edebiyata xwe.

Çavkanî

- Babler, O. F. (1970), "Poe's "Raven" and the Translation of Poetry", Li nav *The Nature of The Translation-Essays on the Theory and Practice of Literary Translation*, De Gruyter, The Hague & Paris.
- Bassnett, S., Lefevere, A. (1998), "The Translation Turn in Cultural Studies", li nav *Constucting Cultures-Essays On Literary Translation*, Bassnett, S., Lefevere, A., Multilingual Matters, Clevedon.
- Beecroft, A.,(2015), *An Ecology of World Literature, From Antiquity To The Present Day*, Verso, London & New York.
- Boyik, E., (2019), Çanda Kurdên Sovêtê, Weşanên Peywend, Stembol.
- Casanova, P., (2009), *Dünya Edebiyat Cumhuriyeti*, Varlık Yayınları, İstanbul.
- Damrosch, D., (2008), *How to Read World Literature*, Wiley-Blackwell, West Sussex.
- Göktürk, A., (2004), *Çeviri Dillerin Dili*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul.
- Lefevere, A., (1992), *Translation, Rewriting, And the Manipulation of Literary Fame*, Routledge, London & New York.
- Niranjana, T., (1992), *Siting Translation, History, Post-Structuralism, and the Colonial Context*, University of California Press, Berkeley.
- Öpengin, E. (2011), «Bizava wergerê di kurmanciyê de [Translation movement in Kurmanji Kurdish]», *In Proceedings of 1st International Conference on Kurdish Literature, xxx. Sanadaj*: University of Kurdistan Press.
- Salvador, D. Sales, (2004), "Translational passages: Indian fiction in English as transcreation", Li nav *Less Translated Languages*, Ed.: Albert Branchadell, L.M. West, John Benjamins Publishing, Amsterdam/Philadelphia.
- Serfiraz, M. (2014), "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wegera Wêjeyî", *Wêje û Rexne*, hejmar 2, 2014.
- Vanderauwera, Ria (2014), "The Response to Translated Literature", li nav *The Manipulation of the Literature*, Routledge,
- Venuti, L. (2013), *Translation Changes Everything*, Routledge, London & New York.
- Yazıcı, M., (2005), *Çeviribilim Temel Kavram ve Kuramları*, Multilingual, İstanbul.
- Yıldırımçakar, Z., (2016), *Weger Wek Kirineke Çandî*, Teza Lisansa Bilind a Neçapkirî, Zanîngeha Mardin Artuklu.

Weşangerîya Kurdkî ya Tirkîya de Cayê Kirmanckî

Mutlu Can

Kilmnus

Tirkîya de kitabê kirmanckî (zazakî) yo tewr verên 1899 de ginayo çap ro. Perîyodîko tewr verên o ke tede tekstê kirmanckî zî weşanîyayê rojnameyê Roja Newe ya ke 1963 de ameya vetene. Qedexekerdîşê kurdkî yê dewleta tirkan astengo tewr muhîm o ke bîyo sedemê apeymendişê kirmanckî. La vera heme şertanê nêgatîfan yew pêserîya cîdî ya kirmanckî vejîyaya orte. Lehçeya kirmanckîya ke şertanê mendişî-mergî de rî bi rî ya, semedê aye warê weşangerîye ehemîyetêko cîdî teşkil keno. La kirmanckî de sewîyeya nîsbetê weşangerîye kitabî û perîyodîkan hema zî kêmi ya. Ewro Tirkîya de qedexeyê kurdkî biney sist bibo zî polîtîkaya asîmîlasyonîste ya dewlete bi hawayo pratîk yena tetbîq kerdene. Hetanî ke kurdkî nêbo zîwanê perwerdeyî, warê weşangerîye de temînbiyayîşê şert û îmkanan yê ke kurdkî (kurmanckî-kirmanckî) biresno sewîyeya îdeale mumkin nêaseno.

Ma do na xebate de Tirkîya de weşangerîya kitabî û perîyodîkan de cayê lehçeya kirmanckî (zazakî) ser o vinderê. Ma do beşe yewinî de weşananê perîyodîkan bi goreyê kirmanckî rê cadayîşê înan analîz bikê û derheqê înan de zanayîşanê umûmîyan bidê. Beşe diyinî de zî bi hawayo kilmî weşangerîya kitabî de rewşa kirmanckî ser o vinderê. Beşe peynîye de zî ma ca bidê çend zanayîşan û tesbîtan yê ke ma peynîya na xebate de resayî înan. Sînorê xebata ma hetê mudetî ra mabenê 1963 û 2017î yo. Ancîna perîyodîk û kitabê ke Tirkîya de, hetê kirmancan ra û bi alfabeya kirmanckî (kurdkî) vejîyayê yewna sînorê xebata ma teşkil kenê.

Kîlîtçekuyî: Kirmanckî, zazakî, kurdkî, perîyodîkê kurdkî, weşangerîya kurdkî, rojname, kovare, kitabê kirmanckî

Destpêk

Kurdê ke lehçeya kirmancî (zazakî) qîsey kenê mintîqa bi mintîqa xo sey kird, kirmanc, dimilî (dimlî) û zaza name kenê. Naye ra girêdaye lehçeya ke pê qîsey kenê, aye ra zî vanê kirdkî, kirmancî, dimilkî yan zî zazakî. Seke yeno zanayîş Grûba Xebate ya Vateyî ke 1996î ra nata standardîzasyonê na lehçe ser o xebitîyena, çarçewaya kirmancîya standarde de seba nameyê na grûba kurdan “kirmanc”, nameye lehçeya înan zî “kirmancî” munasîb qebul kerdî. Aye ra ma do naye ra dima nê nameyan bixebitnê.

Na grûba kurdan tena Kurdistanê Vakurî ke ewro binê bandorîya Tirkîya de maneno de ciwîyena. Derheqê nufusê pêroyî yê kirmancan de yew hûmara resmî û zelale ke netîceyê hûmaritişê nufusî de tesbît bîya çin a la goreyê texmînan nufusê kirmancan yê Tirkîya 3-4 mîlyonî esto. Bi vatişêkê binî %25ê kurdanê vakurî kirmanc ê.

Kirmancî, bajaranê vakurî ra Dêrsim û Çewlîg de zafaneyê girdî yê nufusî teşkil kenê. Çewlîg de merkezî ra teber qezayanê Dara Hênî û Bongilan de kahîr ekserîyetê nufusî kirmancan ra awan beno. Ancîna qezayanê Azarpêrt, Kanîreş, Gêxî, Xorxol û Çêrme; Dêrsim de merkezî ra teber Çemişgezek, Xozat, Mazgêrd, Qisle, Pultur, Pêrtage û Pilemuriye; Dîyarbekir de merkez, Çêrmûge, Çinar, Şankuş, Pîran, Gêl, Erxenî, Hênî, Hezro, Karaz, Pasûr û Licê; Xarpêt de merkez, Xulaman, Mîyaran, Depe, Qowancîyan, Maden, Pali û Sivrîce; Ezirgan de merkez, Mose, Îlic, Kemax û Têrcan; qezayanê Erziromî ra Aşqele, Çat, Xinûs (Kela), Hesenqela û Tatos; Sêwas de mintîqaya ke sey Koçgîrî name bena: Dîvrîxî, (Tivirgî), Hafîk, Îmran (Çit & Umranîye), Kangal, Ulaş û Zara (Koçgîrî), qezaya Semsûrî Aldûş, qezaya Bidlîsî Modan (Motkî), qezaya Mûşî Gimgim, qezaya Riha Sêwreği; qezayanê Meletî de Şîro (Pötürge) û Erebgir; qezayê Sêrtî Hewêl, qezaya Êlihî Hêzo de nufusê înano cîdî esto. Ancîna mintîqaya Qerecdaxî de (dew û mezrayê Çinar, Dêrike û beledîyaya Rezan ya Dîyarbekirî) tayê nufusê kirmancan esto. Nînan ra teber Erdexan, Adana (Seyhan), Aksaray, Qers, Kayserî û Gumuşxane de zî tay bo zî nufusê kirmancan esto. ¹

Seke yeno zanayîş 1923 de ronîyayîşê Komara Tirkîya ra pey ziwanê kurdkî (kirmancî-kirmancî/zazakî) ame qedexekerdiş. Polîtîkaya asîmîlasyonî ya dewleta tirkan ver kurdkî nêbîye wayîrê statu. Îmkananê payranmendiş û averşîyayîşî ra mehrum mende. Herçiqas ke no qedexe bi tesîrê muxalefetê kurdan û muzakereyanê Yewîya Ewropa û Tirkîya ewro biney sist bîyoz; warê weşangerî û medya de serbest veradiyayîşê kurdkî, dera weçînita ya kurdkî, çend unîversîteyan de abiyayîşê bêşanê ziwan û kulturê kurdan ûsn. gamê pozîtîfî erzîyay zî nê, estena kurdkî nêgênê binê temînatî. Kirmancîya ke di lehçeyanê kurdkî

1 - Ercan Çağlayan, *Zazalar: Tarih, Kültür ve Kimlik*, 3. Baskı, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, Ekim 2018, s. 49-50

yê ke Tirkîya de qisey benê ra a dîyin a, rewşa aye hîna negatîf o. Kîştâ netîceyanê qedexekerdişî de dezavantajê aye zî bîyê sedemê na rewşe. Tena Tirkîya de cayî (meskûn) bîyayîşê kirmancan ver, sewbîna parçeyan yan zî welatan de nêbîyayîşê xebatanê ke kirmanckî ser o bîyê, zaf tay bîyayîşê nîsbetê bajarijan yê nufusê kirmancan û îmkananê perwerdeyî rê nêresayîşê kirmancan çend nimûneyê dezavantajan yê kirmanckî ra yê.

Eke teşbîh ca de bo kirmanckî gonî vîndî kena. Çünke kirmanckî zıwanê perwerdeyî nîya, zafêr kirmancî bi hawayo umûmî keyeyanê xo de û cuya xo ya rojane de kirmanckî qisey nêkenê û netîce de na lehçe neqlê neslanê newîyan nêbena. Nê tabloyê aye negatîfî ver UNESCO rapora xo ya 2009î de ca dayo kirmanckî û na lehçeya kurdkî grûba “Ziwananê ke tehlukeyê ci esto ke bimirê” mîyan de kategorîze kerda.² Helbet na rewşa negatîfe ya kirmanckî xoser babeta meqaleyêk a. Aye ra ma hîna zêdeyêr nêkewîn detayan mîyan û derbazê esasê babeta xo bibin.

1. Weşananê Perîyodîkanê Kurdkî yê Tirkîya de Kirmanckî

Ma do nê beşî de weşananê perîyodîkanê ke Tirkîya de û hetê kurdan ra ameyê weşanayene hetê kirmanckî ra analîz bikê. Bi vatişêkê bînî kovar û rojnameyê kurdan yê ke Tirkîya de weşanê xo kerdo yan zî kenê û tede sey beşêk ca dîyayo kirmanckî yan zî tede tekstê kirmanckî zî weşanîyayê ser o bivindê û na çarçewa de zanayîşanê pêroyîyan bidê. Tîya de ganî ma sînorê xebata xo wina eşkera bikê: Hetê demî ra sînorê ma mabênê serranê 1963-2017î ra sînor kerde yo. Tarîxê ke nameyê her perîyodîkî dima parantezan mîyan de nusîyayê, serra destpêkerdişê weşanê înan o. Ancîna seke ma cor ra zî bi yew hawa dîyar kerd perîyodîkê ke Tirkîya de dest bi weşanê xo kerdo yan zî yew demî ra pey weşanê xo Tirkîya de domnayo kewenê xebata ma mîyan. Yewna sînorê ma zî no yo: Perîyodîkê ke bi alfabeya kurdkî (kurmanckî-kirmanckî) vejîyayê/vejîne daxilê xebata ma yê. Seke yeno zanayîş bi alfabeyanê bînan zî çend perîyodîkî weşanîyayê/weşanîyênê. Bêguman mabênê serranê 1963 û 2017î de sey kovar, rojname û fanzîn gelek perîyodîkê kurdkî/kurdan vejîyê la seba ke babeta ma kirmanckî ra girêdaye ya, ma tena ca dayo nameyê ê perîyodîkanê ke tede tekstê kirmanckî weşanîyayê.

Ma vere cû metodê analîzê xo ser o zî çend xususanê bingeyênan vajîn û bi no hawa dest bi babeta xo bikîn. Perîyodîkê ke kewenê sînoranê nê beşî, ma do înan bi goreyê hawayo kronolojîk hîrê dewran de analîz bikê. Nê dewrê ke eynî wext de nameyê sernuşîkanê ma teşkîl kenê nê yê:

2 - Tolga Korkut “UNESCO: 15 Languages Endangered in Turkey”, <http://bianet.org/english/english/112728-unesco-15-languages-endangered-in-turkey>

1. Dewrê Roja Neweyî (1963-1979)
2. Dewrê Kovara Tîrêjî (1979-1997)
3. Dewro ke bi Kovara Vateyî Dest Pêkerd (1997-2017)

1.1. Dewrê Roja Neweyî (1963-1979)

Kirmanckî, ronîyayîşê komara Tirkîya ra hetanî serra 1963yî tu perîyodîk de xo rê ca nêdîyo. Ganî ma destpêk de nayê zî vajê: Tirkîya de 1920î ra hetanî 1970yî kovarê ke bi kurdkî-tirkî neşr biyê, hûmara înan 10î derbaz nêbena.³ Ma reya verêne rojnameyê Roja Newe ya ke 1963yî de İstanbul de (bi kurdkî-tirkî) vejîyo de rastê tekstanê kirmanckî yenê. Nê, tena di tekstê folklorîk û kilm ê. Aye ra 1963 û Roja Newe bi hawayo sembolîk bo zî destpêkê nuştîş û weşanîyayîşê kirmanckî yê dewrê modernî teşkîl keno.

Hîrê perîyodîkê nê dewrî ke badê Roja Neweyî vejîyê û tede ca dîyayo kirmanckî nê yê: Kovara Özgürlük Yolu (Rîya Azadî), rojnameyê Roja Welat û kovara Devrimci Demokrat Gençlik. Kovara Özgürlük Yolu'yê ke 1975 de dest bi weşanê xo kerdo, pêsero 44 hûmarê aye vejîyê. Nînan ra 5 teneyan de tekstê kirmanckî weşanîyayê ke zafaneyê bêjê înan folklor o. Rojnameyê Roja Welat 1977 de vejîno û Tirkîya de pêsero 12 hûmarê ey weşanîyayê. Nînan ra 8 teneyan de tekstê kirmanckî neşr biyê ke ancîna zafê înan tekstê folklorîk ê. Devrimci Demokrat Gençlik yew kovara kurdan a ke 1978 de dest bi weşanê xo kerd. Pêsero 11 hûmarê na kovare vejîyayî. Na kovare de zî zaf tay bo zî tekstê kirmanckî ca girewto.

Eke ma bi kilmîye taybetîya nê dewrî û perîyodîkanê ey ser o çend detayan îlawe bikê eşkenê nînan vajê: Nuştîşê kirmanckî de qonaxê destpêkî yo. Roja Newe rojnameyo yewin o ke tede tekstê kirmanckî weşanîyayê û eynî wext de perîyodîko yewin o ke bi nameyêkê kirmanckî vejîyo. Roja Welat rojnameyo dîyin, Özgürlük Yolu kovara yewin, Devrimci Demokrat Gençlik kovara dîyin a ke tede ca dîyayo lehçeya kirmanckî. Nê dewrî de nuştîyê Munzur Çem, Malmîsanij û Zilfîyî⁴ ameyê weşanayene.

1.2. Dewrê Kovara Tîrêjî (1979-1997)

Tîrej kovarêka kulturî û edebî ya ke hûmara aye ya yewine 1979 de vejîyaya. Hema-hema nêmeyê kovare bi kirmanckî neşr biyo. Hîkaye zî tede gelek tewîranê edebîyan de nimûneyê tewr verênî aye de weşanîyayê. Coka na kovare sey nuqtaya destpêk yan zî bingeyê edebîyatê kirmanckî qebul beno. Hîrê hûmarê xo

3 - Malmîsanij, "İsveç'te Kürtçe Yayınlar", *Defter Dergisi*, Sayı: 13, İstanbul, Nisan-Mayıs 1990, s. 100.

4 - Munzur Çem, yew bantê muzîkî yê Zilfîyî ke Ewropa ra ameyo ardene ra tayê deyîranê şarê Dêrsimî deşîfre keno û dano weşanayene. Çem, semedê nameyê xo nêxêbitnayîşê xo ser o nînan vano: Seba ke esas arêkerdoxê nê deyîran Zilfî bî û o ê wextan teberê welatî de mendêne, mi nameyê ey ser o dayî weşanayene. No melumat hetê Munzur Çemî ra bi hawayê e-mailî dîya mi.

Tirkîya, yew hûmara xo darbeya leşkerî ya 1980yî ver Swêd de pêsero 4 hûmarê na kovare vejîyê. 5 nuştayan ra teber heme tekstî hetê Malmîsanijî ra (bi mexlaxsanê cîya-cîyayan) nusîyayê.

Dengê Komkar (1979), Armanc (1979), Berbang (1982), Hêvî (Parîs), Berhem (Swêd) kovarê bînî yê ke mabênê nê dewrî de Ewropa de welatanê sey Swêd, Almanya, Fransa de vejîyayê. La semedo ke babeta ma perîyodîkanê ke Tirkîya de weşanê xo kerdo ra sînorkerde ya ma nînan ser o nêvindenê. Labelê baş beno ke ma tîya qalê yew detayê muhîmî bikê, o zî no yo: Badê Tîrêjî di perîyodîkan de; Armanc û Hêvî de zî sey beşêk ca dîyeno lehçeya kirmanckî. Hetanî weşanîyayîşê kovara Vateyî (1996) hîrê perîyodîkê ke tede bi hawayo sîstematîk û sewîyeya cîdî de tekstê kirmanckî ca gênê Tîrêjî zî tede nê hîrê kovar ê. Redaktor û berpirsîyarê înan yê beşe kirmanckî M. Malmîsanij o.

Serra 1991 Tirkîya de semedê kurdkî muhîm a. Çünke seke yeno zanayîş 12 êlule 1980yî dima Tirkîya de kurdkî amebî qedexekerdiş. Tu îmkanê nuştîş û weşangerîya kurdkî nêmendbî, înanê ke bi kurdkî nuştêne, perîyodîkan vetêne derbaya leşkerî ya 1980yî ver vejîyayî teber, şîy Ewropa û fealiyetanê xo uca de domnay. Tirkîya de qanûno 2932 numreyino ke weşangerîye de kurdkî qedexe kerdêne, 29.12.1991 de hetê hukmatê Tirkîya yê ê wextî ra ame wedarnayene. Naye ser o Tirkîya de verê weşangerîya kurdkî bi hawayo fîlî abî. Nê qewimîyayîşî ra girêdaye bi nameyê Rojname yew rojname ame vetene. Rojname, perîyodîko kurdkî yo tewr verên o ke badê serra 1980yî Tirkîya de bi hawayo resmî dest bi weşanê xo kerdo. Rojnameyo ke tena yew hûmara ey (hejmara provayê) vejîyo de 2 rîpelî (4 nuştayî û beşê daşinasnayîşê kitabani) bi kirmanckî neşr bîy. Rojnameyî, rojnameyê Welat (1992) û Azadî (1992) taqîb kenê. Nînan ra rojnameyê Welat demêk dima weşanê xo bi hewayo rojane keno û hema-hema bi her hûmara xo de tekstê kirmanckî weşanîyenê. Azadî nê dewrî de rojnameyo hîreyin o ke muhtewaye xo de kirmanckî zî ca gêna.

Goreyê tesbîtanê ma ra nê corênan ra teber 9 rojnameyanê bînan de zî tekste kirmanckî ameyê weşanayene. Nînan ra Welatê Me (1994), Dengê Azadî (1994), Ronahî (1995), Azadiya Welat (1996), Hêvî, (1996) de hema-hema ke bi hawayo sîstematîk ca dîyayo na lehçe. **Mîqdarê bêj û hûmara tekstanê nê rojnameyan zêde yê.** Herçiqas ke nîsbetê înan bi goreyê verênan tay bo zî ge-ge rojnameyanê Jîyana Nû (1994), Roj (1995), Nû Roj (1996), Roja Teze (1998) de zî tekstê kirmanckî weşanîyayê.

Eke ma derbazê kovaranê kurdkîyan yê nê dewrî bibê, vînenê ke tena yew kovare bi sewîyeya cîdî ca dayo tekstanê kirmanckî. Na, kovara Nûbihar a ke weşanê xo 1992 de dest pêkerdo û hetanî ewroyî zî bê mabên domnena.

Ancîna goreyê tesbîtanê ma çend kovarê bînî ke nê dewrî de vejîyê û tede tay bo zî ca dîyayê tekstanê kirmanckî nê yê: Medya Güneşi (1988), Vatan Güneşi (1989), Deng (1989), Rewşen (1991), Newroz, 1991 Govend (1991), Newroz (1991), Newroz Ateşi (1992), Hevdem, 1993), Stêrka Rizgarî (1994), Çağdaş Zül-fikar Dergisi (1995), Zend (1996), Roza (1996), W (1996)

1.3. Dewro ke bi Kovara Vateyî Dest Pêkerd (1997-2017)

Kovara Vate 1997 de dest bi weşanê xo kerdo. 20 hûmarê aye verênî Swêd de, yê bînî (2003yî ra tepîya) Tirkîya de vejîyayê. Wexto ke ma na meqale nuştêne hûmara 59. ya kovare weşanîyabiye. Kovara Vate, hetê Grûba Xebate ya Vateyî ke serra 1996î ra nata xebata standardîzasyon û arşîvkerdişê na lehçe ser o xebitîna ra yena vetene. Helbet tena na kovare babete yew meqale teşkîl kena, la îcab keno ke ma tena ca bidîn çend xususanê muhîman. Vate, kovara yewin a ke temamen (safî) bi kirmanckî ameya weşanayene. Mîsyonê aye yo esasîna vilabîyayîş û pratîzêbiyayîşê qaydeyanê kirmanckîya standarde yo ke ê hetê Grûba Xebate ya Vateyî ra tesbît biyê. Serredaktorê kovarê M. Malmîsanîj, Munzur Çem û J. Îhsan Espar ê, kesê ke sey redaktorê kovare asene zî nê yê: M. Selîm Uzun, Haydar Diljen, Cemîl Gundogan, Deniz Gunduz û Serdar Bedirhan. Awanbiyayîşê pêserîya nuşteki ya kirmanckîya ewroyêne de rolê na kovare gird o. Çarweya wendiş û nuştîşê kirmanckî de zî zaf ehemîyetê aye esto, çünke sayeyê na kovare de wendox û nuşttoxê na lehçe zêdîyayî, kadroyê aye ewroyênî vejîyayî. Bi kilmîye kovara Vate edebîyatê kirmanckî de yew ekol, hetê mîsyonî ra zî yew mekteb o⁵.

Dema Nû (2001) rojnameyo verên o ke serranê 2000î de dest bi weşanê xo kerdo û ca dayo tekstanê kirmanckî. Çend rojnameyanê kurdan yê Tirkîya ra yo ke weşanê înan demêko derg dewam kerdo. Herçiqa ke mîqdarê tekstanê kirmanckî zaf nêbo zî Dema Nû seba na lehçe perîyodîkêko muhîm o. Kovara Mizgîn (2004) yew kovara kurdî ya ke tandanse xo dînî yo. Na kovara ke pêsero 74 hûmarê aye vejîyê de nîsbet bi lehçeya kurdî tay bo zî tekstê kirmanckî zî neşr biyê. Mukaddîme (2010) kovara bihakeme ya yewin a ke tede çend meqaleyê kirmanckî zî ameyê weşanayene.

Newepel (2011), perîyodîko diyin û rojnameyo tewr veren o ke safî bi kirmanckî ameyo weşanayene. No rojnameyo ke çarçewaya xebatanê *Komela Ziwan, Huner û Kulturî* (ZIWAN-KOM) de weşanîyayo, pêsero 100 hûmarê ey vejîyayê. Kovara Vateyî ra dima perîyodîko diyin o ke gelek nuşttox, şair û wendoxê kirmankî vetî meydan. Pêserîya nuşteki ya kirmanckî aver berde. Weşanê Newepelî, badê vejîyayîşê hûmara ey ya 100. ame vindarnayene.

5 - Seba ke derheqê kovara Vateyî de hîna zêde zanayîşan bigîrîn, biewnîn nê nuşteyî ra: "J. Îhsan Espar, "Bi Nuşte û Nuşttoxanê Xo Pancas Hûmarê Kovara Vateyî", *Vate: Kovara Kulturî, Hûmare: 50, İstanbul, Payiz 2016, r. 15-30*

Şewçila yewna kovar a ke safî bi kirmanckî yena vetene. Kovarêka edebî ya Wayîr û redaktorê Şewçila Roşan Lezgîn o. Tede bêjanê cîya-cîyayan de gelek eserê edebî weşanîyayê. Perîyodîko hîreyîn û kovara dîyin a ke safî bi kirmanckî vejîyeno. Hetanî nika 16 hûmarê aye neşr bîy.

Welat Verroj (2012) sey îlaweyê rojnameyê Azadiya Welatî ame weşanayene. Safî bi kirmanckî vejîyo. Welat Verroj, kovara Vate û rojnameyê Newepelî dima perîyodîko hîrêyin o ke tede tewr zaf kesan bi kirmanckî nuştî û tewiranê cîya-cîyayan de gelek tekstî weşanîyayê. Rojnameyê Zazakî (2013) yewna rojnameyo ke safî bi kirmanckî weşanê xo kerdo. Yewna taybetîya nê rojnameyî bajarê Çewlîg de vejîyayîşê ey o ke kirmanckî de rojnameyo lokalo verên o. Tede cîya-cîya bejan de gelek tekstê kirmanckî ca gênê. Hûmara xo ya 12. ke 2014 de vejîyaya dima weşanê rojname hetê îdarekaranê ey ra ame vindarnayene.

Yewna rojnameyo ke ca dayo kurdkiya kirmanckî rojnameyê BasNûçe (2014) yo. Zafanê di rîpel ge-ge zî yew rîpelê BasNûçeyî bir kirmanckî neşr bîy. Rojname de zaf kesan nuştî û gelek tekste kirmanckî ameyê weşanayene. Serranê 2000î ra pey çend rojnameyê ke bi hawayo sîstematîk û nîsbeto muhîm de ca dayo kirmanckî estê, BasNûçe înan ra yew o.

Folklorê Kurdan goreyê tesbîtanê ma ra, kovara folklorî ya yewin a ke hetê kurdanê bakurî ra ameya weşanayene. Kovare, hetê Şaredariya Bajarê Girdî yê Dîyarbekirî ra û safî bi kurdki (kurmanckî-kirmanckî) ameyê vetene. Tede nîsbeto zêde de tesktê folklorîkê ke mintiqayanê cîya-cîyayan yê kirmancan ra arê bîyê ca gênê. Muhtewaya xo de hema-hema her bêjê folklorê vatişkî/fekkî ra nimûneyî estê.

Bas, kanûna 2016î de û sey rojnameyo ke sey dewamê BasNûçeyî dest bi weşanê xo kerd. Pêsero 44 hûmarê xo vejîyay û weşanê xo kanûna 2017î de qedîya. Her hûmara rojnameyê Basî de di rîpelî safî bir kirmanckî neşr bîy. Edîtorîya beşê kirmanckî Mutlu Canî kerde. 88 rîpelanê kirmanckîyan yê Basî de 188 tekstê kirmanckî weşanîyay. Bas, rojnameyanê kurdki yê ke serranê 2000î ra dima vejîyay, înan miyan de rojnameyanê îstîsnayîyan yê ke bi hawayo sîstematîk ca dayo kirmanckî ra yew o.⁶

Ancîna nê dewreyî de tayê perîyodîkî estê ke muhtewaya înan de bi hawayo zaf nîsbî; ge-ge zaf tay ge-ge zî tena çend hûmaranê înan de tekstê kirmanckî neşr bîyê. Ma verê nameyanê kovaran rêz bikîn: Pîne (1999), Nûpel (1999), War (1997), Vesta (2004), Bîr (2005), Şemamok (2005), Roja Kurd (2007), Ajda (2007), Kovara Asîva (2011), Veyveka Darêne (2013), Zarokên Roje (2013), Wejê û Rexne (2014), Zarema (2014), Axa Sor (2014), Heftreng (2014), Fername (2014), Kovara Çewlîg (2015), Keskesor (2015), Diyarbakır Bülten (2015),

6 - Seba hîna vêşî melumatan biewnîn: Mutlu Can, "Panoramaya Kirmanckî yê Basî", Bas: Heftnameya Nûçeyî û Şiroveyî, Hejmar: 44, 2017, r. 10

Kovara Derûnnasiyê Psychology Kurdî (2016), Heterotopîa (2015). Rojnameyî zî nê yê: Hawar (2009), Rojev (2009), Roja Welat (2004), Dengê Welat (2007) Bajarname (2014), Rojeva Medya (2016)

2. Tirkîya de Weşangerîya Kitabanê Kirmanckî

Lehçeya kirmanckî bi goreyê lehçeyanê bînan yê kurdkî zaf erey nusîyaya. Naye ra girêdaye kitabo tewr verên o ke bi destê yew kirmanckî nusîyayo 1899 de çap biyo. No kitab, Mewlîdê Kirdkî yê Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) yo ke Dîyarbekir de ginayo çap ro. Xasî bi xo licêyij o û muftîyê Licêyî yo verên o. Şexsî-yetêko kurdperwer o. Ey ra dima kitabo dîyin bi nameyê Osman Efendî Babijî (1852-1929) hetê yewna kirmanckî ra nusîyayo. Kitabê ey Biyîşê Pêxamberî mergê ey ra pey 1933 de Şam de hetê Celadet Elî Bedirxanî ra ameyo çap kerdene. Nê her di kitabê mewlîdan, kirmanckî de kitabê tewr verên ê. Badê nê her di kitaban ma demêkê zaf dergî; hetanî rojnameyê Roja Newe ke 1963yî de Îstanbul de vejîno, rastê metnanê kirmanckîyan nê. Çend kitabê kirmanckî ke serranê 1980yî de Ewropa de vejîne, kitabê verênî yê dewrê modernî teşkîl kenê. La ganî her çîyî ra ver no bêro vatene: Kirmanckî de sewîyeya mîqdarê kitaban ewro goreyê vizêrî tayêna baş biba zî bi goreyê lehçeyanê bînan yê kurdkî zaf kêmi ya. Seke yeno zanayîş qanûno 2932. ke kurdkî qedexê kerdêne, 1991 de wedarîyayîşê ey ra pey verê weşangerîya kurdkî de asteng nêmend. No vurîyayîş kurdkî ser o tesîro pozîtîf keno. La çi Ewropa çi Tirkîya de hetanî serra 2004î tu serre 10 kitabî nêameyê çapkerdene. Di gamê ke zêdebîyayîşê nuştene û weşanayena kitabanê kirmanckî de tesîrê înan gird o, înan ra o verên Grûba Xebate ya Vateyî û kovara Vateyî yê. Weşanîyayîşê kitabe tewr verênî yê kirmanckî ra yanî serra 1899î ra hetanî 1996î 23 kitabê kirmanckî weşanîyabî. La 1996î ra hetanî peynîya 2010î hûmara kitabanê kirmanckîyan yê weşanayeyan 102 o. Û giranîya nuştexan yan zî tadayoxanê nê kitaban kesê ke endamê Grûba Xebate ya Vateyî yê yan zî kesê ke desteg dayo na xabete, înan ra teşkîl bena.⁷ Yewna gama muhîm a ke nusîyayîş û weşanîyayîşê berhemanê kirmanckîyan ser o tesîr kerdo, serra 2005î de destpêkerdişê muzakerayanê endamîya Tirkîya û Yewîya Ewropa (YE) yo. Nê prosesî de, seba ke hetê dewleta Tirkîya ra tayê qedexeyî wedarîyay, nusîyayîş û weşanîyayîşê kirmanckî tenêna (bineyna) aver şî. Sey nimûne, tayê unîversîteyan de abîyayîşê beşanê zîwan û kulturê kurdkî dima, tayê wendekeran nê beşan de reya verêne bi kirmanckî wend. Kirmanckî de serra 1963yî ra hetanî peynîya 2017î 332 kitabê kirmanckî ameyê weşanayene. Nînan ra 250 teneyî Tirkîya de weşanîyayê. Kitabê ke tewr zaf çap biyê, bejê înan şîr a.⁸

7 - J. İhsan Eşpar, Kirmanckîyanın (Zazacanın) Standart Bir Yazı Diline Kavuşması İçin Yapılan Çalışmalar: Vate Çalışma Grubu ve Vate dergisi (Teblixo yew komxebate de ameyo pêşkêşkerdiş)

8 - Mutlu Can, Bibliyografyaya Kirmanckî (Zazakî) [1963-2017], Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, r. 459-460

Tirkîya de weşanxaneyê ke xususen hîna zaf kitabênê kirmankî çap kenê 2 tene yê. Nînan ra o yewin weşanxaneyê Vateyî yo ke serra 2003yî de İstanbul de ronîyayo. Hetanî wextê na xebata ma weşanxaneyê Vateyî ra 75 kitabê kirmankî ameyê weşanayene. O diyin weşanxaneyê Roşna ya ke 2012yî de Dîyarbekir de ronîyayo. Hetanî nika nê weşanxaneyî zî 57 kitabê kirmankî weşanayê. Ancîna sewbîna weşanxaneyê kurdan yê ke Tirkîya de fealiyet kenê, sey vizêrî ewro zî kitabênê kirmankîyan weşanenê.

Kirmanckî de çend kitabê gramerî estê ke baş beno ke merdim tîya de behsê înan zî bikero. Bêjê her di xebatanê verênan bi hawayo zanistî muqayesekerdişê kurmanckî û kirmankî, yê hîrêyinî zî bi kurmanckî musayena kirmankî yo. Ma kunyeyanê înan nêqlê cêrî kenê:

M. Malmîsanij, *Kurmancca Île Karşılaştırmalı Kurmancca (Zazaca) Dilbilgisi*, Vate Yayınevi, İstanbul, 2015.

Seîd Verroj, *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmanckî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetik, Morfolojî (Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmanckî: Dîyalket, Alfa-be û Fonetik, Morfolojî)*, Weşanên Ava, Diyarbakır, 2014.

Roşan Lezgîn, *Ji Bo Kurmancan bi Awayê Muqayeseyî: Gramera Kirdkî (Zazakî)*, Roşna Yayınevi, Diyarbakır, 2013

Peynîye

Tirkîya de nuştîşê kurdkî perîyodîkanê kurdkî de dest pêkerd. Naye ra girêdaye zemînê pêserîya nuşteki ya kirmankî zî kovar û rojnameyê kurdkî bîyî. Nuştîşê kirmankî yo dewro modern bi hawayo sembolîk 1963 de bi rojnameyê Roja Neweyî dest pêkerd. Badê Roja Neweyî kovara Özgürlük Yolu, Roja Welat û Devrimci Demokrat Gençlik zî hîrê perîyodîkê kurdan ê ke verê 1980yî dest bi weşanê xo kerdo û tede tekstê kirmankî neşr bîyê. La seke ma zanê kovara Tîrêjî ke 1979 de vejîyaya, bingeyê edebîyatê na lehçe teşkil kerdo.

Nusîyayîş û weşanayîşê kirmankî de gamêka tewr muhîme ronîyayîşê Grûba Xebate ya Vateyî ya ke xebata standardîzekerdişê na lehçe hema zî domnena. Kovara Vateyî ke 1997 de çarçewaya xebatanê na grûbe de dest bi weşanê xo kerdo, bîyo wasitayê pratîzebîyayîş û vilabîyayîşê kirmankîya standarde û gelek kadroyê kirmankî vetê meydan. Rojnameyê Newepelî ke 2011 de hûmara xo ya yewine vejîya û weşanê xo hetanî hûmara xo ya 100. domnayo yewna perîyodîko muhîm o ke seba na lehçe ehemîyetê xo esto. Her di zî bêjanê xo de perîyodîkê tewr verên yê ke safî bi kirmankî vejîyê. Her di zî çimeyê tewr dewlemendî yê edebîyat û folklorê na lehçe yê.

Ma vînenê ke kesê verên yê ke Tirkîya de bi kirmanckî nuştê, zafê înan endam yan zî terefdarê hereketanê sîyasîyan yê kurdan ê. Nê kesî seba ke nêrê tewqîfkerdiş derbeya 12 êlule 1980yî ver remenê Ewropa û fealiyetanê xo yê nuştekiyan na rey uca domnenê. Tirkîya de weşanayîşê berheman û perîyodîkanê kurdî 1991î ra tepîya serbest veradiyeno. Na serre de wedariyayîşê qanûnê 2932. numreyinî, 2003î de destpêkerdişê muzakerayanê Yewîya Ewropa û Tirkîya û Prosesê Çareserîye ke hetê dewleta Tirkîya ra 2015 de ame qednayene hîrê prosesê muhîm ê ke sey waranê bînan warê weşangerîyanê perîyodîkan û kitabın de pozîsyonê kirmanckî aver berdbî. Goreyê tesbîtanê ma Tirkîya de mabênê serranê 1963-2017 de 39 perîyodîkan de ca dîyayo kirmanckî. Nînan ra 18 teneyî rojname 21 teneyî zî kovar ê. Ancîna hetanî peynîya 2017î Tirkîya de 250 kitabê kirmanckî çap bîyê.

Çimeyî

Ercan Çağlayan, *Zazalar: Tarih, Kültür ve Kimlik*, 3. Baskı, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, Ekim 2018.

J. İhsan Espar, “Bi Nuşte û Nuştexanê Xo Pancas Hûmarê Kovara Vateyî”, *Vate: Kovara Kulturî*, Hûmare: 50, İstanbul, Payîz 2016.

J. İhsan Espar, Kirmanccanın (Zazacanın) Standart Bir Yazı Diline Kavuşması İçin Yapılan Çalışmalar: Vate Çalışma Grubu ve Vate dergisi. (Teblixo yew komxebate de ameyo pêşkêşkerdiş)

Malmîsanij, “İsveç’te Kürtçe Yayınlar”, *Defter Dergisi*, Sayı: 13, İstanbul, Nisan-Mayıs 1990.

Mutlu Can, “Panoramaya Kirmanckî yê Basî”, *Bas: Heftenameya Nûçeyî û Şıroveyî*, Hejmar: 44, 27 Mijdar-03 Kanûn 2017.

Mutlu Can, “Kürtçe Süreli Yayınlarda Kirmancca (Zazaca) Üzerine Bir İzlek (1963-2017)”, *Sözden Yazıya Zazaca*, Editörler: Nurettin Beltekin-Ahmet Kırkan, Weşanxaneyê Peywend, İstanbul, 2019.

Mutlu Can, *Bibliyografyaya Kirmanckî [Zazakî] (1963-2017)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2018.

Tolga Korkut, “UNESCO: 15 Languages Endangered in Turkey”, <http://bianet.org/english/english/112728-unesco-15-languages-endangered-in-turkey>

“Lanetlêhatiyên li Ser Rûyê Erdê Mecbûr in Polîtîk Bin” Hevpeyvîn bi Serday Ay re

Bilal Ata Aktas

Serdar AY kî ye?

Ji herema torê, ji navbera Mêrdîn û Şirnexê ye. Beşa dîrokê ya Zankoya Stembolê kuta kirîye. Mastera xwe li EHESS-Parîsê qedandîye. Teza wî ya dok-torayê li ser dîroka wêjeya kurdîya kurmancî ya li Tirkîyeyê bûye di derdora kovaran ra ku di çileyê 2021an de parastîye li INALCO-Parîsê. Di navbera 2016 û 2018an de, li Pirtûkxaneyaya BULAC-Parîsê berpirsyarê beşa kurdî bûye. Yek ji edîtorên kovara Wêje û Rexneyê ye.

Serdar Ay 11 sal ewil bo xwendina xwe ya bilind ji Bakurê bar kir û hate Parîsê. Di nav van salên xerîbîyê da wî reqs û debdebeyên bajêr jî dîtîn, ketin û xirabîyên wî jî. Vî bajarê ronahîyê ku ji mêj ve bo neferên bindest bûye medrese û stargehek ku timî qibla wê ber bi vegeerê ve ye, ber bi ehd û cehdekê, hêvîyekê ve ye, ji bo kak Serdar jî bûye medrese û stargehek. 3 sal ewil rojekê, em li terasa Inalcoyê rastî hev hatin. Min dît li kêlekê cixara xwe dipêçe, ez çûm balê û min silava xwe dayê. Hevaltîya me wilo dest pê kir. Hê ku corona mal li me xerab nekiribû, rojekê em bi saetan meşîyabûn li sikak û kolanên Parîsê. Ji hingê ve him piştî min diêşe him jî lê şahidîyê dikim ku serê xwe bi mijar û babetên mêtîngerî, edebîyat û bindestîyê diêşîne. Teza wî ya doxtorayê jî îspata vê yekê ye ku piştî demeke dirêj, tevî ked û êmegeke mezin ew xilas kir û bi awayekî serketî çend meh ewil parast.

Îja hem bi minasebeta xilasîya teze, him jî ya dosyeya edebîyata kurdî ya kovara lêkolînên kurdî, me got em ji xwe ra bicivin û li derdora kovargerî û pozîsyo-

na wê ya bindestiyê sohbeteke serbest û serberdayî bikin. Min got madem sohbet serbest e bila pirsên min jî wisa bin û derba ewil çî hate bîra min, min nivîsî. Hê paşê min ji wan çend pirs derxistin û jê ra şandin. Li gor bersivên wî me yê hevdu bidîta û cil û bergêkî xweşik lê bianîya. Lê gava ku Serdêr bersivên xwe li min vegerandin, min dît ku guldesteyek ji teza amade kirîye û ji pirkêtên wekî pasaj, jêrenot û îqtîbasên girîng xanîyekî delal î analîtîk çêkirîye. Lewra min jî biryar da ku xwe hebekî ji tekstê bişom da ku ji hevpeyvînê bêtir bila bişibe formata gotar-hevpeyvînê. Tika ye bila ev nivîs jî wilo were xwendin.

Bilal Ata Aktas: *Keko em pêşî bi teza te û sernava wê ya 2 kîloyî dest pê bikin. Te nave wê danîye “Wêjeya kurdîya kurmançî ya li Tirkîyeyê di navbera rûdan û (ve)keşfkirinê de: Nivîsandina dîroka wêjeyêke têkoşînê bi rêya kovaran re” Çawa ku çavê min pê ket, him kelecaneke hênik li derdora min gerîya him jî jê tirsîyam a rast. Min go ka meriv çawa dikare ji bin vî karî rabe bêyî ku derekê xwe bişkîne. Gelo di qeyda te ya xesarê da çî heye?*

Serdar AY : Ku ji dil bêjim, min çiqasî barê vî karî hilgirt, çiqasî hilnegirt û çiqasî ji min hat ku baş û qenc hilbigirim, nizanim, û ji xwe, bi kêrî min nayê û dirist nabînim ku vêya biwezînim. Lê dikarim bêjim ku min hewl da û sere xwe pê êşand. Lê dîsa jî, ya ku min kir, belkî, bi tenê bû gavek di rêyekê dirêj de. Ji bo min ya girîng peydakirina rêyekê û tê de gavek jî be meşîn bû ku ez dibêmin qey qet nebe min lê tiştêkî wek qerqotê wêjeya kurdîya kurmançî ya Bakur dît. Lewma, ji xesarê bêhtir, sûdewar e ev rê-qerqot ku heta ez hebim, ez ê tê de rêwing bim. Lê dawîya dawî, ez qebûl dikim, wek mirov, em çî bikin jî em dixesirin, dixesirênin.

Nexwe ka ji kerema xwe ji me ra hinek behsa çîroka vê sernavê û teza xwe bike. Tu ji kengê ve serê xwe pê diêşînî, derd û kuleke çawa li te peyda bû ku te berê xwe da kovargerîya kurdî?

Gava min nû dest bi xebata xwe kir di 2013an de, min digot ez ê li ser wêjeya kurdî ya hevçerx bixebitim li Tirkîyeyê di derdora kovaran re. Ji ber ku di dema xebatên xwe yê masterê de derfeta min çêbûbû ku ez girîngîya kovargerîyê hinekî nas bikim. Lewma, serê pêşî, bi vî awayî min dest bi xebata xwe kir. Lê dîv re, min hem di lîtêratûra nivîskî û hem jî di hevdiînên xwe yê sehê de dît ku hin pirsgerêkên bingehîn hene ku ez gêj dikirim û rê nedidane min ku ez bikarim xwe li qadê bi cih bikim û berêkî bidime ber xwe. Mînak, ji bo ku min bikarîba ez heyama nû yê wê wêjeyê baştir binasim divîya min cûdatiyên wê, taybetmendiyên wê yê li gorî heyamên berîya wê jî bizaniba; nûya ku wê anî, teqla ku wê

1 - La littérature kurde kurmandji en Turquie entre émergence et (re)découverte : Écrire, par le biais des revues, l'histoire d'une littérature de combat.

avet, girêka ku wê bi ser xist, yan jî tiştê(n) ku wê dubare kir(in). Ango, xebatên heyî derfeta selmandin û şopandina derz, qûtbûn, vebirrîn û hwd., ên vê wêjeyê nedida min. Lewma min got qerqot, yê vê wêje ye, girîng bû, ji ber ku kême zêde me dizanîbû bê ser, pişt, dest û lingên vê wêjeyê çi ne, lê pirsgirêka gellekî mezin ew bû ku ev hemû bi hev ve nehatibûn girêdan, xwendin û analîz kirin di ser dem û dewranan re. Divîya pêşî qerqotê vê wêjeyê bihata peyda kirin, keşf kirin û yan jî avakirin ji bo ku me bikariba goştê wê baştir vebîçirranda, ruhê wê xweşiktir fahm bikira û qûpeqûpa dilê wê hîs bikira...

Tu behsa kîjan qerqotê dikî gelo? Qerqota kû derê ye ev?

Ka ez bêjime te. Eger gelek zarava, alfabe û êkosistemên li qadên cuda yên zimanê kurdî, yan jî “cureyên zimanî” hebin ku ji hêla Kurdan ve têne peyivîn û ji ber şertên civakî, polîtîk û halê bindest, wêjeyên zaravayên vî zimanî û yan jî qonaxên wêjeya, wêjeyên wî perçeperçebûyî û bi awayekî organîk ne di tekîlyê de bin di demeke dirêj de, wê hingê mirov nikarîbû qala *wêjeyeke kurdî* ya serbixwe bike. Ji lewma, min berê xebata xwe da ser *wêjeya kurdîya kurmançî*, ya li Tirkîyeyê, bo xemên metodolojîk û diyarkirina kontekstekê da ku min bikaribûya xûyangên demî, mekanî û nîfşî yên vê wêjeyê baştir fahm bikira û bişopanda ku girîng in bo nivîsandina dîroka wêjeyekê. Lê dîsa jî, pêwîst e bê gotin ku sînorenê vê wêjeyê jî sînorenê Dewleta tirk derbas dikin. Ku ez li vir bêjim *Hawar* û hatina wê ya Tirkîyeyê di ser torên dîasporîk en Kurdan re ku li Ewropayê dijîn, û Ehmedî Xanî, bawer im ku wê ji min bê fahmkirin bê ez dixwazim çi bibêjim. Ev yek, bi awayekî giştî bi dînamîkên warê (*espace*) kurdî-re têkildar e ku der-sînorî (*transfrontalier*) û transnasîyonal e. Bi ya min be, ji bo ku ev rewş jî xweş û baş bê fahmkirin, divê em ji *derekê* dest pê bikin...

Hezkî berîya wê ez pirseke teknîk ji te bikim. Bera tu cûdahîyeke çawa dixî navbera rojname û kovarê? Yê ku wan ji hev vediqetîne çi ye? Em ji çi ra dibêjin kovar, ji çi ra nabêjin? Niha kême zêde xeteke stûr ketîye navbera her duyan ku meriv bişê wan ji hev cihê bike. Lê dema ku derfetên çapxaneyan kême bûn û kovar, rojname û belavok hima bêje bi heman formatan derdiketin ev cudahî çawa çêdibû? Li ser kaxîzê mîna pirseke hêsan xuya dîke lê carna gava ku meriv dikeve nav arşîvan serê meriv gêj dibe. Gelo te di teza xwe de zehmetîya vêya kişand?

Gava li sehê min hevpeyvînen xwe dikirin û li lîteratûrê heyî dinêrî, min didît ku hin caran rojname wek kovar dihatin binav kirin. Ev ne tiştêkî belesebeb e. Li gorî min, rast e ku rojname kurdî tişibe kovara kurdî. Lê beravajî nabe. Çima?

Gelek sedem hene ku em dikarin qal bikin, lê sedema yekem mesela *zîndîtîya* zimanê kurdî (wek zimanekî standardîzebûyî ku herkes bikaribe pê ji hev fahm bike di warê xwendin, nivîsandin û ragihandinê de) ye ku bi tenê komeke mirovan karîbûya û dikare wî bi dest bixe. Lewma ew ji ragihandine bêhtir, ango ji rojanîyê bêhtir (ku warê rojnamegerîyê ye), zimanê afirandinê ye; afirandina hebûnekê, gelekî ku bêrîya xwe dike, gelekî kerr û lal ku *nikare bipeyîve*, afirandine listikeke jîyanê ku xera bûye, afirandina serhildanên zanyarîyên serkûtîkirî, afirandina kesayetekê ku bikare bêjê « zimanê min divê hebe, da ku ez bikaribim pê ava bikim, xera bikim û ji nû ve ava bikim.. ku newlo be, subjektîvîtêya min wê her bi pirsgirêk be, ji ber ku ez ê ti carî nikaribim ne dîya xwe û ne jî zaroktîya xwe ji bîr bikim... », hetta afirandina zimanê afirandinê ye û hwd. Lewra, hem kovara kurdî û hem jî rojname kurdî ku dişibe kovara kurdî, ji « lezgîniya » rojnamegerîya ku em dizanin, dîr in. Û ji xwe, em dizanin ku kovar xwedî dem û rîtmeke xweser e ku ji « dema dirêj » a pirtûkê jî cuda ye. Lewma, dibêjim ku di nav « êkosîstema » hov û zor a sansûra Dewlete tirk de, kovar şeweyê têkoşîna çand, huner, wêje û zimanê kurdî ye. Je ber ku, qad û yan jî warê kurdî li vê dewletê di rewşa « dê-sivîlîzasyonê » de ye, ango kapasîteya karîna bi rê ve birin û hesap kirina “dem”ê bi kurdî nîne. Ji bo ku paşeroj, niha (ragihandin, rojanî) û pêşeroj (mînak, dema dirêj a pirtûkê) hebin û li wan bê hikim kirin, divê di serî de « demeke » bi kurdî çebîbe ku ev yek li xweza û rîtma kovargerîyê tê; çûnkî her kovar ji dînamîzmekê, sînerjîyekê, mebestêke nû, pêdevîyekê, nêrîneke nû, xîretekê, daxwazekê xwe li ber tiştekî rakirinê diwelide. Ji xwe, di dîroka kovargerîyê da, kevneşopa destpêkirina bi *manîfestoyekê* ve, vê rastîya kovarê pesend dike. Wek ku Georges Sorel digot: « Rojname rojnamegerîyê dikin ; kovar çandê dikin »².

Te behsa sînoren wêjeyê dikir...

Belê. Bi demê re, min dît ku ev wêje jî xwedî taybetmendiyên wiha bû ku li gorî min derfeta nivîsandina dîroka wê dixistine çirraveke zor û zehmet de û belkî ji ser rûyên wan bû ku hê dîroka wêjeya kurdîya kurmancî ya li Tirkîyeyê nehatibû nivîsandin. Çi bûn ev taybetmendî ku bêguman bi sansûra li dijî Kurdan a Dewleta tirk re alaqedar bûn? Sansûr ku asîmîlasyon, înkâr, zimankujî, bîrkujî, arşîvkujî û hwd., bû. Ev bûn taybetmendiyên sereke: Rewşa parçeparçebûyî, neberbelav³ û yan jî pîrr hindik berbelav, û rûdanên merheleyeke dubare-

2 - Leymarie, Michel, « Introduction », Michel Leymarie et Jean-Yves Mollier (dir.), *La Belle Epoque des Revues 1884-1914*, Paris, Edition De L'IMEC, 2002, r. 11.

3 - Lê li vir dive bê dîyar kirin ku ev halê perçeperbûyî, bêberdewamî yê warê kurdî ku tişt lê ne berbelav in û yan jî bi awayekî pîrr hindik berbelav in, bi tenê wek « tespîtekê » hatiye bilêv kirin ji hêla van kesên li jêrê ve. Ango, bi awayekî civakî-dîrokî, wan geşedana fenomenên vî halî destnîşan nekirine, neşopandine di qadeke kurdî da û bi vî awayî li ser nexebitîne. Vali, Abbas, « The Kurds and Their “Others”: Fragmented Identity and Fragmented Politics », *Comparative Studies of South Asia, Africa and the Middle East*, n°18 (2), 1 August 1998, rr. 82-95 ; Ahmedzade, Hasim, *Ulus ve Roman, Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma*, İstanbul, Perî Yayınları, 2004 ; Alan,

kirî ya embrîyoner bi awayekî Sîsîfosî. Lewra, mesela temporalîteyê, demê dibû pîrsgirêk ku helâ dîyakronîk dikire teşqelêyê de, û ji ber vê yekê dîroka vê wêjeyê; dîroka wêjeyêkê bê vê hêlê nabe. Bi awayekî din, wek ku min berî niha jî gotibû, em dikarin vê rewşê wek rewşeke di “dê-sîvîlîzasiyon”ê de bûyîn jî bi nav bikin ku Hamit Bozarslan vê yekê, di çarçoveyê de, wek bêkapasîtebûna karîna birêvebirin û hesapkirina “dem”ê pênase dike. Ango, gava em ji “dem”ê bêbawerî bûbin û yan jî, jê hatibin bêbawerîkirin, û ji ber vê yekê, gava em nikaribin li paşerojê bifikirin, li nihayê hikim bikin û xwe li pêşerojê tesewir bikin û lewra nema karibin di wêr da bilivin bê tirs û bê bînavberî wek xweyê takekesî, pevrâyî û lewma gerdûnî⁴.

Li hemberî vî halê wêjeya kurdîya kurmançî ya li Tirkîyeyê û di hewldana nivîsandina dîroka wê de, rêya min keta ser *Kovarê* wek çavkanîya sereke. Li gorî min ew îmkana nivîsandina dîroka vê wêjeyê bû...

Çima? Ji ber ku berî her tiştî, divê ez bêjim ku ev rûdanên merheleyê dubarekirî ya embrîyoner a vê wêjeyê di kovaran de pêk hatibûn, heya salên 2000’an. Dîsa, di qada kurdî ya bindest û ji hêla sazûmanî ve qels da, kovara kurdî wek forma têkoşer û yan jî hewldana mayîna li ser pîya ya çand, wêje û zimanê kurdî xûya dibe di “êkosîstema” hov û zor a sansûra Dewleta tirk de. Gava em baş dêhn û bala xwe didine kovara kurdî, em dibînin ku kovara kurdî wek dibistana nivîskarê kurdî, enstîtusyona şîn û yan jî hezina filolojîk, hosîname û yan jî wesîyetnameya netewî, qada bûyîn û jîna wêjeyî, binyad û kevirê anîşkê yê dîroka wêjeya kurdîya kurmançî dîyar dibe⁵. Ew çavkanîya sereke ya dîroka vê wêjeyê ye ku bi awayekî peryodîk dîroka wê lê hatîye nivîsandin.

Herwiha, wek objeyeke lêkolînê, di litêratûrê de, kovar bi hin taybetmediyên ve xwe gellekî girîng dibû bo hewldana nivîsandina dîroka vê wêjeyê ku min qal kir bê ma çima ewqasî zor dibû. Her kovar derek e ku dibe derdor, û lewra tor. Şahidîyek e ku gelek şahidên wê hene, ji ber ku her kovar xwe bi zanebûn li ber tiştêkî radike di demekê de û yan jî di deman de. Fenomeneke civakî ye ku dewrdarîyê pêkan dike. Ev yek girîng e, ji ber ku derfeta şopandina pêwendîya nav-nifşî pêkan dike. Laboratuar an jî atolyaya fesilandina hin raman, helwest û daxwazan e, lewma laboratuara ceribandinan e ku tişt bi wan dicebirin. Kovar

Remezani, « Careke Din “Edebîyata Netewî” », *Bendname, li ser rûhê edebîyatekê*, Istanbul, Avesta, 2009, rr. 115-123 ; Amida, Irfan, *Qonaxê Modernîzma kurdî helbesta Tirêjê*, Amed (Diyarbakir), Lis, 2016.

4 - Bozarslan, Hamit, *Crise, violence, dé-civilisation*, Paris, CNRS éditions, 2019.

5 - Li gel vê girîngîya mezin a kovara kurdî, tê ditîn ku ew wek objeyeke xebatê, lêkolînê hê bi cih nebûye û nehatiye çandin di xaka lêkolînê kurdî de. Lê divê bê gotin ku her çî qasî bi awayekî gellekî kurt û biçûk jî be, çend kesan bal kişandiya ser hin hêlên kovargerîya kurdî : Gorgas, Tejel Jordi, *Le mouvement national kurde de Turquie en exil* *continuités et discontinuités du nationalisme kurde sous le mandat français en Syrie et au Liban (1925-1946)*, Paris, Teza doktorayê, EHESS-Paris, 2004, rr. 262-265 ; Scalbert-Yücel, Clémence, *Engagement, langue et littérature, Le Champs littéraire kurde en Turquie (1980-2000)*, Paris, Editions Petra, 2014, rr. 282-285 ; Seydo, Ibrahim Aydoğan, « Littérature par la presse », *Yod [En ligne]*, 17 | 2012, mis en ligne le 27 octobre 2012, consulté le 09 juin 2015. URL : <http://yod.revues.org/1578> ; DOI : 10.4000/yod.1578 ; Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebîyata Kurdî*, Oz-ge, Ankara, 1992, r. 23.

dîyalogekeke bi demê ra ye û lewma dîyalogekeke bi der û derdorên demê ra ye jî. Ji ber ku kovar ji dînamîzmekê, sînerjîyekê, mebesteke nû, pêdivîyekê, nêrîneke nû, xîreteke, daxwazekê xwe li ber tişteki rakirinê diwelide, em dikarin bêjin her kovar mudaxileyek û bi awayekî ji awayan hewldana vekirina cihokeke cihê ye jî (pirranîya caran, li hemberî bawerî û qeneatên serdest. Ev yek, di xakên bindest da, dibe berxwedan û serhildana li dijî hegemonyaya zimanî, çandî û hûnerî) ku ev yek di dîroka kovargerîyê da yek ji taybetmendiyên sereke ya kovarê ye ku sedema hebûna wê qayîm dike.

Wek ku hate gotin, her kovar derek e ku jê derdorek diwelide, û lewra toreke e ku di dîyakronî û senkronîyê de, ew têkildarî hin derdorên din e. Ev rewşa têkildarîyê, ne bi tenê deqî ye û yan jî tekstuel e, ew mirovî (civakî, hevaltî, sîyasî, bîrdozî, aborî û hwd.) ye jî. Ango kovarek hem derek û derdoreke tekstuel e û hem jî derek û derdoreke mirovî ye ku bi gelek der û derdorên din re jî di têkilîyê(yan) de ye. Lewra, mirov dikare bêje ku her kovar der û derdorek e ku li dora wê gelek têkilîyên tekstî, mirovî têne hunandin. Lewma, her kovar gelek girêk e di toreke xwedî gelek teybetmendî ya qadekê de. Di vê çarçoveyê de, kovar wê derfetê dide ku em wê di berdewamîya dîroka dema qadekê da bi cih bikin. Berepaşki û berepêşki, em dikarin çibûn û çawabûna kovarekê bişopînin di demekê de, di berdewamîya demekê de. Ango, ew derfeteke pîrhêl e ku dibetîya naskirina berdewamîya (çandî, hunerî, zimanî, wêjeyî, sîyasî û hwd.) qadekê pêkan dike û di vê berdewamîyê de, derfeta selmandin û şopandina derz, qûtûbûn, vebirîn û hwd. jî çêdike. Bi vî awayî ew wekî avahîyê, binyadeke mînor wê îmkanê dide me ku em bi çavekî din ê mîkroskopîk li dîrok û çandê binihêrin ku ev yek bêhtir ji bo qadên bindest û “pêrîfêrik” derbasdar e. Lewra li van qadan, hêla sazûmanî, an jî em bêjin enstîtusiyonel qels e ji ber kiryarên desthilatên hêjemonîk û despotîk.

Ji xwe wek ku me qal kir, ku qada kurdî qadeke parçeparçebûyî be û tişt tê de ne berbelav bin, anga di çirrava bêberdewamîyê de teqînî mayî be, li vir tekane rê ew e ku em wê di mala wê de, di kovarê de bişopînin. Ku me bi vî awayî kir, em ê bibînin ku li gel bêberdewamîyê, di vê bêberdewamîyê de hin cure berdewamî hene. Herwiha, em ê bibînin ku dîrokeke xef, veşartî a vê wêjeyê heye ku ne li ser milên nav, berhem û formên wêjeyî yên “gudgude” bûye. Lewma, pîrr girîng e ku berevajî cîrnexweşîya ortodoksîya akademîk a serhişk û nêrîna pozbilind a ku bi kêrî fêtişîzekirina nivîs û nivîskarîyê tê, em ê bi vî awayî bikaribin hewl bidin berê xwe bidine “dîrokeke din” a *lanetlêhatîyên li ser rûyê erdê*, ku mecbûr in polîtîk bin, ji ber ku zimanê ya/yê mexdûr nîne, ku hebe, bi pirranî dibe zimanê dikirandina mexdûrîya xwe. Li warekî bindest, zimanê bedewîyê bi têkoşînê pêkan dibe. Ji ber vê yekê, em ê bibînin ku dîroka vê wêjeyê dîroka tevlihevûna hibr û xwînê ye, û ziman, wêje û sîyaset (neteweyî) dibine ziman-wêje-sîyaset. Herwiha, wê bê

fahmkirin ku bê qonaxên sîyaseta Kurdan, aktor û tevgerên wan, em ê nikaribin qenc û baş ji vê dîrokê fahm bikin.

Balkişandina te ya li ser senkronîzasyonê girîng e, dê pirseke min î wilo jî hebe hê paşê. Lê berîya wê ez dixwazim em hinekî din jî behsa qonax û aktorên kovargerîyê bikin. Tu çîroka kovargerîya kurdî ji kû didî destpêkirin û kategorîzasyonêke çawa didî ber xwe? Li gor dem û naverokê, ruhê kovargerîya kurdî çawa herikîye, xalên werçerxê kîjan in?

Dîroka kovargerîya kurdî bi *Rojî Kurd* (1913, Stembol) dest pê kirîye di bin banê *Kürt Talebe Hêvî Cemîyeti* de. Dema derketina kovarê girîng e. Di çarem kongreya *Ittihat ve Terraki Cemîyeti* de ku li Selanîkê pêk hatibû di sala 1911a de, her sê bavên Tirkîtiyê, Zîya Gökalp, Yusuf Akçura û İsmail Gaspıralı, bo komîteya navendî hatine hilbijartin. Ev yek dide dest nîşankirin ku êdî Tirkîti bûye xeta sereke ya *Ittihat ve Terraki Cemîyeti*. Piştî vê yekê, em dibînin ku di cih de Komala *Türk Yurdu* tê avakirin di heman salê de û kovarekê bi heman navî derdikeve. Ev kovar, bi awayekî eşkere xwe wek têkane kovara nasyonalîzma tirkîtiyê bi nav dike. Ev yek dike ku gelên din ên misilman ên Imparetoriyê jî bilivin. Mînak, Yusuf Akçura dibêje ku Ereban « Ahali'ul Arabi » û Kurdan « Hivi » (Hêvî) ava kirin bo pêk anîna armancên neteweyî. Qedri Cemîl Paşa (Zinar Silopî) jî vê yeke têne zimên⁶. Di demeke wiha de, derketina yekem kovara kurdî û wek formekê rûdana kovarê gellekî watedar e. Disa, em dizanin ku kovarake ermenî jî derdikeve bi navê *Mehyan* di 1914an de li Stembolê ku gelekî li ser nasyonalîzasyona estetîk disekine di derdora zimên û wêjeyê re⁷. Lewra, em dikarin bêjin ku gava ramana netewesazîyê derketiye pêş bi awayekî sîyasî, kovaran rû dan li Stembola osmanî û bûne mutbex ku lê xwarin û vexwarina netewesazîperestan dihate çêkirin û amade kirin. Ji bo netewesazîperestên osmanî ên wek Kurdan ku ji hêza dewletê ya sazûmanî bêpar bûn, kovar gellekî bêhtir girîng dibû. Herwiha, di vê dewra dawî ya osmanî de, Kovara *Jîn* (1918, Stembol) jî girîng e bo netewesazîya kurdî ku di bin banê *Kürdistan Teali Cemîyeti* (1918) de derdiçû. Ew der û derdoreke aktorên kurd bû ku li hemberî «têzên zanistî» yên tirkîtiyê derdiketin ku di derbarê Kurdan de dihatin nivîsîn û bi lêv kirin, û hewl didan hebûna neteweyî îspat û saz bikin bi rêya dîrok, ziman, wêje, folklorê. Ji *Rojî Kurd*'ê heta *Jîn*'ê, Tekstên wêjeyî yên kurdî di bin bandora hewayaya sîyasî ya demê de dihatine nivîsin, pejirandin û weşandin ku rasterast bi kêrî netewesazîya kurdî dihatin.

6 - Koma Xebatên Kurdoljîyê, *Di Sedsalîya Wê de Rojî Kurd 1913*, Istanbul, Weşanxaneya Institutuya Kurdî ya Stembolê, 2013, r. 41-42.

7 - Nicholson, Marc, *Entre l'art et le témoignage. Littératures arméniennes au XXe siècle, vol. II. La Philologie du Deuil*, Geneve, Metis Presses, 2007.

Dûv re, ku em ji hêla Kurdên bakurî ve meyzênin, qonaxa *Hawar*'ê heye. Piştî avakirina Dewleta tirk, pirranîya aktorên kurd mecbûr man ku derbikevin ku gellek ji wan çûne Sûrîyeyê ku wê demê di bin mandaya fransî de bû (heta 1946an). Li wir Xoybûn (1927-1933) avakirin ku gaveke mezin e di dîroka netewesazîya Kurdistan de. Xoybûn serhildana Agirî (de 1927 à 1930) organîze û kumande dike. Lê serhildan bi ser nakeve û tê dîtîn ku gel ji hişmendîya neteweyî dût e û mobîlîze nebûye ji bo doza neteweyî. Lewma, ji stratejî û nêzîkatîya xwe ya di derbarê netewesazîyê de guman kirin ku kokên wê diçûne heta destpêka sedasala 20an. Dîtîn ku bi zorê nema dikarin vê dozê hilgirin. Ji ber ku hem gel ne li pişt wan bû û hem ji hêzên neteweyî ên tirk, faris, ereb û berjewendîyên fransî û brîtanî nema rê didane wan. Lewma asoyeke din dane ber xwe ku *Hawar* bû der, derdor û tora wê.

Hawar hewarek e ku hebûna felaketekê destnîşan dike û dizane ku « Hawar hebe gazî li dû ye »⁸. Bi vî awayî, em fahm dikin bê ma çima xencera Celadet gazinan jê dike⁹. Navika vê asoyê ziman e ku wek bingehê « kurdanîya bîrewer » tê destnîşankirin ku « bi Xanî re dest pê dike », ji ber ku, wî « gîyanê wî afirandibû »¹⁰. Ev yek girîng e ku bandora herderîyen (Herder) dîyar dike. Bi vî awayî, wek zimanê gel û çavkanî, ruh û kakilê gel, kurdî (kurmançî) û lewma folklor dibê armanca sereke ya *Hawarê* : bo ku gel neteweyî bibe li ser zimanê gelî sekinîn ku çavkanîya wî ye, lewma folklor ku mîrata zimên e. Ji ber vê yekê, ziman û folklor dibine armancên sereke yê kovarê ku neteweyîkirina wan tê kirin. Ji ber ku ev folklor, lewma ziman, ne neteweyî bûn, divîya bihatana neteweyîkirin bi zimanê nivîskî. Ha li vira girîngîya wêjeyê derdikeve holê: berhemên folklorîk huner in ku divîya dîsa bi hunerê (zimanê nivîskî, wêje) bihatana neteweyîkirin. Lewma, wêje dibû amûra sereke ya neteweyîkirina folklorê; ew dibû amûr û dîka vê yekê. Ev yek dikare bi me bide gotin ku *Hawar* li ser bingehêkî nasyonâlîzasyonêke êstetîk ava bûye.

Dîsa *Hawar*, dîyem kêlîka avaker a *wêjeya kurdîya kurmançî* ye ku xwe li ser tradîsiyona Xanî ava dike ku li gorî wê, ew « pêxemberê ola neteweyî û nija-dî yê Kurdistan e »¹¹. Duyem kêlîk e, ji ber ku ew bi xwe dibêje ku Xanî yê yekem, pêxember e (Lewma ez di xebata xwe de, bi awayekî dîvîrêj li ser van herdû *bavên* vê wêjeyê disekinim ku hebûna wê bi wan e û di dilê dîroka wê de ne), ku alfabe û gramera zimanê kurdîya kurmançî ava dike ku dibê model. Bilêvkirina

8 - Kedrîcan, « Hawar hebe, Gazî li dû ye », *Hawar*, Şam, Çapxana Terekî, n°1, 1932, r. 5 (Dîyarbakır, Belkî, 2012, r. 14-15).

9 - Bedir-Xan, Celadet, « Gazinda Xencera Min », *Hawar*, Şam, Çapxana Terekî, n°12, 1932, (Stockholm, Weşanên Nûdem, 1998, c. 1, r. 519-520).

10 - Nivîsanoqa Hawarê, « Heyîneqe Yeqsalî », *Hawar*, Şam, Çapxana Terekî, n°20, 1933, rr. 1-3 (Dîyarbakır, Belkî, 2012, rr 314-316).

11 - Herekol Azizan, « Klasîkên Me, An şahir û edîbên me ên kevin », *Hawar*, Şam, Çapxana Sebatê, n°33, 1941, rr. 6-14 (Dîyarbakır, Belkî, 2012, rr. 558-565).

«kurmancî», piştî hejmara 27a xwe dide der û gellekî xûya dibe ji bedêla « kurdî » ve¹². Ji ber ku şert û mercên siyasî, û zora hêzên heremî rê nedane pêwendîya Celadet, Hecîyê Cindî û Tewfîq Wehbî ku hewl didan di pêwendîyê de bin bo mesela yekîtiya zimanê kurdî û alfabe-yê. Ji xwe di heman demê de *Gelawêj* (1939-1949) derketîye êdî ku bi kurdîya soranî ya bi alfaba erebî ye, û heya Celadet ji vê yekê heye, ku xwe bi awayekî kubar pê ne xweş dike û dikeribe¹³.

Salên 60î girîng in ku em li der û dora rojname û kovarên wek *Ileri Yurt* (1958, Diyarbakır), *Dicle-Fırat* (1962, İstanbul), *Deng* (1963, İstanbul), *Yeni Akış* û hwd., re dibînin ku yekem gavên wêjeya kurdîya kurmancî têne avêtin li Tirkîyeyê ku di nav hereketa Rojhilatîti (*Doğuculuk*) de û pê re bûne. Ji ber şertên sansûrê, mesela kurdî û kurdan li Tirkîyeyê di bin « Rojhilatîti »yê de, di derdora « pêşketin »ê (*kalkınma*) re, dihate nîqaşkirin. Li gorî vê hereketê ku bêhtir xwe di çapemenîyê de çêkirîye, Rojhilat bi zanebûn û bi hemdê dewletê li paş hatîye hiştin û lewma pêşneketî ye. Ev hereket dibêje ku ziman, çand û folklorê Rojhilatîyan jî mijarên girîng in di mesela pêşketina Rojhilêt de. Ji ber ku ew wan wek hêlên « manevî » ên lipaşiştina Rojhilêt pênase dike; eger Rojhilat bi pêş bikeve, ew jî divê bêne hesibandin, bê wan nabe. Ango, li dijî nêrîna serdest ya ku bêhtir li ser aborîyê disekîni di derdora pêşketinê re, wan hewl dida hêlên « manevî » yê meselê destnîşan bikin. Yekem gavên ku hatine avêtin di warê wêjeyê de, di bin bandora vê hereketê de mane ku tîmayên *rojhilatî* yên wek feqîrî, bertîl, cendirme, cahilî, jin, paşvema-yîna Rojhilêt û hwd., hatine bikaranîn. Dîsa, divê bê gotin ku ya ku hiştîye ku ev hereket bi awayekî berbiçav dest pê bike, helbestek e: *Kimil'a Musa Anter* (1959, *Ileri Yurt*).

Salên 70yî, ku hêdî hêdî qada kurdî ya polîtîk çêdibû û siyaseta kurdî ber bi xweserîyekê ve diçû, aktorekî bi bandor û karîzmatîk tî xuyakirin ku Dr. Şivan e (Sait Kırmızıtoprak, 1935 Dersîm). Yê ku yekem car pîrsgirêka kurdî ya li Tirkîyeyê pênase dike di derdaro antîkolonîyalîzm û dîkîlonîyalîzmê re, ew e. Dr. Şivan, li ser bingîhê asîmîlasyon û înkare, pîrsgirêka kurdî wek « nakokîya neteweyî ya hundirîn li welatên kê-m-pêşketî » bi nav dikir. Li gorî wî, di nav formên zilm, serdestî û mêtîngêhkarîyê de, forma herî hov û barbar asîmîlasyon e¹⁴. Lewma, mesela zimên û çanda kurdî dibû navîka pîrsgirêka kurdî ku wî ziman wek hebûna netewî û bingîhê xwe li hemberî asîmîlasyonê (ya ku ew pênase dike) rakirin, didît di çarçoveyêke marksîst-stalînîst de¹⁵. Kirpandina girîngîya zimanê kurdî bi vî awayî hin tiştên di navbera Kurd û Tirkên çepgir de jî ji kel

12 - Xwedîyê Hawarê, « Sê Tarîxên Hawarê », *Hawar*, Şam, Çapxana Sebâtê, n°27, 1941, (Diyarbakır, Belkî, 2012, r. 449-50).

13 - « Neşreyên Kurdî, Gelawêj », *Hawar*, Şam, Çapxana Sebâtê, n°27, 1941 (Diyarbakır, Belkî, 2012, r. 453-454).

14 - Büyükkaya, Şerwan, İlk Anlatım, Stockholm, Tryckt hos Författares Bokmaskin, 2004 ; Arık, Ali Selahatin, *Dr. Şivan (Dr. Sait Kırmızıtoprak)*, İstanbul, İsmail Besikçi Vakfı Yayınları, 2015,

15 - Yekem kesê ku bi dengê bilind alfabe û gramera *Hawarê* pêşnîyar dikir ji bo hemû Kurdan ew bû li Tirkîyeyê

didada hejandin. Ji ber ku wek ku Ismail Besikçi digot, peyîvîna bi kurdî û karûbarên kurdayetîyê di nav kismekî mezin ê çepgirîya tirk de bi şovenîzmê dihatine tawanbarkirin. Lewma, şoreşgerên kurd newerîbûn bi kurdî û kurdayetîyê re têkildar bibin bo ku peşk li *enternasyonalîstîbûna* wan nekeve. Beşikçi dibêje ku di navbera salên 60 û 70yî de, ev damar gellekî xurt bû li cem Kurdên Tirkîyeyê¹⁶.

Der û dorên ku di bin bandora Dr. Şivan de mabûn, gellekî girîngî didane xabatên zimanî, çandî û hunerî yên bi kurdî. DDKD/KIP (*Devrimci Demokratik Kültür Dernekleri / Kurdistan İşçi Partisi*) rêxistina herî berbiçav e ku daye ser rêya wî ku *Tîrêj* derxistîye (1979, İzmir), yekem kovara ku xwerû bi kurdî derketîye ew e (kurmançî û kirmançî/zazakî) li Tirkîyeyê. Cara yekem e ku kovarek bi vî awayî derdikeve ku gellekî li ser zimên disekine. Ew doza zimên û neteweyî wek heman dozê bi nav dike li hemberî « kolonîzatoran ». Têkoşîna bidesxistina zimanê xwe û krîza vê yekê tê xuyakirin di vê kovarê de ku ev yek dihêle ku em li ser van pirsan bipojînin: li welatên bindest ziman çî ye? Bindest çawa *dikarin bipêyîvin*? Dîsa, berhemên wêjeyî yê kovarê ku cihêkî mezin digirin, yekser li ser xeta réalîzma sosyalîst in; ango forma neteweyî, naveroka sosyalîst.

Salên 90î, bi sistbûna qedexeyên li ser zimanê kurdî û xuyabûna PKK re (di awarê çandî, hûnerî û sazûmanî de), heyameke nû dest pê dike : Navenda Çanda Mezopotamya ava dibe ku li gel gellek kar û barên çandî, hûnerî û zimanî, kovara *Rewşen*'ê jî derdixe di sala 1992ya de ku li ser xeta PKK ye. Helwesta wê alîkarîkirina avakirin û çêkirina « Mirovê nû » yê kurd e bi awayekî çandî, hûnerî û wêjeyî. Li gorî PKK, ev « Mirovê nû » yê kurd, ancex dikare di şer de û bi şer re, bi zorê werê afirandin ku ev têngiştin pirr dişibe xêta îdeolojîk a Frantz Fanon ku *Rewşen* qala wî dike di derbarê « dîrok û zor »ê de¹⁷. Ji ber ku eger kurd kolonîze bûbûn, ev tê wê wateyê ku ew bi xwe jî hemtawanên kolonîzêbûyîna xwe ne. Lewra, bo afirandina « Mirovê nû » yê kurd, divê zor hem berê xwe bide ser Kurdê kolonîzêbûyî û hem jî kolonîzatoran. Tam di vê çarçovê de, helbest, çîrok û pîyesên şanoyê yên *Rewşen*'ê dikevîne pey afirandina vî « Mirovê nû » yê kurd. Ew dibîne dika şer ku lê « sosyolojîya Kurdan » diguhere (bi pirranî li gundan).

Di 1996an de, *Jiyana Rewşen* derdikeve wek xwîşka *Rewşen*'ê ku dikevê cihê wê. Li gorî min, derketina vê kovarê destpêkeka nû a hereketêke zimanî-wêjeyî ye ku nîfşek tê de digihe, « nîfşê Rewşenê », ku li pey çêkirina « demeke kurdî » ye ku berdewamîyekê zêft dike. Îro li Tirkîyeyê, qada wêjeya kurdîya kurmançî hê jî bi pirranî li ser piştê vî nîfşî ye ku hê nîfşekî di ew li pey xwe nehiştîye. *Jiyana Rewşen* behsa « wêjeyeke nû » dike ku divê li ser dû stûnan rûne: wêjeya kurdî (ku divê bê naskirin û keşfkirin) û wêjeya cîhanê (ku divê bê wergerandin). Dîsa, ji bo vê yekê, Pêşbazî û Şevbuhêrkên wêjeyî pêk tên. Kovar, qala « nivîskarîya

16 - Beşikçi, Ismail, Çend Gotin li ser Ronakbîrên Kurd, Stockholm, Weşanên Rewşen, 1992 [1991], rr. 14-19, 27.

17 - Rewşen, « Dîrok û Zor », *Rewşen*, Istanbul, NÇM, n°13, 1992, r. 17.

profesyonel » dike û xwe bi patronajê nexweş dike. Ev yek girîng e, ji ber ku ev cara yekem e ku di dîroka wêjeya kurdîya kurmançî de, kovareke kurdî, Kurdan, hewl dide ji rîtmîya sîyasî derbikeve (ne ya neteweyî). Ji lewma ye ku kovar nabe der û derdora wêjeyê yekreng. Berevajî, em dibînin ku hin *langajên* wêjeyî xwe didine der di derdora hin tîmîyan re: zîman (Kawa Nemir), kavil-cin (Osman Mehmed), êş (Rênas Jîyan), cihûwar (Dilawer Zeraq) û hwd. Herwiha, li gorî vî nîfşî « rizgarkirina hiş ji mêtîngerîyê » bi zîman dibe. *Jiyana Rewşen*, di gellek hejmarên xwe de li ser vê babetê disekine.

Wek ku min got ev nîfşî berdewamîyekê zêft dike ku ev yek girîng e. *Rewşen-Name* (2003) dikeve cihê *Jiyana Rewşen*'ê. Kovarên ku li Kurdistanê derdiketin jî xwe li ser rêya vî nîfşî rêwîng dihesibandin. Mesele, Kovara *Kulîlka Cîwan* (2003, Amed), *Rewşen* û *Jiyana Rewşen* wek « qiblegeh » û « zanîngeha » xwe bi nav dikir ku dûv re tevî *Kovara W* (2004, Amed) bû, ku wê jî dida ser rêya « Rewşenan ». Ji xwe gelek jî avakerên wê jî « Rewşenan » bûn. Heta van herdu kovaran, kovarên kurdî li Kurdistanê dernediketin, nikarîbûn derbikevin ji ber şert û mercên sîyaseta despotîk a Dewleta tirk¹⁸. Lewma ev yek jî girîng e ku destpêkeke din destnîşan dike.

Jiyana Rewşen, *Rewşen-Name*, *Kevan* (2002) û *Pelîn* (1999) girîng in di mesela patronajê de; lewma, di mesela gera li otonomîyê de. Dîsa em dibînin ku nivîskarên kurdî yên li Swêdê, xwe di ser kovarên demê re (bi taybetî *Pelîn* û *Gulîstan*, 2002) re digihênine qada wêjeya kurdîya kurmançî ya li Tirkîyeyê; lê tabî, berê jî çend pirtûkên wan çap bûbûn û car caran di kovarên din de jî xûya dibûn (bêhtir piştî 98an). Ev jî girîng e ku destnîşan dike ku êdî nîfşên vê wêjeyê yên li qadên cuda ketine têkilîyê xurttir de. *Nûbihar* (1992) girîng e ku xwedî hin taybetmendîyên cuda ye li gorî kovarên din ku ji hêla sosyolojîya wêjeyê ve balkêş dibe. Herwiha, *Zend* (1996) jî kovareke girîng e ku ez dikarim bêjim ku yekem kovara kurdî li Tirkîyeyê ku xwe di warêkî bi tenê de bicihkirîye û bi pirranî li ser vî warî mayîye : warê lêkolîn û xwendinên zîmanî.

Di konteksta salên 2000an de, em dibînin ku guherînên sîyasî yên kurd û tirk bandorê li ser qada derfetên wêjeya kurdîya kurmançî jî dikin. Edî nivîskarên li kovaran dibine nivîskarên pirtûkan. Weşanxane ava dibin. Miratên û nivîskarên wêjeya kurdîya kurmançî yên li qadên cuda hêdî hêdî dikevine pêvajoya pêwendîyê de. Ji ber ku sîyaseta kurdî şaredarîyên gellek bajar û bajarêkên Kurdan bi dest dixê, gellek çalakîyên çandî û hûnerî ên wek festîval û rojên wêjeyî pêk tên ku ev yek bandoreke pirr erênî li dînamîkên qada wêjeya kurdîya kurmançî dike û alîkarîya bicihbûna wê ya li Kurdistanê dike ku Amed dibe yek ji navêndên

18 - Divê bê gotin ku berîya van kovaran du fanzînen kurdî jî derketibûn ku yek ji wan heya 2004aN maye : *Kulîlk* (2002, du hejmar) ku dûv re veguherî *Kulîlka Cîwan* û Çirûsk (ya pêşî) ku 4 hejmarên wê derketin li Elezîz'ê di navbera 2002 û 2004a de.

giringtirîn yên çand û hunera kurdî. Di vê kontekstê de, em dikarin qala « ronesansa kurdî » bikin ku li gorî min, wêjeya kurdîya kurmançî ji *merheleyeke dubarekirî ya embrîyoner* derbasî merheleyeke (*ve*)*keşfkirinê* dibe ku lê pêvajoyeke xwenasîn, li xwe fikirîn, xwe bi nav kirin, xwe bi cih kirin, xwe birewer kirin, xwe têr kirinê û hwd., dest pê dike ku heta wek îro jî berdewam e. Ji lewma, wê bêhtir mesela otonomîyê bi lêv kir, bêhtir xwest xwe li asoyên nû biqelibêne.

Di heyameke wiha de ku bi nûyan ducanî bû, figurekî girîng xuya dibe: Rênas Jîyan. Li gorî min ku ez di xebata xwe de dîvdîrêj li ser disekinim, di mesela otonomîxwazîyê de, ew navê herî girîng e di vê heyamê de ku gava herî mezin avêtîyê. Yê ku hem di kiryarên xwe de û hem jî di nivîsên xwe de ev yek bêhtir ji xwe re kirîye derd û serê xwe pê re êşandîye ew e¹⁹. Lewma, Çirûsk'a wî vîrajeke gellekî girîng e di dîroka wêjeya kurdîya kurmançî ya li Tirkîyeyê de. Ji ber ku dîrektorê wê li ser mesela otonomîyê hesas e, em dibînin ku bêhna azadîyekê ji nav rûpelên kovarê difûre. Argo, erotîzm, homoseksûelî, zayendîtî û gellek tiştên bi vî awayî di Çirûsk'ê de berbiçav dibin ku em di dîroka kovarên kurdî de nabînin. Dîsa, cara yekem kovareke kurdî dibe hevîrtirşê nanê xetêke hûnerî û ramanî: çirûskîzm. Heta Çirûsk'ê, kovargerîya kurdî wek blokeke ku bi awayekî giştî – bê herk, hereket û êkol – ji bo parastin û bipêşvebirina çand, hûner û zimanê kurdî ye, tê xuyakirin.

Piştî vê kovarê, ku li gorî min ya ku hişt ku ev kovar jî bi dawî bibe, derketina kovarên nû ye ku berê xwe fereh nakin wek kovarên berîya xwe û xwe di hin waran de bi cih dikin: rexne, psîkolojî, helbest, çîrok, muzîk, folklor. Ev jî, nîşaneyê heyameke nû ye.

Hege em serencama kovargerîya kurdî bidin ber çîroka kovargerîya gelên din ên bindest rismeke çawa derdikeve hole, ka em berê xwe bidine vê yekê jî... Ji ber ku hemû qadên bindest ji hêla sazûmanî ve qels in, bê ziman in (zimanekî standardîze ku bikaribe « em »ê çêbike), *nikarin bipêyîvin*, di halê “dê-sîvîlîzasyon”ê de ne û nîşangeha çand, hûner û zimanên hêjêmonîk in, û lewma bi awayekî xwezayî di çandê berxwedanê de, kovar dibe formeke xwe-derbirînê, afirînerîyê, hebûnê û têkoşînê. Me got kovar ji rojnamegerî û pirtûkê cûda ye. Wekî din, derxistina wê û belavkirina wê hesanî ye ku torekê dide çêkirin, ango hêzeke kollektîf. Her çiqasî gelek tekakes tê de bigihin jî, kovar ne karekî takekesî ye, û bindest (ya/yê serhildêr û berxwedêr) heta derekê nikarin ne « pevrayî » bin. Ji ber ku ji xwe « qels » û « ne-strandî » ne, ku « bi tenê » dimênin, dikarin zûtir « tûne » bibin û « bikevin ». Lewma, bi « sermîyana peywendîdar » (*capital relationnel*) xwedî dibin ku ji peywendîyên wek hevaltî, hevalbendî,

19 - Bi giştî di dîroka wêjeya kurdîya kurmançî de, du kesê pêşeng hene ku bêhtir serê xwe bi mesela otonomîya nivîskêr re êşandine: Mehmed Uzun li Stockholmê û Rênas Jîyan li Amedê. Lê tabî, ev nayê wê wateye ku ew bi her awayî û di hemû kiryarên xwe de otonomîperest bûne. Mesela wergêrên tirkî yên pirtûkên Mehmed Uzun girîng dibe li vir.

nêzîkayîyên ramanî, aborî, sîyasî, bîrdozî û hwd., pêk tê. Ev yek xetereyekê jî bi xwe re têne: çêbûne gelek “komik”an ku berberî û pevçûnên di hundirê “em”ê de har û dîn dike.

Dewleta Osmanî jî tê da gava ku em li dîroka kovargerîya cîhanê dinêrin, dibînin ku kovarên ewil, yên zanistî ne. Bereks, kovargerîya kurdî ji tunebûna sazûmanîyê zîl da û xwe li ser kêmasîyêke bêserûber ava kir. Ev kêmasîyên kolektîf çiqas zêde bin, polîtîzasyona çand û hunerê jî ewqas zêde dibe. Di konteksta Kurdayetî da jî ev tunebûn teqabulî dewleteke serbixwe dike bêguman. Hege em mînakê Hawarê jî bidin ber xwe, gelo em dikarin bibêjin ku aktorên sereke di sîyasêta da têkçûn û ketin pey stargehekê loma kovaran derxistin?

Belê, gava dewlet û yan jî xweserî nebin, qadek ji hêla sazûmanî ve qels dibe û yan jî tê qelskirin. Kovarên kurdan û kurdî bi destên der û derdorên sîyaseta kurdan ve hatine derxistin heta salên 2000an. Lewma, na, *Rojî Kurd* û *Jîn* bi destê rêxistinên polîtîk derdiketin û bi hev re doza kurdî hildigirtin. Rast e, *Hawar* jî binkeftina sîyasî-leşkerî derket ku sîyaseta kurdî nekarî bi zorê û bi dîplomasîyê Dewleteke kurd ava bike û yan jî otonomîyêke bi dest bixe. Lê divê neyê jibîrkirin ku *Hawar* sîyaseteke din a sîyasetmedar û rewşenbîrên kurd bû ku berê xwe didane pêşerojê û dikirine hewar. Salên 60î rojname û kovaren kurdî bi sîyaseta kurdî re bûn, hetta, sîyaseta kurdî di wan bi goşt û xwîn dibû. Salên 70î, kovar nîşaneyê hebûna tevgerêke sîyasî bû li cem Kurdan, ango, rêxistin û kovar bi hev re. Salên 90î, derxistina kovarekê wek vekirina enîyêke di şerê rizgarkirina neteweyî de dihate fahmkirin. Kovara kurdî bêhtir der, derdor û tora xwe-berizandina desthilatdarî û serdestîyê ye, lewma ne mêşinî ye. Lê dîsa jî, ez nabêjim ne “stargehek” e.

Gava ku em bala xwe didina analîzên te, bandora Pierre Bourdieu yekser xwe dide der. Hêmayên wî di nivîsên te da beloq in. Bi nezera wî, di dema qrîzên sosyal de -wekî şer, xelayî, qeyrana aborî- cudahîyên cihêreng senkronîze dibin û tiştên ku di demên asayî da nayên cem hev, girêdayî hevdu dibin. Ev jî rê li ber çînên bîndest vedike ku têkoşîn û berxwedana xwe baştir organîze bikin. Tu dibêji kovargerîya kurdî jî di demên wiha de roleke pêxemberane dilîze ji bo Kurdan. Gelo ev pêxember şahidîya çî dike û şahidên wî kî ne?

Erê, heger sansûra (ku asîmîlasyon, înkâr, zimankujî, bîrakuji, arşîvkujî û hwd., ye) Dewlete tirk li ser Kurdan be, biqasî 100 salekê, wî çaxî divê bê gotin ku dema Kurdan û yan jî dema kurdî, dema krîzan e. Ji bo Bourdieu, helwes-

ta “pêxemberane” helwesta qûtbûna bi pergala heyî re ye. “Pêxember, merivê rewşên qeyranan e ku di wan de pergala heyî xera dibe û pêşeroj bi her awayî betalbûyî ye”. Li gorî wî, berevajî helwesta “patrik” û “keşê” (ku em dikarin wek “şêx” û “mele” jî bifikirin), jî ber ku ew berbiemir in, “pêxember” ew kes e ku bi hin awayên avaker ên dijîtîyê, berberîyê dike bi pergala heyî re û li dijî ortodoksîyê ye. Peyama wî jî aqilmendîyê bêhtir bi coşdarîyê avabûyî ye. Lewma ew yekî “kafir”e²⁰. Di vê çarçovê de, min gotibû ku kovara kurdî, jî ber ku her di dema bi krîz de dibû, bi taybetmendîyên xwe yên xususî xwedî şîyana lîstina roleke “pêxemberane” bû.

Ev helwesta pêxemberane, di felaketê de, dike hewar, bangî “xîrêt”ê dike û dibêje: em hebûn, em hê hene û divê em hebin bi ruhê xwe, bi zimanê xwe, bi çanda xwe û bi hunera xwe wek hemû gelên cîhanê.

Di serê pêşî de, kes jî pêxemberan bawer nake. Gellekî hindik kesan jî rola “pêxemberane” ya kovargerîya kurdî bawer kirîye, jî ber ku her di “serê pêşî” de maye ku merheleyeke embrîyoner dúbare kirîye. Ji xwe, di warên bindest de, şahidî nîne û yan jî pîrr kême, jî ber ku ”bîr”, “dem” nîne, ziman nîne (ku bi têkoşînê tê bi dest xistin). Lewma, gellekî caran “pêxemberên” kurdan bi xwe jî dev jî “ola” xwe berdane, jî ber ku nema îdare kirine di tenêtiyê de.

Em dizanin ku kovar bi tena serê xwe nûnertîya çend rûpelên li ser hev tov-kirî nakin. Ji tor û tevneke mezin jî îstîfade dikin. Gelek kes nivîsa xwe ya ewil di van kovaran de didin çapkirin, carna tevî îdolên xwe di heman kovarê de dinivîsin. Piştî demekê jî bivênevê li derdora van kovaran habitusek ava dibe û meriv dişê tê da çavdêriya qabîliyeta der û derîyekî, niş û milletekî bike. Lê belê di vê tradîsyonê da li gor te “di wêjeya kurdî de kur, bavê xwe înkâr nakin, hewl didin xwe bigîhinin wan an jî wan bînin asta xwe, loma kompleksa Oedipusê tune li cem wan.” Hege em hemû çîroka kovargerî û wêjeya kurdîya li derdora wê avabûyî jî bidin ber çavan, gelo reddîye tunebe em çawa dikarin jî ekol û nişan behs bikin?

Belê, di xebata min da, sê sînoren dîyarker û cudaker ên wêjeya kurdîya kurmançî derdikevine holê di derdora kovaran re: ziman, hewldana avakirina kano-neke wêjeyî û têkoşerî. Rast e ku “kur” “bavên” xwe û yan jî “keç” “dêyên” xwe “nekujin”, nivîskar, helbestvan û yan jî êkol, niş, herk û hereket çênabin. Lê berî her tiştî, divê “bav” û “kur” di “malekê” de bin û yan jî nêzikê hev bin, bo ku “kur” bikaribe wî “bikuje”. Îcar, di dîroka wêjeya kurdîya kurmançî de, “bav” ne li “mal” e, “wenda” ye û yan jî “ne-kefşbûyî” ye jî ber şert û mercên sansûrê, lew-

20 - Bourdieu, P., « Genèse et structure des champs religieux », *Revue française de sociologie*, 1971, vol. 12, n°2, rr. 295-334.

ma kompleksa Oedipus pêk nêhatiye. Di vê çarçovê de, min digot “kur” « bavê » xwe « înkâr » nakin, « nakujin » û têkîliya odîpîyen nîne; « kur » dixwazin bigihine « bavê » xwe, yan jî « bavê » xwe bigihênine xwe. Li vir mesela hewldana avakirina kanoneke wêjeyî û ev taybetmendiyên wêjeya kurdîya kurmancî girîng dibin: rewşa parçeparçebûyî, neberbelav û yan jî pîrr hindik berbelav, û rûdanên merheleyeke dûbarekirî ya embrîyoner.

Ka em vêga taybetmendîya têkoşer a kovargerîya kurdî daynin alîyekî, ez dixwazim em hinekî jî behsa nasnameya wê ya şîngirtinê bikin. Yek ji danerên edebîyata dijkolonyal a Afrîkî, Chinua Achebe, di kitêba xwe ya bi navê Arrow of God (Tîrê Xwedê) da dibêje “gava ku êş li derîyê te dixê û tu dibêjî cih tune, ew dîsa jî dibêje meraqan neke, min kursîya xwe bi xwe re anîye”. Em derîyê digirin lê ji pacyê dikeve hundir ev êşa me ya mezin a neteweyî. Gelo şaş e hege ez bêjim kovargerîya kurdî çiqas baregeh be ewqas jî şîngeh e?

Em dikarin bêjin ku kovara kurdî “şîngeh”e. Çima? Eger em li vir rêya xwe bi wêjeya ermenî bixin di derdora xebatên Marc Nichanian re, em ê bibînin ku gotina şîne gotina bîrê ye û lewma hêza şîne ew tişt e ku ji koletîyê, bindestîyê tê çirpandin û yan jî jê tê nizilandin. Çima ji koletîyê hêza şîne tê çirpandin û yan jî jê tê nizilandin û ne tiştêkî din? Ji ber ku ew hêza sembolîk a karîna gotina tiştêkî û yan jî tiştinan e di derbarê windakirinê (*perte*), jîdestçûyîne de²¹: hêza gotinê ku dikare bêje bê çî hatîye windakirin, çî ji dest çûye, ango dikare heya yê kole ji koletîya wî çêbike û beje: “ev û ev xesara te heye û ev û ev ji destê te çûye”. Şî, nuxsanîyê, kemasîyê destnîşan dike. Lewma, hêza şîne, gotina û yan jî destnîşankirina nuxsanî û kemasîyan e û disa ji ber vê yekê ye ku tiştê ku ji koletîyê, bindestîyê tê çirpandin û yan jî jê tê nizilandin ew e ku bîra yê bindest çêdike, wî *bîrewer* dike, di hêle.

Gava “asîmîlasyon” û sansûr hebin û “ziman” (lewma hemû cîhan û gerdûna ku pê hatîye avakirin) – ku mezintirîn mesela kovargerîya kurdî ye – ji dest çûbe û yan jî di ji dest çûyîne de be, her gotina ku vê nuxsanîyê, kemasîyê destnîşan dike, dibe şî. Lewma, kovara kurdî şîngeh e û yan jî forma şîngirtinê ye. Ji ber ku hebûna wê bi xwe gotina nuxsanîyê û kêmasîyê ye. Her gotina kurdî ya kovaran nîşaneya gotina şîne ye ku şahidîya nuxsanîyê û kêmasîyê dike, welew bi hemdê xwe û yan jî bê hemdê xwe. Bi vî awayî, hêza şîne û yan jî gotina şîne her gotina axiverê zimanê zîkmakî-dayikê jî wek şahidên şîna ku nuxsanîyê, kemasîyê destnîşan dike, dibîne. Yan jî wek “tirbekê”, “kavilekî” ku wateyên dîrokî ên arkêolojîk, antîk û mîtolojîk hildigirin, ku pêwîst e ku veguherine ji nû ve avabûnekê ku neteweyîbûn e.

21 - Nichanian, Marc, *hb.*, r. 165

Û gava hêza şînê ji dest biçê, “felaket” destpêkirîyê an jî dest pê dike. Asli Erdoğan, di derdora Primo Levi re, digot ku li dijî bindestan, gava zilm dihehe lûtkeya xwe, mirovê bindest yan dibe melek û yan jî dibe şeytan²². Lê ez dibêjim, bêhtir dibe « melek » ku « şeytan » ji melekan bêhtir diêşê û şînê digire, dihezine.

Darling, Lehenga sereke ya kitêba We need new names (Me navên nû divê) ya NoViolet Bulawayoyê, tevî hevalên xwe diçe dizîya zengînan û li wir rastî jinikekê tê “ku li ser laşê wê ti birîn tune ku destrûşan bike ka jinik sax e yan na”. Li ser laş û bedena kovargerîya kurdî jî birînen çawa hene ku meriv bêje ew hêj sax e?

Ku em ji hêla dîroka wêjeya kurdîya kurmancî ve lê dimeyîzênin, hingî serdestan lédane, her kulîyaye û carna bi salan nêkarîye ji “mal” derkeve. Hingî xwe daye ber “wêje û zimanên mezin”, “qût” maye. Hingî xwe “biçûk” dîtîye newêrîyaye destên xwe bi asîmanan ve bike; “kop” maye. Hingî polîteze bûye, çavên xwe “temirandine” ji patronajê re. Hingî “felaket” dîtine “fedîkar” bûye li jîyanê. Hingî di bin sîya bin-destîyê da maye, bê “roj” maye. Hingî, sere pêşî ji kel qîrîyaye, dûv re ne bi gellekî “kuxîyaye” û “dengketî” bûye. Hingî feqîrî dîtîye, nanê ziwa jî bi dest neketîye, “birçî” maye. Hingî bi « sermîyana peywendîdar » xwedî bûya, di nav lepên “komik”an de hatîye eciqandin. Hingî ji welêt dûr maye “psîkolojî-xerab” bûye. Hingî bi xwe re peyîvîye, “dîn” bûye; bi çol û çîyan ketîye. Hingî xwe ji sersarîya Kurdan ya di derheqê zimên de qeherandîye, “kezebreşî” bûye. Hingî li gramer û peyvan, li ferhengan û li devok û zeravayan fikirîye, “lalîkî” bûye. Lê ji ber ku têkoşîyaye û serîhildaye wiha bûye, yan na tiştê nedibû. Tam jî ji ber van û gellek “birînen” din, hê jî sax e, ewqasî ku dikare “mirîyan” sax bike.

22 - Erdoğan, Asli, Artık Sessizlik Bile Senin Değil, İstanbul, Karakarga, 2017, r. 92.

Yazılı Kürt Edebiyatının Zenginlięi

Nevzat Eminoęlu

1. Giriř

Tarım devriminden sonra řehir-devletlerin ortaya çıkmasıyla kentler medeniyetlerin oluřum alanları haline geldi. řehirlerdeki nüfus yoğunluęunun sonucu oluřan ticari faaliyetlerle ortaya çıkan refah ortamı insanları estetik duyguların tatminine yönlendirdi. Bu ise řehirlerin bařta edebiyat ve sanat olmak üzere mimari, zevk, zarafet, hitabet, inanç, ahlak, ümran gibi insana özgü his ve hassasiyetlerin kaynaęı konumuna getirdi. Bu nedenle insan ruhu en çok řehirlerde řekillenmeye bařladı ve řehirler bu yüzden insan ruhunun estetik tablosuna dönüřtü¹.

İbni Haldun eserlerinde řehir hayatının bu düzeyini “ümran” kavramıyla niteler. Bu kavram řehir yaşamının gerektirdięi bütün ihtiyaçların söz konusu bu toplumsallık içinde karřılanmasını ifade eder. M.Ö.3000’li yıllarda yazının medeniyet coęrafyamız içinde yer alan Mezopotamya’da icadıyla beraber insanlık tarihi için aydınlık bir dönemin kapısı da açılmış oldu. Yazı ve yazılı edebiyata kaynaklık eden unsurlara baktığımızda, bunların bařında řehircilik, ticari hayat, eğitim kurumları, siyasi istikrar gibi olgular gelmektedir².

1 - Zülkif Ergün, *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2015, s. 50.

2 - İbn Haldun, *Mukaddime*, Dergah Yayınları, İstanbul 1991, c. 2, s.967.

Türkiye’de Türkçeyle beraber en çok konuşulan iki dilden biri olan Kürtçe’nin edebiyat tarihine baktığımızda, metinsel edebiyata kaynaklık eden bütün bu unsurları görmek mümkündür. Çünkü yazılı Kürt edebiyatının ortaya çıktığı merkezlerin, Cizre, Hemedan, Erdelan, İmadiye, Bitlis, Hakkâri, Doğubayazıt, Müküs, Hizan, Meyafarkin, Siirt, Diyarbakır gibi orta çağ Kürt devlet ve beyliklerine başkentlik yapmış şehirler olduğu görülür. Bu şehirlerde Kürt hükümdarlar/mirler tarafından kurulup finanse edilerek klasik dönem edebi patronaj sistemi içinde himaye edilen başat eğitim kurumları olan Kürt medreseleri bu yazılı edebiyata kaynaklık etmiştir.

2. Ortaçağ Kürt Otorite Bölgeleri Yazılı Kürt Edebiyatının Oluşum Merkezleridir

İslam’ın 7. yüzyılda ortaya çıkmasından sonra Kürtler, kendi toprakları dışındaki yerlerde krallıklar ve prenslikler şeklinde iktidara geldiler. Batı İran toprakları ve daha sonra da Bereketli Hilal (Mezopotamya) neredeyse birkaç bağımsız Kürt hanedanlığının hükümlanlık bölgesi haline gelmişti. İslam’ın merkezi topraklarının siyasal tarihinde 10 yy. ile 12. yy. arasındaki dönem, İslam’ın Kürt yüzyılları olarak adlandırılmalıdır. Zira İslam’ın merkezi topraklarını Bizanslılara, Ruslara ve son olarak da Haçlılara karşı koruyanlar Kürtlerdir³.

riya dixwar, vedixwar. “Çi li ber derê mala Mîrzo hebû temam jî xwîdana xelqê bû... Pezê mirîda hebûya, tunebûya, qir biketa nav yanê gura bixara Mîrzo ra yek bû. (r.22-23).” Hemîd Beg, Keleşê rîspî û pîr Mîrzo mezintiya ovê dikirin. Wekî hemû beg û axayan Hemîd beg jî begtî ji bavê xwe girtibû, piştî mirina bavê xwe Silêman axa bibû beg. Serşivanê Silêman begê ‘Elî ji ber ku di dema şivantiya wî de guran pêncî pezê Silêman begê kuştibûn; “ew peza li ser wî bûbû cirme. Silêman begê û rîspiyên gund qirar dabûn ku ‘Elî bîst sala jî nanoziko mala beg da şivantiyê bike, wekî berga pezê ku gura kuştibû bigre (r.24).” ‘Elî piştî vê bûyerê çend sala jî şivantî kir û bi ecelê xwe mir. Piştî mirina ‘Elî, Hemîd begê, Keleşê rîspî û Pîr mîrzo; “qencî” ji Perîşana jîna ‘Elî û kurê wî Kerem kiribûn ku Kerem here ber berxa, belkî borcê bavê xwe bîne serî (r.24).” Kerem jî zaroktiya xwe heya xortaniya xwe berxvanî-şivanî kir, gelek kutan xwar, zorî zehmetî kêşa. Ji bilî qîza Hemîd begê -Zeytûn- ku temenê wî û Kerem nêzî hev bûn, gunehê tu kesî li Kerem nedihat, kesî rihm lê nedikir. “Îsal we’de Kerem temam bibû, ewî borcê bavê xwe qedandibû, li benda hemîd begê bû ku gazî wî bike, heqiyeta wî bike, da zanibe bo çi dixebite, lê deng û hisê beg tunebû (r. 27).” Rojekê qirar da, çû mala beg, destûr hilda çû hundur, hal û hewalê xwe ji wan re got, ev gotin xweşa wan nehat; rîspî got : “Ê tu qurbana beg û mala wî, tu wê duxî, didî, heq çi te ra ye. Beg got: Tu çi dixwazî pêzeveng, de were nanê xwe bide van meriza, mezin ke, firê xe, wekî îro jî bên te ra heq û hesava bikin (r.29). Kerem dilşikestî vegeriya malê. Êla Ortila havîna diçûne zozanên çiyayê Sînekê. Her sal cerdê diavête ser êlê. Çi di destê wan de hebû talan dikirin, dibirin. Hemzê birê Şiblî rojekê çû cem oranîk şikyat bike. Ev kirina hemze ji begê re xweş nedihat, digot: “Çi kula Hemze tiştê usa ketibû, ew ku şikyat ku? (r. 29).” Ji bilî feqîrbûn û cerdê, tunebûna xwendinê jî êla Ortila dirizand. “Wextê merivekî xwendî lazimî hinek bûya gotî biçûna bajarê Îdirê, vi ra êpece ermeniyê xwendî hebûn (30).” Sûrên’ê ermenî her sal dihat çend zarokên gund bibe ku li mekteba gundê Zorêyê fêrî zimanê ûrisî bibin da ku kêrî gundiyan bên. Lê her sal Hemîd beg û pîr Mîrzo rêyek didîtin, nedihîştin Sûrên kesekî bibe, bide ber xwendinê. Mîrzo wuha bangî Sûrênê ermenî dikir: “Tu çima dixwazî cima’eta me ye belengaz li riya wê derxî, kal û bavê me xwendine wekî em bixûnin (r.30).” Nêdixwestin kes bixwîne, şiyar be, li hember zulm û zordariya wan serî hilde. Zurbe kesekî dewlemend bû lê bi eslê xwe rênçer bû, bi ticaretê zengîn bibû, deriyê wî li her kesî re vekirî bû. “Tasê ava sar jî bêyî cînara venedixar (r. 31).” Ew tevgera Zurbe bi Hemîd beg û giregirên gund re xweş nedihat. Hemîd begê û giregirên êlê ji bo Zurbe ji gundiyan biqetînin, bînine terefê xwe Meyana qîza Zurbe ji Serdarê kurdê Keleşê rîspî re xwestibûn. Lê Zurbe terka xeysetê xwe nekiribû; “ew çûka ra çûk bû, mezinara jî mezin. kesîva ra kesîv, dewletiya ra jî dewletî (r. 32).” Hemîd beg, rîspî û Mîrzo dîna xwe danê Zurbe nayê rê, kirina xwe bi ya cerdbaşiyên re kirine yek. “Rojekê jî cerdê dada ser mala Zurbe, pez û dewarê wî temam birin (r. 32).” Piştî cerdê Zurbe gelekî bû kesîb, Serdar jî jîna xwe Meyan biçûk didît, her car heqaret

lê dikir. “Rojekê Serdar Sebriyê kurê xwe li Meyanê stend û jinka belengaz ber bi mala bavê wê ve rêkir (r. 32).” Piştî van hur du bûyeran Zurbe têgihîşt ku ev kirin hemû fêlê Hemîd beg, rîspî û Mîrzo ne. Konê xwe bar kir û çû. Piştî çûna Zurbe, heft-heşt sal bihurîn. Serdar dixwast Zeytûna qîza Hemîd begê ji xwe re bixwaze. Zeytûn di temenê kurê wî Sebrî de bû. Keleş ji bo dewlemendiya Hemîd begê ev fikra Serdar pejirand û Mîrzo kire aracî. Rojekê Zeytûn bi cariyeya re çû hirîşonê, ew û Kerem rastî hev hatin, qasekê xeber dan. Zîna qîza Mîrzo ew dîtî û hat ji Kerem ra tiştên nebaş gotin; “êtîmê heram, Zeytûn qîza devê te ye, wekî tu pê ra xeber didî (r. 35).” Zîna qîza pîr Mîrzo li nav ovê ket; “wekî bi çavê xwe dîtiye ku Kerem û Zeytûn hev du ramûsaye (40).” Xeber çû guhê Beg ji. Rîspî û Mîrzo ketine bin beg, gotin sûcê qîza te tune, hemû qebebet ya Kerem e, divê em wî ceza bikin, qîza te jî bidine yekî munasib û vê lekeyê li ser te rakin. Rîspî û Mîrzo bi vî awayî dixwestin beg qanî bikin da ku qîza xwe bide Serdar. Kurê Serdar Sebrî jî piştî çûna dayîka xwe û koçkirina kalkê xwe yî Zurbe li bavê xwe nedikir. Hemzeyê birayê Şiblî li ber destê Sûrênê ermenî û çend hevalên din fêrî fikra marsîzmê bibû, propogandaya şoreşê dikir: “Pale û gundî bûne yek, textê padşê dewremiş kirine, zûrî, milkedar dane hildanê, dewleta xwe dane sazkirinê (48).” Ev kar û xebatên Hemze çûbûn gihiştibûne guhê Hemîd beg, wî jî xeber gihandibû merivê dîwanê. Rojekê qefleyek siyarî hatin Hemze kelebçe kirin, hildan birin, kirin hepîsxaneyê. Piştî ku Hemze kete hepîsxaneyê bi arîkariya Serdar û Ehmedê kurê Hemîd begê cerdê dada ser mala Şiblî, mal û milkê wî birin, zarokeke wî kuştin.

Sûrên ji Îdirê dijiya. Sûrên li bajarê Bakuyê hem xebitîbû hem jî pê re xwendibû. “Sala 1904 ew ketîbû nava cergê Partiya bolşevîka (r. 36).” Piştî xwendinê ew şandibûne bajarê Îdirê da ku; “di nava cima’etê fikrê marksîzmê belav bike (r. 36).” Wî li gundê Zorê ku lê kurd dijîn, bibû dersdarê zimanê rûsî. Sûrên cara dihat serî li dostê xwe Zurbe dida. Zurbe koçî gundekî cînar -gundekî ermeniyankiribû. Gundî jê xwedî derketibûn, kêmasiyên wî tekûz kiribûn, ber dilê wî de hatibûn. Sûrên ji Hemze ra qala înternasyonalê, xebata pale û gundiyan ya li dijî milkedar û muftexura dikir û digot: “Piştî û baza merivê xevatçî heye, ew partiya bolşevîka ne (37).” Meyanê gelekî bêriya kurê xwe Sebrî dikir. Keleş berdabû Sebrî li malê derxistibû. Zîna qîza Mîrzo bi nivişta, nifira xelk dixapand-ditirsand, zarokên nexweş li binê kerê re derbas dikir Xwedê giravî qenc dikir. Ji bo Zeytûnê bidine Serdar diçû Belgîzar qanî dikir. Sûrên gelek li ser Zurbe da disekinî ev yek li xweşa Kerapet axayê ermenî nedihat. Nedixwest ermeniyek arîkariya kurdekî bike. Teşkilat dizîka va li mala Sûrên tov dibûn, Umrovê Êris jî tevî komê dibû, li ser pîrsgirêkên gel dixebitîn, dixwestin fikra xwe di nav kurdan de jî belav bikin, teşkilatekê li wir jî ava bikin. Zurbe cara pêşî navê Lenîn li wir bihîst: “Hevalê Lenînê kêrî we jî bê (63).” Kerem û Sebrî hevalê hev bûn, gelekî ji hev hez dikirin. Hemîd beg Kerem sirgûn kiribû, nedihîşt were gund, çavê wî

li çavê zeytûnê bikeve. Sebrî jî ji malê hatibû avêtin, çibû gihîştibû Kerem. Kerem, Sebrî, hemze ji hêla Sûren ve hatibûne teşkilatkirin. Hemze di hepsê de bû. Yekî bi navê Elyaz kirine qawûşa wî da ku wî bixapîne, navê hevalên Hemze yên teşkilatê hîn be lê Hemze tu tişt jê re negot. Rojekê Kerem pez anî ovê, wî û Zeytûne hev du dîtin, desmala xwe dane hev, Kerem ramûsanek da sûretê Zeytûnê. Paşê piştî demekê bi qelenekî baş Zeytûn bo Serdar nîşan kirin, dilê Zeytûnê di Kerem de hebû lê kesî lê nepirsîbû ka dixwaze Serdar bike yan na. Rojekî Kerapet axa gazî Zurbe kir û xwest ku li gundê wî derê. Ev kirinên Hemîd begê bûn. “Se goştê sa naxwin. Kerapet û Hemîd beg jî wusa bûn Hemîd beg zûriyê gundê xwe, Kerapet axa jî zûriyê gundê xwe bû (110).” Rojekê Sebrî li zozanê gihîşte Şiblî û jê re got ku beg û rîspî Hemze dane girtinê. Bi vî awayî Şiblî bi heqîqetê hesiya. Ûmnov û Sûrên li nav êlê kurdan digeriyan, xortên kurdan şiyar dikirin. Kerem, Sebrî, Zurbe bi wan re kom dibûn, xeberên derheqê teşkilatê de li wan fêr dibûn û li nav gel de bi awayekî veşarî belav dikirin. Ûsivê kurê birê Şiblî li gundê Zorê mekteb dixwend. Piştî xwendinê şiyar bibû, rexne li beg, axa dikirin. Ev qet xweşa Hemîd beg û giregiran nedîçû. Piştî birêxistinbûnê gundiyên gundê Kerapet axa dest ji karê axê berdan, nexebitûn. Sûren û Ûmnov ew teşkilat kiribûn. Kerapet xwest ku gundiyan bixapîne, lê Sûrên gote gundiyan: “Gelî heval û hogiran li Kerapet axa bawer nekin, ew tu car heqiyeta we zêde nake, zûriyên mîna wî xwîna we ye helal dimijîn, nava xwîdana we de sovekariya dikin (123).” Tirseke mezin ketibû dilê Kerapet axa, xewa şevê li wî heram bibû. Sûren texmîn dikir ku kerapet axayê wî bide destê dîwanê, zurbe hilda û çû gundê Qereqoyînê, bi Hemîd beg ra xeber da, ew qanî kir ku Zurbe vegere gundê xwe. Merûjan xortekî ermenî bû ku li hepîsxaneyê dixebitî. Gelek caran bi dizîka arîkariya Hemze dikir. Merûjan nave wî yî ‘eslî Meyrî bû lê piştî dê û bavê wî miribûn, li cem tirka xulamî kiribû, ji tirsê navê xwe guherandibû, xwe wekî kesekî misilman nîşan dida. Ûmnov û Sûren plan çêkirin, Sebrî û Ûsiv şandine mala Merûjan û xwestin ku Hemze ji zîndanê birevînin. Bûyera li gundê Kerapet axa, bûyerên li Ûrisetê diqewimîn ziravê pîr Mîrzo û rîspî jî qetandibûn. Dixwestin qal û qîlê, Sûrên, Hemze, Kerem, Sebrî, Zurbe, Ûsiv ji beg re bikin, li ber guhê wî bixin ka çareyekê ji wan re bibîne. Ji aliyekî ve Serdar, “rêya mala beg kiribû rêya kadizê (136)”. Diçû dergistiya xwe didît. Lê Zeytûnê rû nedida wî. Zeytûnê rojekê jê re bi awayekî eşkere got: “Tu mêrekî rû simbêl î, tu hevalê bavê min î, ez û Sebrî berxê salekê ne. Wextê ez bivme xweyê heft zik zar jî ez li cem te nasekinim, tu bavê min î, Ehmedê birayê min î (137).” Û piştî vê berteka Zeytûnê Serdar êdî neçû serdana Zeytûnê. Serdar gilî û gazin li Ehmed kirin, şikyatê Kerem birin ber wî, wan qîrarê xwe kirin yek da ku tiştêkî bînine serê Kerem. Merûjan û Şiblî ya xwe kirine yek. Merûjan dizîkava bizmarekî mezin î hesinî da Hemze da ku dîwêr bikole, û bireve. Hemze dîwar kola û gihîşte Şiblî, reviya. Siharê her kes li vê revê hesiya. Sûrên Hemze bire gundekî ermeniya, li mala kesekî beled da bi cî kir. Ew

roj cendirma dora mala Şiblî girtin lê tişte bi dest nexistin. Ehmed û Serdar li hespê xwe siyar bûn, çûne çiyê cem Kerem, Kerem kirine fesalekî, êrîşî wî kirin, Serdar bi qameyê lê da Kerem kuşt. Di wê hingavê de Sebrî li wan derket, da dû wan, li gelî de gihîşte wan, qama xwe avête Serdar lê qame li Ehmed ket, Ehmed kete 'erdê mir, Serdar reviya. Cihav gihîşte gund ku Serdar lêdaye Kerem kuştiye, gundî hatin laşê Kerem birin, spartine axê. Sebrî ji bilî kalê xweyî Zurbe û Şiblî tu kesî ra behsa bûyerê nekir. Du roj li ser bûyerê re borî lê deng û hîsê Ehmed û Serdar tunebûn. Zeytûnê jî hew şîna Kerem dikir li ser desmala wî da digot, digiriya. Wê şevê, "cerdbaşıya dîsa dakuta ser gund (195)." Di navbera gundî û cerdbaşıyan de şerekî giran qewimî. gelek kes hatine kuştin. Xeber hat gotin: "Zozana jina Şiblî, du zarê wê, Sebriyê Serdar, Ûsivê 'Emo, Ehmedê kurê Hemîd begê hatine kuştin(197)." Lê agahî şaş bû, Sebrî û Ûsiv nehatibûne kuştin. Piştî cerdê rênberên Hemîd begê laşê ehmed di nevalê de dîtin. Wê rojê 33 mêr, jin û zarok hatine defîn kirin. Gundiyên hew dizanî ku cerdbaşıya Ehmed kuştine. Zeytûnê nava du rojan de hem Kerem hem jî Ehmedê birayê xwe xiste bin axê, derd û kulên wê bê terîf bûn. Zeytûn dîn bû, aqilê xwe avêt. Serdar derbasî aliyê romê bû û hew vegeriya. Belgîzar û Hemîd begê jî gelekî şîna kirin. Xeber hat ku Kerapet axa gundê xwe hiştiye û reviyê. Vê xeberê zêdetir tirse xiste dilê Hemîd begê. Van rojan Ûmrov jî Sûren re nameyeke hişyariyê şandibû: "Çawa dixuyêne ordiya romê zûtirî we ber bi çemê Erez dileqe (199)." Piştî çend rojan barê xwe hildan berê xwe dane çemê Erezê. Hemze û Merûjan li ser pirê hev dîtin, hevdu hemêz kirin û tev derbasî aliyê din bûn.

3. Vegêr û Bergeh

Vegêr yek ji hêmana herî girîng a romanê ye. Nivîskarê romanê, pêşî ji xwe re tema û bûyereke hildibijêre, piştê jî şexsiyetên romanê diafirîne û di dawiyê de ji bo ku ji xwendevanan re vê honaka bûyerê vebêje, vegêrekî diyar dike (Tekin, 2018, r. 19). Ew ê ku bûyerên di romanê de ji me re vedibêje ne nivîskarê romanê ye, ew vegêrê ku nivîskar hildibijartî ye. Ango nivîskar her tiştên der barê romanê de amade dike, vana dinivîse lê belê vegêr, ew kes e ku nivîskarê romanê di huşê xwe de afirandiye. Bûyerên romanê li gorî bergehên vegêrên cuda dikare bê vegotin. Romana Kurdê Rêwî bi Bergeha Xwedayî (Îlahî) hayiye pêşkêşkirin. Vegêr di nava bûyeran de cî nagire, midaxaleyê bûyeran nake. Bi bergeheke fireh li bûyeran dinêre. Vegêr her tiştî dizane; tiştên di huşê lehengan re derbas dibe, hestên wan, derûniya wan, serboriya wan, dahatûya wan, agahiyên herî nepen yên der barê wan de bi hemû hûrgiliyên xwe ve dizane. Li serê romanê heya binê romanê vegotin bi devê kesê sêyem e û hevok piranî bi dema boriya diyar in.

4. Honak

Yek ji hêmanên sereke yê romanê jî honaka bûyeran e. Ev bûyer cara bûyerên rastîn in ku nivîskar di jiyana xwe de rastî wan hatiye, kiriye tecrûbe, çavdêriya wan kiriye. Cara jî bûyerên xeyalî ne ku nivîskar di huşê xwe de afirandiye. Bûyer di romanê de bela vela nînin; di navbera wan de têkiliyeke ji sedem û encaman pêk tê heye, bûyer pişgiriye didine hevdu, di nav rêkûpêkiyekê de ne (Forster, 2019, r. 128). Bûyer her dem di nava kronolojiyê demê re naherike carînan şûndavegerînan dikin û rêza siruştî ya bûyeran diguherînin. Romana Kurdê Rêwî bi teknîka romana Klasîk hatiye nivîsîn. Honak sade ye. Bûyer bi rêzê têne pêşkêş kirin lê carînan bi teknîka flashbackê diçe demên berî niha jî. Roman ji 60 binbeşan pêk tê. Her binbeşekê de qala bûyerekî dike, piştî ew beş diqede, bûyerê li wir dihêle û derbasî cihêkî din dibe, li wir bûyer dewam dike.

5. Tema û Mijarên Sereke

Hest û ramana ku ji serê romanê heya binê wê serdest e wekî temaya romanê tê binavkirin. Temaya romanê li gorî mijara romanê diha gelemperî û rêzber e; têgehên wekî hezkirin, evîn, hevaltî, dostanî, tenêtî, bêrîkirin û hwd. jî dihewîne. Ango tema hest û fikra bingehîn a di romanê de cî digire ye. Temaya romanê jî serî heya dawiyê li hev digire. Roman li ser îdeolojiya realîzma sosyalîst ava bûye. Ji aliyekî ve qala feodalîzmê dike ji aliyê din ve jî mizginiya şoreşa oktobirê dide. Jiyan rastîn a gunduyên kurd û ermenan bi awayekî rasterast radixe ber çavan. Zulum û zordariya axa, pîr û giregirana ya li ser gundî, pale, xulam û kesên kesîv. Û teşkilatkirina fikrê marksîzmê, belavbûna wê ya bi zehmetî ya li nav gel de dide nîşan.

6. Ziman û Şewaza Vegotinê

Berhemên edebî li ser zimên ava dibin. Roman jî cureyek ji berhemên edebî ye loma em dikarin bibêjin hunereke zimanî ye. Roman bi îmkânên ku zimên dayê ji xwe re dinêyekî ava dike û hewl dide ku ev dinêya ji xwe re saz kiriye nêzî rastiyê be. Ji ber vê yekê mecbûr e ziman û şewazeke li gorî vê rastiyê bi kar bîne. Wekî hemû cure berhemên edebî di romanê de jî ziman û şewaz gelekî girîn in. Zimanê romana Kurdê Rêwî zimanekî sade û herikbar e. Devoka kurdên sovyetê hatiye bikaranîn. Zimanê romanê zimanekî çandî ye. Ji hêla biwêj û gotinên pêşyan ve jî gelekî dewlemend e, ziman zimanê gundiyan e. Tê de kêm jî be peyvên biyanî hene. Wekî mînak: Oranîk, apincî, qepece, revolyûsiya fêvralê, aşqorkî, arxanî bûn, duşurmîş bûn, kivav, tewekel...

6.1 Gotinên Pêşyan; Çend Nimûne

Mala mêra xirav nabe mala zêra xirav dibe, çiyayê bilind ji cînarê xirav paktir in, wexta ga têr dixwe stûyê xwe li kendala radide, gerek e meriv baxê xwe av de paşê yê xelkê, xwedê berxê nêr daye bona kêr, golkê malê li gayê malê natirse, siva xêr sivê da xêr e, zimanê şîrîn mar ji qula derdixe, qenciyê bikin mala xwe da nemirin, se goştê sa naxwin, malê dinê qirêca destan e, lingê pêxasa timê ber derê soldirûya ne...

6.2. Biwêj; Çend Nimûne

Mitanebûn, kap bi yekî re avêtin, dîtina xewneke neşûştî, mil xistina kulêv, serê xwe xwarin, cûcka xwe firêxistin, porê xwe kurkirin, çivt sekinîn, hûkî kirin mûkî, bûyîna qîr û sîr, rotin û pîvan, zor dana zimanê sor, di guhê gayê da bûn, ser guhekî razan, ji nêrî gulmast çêkirin, hîlê yekî li yekî çûn, ketina orta du kevira, xew ji çavan kuvî bûn, lêva xwe gestin, şer û şiltaq avêtin, tûyî cinyazê yekî kirin, bûna hîva bin'ewr, pê xwe guhê xwe xistin, kirina riya kadizê, bûna kelemê çavê yekî, pehîna xwe kodka xwe ye tijî xistin, xew lê herimîn, dilberk dana xwe...

7. Kes û Tîp

Yek ji hêmanên sereke yê romanê jî kesên romanê ne û roman li ser kesan tê avakirin. Taybetiya kesên romanê ya herî girîng ew e ku divê ew kes ew kes bin ku di civakê de em bikaribin rastî wana bîn ango ne durrî rastiya kesên di jiyana civakî de em rastî wan tên bin. Kesên romanê caran jî însanan caran jî heyberên temsîlî yên ku zanavên însanî li wan hatine barkirin yên wekî; ajal, giha, heyberên bêgiyan, têgeh û hwd. pêk tên. Ji van kesên di nava bûyerên romanê de cî digirin yên bigiyan û bêgiyan gişk wekî kadroya kesên romanê tene binavkirin. Hemû kesên romanê bi awayekî rêkûpêk, bi hev re tev digerin û li gorî rola xwe cî digirin. Ev kes li gorî tevgerên xwe yên derveyî û xwiyayiyên fîzîkî yan jî jiyana xwe ye hundurîn û derûniya xwe tene ravekirin û eşkerekirin (Çetin, 2019, r. 144-146). Di romanê de kes wekî tîp û karakter dibine du birr. Tîp ew kesên romanê ne ku taybetiyeke wî bi awayekî zêderoyî derdikeve pêş, berdevk û temsîlkarê fikr an tevgerê civakî ya diyar in. Tîp şexsî yan jî bêhempa nîn in, gelemperî ne. Taybetiyên hevpar yên dewrekî yan komekî di xwe de dihewîne. Heçî karakter e, ew kes e ku ji tevgerên xwe yên derveyî zêdetir bi jiyana xwe ye hundurîn û derûnî berbiçav dibe. Ji ber vê yekê ne rûyê kesan lê kûrahiya û derûniya wan nîşan dide. Di romana Kurdê Rêwî de gelek kes hene, wekî hemû romanên ku li ser hîmê realîzma sosyalîst ava bûne, kesên wekî reş û sipî jî hev vediqetin, kesên feodal û arîkarê feodalîzmê wekî karakterên nebaş, xirab, kirêt hatine afirandin û kesên feqîr, belengaz, xwende, şoreşger jî wekî kesên bi her awayî ve baş hatine îdealîze kirin.

7.1. Kesên Erênî:

Sûrên: Sûrên bi eslê xwe ermenî ye. Piştî xwendina mektebê tevî refên partîya bolşevîk bibû. Li gundekî kurdan ders dida zarokan. Ji hêla partiyê ve jib o fikra marksîzmê li nav gundiyan belav bike, gundiyan li hember feodalan teşkil bike hatibû şandin. Şev û roj jib o şiyarbûna gel dixebitî, dostê kesên kesîv bû. Ji bo zarokan bide xwendin gund bi gun digeriya, zarok dibirine dibistanê fêrî zimanê rûsî dikirin.

Zurbe: Zurbe bi eslê xwe rênçer bû, biştî mijûlahiya ticaretê dewlemend bibû lê wekî dewlemendan tev nedigeriya. Mal û sifra wî ji her kesî re vekirîbû. Dostê kesîv û belengazan bû. Însanekî dilrihm bû, li hember zilm û zordariya feodalan li cem pale û gundiyan disekînî.

Kerem: Şivanê hemîd begê bû, ev pîşe ji bawê wî jê re mabû. Bi saya Sûrên û Hemze bibû xwedî fikrekî sosyalîst. Xortekî jêhatî bû, aşîqê Zeytûna qîza Hemîd begê bû. Axirî jib o eşqa xwe hate kuştin.

Sebrî: Kurê Serdar û Meyanê ye, xortekî jêhatî bû. Bi saya Sûrên û Hemze bibû xwedî fikrekî sosyalîst. Li hember feodalîzme li cem gundî û paleyan bû.

Ûsiv: Ûsiv biraziyê Şiblî bû, mekteb dixwend. Ji ber ku xwende bû, şiyar bibû, xwedî fikrekî azadîxwaz bû. Rexne li feodalan dikir, fikra marksîzmê li nav gel belav dikir.

Merûjan: Bi eslê xwe xortekî ermen bû. Ji tirsê nasname û baweriya xwe guherandibû. Li hepîsxaneyê dixebitî, arîkariya kesên bindest û girtî dikir.

Hemze: Kesekî zana û mêrxas e, ji ber fikrên xwe yê sosyalîst tê girtin û li hepîsxaneyê direve. Fikrê marksîzmê li nav êlê de belav dike. Dost û hevalên gundî û paleyan e.

Şiblî: Gundiyeke qenc e. Birayê Hemzeyê mezin e. Jiyanê normal didomîne. Piştî girtina Hemze ew jî şiyar dibe. Çiqas jî destê wî were arîkariya fikra sosyalîst dike.

Ûmnov: Ûmnov bi eslê xwe Ûris e. Peywira wî belavkirina fikrê sosyalîs e. Li nav gel digere, gel teşkilat dike. Fikr û xeberên nû ji pariyê hildide digihîne teşkilatan. Dostê gundî û paleyan kurd û ermenan e.

Zeytûn: Keça Hemîd begê ye. Xwedî kesayeteke baş e. Naşibe zarokên dewlemend û milkedaran. Gelekî bi rihm e. Ji Keremê Şivan hez dike, xwedî li eşqa xwe derdikeve, li hember bavê xwe disekîne. Piştî mirina Kerem dîn dibe.

Perîşan: Dayîka Kerem e. Hingê heye rênçerî û xulamtî kirye. Gelek cefa kişandiye. Mêrê wê Elî şivanê Hemîd begê ye. Piştî mirina elî Kerem pêş deynê bavê xwe ve dibe şivaê beg. Ew û kurê xwe nanoziko jib o beg dixebitin.

7.2. Kesên Nerênî:

Hemîd Beg: Axayê êlê ye, xwediyê hezar û heysed malên êlê ye, gundiyan kesîv bi nanoziko vî re dixebitin, xwîna millet dimije, bi xwîdana pale, gundî û rêncberan bûye xwediyê servetekê. Fêlbazekî xirab e. Çavê wî bi tovkirina mal û milk têr nabe, naxwaze kesek têr be, xwe li ser her kesî re digire. Ji dîwanê û cerdbaşyan re li hev dike, gundiyan dide girtin, mala wan dide şêlandin.

Belgîzar: Xanima Axê ye, ew jî wekî mêrê xwe herkesî biçûk dibîne, zulm û zordariyê li xulam û xizmetkaran dike. Tu rihm di dilê wê de tune.

Pîr Mîrzo: Pîrê ovê ye, kesekî durû, derewîn, sixûr, fêlbaz û minafiq e. Fesadiyê dike, planan çêdike, herkesî li ser tiliya xwe dide lîstikê. Olê wekî alavekê bi kar tîne, xelkê bi dîn û xurefyan dixapîne. Li ser keda feqîr û kesîvan dewlemen bûye, xwe di nava xwîdana gel de digevizîne.

Keleşê rîspî: Rîspiyê gund e, kesekî dewlemend e. Gelekî tima ye, qêmiş nake kincekî li xwe bike, xwedî fêl û fita ye, ruşetê dixwe, cerdê dişîne ser mala gundiyan.

Zînê: Qîza pîr Mîrzo ye, ew jî wekî bavê xwe fêl û fita dike, xwe wekî kesekî pîroz nişan dide û bi bawerî û pîrozbûna xwe milêt dixapîne. Fe'la vedike, remla davêje, bi xurefyan xelkê ditirsîne, dixapîne, fesadiya gund tev ew dike, îftiraya davêje millet, keseke hesûd û qelp reş e.

Serdar: Kesekî qure û bê 'edelet e. Terefterê feodalîzmê ye, ji bo beg canê xwe feda dike. Heqaretê li jina xwe dike, wê dikute. Cerdê berdide ser mala xelkê kesîv. Dawiya dawî Keremê bê sûc dikuje.

Ehmed: Kurê Hemîd begê ye, kesekî qure û zulmkar e. zilmê li şivanan dike, qure ye, xwe mezin dibîne. Hero diçe nêçîr û seyranê, dinya ber di xema wî da nîne.

Kerapet Axa: Axayê gundê ermenyan e. Wekî Hemîd beg ew jî bi keda gundiyan kesîv dewlemen bûye, heqê gundiyan dixwe, zulm û zordariyê li wan dike. Bi dîwanê re têkilîdar e, sixurtiyê dike, cendirmeyan dişîne ser mala xelkê.

Zabîte Keçel: Zabiteyekî zulmkar û hîlekar e, karên qirêj dike, îşkenceyê li girtiyan dike. Siqûran dişîne cem girtiyan û dixwaze agahiyan li wan tov bike.

Elyaz: Sixûrekî navdar e, bi fêl û fita girtiyan dixapîne, wana dide xeberdanê û ji wana agahiyan tov dike û digihîne Zabiteyê Keçel.

8. Zeman

Ji ber ku jevveqetandina dem û bûyerê ne pêkan e, nivîskarê romanê, mecbûr e bûyer û honaka bûyerê çawa ku di nava demeke diyar de qewimî be, vebêje.

Dema em behsa bûyereki û kesên di wê bûyerê de cî digirin bikin pêwîst e em qala dema qewimîna wê bûyerê jî bikin. Dema ku di romanê de derdikeve pêşberî me ji dema ku em romanê dixwînin cudadir e. Dema em tê de ne demeke rasteqîn e lê dema ku bûyerên romanê tê de derbas dibin demeke honakî ye, di xeyalê nivîskar de hatiye afirandin. Romana Kurdê Rêwî di destpêka sedsala bîstem de diqewime. Şoreşa Oktobê nû çêbûye û fikrên sosyalîzmê nû nû di nav kurd û ermenan de belav dibe. Roman dema eskerê romê têne Qersê diqede. Kesên herêmê ber bi Sovyetê ve koç dikin, jî çemê Erezê derbas dibin.

9. Mekan

Mekan ji cihê ku bûyer(ên) ku di romanê de têne vegotin derbas dibin, şexsên romanê lê dijîn re tê gotin. Bûyerên di romanê de têne vegotin di cihêkî diyar de derbas dibin, mekan bi bûyer(ên), şexs(ên) û unsurên romanê yên din re di nav têkiliyekê de ye û taybetiyên cihêreng nîşan dide. Şexsên romanê li gorî dorhêla fizîkî ya tê de ne têne pêşkêşkirin û di navbeyna dorhêl û însên de hevgirtinekê tê sazîkirin. Mekan wekî “dike”ya bûyerên di romanê de têne vegotin e. Di romana Kurdê Rêwî de mekan gelekî teng e, bûyer piranî li gundê Qereqoyînê diqewimin lê gundê cînar yê ermenîyan jî mekanekî romanê ye. Gund li bintarê çiyayê Sînekê ye, gundî havîna diçine zozanan û zivistanê vedigerine malên xwe.

10. Rexneya Tematîk

Wekî her berhemên hunerî roman jî ji “mebest”ekî der diçe. “Mebest”a romannûs, hêmana herî diyar e ku dibe sedema nivîsîna romanê. “Mebest”a romannûs, ji peyama ku metna romanê di hewîne pêk tê. Ev peyama jî di xwîneran de fikr û bîrbirînekî çê dike. Ev hemû tişt; mebest, peyama, fikr û bîrbirin “binyada tematîk” a romanê pêk tînin. Mijara romanê her çî be bila bibe, her romanek xwedî peyamekî ye. Ev peyama di nav vehûna/tevîneka romanê de wekî fikreke diyar cî digire. Bi domana bûyerên romanê re, di nav kirû û diyardayan de ber dewam dike, li gorî dereceya reng û pîvana xwe girîngiyê bi dest dixê. Di romana Kurdê Rêwî de rexne herî zêde li feodalîzmê, zilm û zordariya axa û beganê tê kirin. Her wuha zordariya dewletê û zilma romê jî tê rexne kirin. Dîsa baweriyên pûç, urf û edetên berê yên xirab, statuya jinê ya di nav civakê de, kêmbûna xwendinê ya di nav gel de tê rexnekirin.

Encam

Realîzma sosyalîst mizgîniya hilatina pergaleke nû ya civakî dide. Ji bilî nîsandana rewş û tîpên heyî, pûçbûna wan jî pê re pêşkêş dike û dide zanîn ku ev rewş û tîpên heyî bivê nevé bêgav in ku hilweşin. Ji aliyekî din ve jî qala hilatina civakeke nû dike, bi hêviyeke xurt jî rabirdûyê heya îro dide rê û dahatûyekê radigihîne. Romana Kurdê Rêwî li ser realîzma sosyalîst ava bûye. Romaneke bi şêwaz, vehonana bûyeran, afirandina karakterên xwe ve romaneke klasîk e. Di romanê de, armanc; hişmendîkirin û şiyarkirina mirovan e. Roman hem xwedî şêwazeke dramatîk e hema jî xwedî şêwazeke ramanî. Wekî hemû romanên realîzma sosyalîst karakter reş û spi ne, li aliyekî karakterên erênî yên idealizekirî, li aliyê din jî karakterên nerênî-reş hene. Têkoşînek di navbera feodalîzm û sosyalîzmê de heye. Milkedar, axa, beg û pîr xwîna gundî, rênber û paleyan dimijin. Tekane arîkarê feqîr û belengazan partiya bolşevîk e û fikra sosyalîst e. Ji bo şiyarkirina gel bi dil û can dixebitin. Lê îşaretên hilweşîna pergala feodal hene. Şoreşa oktobirê ji bo mezlûman bûye mizgîniyekê.

Jêder

Çetin, Nurullah, (2019), Roman Çözümleme Yöntemi, Ankara, Akçağ Yayınları.

Forster, E. M., (2019), Roman Sanatı, İstanbul, Milenyum Yayınları.

Îbo, Sehîdê, (2009). *Kurdê Rêwî*. (trans) Omerxalî, Xanna, Stenbol, Weşanxaneya Avesta.

Îbo, Sehîdê, (2019). *Qurna Min*. (trans) Yıldırımçakar, Mehmet, Stenbol, Weşanxaneya Avesta.

Tekin, Mehmet, (2019), Roman Sanatı 1 Romanın Unsurları, İstanbul, Ötügen Yayınları.

Uzun Bir Sürgün ve Yitirilen Bir Gelecek

Abdullah Aren Çelik

1970’li yılların sonunda dilini ve kültürünü yaşaması için mücadele eden genç bir adam hapis yatmamak için ülkesini terk etmek zorunda kalır. İltica ettiği ülkede karşılaştığı ilk şey, korkunç bir yabancılaşma olur. Sürgünlüğünün ilk zamanlarını Suriye’de, kalanını ise Avrupa’nın çeşitli ülkelerinde geçirir. Topraklarından uzakta, başka bir dilin sancısı, başka bir dilin yabancı olduğu yaşadıklarını şu sözlerle dile getirir:

Dilim birden gereksiz, anlamsız, külfetli, bir varlık oldu. Beni koruyan, ifade eden, bana güç ve güven veren varlık olmaktan çıktı. Kendimi ifade edemez oldum. Dilimle birlikte benliğimi, kimliğimi yitirdim. Ben, ben olmaktan çıkıp ne olduğu bilinmeyen, uzaklardan gelmiş, yardıma muhtaç “bir yabancı, bir göçmen” oldum. Bana çok yabancı olan, istemediğim, arzulamadığım bir “yabancılar kategorisinin” üyesi, merkezde değil, periferide yaşayan bir topluluğun mensubu olmaya başladım. Yaşamım, deneyimlerim, düşüncelerim, birden anlamsızlaştı, değersizleşti.¹

Yukarıdaki sözlerin sahibi Mehmed Uzun. Çileli sürgün yılları sona erdiğinde ölmek üzereydi. Ülkesine kendi dilinde pek çok eser vermiş bir yazar olarak dön-

1 - Feridun Andaç’ın *Sürgün Edebiyatı, Edebiyatın Sürgünleri* isimli çalışmada Mehmed Uzun’un *Bir Hüzündür Ayrılık* isimli makalesinden alıntılanmıştır. Bağlam Yayınları, 1. Basım, S. 52

düğünde, artık doğduğu topraklara da yabancıydı. Zira hiçbir şey bıraktığı gibi değildi, hasta yatağında ölümle cebelleşirken, pek çok insanı kendi dilini terk etmiş buldu. Uzun'un ölmek için geldiği vatanında, uğruna mücadele ettiği dil ondan önce ölmeye başlamıştı. Ölüm kadar hazin olmalı bu karşılaşma.

Bir ulusun dille ilişkisi varoluşu kadar elzemdir. Dil, bir toplumda yaşayan her bireyin ilk evi, yarattığı belleği, kültürel değeri ve tarihsel serüveni konusunda kendisini koruyup kolladığı mekândır. Belki de bu nedenle, egemenler bir sömürge toplumunu asimile ederken önce dile yönelir. Dilin bunun temeli ve başlangıcı olduğunu bilir, zira dil farklı seslerin kelimelere dönüşmesinden ibaret değildir; her bir kelime, ses, cümle dizilimi ve vurgu bir kültürün, hayata bakışın ve düşünme biçiminin yansımasıdır. Bu nedenle bir dilin yok olması bir kültürün, bir kimliğin de yok olmasıyla eşdeğerdir.

Ngugi Wa Thiongo, *Zihni Sömürgeden Azâd* isimli kitabında bir anekdottan bahseder.

1952'de Kenya'da olağanüstü hal ilan edilmesinin ardından vatansever milliyetçilerin yönetiminde olan tüm okullara sömürgeci rejim tarafından el konularak, bu okullar İngilizlerin başkanlığındaki Bölge Eğitim Kurullarına tabi kılındı. İngilizce benim resmî eğitim dilim olmuştu. Kenya'da İngilizce, bir dilden daha fazlasını ifade eder oldu: O öyle bir dildir ki, tüm diğer diller onun önünde itaatle boyun eğmek mecburiyetindedir. Nitekim en onur kırıcı olan acı tecrübelerden birisi okul çevresinde Gikuyu dilinde konuşurken suçüstü yakalanmaktı. Suçluya işkence cezası veriliyordu –ve çıplak kıçlarına üç ya da beş kez sopa ile vuruluyordu- veya boyunlarına BEN APTALIM yahut BEN BİR EŞEĞİM yazılı bir tasmaya mahkûm ediliyordu. Bazen suçlular neredeyse ödeyemeyecekleri meblağda para cezasına çarptırılıyorlardı. Peki öğretmenler suçluları nasıl kısıvrak yakalıyorlardı? İlk bir öğrenciye bir düğme verilir, bu öğrenci o düğmeyi her kim ana dilinde konuşurken yakalanırsa ona vermekle yükümlüdür. Düğme kimin eline geçerse günün sonunda düğmeyi ona kimin verdiğini ötecektir. Böylece çocuklar cadı avcılarına dönüştürüldüler ve süreç içinde onlara, kendi toplumuna ihanet eden bir hain olmaktan kâr sağlamanın değeri öğretildi.”²

Bu çarpıcı hikâye, kendi dilinde konuşamamanın yarattığı huzursuzluk kadar bir toplumun adım adım yozlaşmasının da hikâyesidir. Uzun'un ülkesine döndüğünde karşılaştığı tablonun nasıl oluştuğuna dair bir fikir verebilir bu örnek. Kenya'daki okul-dil ilişkisi hemen hemen her yerde aynı şekildedir. Bu ve benzeri uygulamalar Güney Afrika, Asya, Güney Amerika'da da göze çarpar. Bu kıtalarda yaşayan pek çok halk, bağlı oldukları ülkelerin yönetimlerinde dilleri

2 - Zihni Sömürgeden Azad, Afrika Edebiyatında Dil Politikası, Ngugi Wa Thiongo, Hece Yayınları, Çev. Şebnem Nantu, Hece Yayınları, S. 37

yasaklanmış ve dahası asimile edilmiştir. Bu açıdan dünyada en çok konuşulan dilleri aynı zamanda dünyanın en günahkâr dilleri kategorisinde değerlendirmek yanlış olmaz.

Merceğimizi dünyadan Türkiye'ye çevirdiğimizde, özellikle Kürtçeye yönelik planlı bir asimilasyon politikası izlendiğini görmek mümkün. Söz konusu politikanın yansımalarını anlatmaya Şark Islahat Planı'yla başlayalım.

“Aslen Türk olup Kürtlüğe mağlup olmaya başlayan bervech-i âtî Malatya, Elaziz, Diyarbakir, Bitlis, Van, Muş, Urfa, Ergani, Hozat, Erciş, Adilcevaz, Ahlat, Palu, Çarsacak, Çemişgezek, Ovacık, Hısn-ı Mansur (Adıyaman), Behinsi (Besni), Arga (Akçadağ), Hekimhan, Birecik, Çermik, vilayet ve kaza merkezlerinde hükümet ve belediye dairelerinde ve sair mücessesat ve teşkilâtta, mekteplerde, çarşı ve pazarlarda Türkçeden maada lisan kullananlar evâmîr-i hükûmete ve belediyeye muhalif ve mukavemet cürmile tecziye edilirler.” (Madde 13)

24 Eylül 1925'te yürürlüğe konan bir kararname ile insanların, sokaklarda bile hangi dili konuşacaklarına karar veren bu uygulama, 12 Eylül Anayasasıyla birlikte tam manasıyla yasadaki yerini alır. 12 Eylül Anayasası'na kadar olan sürece bakmak bile Kürtçenin git gide neden bu kadar az konuşulup yazıldığını anlatmak açısından önemlidir. Şark Islahat Planı hayata geçirildiği gibi pek çok “asker sosyolog” Kürtler ve dilleri hakkında araştırma yapmaya başlar. O dönemlerde Kürtçe ve Zazacayı birbirinden ayırmaya, konuşulan dillerin de Türkçenin Orta Asya Türkmen beyliklerine kadar uzandığına dair tezler yazılmaya başlanır. Devletin “resmî sosyologları” bir yandan Kürtlerin (Zazalar da buna dâhildir) nasıl Türk; Kürtçe ile Zazacanın da nasıl Türkçe olduğunu anlatırken diğer yandan da neden Kürtçenin yasaklanması gerektiğini anlatır. Garip bir kafa karışıklığı olduğu muhakkak; eğer Kürtçe ve Zazaca aslında Türkçe ise neden sonraki yıllarda yasaklandığı sorusu da cevap bekler. Bilinçli bir şekilde yaratılan bu durum, çalışmayı yürüten sosyologlar için anlaşılabilir belki, ama bu kafa karışıklığına pek çok Zaza Kürdün de düştüğünü bilmek epey düşündürücü. Bugün bu konulara kafa yoran pek çok Zaza'nın birbirinden farklı düşündüğünü belirtmek lazım. Kimisi Zazaların Zaza olduğunu, kimisinin de Zazaların Kürt olduğunu iddia ediyor. Hatta daha ileriye gidecek olursak Türk ya da İrani kökene dayandığını yazıp çizen bile olduğunu belirtmek gerek. Yalnızca Türkiye'de değil, Zaza Kürtlerin yaşadığı diğer ülkelerde de aşağı yukarı aynıdır. Peki, neden Zazaların hangi dilin parçası oldukları ve kim oldukları bu kadar tartışılır oldu? Oysa bir dilin varlığından söz edebilmek için öncelikle bir milletin varlığını kabul etmek gerekir. Dolayısıyla Zaza kelimesinin geçtiği kaynaklara bakarak bir literatür taraması yaptığımızda karşımıza azımsanmayacak bir sonuç çıkar. Hâlihazırda elimizde “Zaza” sözcüğünün etimolojisi hakkında bir bilgi mevcut değildir, ama bu

kavram gerek Osmanlı arşivlerinde, gerek Arap, gerek İran ve gerekse Türkiye Cumhuriyeti kayıtlarında karşımıza çıkar. Osmanlı İmparatorluğu'na ait kayıtlarda "Zaza" sözcüğüne ilk kez Evliya Çelebi'nin *Seyahatname*'sinde rastlanır. Kitapta Zazalara, "Ekrad-ı Zaza"³ adını kullanır Çelebi. *Seyahatname*'de Zazalar hakkında şu bilgiyi aktarır:

"Bu şehre Palu kal'asından sekiz sâ'atde gelirken nehr-i Murâd üzre Çapakçur cistr-i aziminden ubûr ederken Bingöl yaylasına çıkan aşiret-i Hâltî ve aşiret-i Çekvânî ve aşiret-i Yezîdî ve aşiret-i Zâzâ ve Zebârî ve Lolo ve aşiret-i İzoli ve Şikâkî ve Kiki aşiretleri ki cümle iki yüz bin âdem-î Ekrâd ve on kerre yüz bin gûsfend-i devâbât olup bu cistr üzre Çapakçur beğinin âdemleri kuş uçurmayıp öşür alırlar."⁴

Seyahatname dışında Şemseddin Sami'nin *Kumus'ul Alam*'ında, Osmanlı'nın nüfus defterlerinde, ticari kayıtlarında, mühimme defterlerinde, salnamelerde ve resmi yazışmalarda Zaza ismi sıklıkla kullanılır. Çelebi, Zazaları Kürt olarak gördüğü gibi dillerini de Kürtçenin bir lehçesi olarak görür. Bu net yaklaşımın nedeni "Zaza" sözcüğünün kamusal alanda, siyasi literatürde, ticari kayıtlarda, gündelik hayatın içinde sık sık bir kavram olarak kullanılmasıdır.

Cumhuriyetin ilk yıllarında Kürtlerle ilgili pek çok rapor yazılır, bunlardan belki de en önemlisi adına Kürt Raporu da denebilecek Şark Raporu'dur. Bu raporlarda dil, tarih, kültür, antropoloji ve daha pek çok konuda onlarca çalışma hazırlanır. Bu çalışmaların temel fikri, Zazaların/Kürtlerin Türk olduklarının ispatı yönündedir. Oysa Mustafa Kemal Atatürk'ün *Nutuk*'unda Zazalardan bahsederken, onların Türk olmadıklarını anlarız. "Üçüncü maddede Erzincan ve Sivas arasında mütekâsif bir Ermenilik tahayyülü ilimsizlik ve vukufsuzluktan başka bir şey değildir. Harpten evvel bile buraların sakinleri kısmı azamı Türk ve kısmı kalili Zaza denilen Kürtlerden ve pek az da Ermeniden ibaret idi."⁵

Bu konuda Ziya Gökalp'in de farklı düşünmediğini belirtmek gerekiyor, zira *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler* isimli çalışmasında söyledikleri bu açıdan oldukça nettir. Ercan Çağlayan, *Zazalar, Tarih, Kültür ve Kimlik* isimli çalışmasında Gökalp'ten şu alıntıyı yapar:

"(...) Gökalp, Kürtlerin Kurmanc, Zaza, Goran, Soran, ve Lur olmak üzere beş kavimden müteşekkil olduğunu belirtir. Gökalp, söz konusu dilleri konuşanların birbirlerini anlamadıklarını, ancak beş dilin 'kadim Kürtçe' adı verilen eski bir Kürtçeden türediğini söyler. Ziya Gökalp, Zazaların kendilerini Kırd, Kurmancların

3 - Ercan Çağlayan'ın *Zazalar, Tarih, Kültür Kimlik* isimli çalışmasından alıntılanmıştır: "Evliya Çelebi, *Derviş Muhammed Zilli Evliya Seyahatnamesi*, IV. Kitap (iki cilt), Topkapı Saray Kütüphanesi Bağdat 305 Numaralı Yazmanın Transkripsiyonu- Dizini, YKY Yayınları, İstanbul, Haz. Seyit Ali Kahraman- Yücel Dağlı, S.67.

4 - a.g.e. S. 68

5 - Mustafa Kemal Paşa Nutuk, (1919-1920), C. I, Devlet Matbaası, İstanbul, 1934, S. 71-72

ise Kırdasi olarak adlandırıldığını belirtir ve Dımili olarak bilinen Zazalara, Zaza ismini Türklerin verdiğini söyler.”⁶

Atatürk'ün *Nutuk*'ta, Gökalp'in *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler* çalışmasında bahsettiği ve ayrı bir ırk oldukları anlaşılan Zazalar bir süre sonra resmî tezlerde Türkleşmeye başlar. Bu değişimin nedeni asimilasyona karar verilmesidir. Nitekim Türk Ocakları müfettişi ve aynı zamanda Muş milletvekili olan Hasan Reşit Tankut 1928-1932 ve 1960 yıllarında bir takım raporlar kaleme alır. Kaleme aldığı raporlarda Tankut'un ciddi manada kaleme aldığı raporlarda tutarsızlıklar görülmektedir. Çünkü ilk yıllarda hazırlanan raporlarında Zazaları “Kürt Müslüman” olarak tanımlarken, sonraki yıllarda hazırladığı raporlarda Zazaların Turani ırktan geldiğini iddia eder.

Orgeneral İzzettin Çalışlar'ın *Dersim Raporu* ismiyle yürüttüğü çalışmada yazdıkları özellikle dikkat çekicidir.

“Dersimlilerin bugün konuştukları dil Kürtçe değil, Zazacadır. Zazaların tarihte Jazik diye kaydettikleri boy olmaları akla çok yakın görünmektedir. Zazalara Zazak diyenler de vardır. Bugün Murat boyunu kaplayan bu boyun arasında dolaşanlar dillerindeki çok miktardaki Türkçe köklü kelimelerden bunların uzun müddet Türkçe konuştuklarına şüphesiz bir şekilde kanaat getirir. Çapakçur'da, Genç'te, Palo'da, Lice'de, Ovacık'ta, Hozat'ta, Çemişkezek'te, tesadüf olunan Kızılbaşların yuvarlak kafası geniş alnı, basık yüzü ile ve gözlerinin daima akın yollarını, uzakları araştıran cevvaliyeti ile Türk neslinden ayrı bir nesle bağlamak güç bir iş olur. (...) Zazalar hakkında gösterilen bu kısa izahat hangi cepheden bakılırsa bakılsın Zazalar'ın Orta Asya'dan gelmiş ve izzeti nefsinin en yüksek tanır bir neslin çocukları olduğu ve memleketlerinde zaten Farisleşmeye başlayan bu Türkmen çocuklarının göç ettikleri yerlerinde uzun müddet Acem istilası altında kalması yüzünden ana dillerini tamamen unuttukları ve fakat karakterlerini muhafaza ettikleri görülür.”⁷

Çalışlar'ın yazdıklarındaki anatomik tespitler kulağa ilginç geliyor olabilir. İnsanların kafatasına göre aidiyetlerinin hangi milletten olduğu konusu Almanya'da Hitler'in ideolojik propagandasının bir parçasıydı. Zazaların olmadığı, aslında köken itibariyle soylarının Türk boylarına dayanıyor tezlerine rağmen neden dilleri üzerinde baskı kurulduğu muamma.

M. Bülent Varlık'ın *Umumî Müfettişler Toplantı Tutanakları- 1936* isimli çalışmasında, Dördüncü Umumi Müfettiş General Alpdoğan'ın raporunda Kürtlerden ve Zazalardan bahseder. Raporda yazdıkları aslında Çalışlar'ın yapmak istediğinden farklı değildir, ama ortaya konan şeyler kendi kendini tekzip eder. Alpdoğan, Zaza ve Kürt yoktur tezine sıkı sıkıya bağlı olmasına rağmen şu cüm-

6 - Ercan Çağlayan, Zazalar, Tarih, Kültür ve Kimlik, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, S.86

7 - a.g.e. S. 88

leyi kurar: “Zaza ve Dersim mıntıkasında Kürt aşiretleri ve reislikleri görüyoruz. Bu bölgede asayişsizliği ve asıl çapulcu yapan bu aşiretlerin kendileridir.”⁸

Bu tespitten Dersim Zazalarının Kürt aşiretlerine mensup olduğunu anlıyoruz. Çalışlar’a göre, Alpdoğan’ın çapulcu olarak gördüğü Kürt ve Zaza aşiretleri Türk boyundan gelen insanlardır. Tam da bu noktada, hâsıl olan soru şudur: Bu insanlar Türk boyundan geliyorsa, neden farklı oldukları üzerinde ısrarla durulur? Dahası etnik kökenlerine dair vurgu neden “Kürt ve Zaza” şeklinde öne çıkar? Zazaların yoğun oldukları yerlerde çalışma yürüten pek çok asker, müfettiş ve milletvekili nedense işleri olmamasına rağmen üzerlerine vazife alıp yöre halkı hakkında kapsamlı araştırma yapma ihtiyacı hisseder. Gariptir ki bütün mesleki farklılıklarına rağmen Zazalar hakkında yapılan çalışmaların hepsinde vardıkları sonuç ve izlenmesi gereken yolun aynı olduğu yönündeki tespitlerdir. Hemen hemen hepsi bölgede yaşanan sorunların kaynağı olarak bu insanları gösterir ve çözümün nasıl olması gerektiği konusunda düşüncelerini yazar.

İkincisi, mektep işidir. Elâziz vilayetinde 7, Bingöl vilayetinde 1 mektep binası yapılıyor. Tunceli’de kiralık evlerde 7 ilk mektep açılmıştır. Türkçe bilmeyen çocuklara bu mekteplerde Türkçe öğretiliyor, Türk duygusu aşılanıyor. Bu mekteplere heves ziyadedir. Azamî üç sınıflı olacaktır. Köy mektepleri için daha amelî ve kısa müessir talim ve tedris usulleri konması faydalıdır. (...) Dördüncüsü: Tunceli içerisinde bulunan Türk soyundan Türkçe konuşan, dağ Türkçesi bilmeyen yersiz yurtsuz, şunun bunun yanında marabalık eden insanları yeni kurulan kaza merkezlerinde ve civarındaki araziye nakil ve iskân ederek toplamak istiyoruz. Toplu bir Türk camiası vücuda getirecek olan bu hususta da hazırlıktayız.⁹

Din ve dil bilimci ve aynı zamanda Almanya İslam Konseyi Yönetim Kurulu Üyesi Burhanettin Dağ’ın, Bingöl Üniversitesi’nde düzenlenen 1. Uluslararası Zaza Dili ve Sempozyumu’nda, *Zazaca’nın Farsça ve Deylemi Dilleriyle Olan İrtibatı ve Akrahahğı* isimli sunumunda Zazacanın kökeni hakkında üç ayrı varsayım olduğunu yazar:

Zaza, Dımlı, Dılamı, Dılmık veya Deylemi kavramları üzerinde biraz durmak istiyorum. Zaza kelimesinin kökeni veya bunun kimler tarafından kullanıldığı konusunda üç varsayımdan söz edebiliriz. Birinci varsayıma göre Dicle nehri-nin yukarı taraflarında yer alan ve Zazana olarak adlandırılan bölgeye mensup olanlara Zaza denmektedir. Bu isimlendirmeyi milattan önce 522 ila 486 yılları arasında hükümlük süren Ahamenişler Kralı Büyük Daryüş’ün Bistuun kitabesinde görmekteyiz. 23 milletin kralı olan Daryüş, Zazana bölgesindeki kavga-sından söz etmekte. Bu varsayımdan hareket edersek Zazaların en az 2500 se-

8 - M. Bülent Varlık, Umumi Müfettişler Toplantı Tutanakları- 1936, Dipnot Yayınları, S129

9 - a.g.es S. 149

neden bu yana bu bölgede yaşamakta olduklarını söyleyebiliriz. Kürt araştırmacı Mehrdad R. İzady de bu tezi savunuyor ve Zazaların önce Zazana bölgesinde yaşadıklarını, daha sonra Hazar Denizi sahillerinde bulunan Deyleman mıntıkasına göç ettiklerini ve sonra da yine çeşitli siyasi ve sosyal çalkantılardan dolayı günümüzde yaşadıkları bölgelere muhaceret ettiklerini söylüyor. Zaza kelimesi hakkında var olan ikinci varsayıma gelince; bu varsayıma göre Zaza isimlendirmesi, Zazalarla iç içe yaşayan veya onlarla komşu olan Kürtler veya Ermeniler tarafından, onları aşağılamak üzere kendilerine verilmiş bir isimdir. Nedenine gelince kullandıkları kelimelerin ve bilhassa fiil çekimlerinin başkaları tarafından zorlukla fark edilecek, farklılık arz edip oldukça benzer 'sibilant' olmasından dolayı, dili anlaşmazlıklar anlamında bu isimlendirme yapılmıştır.

Dağ, üçüncü varsayım konusunda sözlerine şöyle devam eder:

(...) Cumhuriyetin ilk yıllarında başlayıp son dönemlere kadar devam eden geçmiş hükümetlerin inkâr ve asimile politikasının resmî mimarlarından Prof. Hasan Raşit Tankut tarafından yapılmıştır. Bu yoruma göre; şimdiki Zazalar çok eski çağlarda olduğu gibi bugün de yüksek kayalar üzerinde durduğuna inanırlar. Sivri ucunu güneşin ışığı ilk defa çavan yüksek kaya onların mihrabı ve niyazlarının uçuşup toplandığı kutlu bir yerdir. Böyle olunca da Zazalara kayalılar demek doğru olur. Eski Türkçe'de kayaya ve taş a "sak" derlerdi. Sak aslı ile kayalı sıfatı "sasak" olacağına göre Zazaların asıl ismi "sasak" olarak kabul etmek kabildir "k" harfleri ekseriyetle düşer ve o zaman "sasak" kelimesi "sasa" olarak kalır. Sasa nasıl Zaza olmuşsa tabii ki buna da bir izahat yok.¹⁰

Tankut'un üçüncü varsayımı oldukça ilginç, fakat ilginç olduğu kadar ikna edici olmaktan da uzak. Görüldüğü gibi örnekler çoğaltılabilir. Ermeni dil bilimciler, İranlı, Türk, Arap, Rus, Kürt ve Zazalar hakkında çalışma yapan diğer araştırmacıların vardığı sonuç birbirinden farklı.

Yapılan bütün çalışmalar alt altta konulunca, çok şey söylendiği ama aslında bir şey söylenmediği görülecektir. Bu nedenle yazının başında sorulan soru hala aynı yerde duruyor: Zazalar kimdir?

Her ne kadar bu konuda Osmanlı ve Cumhuriyet arşivleri bize bir takım doneler sunuyorsa da bunun ne denli yetersiz olduğunu gördük. Belki de dil bilimcilerin söyledikleri bu konuda bir fikir verebilir, bu kafa karışıklığını dağıtabilir. Tebriz İslami Azad Üniversitesi'nden Dr. Ali Dehkan, Bingöl Üniversitesi'nde 2011 yılında gerçekleşen 1. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu'nda *Zazaca, Yeniden Tanıtılması Gereken Bir Dil* başlığıyla bir makale sunar, sunumunda Zazalar hakkında şunları söyler:

10 - Burhanettin Dağ, Zazacanın Farsça ve Deylemi Dilleriyle Olan İrtibatı ve Akralığı, Bingöl Üniversitesi Yayınları, S. 210

Şuna inanıyorum ki, deliller ve kanıtlarla ispatlıyorum ki, Avesta dillerinden imiş ki zamanla Zazalar, Hazar Denizi'nden etrafa hicret etmiştir ve daha sonra bu konu ya kasıtlı olarak veya sehven unutulmuştur. (...) Yâsemî de şöyle diyor: Yirminci asırda araştırmacıların araştırmasında şu sonuca varılmıştır: Kürtler arasında İranlı diğer bir sınıf daha vardır ki Goran ve Zaza adıyla anılırlar ve bunlar Kürtlerden ayrı bir ırktır.¹¹

Bir başka örnek de Rus dil bilimci Vladimir Feodoroviç Minorskiy'nin yaptığı çalışmada karşımıza çıkar. Çağlayan, *Zazalar, Tarih, Kültür ve Kimlik* isimli çalışmasında Minorskiy'den şu alıntıyı yapar: "Minorskiy, F. C. Andreas'a referansla Zazaların kökeninin Deylemilere dayandığını ve Dımlı isminin Hoy'daki Dümbüliler ile bağlantısı olduğunu ileri sürer ve şöyle der: 'Bugün Türkleşmiş olan ve 19. yy. başlarından beri Hoy bölgesinde aktif olarak yerleşik bulunan Dümbüliler de Dımlı ile bağlantılı görünmektedir.'¹²

Çağlayan aynı çalışmasının devamında bu sefer David Mc Kenzie'nin de benzer bir düşünceye sahip olduğunu belirtir.

Zazacanın Farsça ve Deylemi Dilleriyle Olan İrtibatı ve Akrabalığı isimli makalesinde Zazaca'nın kökeni ve diğer dillerle ilişkisine değinen Dağ, Zazaca'yı müstakil bir dil olarak gördüğü gibi, Siverek, Eğil, Dicle, Dersim'de konuşulan Zazacayı da lehçe olarak tanımlar.

Zazaca'nın farklı Kürdi lehçelerle de irtibatı ve akrabalığı elbette vardır. Bu konuda uzmanların bizleri aydınlatmalarını talep ediyoruz. Şu hususun altını önemle vurgulamak istiyorum. Zazaca bir lehçe veya diyalekt değil müstakil bir dildir. Zazaca'nın Bingöl, Dersim, Çermik ve Siverek lehçeleri var. Zazaca'ya bir lehçe olarak yaklaşanların ilmi hiçbir dayanağı yoktur. Dünya genelinde İrani diller konusunda uzman olan ve Zazaca hakkında araştırmalarda bulunan çağdaş dil bilimcilerin hiç biri böyle bir görüşü savunmuyor.¹³

Dağ'a göre Zazaların dilleri müstakildir ve bu minvalde ne Kürt'türler ne de İranlı. Bu noktada Zazaki üzerinde bir dil fetişizmi olduğunu söylemek yanlış olmaz. Elbette bir milletin aidiyetini yalnızca dil üzerinden tartışmak doğru değildir. Dil, din, mezhep, kan bağı, kültürel değerler, ortak tarih, destanlar, mitler, ideolojik bağlar, ırk gibi kavramların bir arada düşünüldüğü bir millet tasavvuru yapmak gerekiyor. Ancak dilin bütün alanlara nüfuz eden etkisi göz önünde bulundurulmalıdır. Dolayısıyla bir milleti sadece konuştuğu "dili" üzerinden konuşmak ve sorunlarına çözüm bulmaya çalışmak yetersiz kalır.

11 - Ali Dehkan, *Zazaca, Yeniden Tanıtılması Gereken Bir Dil*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Çev. Yrd. Doç. Dr. Nusrettin Bolelli, S. 162

12 - Ercan Çağlayan, *Zazalar, Tarih, Kültür ve Kimlik*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, S. 61

13 - Burhanettin Dağ, *Zazacanın Farsça ve Deylemi Dilleriyle Olan İrtibatı ve Akrabalığı*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, S. 209

Yaşar Aratemür, 1. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu'nda, "Arkaik Kaynaklardan Modern Kaynaklara Zazaca ve Zazalar" Adıyla bir sunum yapar. Bu sunumda, Zazacayla ilgili çarpıcı iddialarda bulunur.

Zazaca üzerine en önemli çalışmayı yapan kuşkusuz Alman İranolog Oskar Mann (1867-1917)'dir Zazaca'nın kendi başına bir dil olduğunu hiçbir kuşkuya yer bırakmayacak şekilde ortaya koymuştur. Oskar Mann, Prusya Bilimler Akademisi'nin, Batı İrani Dilleri'nin dokümantasyonu ve gramatik analizi için verdiği görevle Orta Doğu'ya yaptığı seyahatte 1901-1903 yılları arasında İran'da, 1906-1907 yıllarında da Anadolu'nun Doğu ve Güneydoğu Bölgelerinde araştırmalarda bulunarak, İran'i diller ile karşılaştırarak, aralarındaki farklılıkları da tespit etmiştir. Oskar Mann'ın, 04 Temmuz 1906 tarihinde Siverek'ten Prusya Bilimler Akademisi'ne gönderdiği bir mektupta da şöyle yazdığını görüyoruz: Benim tarafımdan çoktan savunulan, Zazaca'nın Kürtçe olmadığı görüşü, bu dilin Awraman (Hewraman)'da konuşulan dillerle, İran- Gurani lehçeleriyle yakın akrabalık ilişkileri içinde olduğunun saptanmış olmasıyla bir kez daha onaylanmış oluyor. Orta Farsça'nın Turfan metinleri'nin Kuzey Lehçesi'ndeki tüm tuhaf fiil çekimlerini Zazaca'da tekrar görüyorum.¹⁴

Yapılan araştırmalar, yazılan raporlar, kararname... İster Zazaların/Kürtlerin ayrı bir ırk olduklarını ispat için isterse de inkâr için hazırlanmış olsunlar, aslında tek bir gerçeğin altını çiziyorlar; Zazaların/ Kürtlerin varlığının.

Dünyada kendi dilini diğer dillerinin emperyalist hırsından korumak isteyen pek çok millet vardır, dünya bu karşıtlık iklimi ekseninde pek çok çatışmaya tanık olmuştur. Asimile edilen diller kadar buna karşı mücadele eden dillerin başarıları da mevcuttur. Bu mücadele tarihi pek çok insan için umut kaynağı olarak bir kenarda durur. Bu bakımdan, sömürgecilerin dili yok eden politikalarına karşın mücadele eden halkların deneyimi çok şey anlatır bize.

Ngugi'nin düğme ile ilgili anlattıkları, pekala bir metafor olarak kullanılabilir burada. Düğmeyi Mehmed Uzun ölüm döşegindeyken elinde tutuyordu hâlâ. Bu korkunç yıkımı anımsatmak, olanları hatırlatmak, ölmeden önce bu düğmeyi ve yarattığı yıkımı gösterecek bir el arıyordu kendine. O nesnenin yarattığı inkârı bildiği kadar, o nesneden yola çıkarak dilini kurtarmak için çıkarılacak dersi de biliyordu. Küçükken dilini konuşmasın diye elden ele dolaştırılan düğme, bir halkın yanlış kapanan gömleğinin ilk nesnesiydi. Bugün bu nesne hâlâ Kürt çocuklarının elinde. Fakat bu düğmenin varlığı, yanlışın nerede olduğunu hatırlatması bakımından önemli. Kapanan her ilik, çözülüp doğru bir şekilde tekrar kapatılmalıdır. Böylece her Zaza/Kürdün iki yakası arzu edilen şekilde kapanacak ve ölüm döşegindeki bir adamın boşuna sürgün hayatı yaşamadığı kulağına fısıldanacaktır.

14 - Yaşar Aratemür, Arkaik Kaynaklardan Modern Kaynaklara Zazaca ve Zazalar, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 1. Baskı, S. 232

Öyleyse ne yapmalı?

Bunun için mutlak suretle bir komisyon kurulmalı, Zaza/Kürtlerle ilgili arşivlerde tutulan belgeler bu komisyonca titizlikle incelenmelidir. Çıkan sonuçlar ışığında bir yol izlenmeli ve dilin, kültürün, tarihsel serüveninin yaygınlaştırılmasına odaklanılmalıdır. Ortak sözlük, ortak alfabe kurulacak bu komisyonca belirlenip aynı düşünce etrafında milletin kümelenmesi sağlanmalıdır. Aksi halde, yaratılan bu karmaşadan yolunu bularak çıkmak Zaza/Kürtler için zor olacaktır.

خواوهندی (میینه) ژن له ئەفسانەیی کوردیدا

Şetav Naderi

پوختە:

له خویندنهوهیهکی وردی ئەفسانە کوردیهکان، به دیدیکی ئایین ناسی و فلسفه ناسی دهگهینه ئەو باوه‌په‌ی که زۆر شت هه‌بوه له (باوه‌پ و نه‌ریت) له ناو ئەفسانە، ئیمه به ئەفسانەمان ده‌زانین، که‌چی ده‌رکه‌وت ئەمانه‌ رۆژانیک ئه‌رکی ئایینی بوونه‌مه‌به‌ست ئایینه‌ زه‌مینه‌کانه‌-و داب و نه‌ریتی ئیو کۆمه‌ل بوونه‌و رۆژانیک به‌ ئه‌رکی ئایینی و پیرۆزیه‌وه په‌ی‌په‌و کراون، وه‌ک ناشتنی زیندوو، قوربانی کردن بۆ مرۆف. له‌م باسه‌دا گه‌رانه‌وه و پشکنینی ئەو سه‌رچاوانه‌ی باسیان له ئەفسانەیی کوردی کردوو، هه‌ندێ گه‌رانه‌وه هه‌ن که تێیدا باس له خواوه‌ندی میینه‌ کراوه. پاشان رییازی به‌راوردکاری که تێیدا لیکچووون و جیاوازی له ئیوان ئەفسانەیی کوردی و ئەفسانەیی گهلانی دراوسێ به‌کار هێناوه بۆ تێگه‌یشتن له ئەفسانەیی کوردی. بۆیه‌ له‌م لیکۆلینه‌وه‌دا هه‌ول دراوه‌یه‌که‌م: له‌ رووی تیۆریه‌وه‌ پێناسه‌ی ئەفسانە بکری و پاشان رۆلی خوداوه‌ند و جوهره‌کانی له ئەفسانەکاندا. هه‌روه‌ها هه‌ول دراوه‌ پێناسه‌ی خوداوه‌ند وه‌ک جوهریکی تایه‌ت قسه‌ی له‌ سه‌ر بکریت به‌ تایه‌ت خواوه‌ندی میینه‌. لایه‌نی تیۆری بریتیه‌ له‌ قسه‌ کردن له‌ سه‌ر چیه‌تی ئەفسانەیی کوردی و تایه‌ته‌ندیه‌کانی و هه‌روه‌ها رۆلی میینه‌ تێیاندا. هاوکات باس کردن له‌ تایه‌ته‌ندی میینه‌ له‌ ئەفسانە و فولکلۆری کوردیدا.

وشه‌ سه‌ره‌که‌کان: خوداوه‌ند، ژن (ئافره‌ت)، ئەفسانە، ئەشکه‌وت، مرۆف، ئایین

Abstract: Through a deep study of Kurdish myths from a religious and philosophical point of view, we found that they contain many beliefs and rituals, and they were interpreted as myths, such as the burial of the living and offering the sacrifices, where they were referred and searched for sources that talk about the Kurdish myth, in some of them talking about female goddess and then taking the form of a comparison between the Kurdish myth and the myths of neighboring peoples in terms of similarities and differences between them to understand the Kurdish myth. Through this research, first: Defining the myth theoretically and

then the role of the gods and their types in the myth, as well as trying to define the gods, especially the female ones, the theoretical aspect includes the essence of the Kurdish myth and its characteristics, as well as the role of females in it with the search for female characteristics in myth and Kurdish folklore.

Key vocabulary: Gods, woman, the myth, the cave, The Human being, The religio

پیشه کی

ئه فسانه به رهه می خه یال و یه کهم شیوازی بیر کردنه وه یه له میژووی هزری مروڤایه تیبدا. بالام ئه گهر چی ئه و شیوازی بیر کردنه وه یه ساده و ساکاره، مانای قول و شاراوه شی تیبدا. تا چهند مروڤ پیش بکه وی پئویستی به وه یه بیر له و ئه فسانانه بکاته وه. بۆیه له م توپژینه وه دا هه ول ده درئ تاوتووی ئه فسانه به گشتی و خواوه ندی مینه له ئه فسانه ی کوردی به تایهت بکرئ. له وانیه یه کیکی پرسی ئایا شتیک هیه به ناوی ئه فسانه ی کوردی چ جای خواوه ندی مینه؟ هه لبهت لای لیکۆله ران هیشتا وه لامی ئه م پرسیاره به ره های ساغ نه بۆته وه. به لام ده توانین په نجه رابکشین بۆ ناوچه به کی دیرین که به نیشتمانی دایکی بیرو باوه ره ئه فسانه یه کان ده ژمیرد ریت ئه ویش ناوچه ی میژو پۆتامیایه. پاشان به و پییه ی ئه م ناوچه یه به شیکه له جوگرافیای کوردستان و به ذلی کوردستان داده نرئ و هه ره له میژوه چهندان ئه فسانه و بیروباوه ری جیاواز سه ریان هه لداوه له ناو ئه و گه ل و نه ژادانه ی که تیبدا ژیاون کاریکه ری هه بوه له سه ر ژیان و دیدو جیهانبینیان.

لیروه و ئیمه ده توانین بلین کوردستان جینشینی و زادگه ی ئه فسانه جیاوازه کانه. یه کیکی له و ئه فسانه ناسراوانه ئه فسانه ی مینه واته خواوه نده مینه کانی وه ک شاشکا و ئه شتار و ئه ناھیتا. هه لبهت تا نیستا لیکۆله ره میژوویه کان ئه وه نده یان بۆ ئیمه باسکردوه، به لام ئه گهر لیکۆلینه وه ی زیاتری شوینه وارناسی بکرئ، ده شتی زیاترمان بۆ ئاشکرا بی له و باره وه. ئه مه ش ئه رکیکه بۆ لیکۆله ره وانی تر به جی ده هیلین.

رپبازی لیکۆلینه وه (میتۆدۆلۆجی)

رپبازی لیکۆلینه وه له م باسه دا گه رانه وه و پشکنینی ئه و سه رجاوانه یه باسیان له ئه فسانه ی کوردی کردوه، هه ندیک گیرانه وه هه ن که تیبدا باس له خواوه ندی مینه کراوه. پاشان رپبازی به راوردکاری که تیبدا لیکچوون و جیاوازی له نیوان ئه فسانه ی کوردی و ئه فسانه ی گه لانی دراوسی به کار هینراوه بۆ تیگه یشتن له ئه فسانه ی کوردی. بۆیه لیکۆلینه وه که بۆ دوو به شی سه ره کی دابه ش کراوه: یه کهم له رووی تیۆریه وه هه ول دراوه پیناسه ی ئه فسانه ی بکرئ و پاشان رۆلی خواوه نده و جوړه کانی له ئه فسانه کان دا. هه روه ها هه ول دراوه پیناسه ی خواوه نده وه ک جوړیکی تایهت قسه ی له سه ر بکریت، به تایهت خواوه ندی مینه. لایه نی تیۆری بریتییه له قسه کردن له سه ر چیه تی ئه فسانه ی کوردی و تایه مه ندیه کانی و رۆلی مینه تیاندا. هاوکات له سه ر تایه ته ندی مینه له ئه فسانه و فۆلکلۆری کوردیدا باس کراوه.

نایینی کوردان

کوئترین نایین له شانده ری کوردستان بووه و ئه و نایینه به رده وام بووه و به کوردستاندا بلا بووه ته وه و گه یشتوه ته سو مه ره یه کان و ئه وانیش له گه ل خویان بر دوویانه ته

خوارهوه و په‌ره‌یان پێداوه و به‌ده‌وربه‌ردا بڵاویان کردووه‌ته‌وه تا گه‌بشتووه‌ته‌وه‌ی له‌ لورستان (گلگامشی) پاشا و پاله‌وانی سۆمهری وه‌ك خوداوهندیك بپه‌رستن گلگامش یه‌كێكه له‌و خوداوهندانه‌ی كه له‌ لورستان و له‌لای خه‌لكه‌كه‌ی پێشانی لای كاسییه‌كان، گه‌بشتووه‌ته‌وه‌ی پله‌ی خوداوهندا. ئە‌گه‌ر سۆمهریه‌كان ئایینیان به‌ ده‌وربه‌ری خۆیاندا بڵاوكردووه‌ته‌وه، ئە‌ه‌وا نابێ ئە‌وه‌شمان له‌بیر بچێ، كه له‌ كوردستان هاتوونه‌ته‌ خوارهوه، كوردستان پاش كوچێ ئە‌ه‌وان بێ دانیشتوان و بێ ئایین نه‌بووه، هه‌روه‌ها په‌یوه‌ندی‌شان له‌گه‌ڵ خه‌لكی كوردستان نه‌پراوه، چ به‌ شه‌رو به‌ ناشتی، ئە‌وه‌ش ئە‌مانگه‌په‌نێته‌وه‌ی كه كوردستان، ئە‌گه‌ر جیگای سه‌ره‌له‌دانێ كۆتێرین ئایینه، پاش ئە‌و سه‌ره‌له‌دان‌ه‌ش هه‌یچ رۆژگاریك بێ ئایین نه‌بووه، هه‌رده‌م زیاتر له‌ ئایینیکی تیدا بڵاوبوو، كه‌واته (ئایینی كوردستان) و (ئایینی كوردان) ئە‌گه‌ر بگوترێ و بنووسرێ، شتیك نییه‌ بێ بنه‌ما، هه‌ر ئە‌وه‌شه‌ وای كردووه له‌ میژوودا (ئایینی كورد- دین كورد) باس بكرێ، محمه‌د عه‌لی سه‌جادی ده‌نوسێ له‌ناو خوداوهند و كه‌سایه‌تیه‌ ئیلامیه‌كان، ئە‌وه‌ی كه زانراوه (ناوی تۆی - Nazi، ناوی، كوردی - kurdi)، ئە‌وه‌ی ناوی «كورد» مان بیره‌خاته‌وه.^۲

ئە‌وه‌ی تێره‌ نه‌ك هه‌ر باسی- ئایینی كورد-مان بۆ ده‌كات، به‌لكه ناوی خوداوهندیكمان بۆ دێنێ، كه پێی گوتراوه- كورد- خوداوهندی كورد. هه‌روه‌ها سه‌ره‌هنگی داودانی له (324ك=935ز) له‌ شیعریكدا ئاوا باسی ئایینی كوردان ده‌كات:

سه‌ره‌هنگ ده‌ودان سه‌ره‌هنگ ده‌ودان

ئە‌ز كانامن سه‌ره‌هنگ ده‌ودان

چه‌نی ئیرمانان مه‌گێلم نه‌هه‌ردان

مه‌كۆشم په‌ری ئایینی كوردان³.

ئە‌و ئایینه‌ كۆن و له‌میژینه‌ی كورد له‌ سه‌رده‌می زه‌رده‌شتیه‌تدا چاكتر روون ده‌بیت‌ه‌وه و باس ده‌كرێ.

له‌ میژوووی ته‌مه‌نی ئایین له‌كوردستان بۆ مان ده‌ركه‌وت، كه په‌یكه‌ری (خوداوهندی دایك) بۆ زیاتر له (30 هه‌زار ساڵ) له‌وه‌و پێش ده‌گه‌رپه‌ته‌وه، هه‌ر ئە‌و په‌یكه‌ره‌شه‌ له‌ به‌رده‌وامی په‌رستندا دوا‌جار ده‌بێ به (بت) و ئە‌وه‌ی بۆ خوداوهندی دایك ده‌كرا، له‌ په‌یكه‌ر و رپۆره‌سمی په‌رستن بۆ خوداوهنده‌كانی تریش ده‌كراو مروقیش به‌رده‌وام بپروای به‌ خودا هه‌بووه⁴، به‌لام خودا له‌ ئایینیكه‌وه بۆ ئایینیکی تر جیا‌بووه له‌گه‌ڵ ئە‌و جیا‌یه‌شدا ئایینه‌كان هه‌موویان به‌كن⁵. ئایینه‌كان هه‌موویان یه‌كن به‌و مانایه‌ی هه‌موویان باوه‌ری ئایینیان هه‌یه و رپۆره‌سمی په‌رستیان هه‌یه و شوینی په‌رستنی خۆیان هه‌یه و كات و رۆژ و ساڵ و مانگی پیرۆزی تایه‌ت به‌ خۆیان هه‌یه و كه‌سایه‌تی پێخه‌مبه‌ر و پیاو چاکی خۆیان هه‌یه و ده‌قی له‌به‌ركراو، یان نووسراوی خۆیان هه‌یه و دوا‌جار خودا- و - خوداوهندی - تایه‌ت به‌خۆیان هه‌یه- ئە‌گه‌رچی هه‌ندی ئایین بێ په‌یامبه‌ر و خودان، ئە‌و ئایینه‌ له‌ كوردستان

1. نازشاك سفاراستیان: كورد و كوردستان، وهرگێڕانی: نهمین شوانی، بڵاو كراوی (ناراس) چاپی دووم، هه‌ولێر ۲۰۰۰.

2. د. ممولود نبیرا هه‌م حه‌سین، گه‌ڕان به‌ دوا‌ی ئە‌مه‌ریدا، بڵاو كرده‌وه‌ی (ناراس) چاپی یه‌كهم، هه‌ولێر ۲۰۰۲.

3. دین له‌ هه‌مراماندا؟

4. مه‌وش و احد دوست، ریکرده‌ی علمی به‌ اسطوره‌ شناسی، (سروشیت انتشارات صدا و سیما) چاپ اول تهران- ۱۳۸۱.

5. نور ثروب افرا، الماهیه و الخرافه، دراسات فی المیتولوجیا الشعریه، ترجمه، هیفاء هاشم، مراجعه: جدل کریم ناصیف، منشورات وزارة الثقافة الطبعه - الاولى، دمیشق- ۱۹۹۲.

بلاونه بوونه ته وه- جا ئه و خوداوه نده له سه ر زه ويدا مرؤف به رجه سته ی کردبئ، له (بت- په يکه ر) ئیک، یان ئه وه ته له که سایه تیه ک، یان له ئاسمان به دوا ی دا گه رابئ و له ئه سته یه و مانگ و رۆژدا وینای کردبئ، یان پئی وابووئ له سه ره وه ی ئه م به رچاوانه یه و به چاوی سه ر نایه زئ، یان دواجار هاتبته سه ر ئه و باوه ره ی- خودا- ئه وه تا له ئیو دلی مرؤفا، جا به گویره ی ئه قل و ئایینی مرؤف، خودا له هه ر جیگایه ک له و جیگایانه بووئ، هه ر خۆشی ویستوه و په رستوه یه تی و لئی ترساوه و داوا ی یارمه تی لیکردوه، ئه مانه ش هه مووی هۆبه کی سه ره کین بۆ ئاین گۆریین و زۆر ئایینی، که ئه م په وشته ئیستاش مرؤفا یه تی لئ رزگار نه بووه.

ئایین له کوردستاندا خاوه نی ته مه نئیکێ درېژ و هه مه جوړی ئایینییه، ئه سته مه بتوانرئ، ئه م هه موو ئایینه له لیکۆلینه وه په کی ئاوا به سه ر بکریته وه، بۆیه لیره به سه ر زۆربه ی زه مه ن و ئایینه کاندایه ده ده یین و خۆمان ده گه ئینیه سه رده می ئایینی میترا یی- مه ره په رستی- و له وپوه هه لوه سته یه کی کورت ده که یین و به په له خۆ ده گه یینیه سه رده می ئیسلام له کوردستاندا. له په کیک له و ئایینه ئایینی (مه ره- میترا) یه، که به کۆنترین ئایینی گشتگیری جیهان ده ژمیردرېت، سه رچاوه ی ئه م ئایینه ئه و میلیله تانه بوونه که له سه ر خاکی کوردستانی ئیمرۆدا ده ژیان و خه لکی ئه م و لاته به گشتی، به ر له هاتنی ئایینی زه رده شت زۆربه یان له سه ر باوه ری ئایینی میترا یی بوون.⁶

دیاره له ئایینی مه ره په رستی (4)- میترا دا، رۆژ، رووناکی، ناگر پیروژبووه و گه یشتوه ته راده ی په رستن، به پیروژ زانیینی خۆر لای میترا ئه کان ئه وه نده گه وره یه رۆژانه دووجار کرنۆشی بۆ ده بن و سوپاسگوزاری خۆیان بۆ میترا ده رده بن.⁷

دیاره ئه و رۆژ به پیروژ زانیین و به خوداوه نده زانیینه ریشه که ی ده گه رپته وه بۆ خوداوه ندی هه تا- ئۆتۆ- سۆمه ری، که په کیک بووه له خوداوه نده زۆره کانی سه روست، به لām لای میترا یه کان بووه به په کانه هیز و خوداوه نده، هه ر ئه و پیروژیه شه ده چپته ناو ئایینی (زه رده شت) و ئه ویش شوئینیکی به رز و پیروژ بۆ رۆژ و رووناکی و ناگر داده نئ، به لām ناگاته ئاستی خوداوه نده و په رستن دواجار ئه و فکریه یه، فکریه ی پیروژ پارگرتنی رۆژ و رووناکی و ناگر ده چپته ناو زۆربه ی ئایینه کانی دواترو به شیوه ی جیا جیا خۆی غمایش ده کات. داگیرساندنی (مۆم، چرا) له سه ر ریکاگان و شوئینه پیروژه کان و گۆرستانه کان به تابه ت له ناو مه زارگه ی پیاوه پیروژه کاندایه (داگیرساندنی مۆم له ناو کلیساکانی مه سیحیه کاندایه) سه رچاوه که یان ده گه رپته وه بۆ میترا ئیزم.⁸ هه ره ها داگیرساندنی مۆم و فتیل و چرا له لاله ش لای ئیزیدییه کان، ئه ویش هه ر په یوه سته به و ریشه وه، هه رچه نده رای وا هه یه، که ئیزه دی ریشه ی کۆنه و بۆ سه رده می سۆمه ریه کان ده گه رپته وه، به لām هه ر چۆنئ بئ رووناکیه و په یوه ستن به په که وه، له باره ی کۆنی ئایینه کانه وه بۆ زه رده شتیش رای جیاواز هه یه، که زۆر کۆنه و ئه و میژوه ناسراوه ی سه ده ی حه وته م و شه شه می پيش زاین میژوونکی په کانه نیه گه لئ سه رچاوه ش هه ن که (ژیا نی زه رده شت) ده به نه وه بۆ 6000 و 5000 و 4000 سال پيش زاین.⁹

هه ره ها هه ن که باوه ریان وایه میژوو زیاترله زه رده شتیکی به خۆیه وه دیوه، ئه گه ر زۆری ئه و زه رده شتانه شتیکی گۆماناوی بیت، ئه وا زۆری ئایین له کوردستان شتیکی به رچاوه

6. موسا محمد خدر، ئایینی زه رده شتی له سه رده ی ئیسلام تا سه رده می بوه یه یه کان، زانکۆی سه لاحه دین کۆلیجی نه جیهات، به شی میژوو، هه رلیز 2004. - 6

7. ناماز جاف، سیخۆری به نامیزی سیخۆری و لیکۆلینه وه له میشک و پاراسایکۆلۆجی، به رگی یه کم، چاپخانه ی توفسیتی کار، سلیمان 2002. - 7

8. دین له هه ورماندا - 8.

9. نهنداز حه ریزی، نینگار کردنه وه ی نافیستا، نامه ی مه نیه تی زه رده شت، به شی یه کم، شوئینی چاپ (2) سالی چاپ (2) - 9.

دینی خەلکی کورد و کورد خەلکیکی دین باوەرن، لە پێش ئیسلام، ئەو خەلکە مەهرپەرست بوون و پاشان بوونە زەردەشتی و لە سەردەمی ساسانیەکان سەرپەرانی ئایینی زەردەشتی، ئایینی مەسیحی و مانەووی و مەزەدە کیش لە یتو کوردان هەبوو، هەریەکە لە وانە خەلکی خۆی هەبوو¹⁰.

ئەگەر پێش ئیسلام کوردستان ئەو هەموو ئایینە هەبوو، ئەوا بە ئیسلام بوونی زۆربە کورد، نەتوانی ئایین و ئاینزاکانی تری کوردستان بێریتەوه، دیسان چیرۆکی ئیسلام بوونی کورد، چیرۆکیکی زانراوه و سەرچاوهی زۆر و گرنگی هەیە.

میژووی ئایینی کورد

کورد وەکو میللەتیک، وەک هەر شتیکی تری خۆی میژووی ئایینی خۆشی هەیە، بەلام ئەم ئایینە کامەیه و لە چ سەردەمیکیدا؟ بۆ وەلایە ئەم پرسیارە باشتەر وایە سەرەتا بپرسین! لە چ کاتیکیه وە مەرۆف لە کوردستاندا دەژی؟ زاناکان زنجیرە چیاکانی زاگرووس بە ئیوەندیکی گرنگی پێگەشتنی میللەتی کورد دەزانن!

ئەووی زانراوه بە شیۆی لیکۆلینەووی زانستی بەر لە (٦٠٠,٠٠٠ سال)¹¹ پێش زایین جۆریک لە مەرۆف لە زنجیرە چیاکانی کوردستان ژیاوه لەو هوش بەدواوه بەردەوام مەرۆف بە شیۆی جیا جیا ژیاوه، وە هیچ قوناغیک نییه لە میژوو تیتیدا باس لەو بەکات کە پاش شەش سەد هەزار سال پێش زایین کوردستان، یا زنجیرە چیاکانی زاگرووس بی مەرۆف بوویت، بەرهەمی ئەو بەردەوامیەش پێگەیشتی و دەرکەوتنی میللەتی کوردە، لە یتو ئەم ماوه دوورو درێژە زۆر شوین هەن لە کوردستان لە یتو زنجیرە چیاکانی زاگرووس خالی گەشی و ئاوەدانی بوون، لەوانە ئەشکەوتی ناوداری (شانەدەر) کە لیکۆلینەووەکان دەلین، بەر لە ١٢٠,٠٠٠ هەزار سال پێش زایین مەرۆف لەو ئەشکەوتە ژیاوه و تیایدا حەوت ئیسکەبەندی مەرۆف دۆزراوه تەوه، کە تەمەنی ئەم ئیسکەبەندانە بۆ ٦٠ تا ٦٥ هەزار سال پێش زایین دەگەریتەوه، لە وردە لیکۆلینەووە لەم دەستە ئیسکەبەندە زۆر شتی گرنگ دەرکەوتووه، هەر بۆیە ئەلکساندەر ئەلفریدۆ چیچ دەلن: (ئەشکەوتە بە ناو بانگەکی «شانەدەر» لە شاخەکانی کوردستان وەک ئارشیفیکی نایابی پاراستنی شوینەواری شارستانی، میژووی مەرۆفایەتییه بە درێژایی (١٠٠,٠٠٠)¹². شانەدەر نەک هەر بۆ کوردستان بۆ مەرۆفایەتیش زۆر گرنگە و تەمەنەکی شە بۆ پاراستنی ئەرشیفی نایابی شارستانی مەرۆفایەتی لە ٦٥ هەزار سال تەمەنی ئیسکەبەندەکانیش کۆنترە، ئەو ئەرشیفە کۆن و گرنگە مەرۆفایەتی و کوردستان، جگە لە بەلگە گرنگەکانی تر بەلگە بوونی (ئایین)یشی بە شیۆ سەرەتاییەکی تیتیدا دەستکەوتوو،

ئەمەش کۆترین میژوووە لە جیهان کە زاناکان بە لیکۆلینەووە بیسەلمینن: ئەو سەلماندنەش لە لیکۆلینەووی ورد و باریکی هەموو لایەنەکانی ئەم ئیسکەبەندانە لە لایەن پەسپۆرانیوه ساغ بووتووه، عە بدولرەقیب یوسف دەلن: (بیری ئایینی لە شورە هەوانەیی و لە گۆری مردوانی ئەشکەوتی شانەدەر، ئەوانە هەوانەیی کە گول لە سەر جەستەیان دانرابوو، هەروەها

10. اسماعیل یورد شاهیان، تبار شناسی قومی و حیات ملی، نیشتر پزوهش فرزان روز، چاپ اول تهران - ١٣٨٠.

11. نارشاک سافراستیان: کورد و کوردستان، وەرگریزانی: نەمین شوانی، بیلو کرادی (ناراس) چاپی دووم، هەولێر - ٢٠٠٥.

12. رمان ژمارە (٩٩)، هەولێر - ٢٠٠٥.

رمان ژمارە (١٠١)، هەولێر - ٢٠٠٥.

رمان ژمارە (١٠٢)، هەولێر - ٢٠٠٥.

رمان ژمارە (١٠٧)، هەولێر - ٢٠٠٥.

رمان ژمارە (١٠٨) هەولێر - ٢٠٠٦.

له چهرموو پهیکه‌ری (خواوه‌ندی دایک) که له قوژ دروست کراوه، به‌که‌م په‌رستراوه له کوردستان له چه‌رموو¹³. هەر ئه‌و ئیسکانه‌ی ئه‌شکه‌وتی شانهدەر- ئه‌وانه‌ی گوول له‌ سهر جه‌سته‌یان دانرابوو- زاناکان به‌ وردی خویندویانه‌ته‌وه له‌ ئه‌نجامدا گه‌یشتوونه‌ته‌ ئه‌و باوه‌ری که‌ ئه‌شکه‌وت نشینه‌کانی (شانهدەر) پێش 65 هه‌زار سال جۆره‌ باوه‌ریکی ئایینی سه‌ره‌تایین هه‌بووه، له‌ به‌ر ئه‌م هۆکارانه:

یه‌که‌م: مردوه‌کان به‌ کوومه‌ل ئیژراون و ئه‌وه‌شیان به‌و مانایه‌ لیک داوه‌ته‌وه، که‌ ئه‌وان بروایان به‌ زیندوو بوونه‌وه‌ی هه‌بووه، بۆیه‌ پیکه‌وه‌یان ناشتوون تا پیکه‌وه‌ش زیندوو‌بینه‌وه.

دووهم: جووری ناشتنه‌که‌ی هەر یه‌کیک له‌ مردوه‌کان، له‌ شیوه‌ی منداله‌ له‌ زگی دایکی، ئه‌مه‌ش واتا مردوو که‌ ده‌مری ده‌چپته‌وه‌ ئیو زگی خاک، زگی دایکی.

ئهم دوو خاله‌ش هەر دووکیان به‌ بیرى ئایینی ده‌چن، چونکه‌ یه‌ک له‌ نیشانه‌کانی- بیره‌که‌ی- ئایینی هه‌لسووکه‌وته‌ له‌ گه‌ل- مردوو- هەر بۆیه‌ هیچ ئایینیکی نییه‌ رپوره‌سمی تایبه‌تی خو‌ی نه‌بی بۆ شارده‌نه‌وه‌ی مردوه‌کانی، ئه‌م جۆره‌ ناشتنه‌ش، که‌ شانهده‌ریه‌کان مردووی خو‌یان پێ شارده‌وته‌وه، کو‌نترین و ریک‌ترین ناشتنی مردوو له‌ میژوو‌دا، که‌ مرو‌ف مردووی خو‌ی ناشتبی، هه‌روه‌ها کو‌نترین ناشتنه‌ که‌ له‌ سه‌ر رپوره‌سمی جۆره‌ (یایین) یک مردوو شاردرایینه‌وه، با ئه‌و ئایینه‌ش هیشتا ته‌واو پته‌و و سیستماتیک نه‌بووی (چونکه‌ ئایینه‌کانی پێش میژوو کیشه‌ی پینه‌گیشتن و ده‌رنه‌که‌وتنی په‌نگ و رووی تایبه‌ت و قایم نه‌بوونی تان و پۆیان هه‌بوو)¹⁴.

جا ئه‌م جۆره‌ بیره‌که‌ ئایینه‌ له‌ کن شانهدەر نیشینه‌کان- به‌ پێ لۆجیکی ژیان- ده‌بی پێشکه‌وتن و گو‌رانی به‌ سه‌ردا هاتبی، ئه‌وه‌ش ئه‌وه‌ ده‌سه‌لمینی که‌ به‌ر له‌ 65 هه‌زار سال پێش ئیستا بیره‌که‌ی ئایین له‌ (شانهدەر- کوردستان) سه‌ری هه‌لداوه، پاش ئه‌و میژوو، پاش ئه‌و میژوو، ئه‌و په‌یکه‌ره‌یه‌ که‌ په‌یکه‌ری دایکه‌ بۆ (30 هه‌زار سال) پێش ئیستا ده‌گه‌رته‌وه: (په‌یکه‌ریکی بچووکی به‌ شیوه‌ی روو ولا که‌ له‌ که‌، بۆ خوداوه‌ندی دایک، له‌ سه‌رده‌می ئورگنیشیه‌وه، پێش نزیکه‌ی (30,000) سال که‌ به‌ وردی سه‌یری سه‌ر سنگ و زگ و ئیکی بکه‌ی، ئه‌وه‌ ده‌رده‌خات که‌ گرنگی به‌ ئه‌ندامه‌کانی مندال بوون دراوه)¹⁵.

که‌ ئه‌م په‌یکه‌ره‌ بچووکه‌ی- دایک خوداوه‌ند- ده‌بی بۆ په‌ره‌ستن دروست کرابی، هه‌روه‌ها له‌ ده‌وربه‌ری گوندی (نه‌مرکی) ی نزیک شاری (ده‌وک) لیکۆله‌ر (ستیفان کو‌زفسکی) و ده‌سته‌که‌ی له‌ سالی 1985، له‌ ئه‌نجامی پشکنین زۆر شتیان بۆ روون ده‌یته‌وه، یه‌ک له‌وانه‌: له‌ گوندی نه‌مرکی (چه‌ند په‌یکه‌ریکی جو‌راو جو‌ر دۆزراوه‌ته‌وه، ئه‌گه‌ر دروستکردنی په‌یکه‌ره‌کان نیشانه‌ی پیکه‌یشتنی هونه‌ر بی، ئه‌وا مانای په‌یکه‌ره‌کان، مانایه‌کی ئایینی و ئه‌فسانه‌یه‌)¹⁶. ئه‌و گونده‌ش ته‌مه‌نی بۆ (10 هه‌زار سال) پێش ئیستا ده‌گه‌رته‌وه، ئه‌مانه‌ش ئه‌وه‌ ده‌رده‌خه‌ن که‌ له‌ کوردستان بی‌ری ئایینی هەر زوو واته‌ (30 هه‌زار سال) پێش ئیستا (خوداوه‌ندی) خو‌ی له‌ شیوه‌ی (مرو‌ف) وینا کردوو، ئه‌م مرو‌فه‌ش مرو‌فی (دایک) ه (ژن) ه. دواتر سو‌مه‌ریه‌کان په‌ره‌ به‌ بیرى خوداوه‌ند له‌ شیوه‌ی مرو‌ف ده‌ده‌ن (وینه‌ی به‌رجاوی خوداوه‌ندی سو‌مه‌ریه‌کان، له‌ سروشته‌وه‌ سه‌رچاوه‌ ده‌گری، سو‌مه‌ریه‌کان سروشتیان به‌ شیوه‌ی مرو‌ف خسته‌ به‌ر چاوه‌ له‌ باشوری عێراق، ئه‌و

13. هه‌زار میژد، ژماره‌ (25) سالی حه‌رمه‌م، 2004.

14. خزعلی الماجدی، الدین السومری، دار الشروق للنشر والتوزيع، الطبعه‌ العربیه‌ الاولی، عمان 1998.

15. ماجد عبدالله الشمس، الحضاره‌ والمیثولوجیا فی العراق القدییم. منشورات دار علاءالدین، الطبعه‌ الاولی- دمشق، 2003.

16. معلود نبیر اهیم حه‌سین، گه‌ران به‌ نوا‌ی نه‌مه‌ریدا، بلاو کردنه‌ری (ناراس)، چاپی یه‌که‌م، هه‌م‌لێر 2002.

میراتی خوداوهندی دایک پهرهسته‌شیان، که خوداوهندی سروشته له باکوری-کوردستان-م-ی-عیراق وه‌رگرتووو¹⁷. چونکه دهرکه‌وتووو، سۆمه‌ریکان، که چونه‌ته خواره‌وه، وه‌ک هر رشتیکی تر له شارستانیته‌که‌یان، ئاینیشیان له‌گه‌ل خۆیان بردووو ئاینیش پیشینه‌یه‌کی دوورو درژی هه‌بووه، هه‌روه‌ها وه‌کو زانراو، ئاینی خۆیان له سروشته‌وه وه‌رگرتووو، هه‌ر بۆیه ده‌بینن (دایکه خوداوه‌ند لای سۆمه‌ریه‌کان که ماناکه‌ی-پر به وشه-ده‌کاته «شاژنی چیا»¹⁸ گومانی تیدا نییه ئه‌و ناوه‌ی خوداوه‌ندی دایک له پیش چونه خواره‌وه‌یان، به‌م ناوه ناساندووو، مه‌به‌ستیشیان له وشه‌ی چیا راسته‌و خۆ چیاکانی کوردستان بووه.

ئه‌وه‌ش به‌شیکه له (ئاینی سۆمه‌ریه‌کان) ئه‌و ئاینه‌ی که خزعه لی ئه‌ماجدی ده‌نوسی: (ئاینی سۆمه‌ریه‌کان، ئه‌و، (تۆ) یه بوو که دره‌ختی ئاینه‌کانی هه‌موو جیهان لای دهرکه‌وت¹⁹. ئه‌گه‌ر ئاینی سۆمه‌ریه‌کان له سه‌ر قسه‌ی خه‌زعه‌لی ئه‌ماجدی تۆی دره‌ختی هه‌رموو ئاینه‌کانی جیهان بێ، ئه‌وا ئه‌و (تۆ) یا له (شانه‌ده‌ر) وه‌هاتووو، هه‌ر خۆشی پیشتر نووسی-خوداوه‌ندی سۆمه‌ری له خواروی عیراق، پاشماوه‌ی خواوه‌ندی باکوری-عیراق-کوردستان-ه-م. ئه‌و خوداوه‌ندی دایکه به‌هه‌لگه‌ی زۆره‌وه له کوردستانه‌وه چووته خواره‌وه (په‌یکه‌ری ئه‌و دایکه خوداوه‌نده‌ی که ساواکه‌ی شیر ده‌دات و له سه‌ر هه‌ر دوو شانی شتیکی وه‌کوو گوله‌تۆ-دیاره، له خوارووی عیراق دۆزرایه‌وه بوو نزیکه‌ی (٦٠٠٠ هه‌زارسال) ده‌گه‌رته‌وه²⁰. که دور نیه ئه‌و خوداوه‌نده‌وه‌ک په‌یکه‌ر له کوردستان سۆمه‌ریه‌کان له‌گه‌ل خۆیان بریبتیانه خواره‌وه، چونکه وه‌ک پیشتر باسمان کرد، سۆمه‌ریه‌کان له کوردستان ئاینیان هه‌بووه، هه‌لبه‌ت که چونه‌ته خواره‌وه، ئه‌و ئاین و خوداوه‌نده‌یان له‌گه‌ل خۆیان بردووو، وه‌ک زۆر شتی تریشیان له‌گه‌ل خۆیان بردووو، به‌تایبه‌ت ئه‌م خوداوه‌نده‌وه‌ ده‌چی خواوه‌ندی بێ په‌یوه‌ندی به سروشتی چاندنه‌وه هه‌بێ، وه‌کوو باسمان کرد سه‌ر شانی خوداوه‌نده‌که گوله‌تۆی له‌سه‌ر بوو، ئه‌وه‌ش دهرکه‌وت که کشتوکالی دیمی کوردستان، سۆمه‌ریه‌کان له خواروو کردوو یانه‌ته کشتوکالی ئاودی، چون له هه‌موو پروه‌کانه‌وه سۆمه‌ریه‌کان له خواروی عیراق گۆرانیکی زۆریان به سه‌ردا هات و پیشکه‌وتن، هه‌ر ئاواش (باوه‌ری ئاینی سۆمه‌ریه‌کان پیشکه‌وتنیکی گه‌وره‌ی به‌خۆیه‌وه بینی، هه‌ر له هه‌زاره‌ی چواره‌می پیش زاینه‌وه، تا ئه‌وه‌ی له کۆتایی هه‌زاره‌ی سییه‌می پیش زاین گه‌یشه‌ شیه‌وه‌ی پته‌وی خۆی)²¹. هه‌ر له‌وه سه‌رده‌مه‌دا-واته هه‌زاره‌ی چواره‌می پیش زاین- (شیه‌وه‌ی په‌یکه‌ری خوداوه‌ندی دایکی ته‌په‌ گه‌وره ده‌بینن که هی سه‌رده‌می عه‌بده)²². ئه‌و و گۆران و پیشکه‌وتنه‌ی ئاین له کوردستان و سۆمه‌ر، که هه‌ردووکیان ته‌واکه‌ری په‌کترن و به‌تایبه‌ت سۆمه‌ریه‌کان، جگه له‌وه‌ی له کوردستانه‌وه چونه‌ته خواره‌وه، له په‌گه‌زیش له هه‌موو نه‌ته‌وه‌یه‌ک زیاتر له کورد نزیکن، په‌کێ له لیکۆله‌ره‌وه‌کان ده‌نوسی (نابئ بلین کورد، سۆمه‌رین، به‌لکو ده‌بئ بلین سۆمه‌ریه‌کان کوردن)²³ ئه‌و سۆمه‌ریانه‌ی که شارستانیته‌تیکیان دامه‌زراندوو له هه‌موو پیکه‌ته‌ی ئه‌و شارستانیته‌ته‌دا داهینه‌ر بوون (له‌گه‌ل دهرکه‌وتنی شارستانیته‌تی سۆمه‌ریه‌کان و داهینانی نووسین له سۆمه‌ر

17. خز علی الماجدی، الدین السومری، دار الشروق للنشر والتوزيع، الطبعة العربية الاولى، عمان ١٩٩٨ - 1998.

18. فاضل عبدالواحد علی (الدكتور) الطوفان العراج المسابيه الاهالي، الطبعة الاول-دمشق ١٩٩٩ - 1999.

19. خز علی الماجدی، الدین السومری، دار الشروق للنشر والتوزيع، الطبعة العربية الاولى، عمان ١٩٩٨ - 1998.

20. ماجد عبدالله الشمس، الحضارة والميتولوجيا في العراق القديم. منشورات دار علاء الدين، الطبعة الاولى-دمشق ٢٠٠٣ - 2003.

21. لالش، ١٦، دهۆک، اب، ٢٠٠١، مجله ثقافیه دوریه بصنرها، مرکز لالش بالعتین الکوردیه و العربیه - 2001.

22. لالش، ١٦، دهۆک، اب، ٢٠٠١، مجله ثقافیه دوریه بصنرها، مرکز لالش بالعتین الکوردیه و العربیه - 2001.

23. نارشاک پولادیان، کورد له سه‌ر چاوه عه‌ربه‌کاتدا، وهرگیزانی، نازاد عوبید صالح، چاپخانه‌ی زانکوی سه‌لاحه‌ددین، کوردستان، هه‌م‌لێز - ٢٠٠٠ - 2000.

نزیکه‌ی (۲۰۰۳ پ.ز) سیستمی ئایینی و زانستی و کۆمه‌لایه‌تی و سیاسی نووی پیکهات)²⁴. زاناکان زۆریان له سهر ئه‌وه نووسیوه که (ئایین و ئه‌فسانه) پیکه‌وه سهریان هه‌لداوه، یان ئه‌وه تا ئیین و ئه‌فسانه له سهره‌تادا هه‌ردووکیان یه‌ک شت بوون. (ئه‌وه‌ی که له سهره‌تای ئایینه‌وه پئ ده‌گه‌ین، یان کۆنترین شیوه له شیوه‌کانی ئایین، ئه‌وه ئه‌فسانه‌یه)²⁵. ئه‌و ئایین و ئه‌فسانه‌یه‌ش له کن سۆمه‌ریه‌کان کۆن و هینده به‌رچاوه‌وه له‌مه‌نده تیکه‌له، له جیهاندا بی هاتویه، هه‌ر بۆیه که لیکۆلینه‌وه له سهر ئایینی کۆنی سۆمه‌ریه‌کان ده‌کرئ، له هه‌مان کاتدا ئه‌و لیکۆلینه‌وه‌یه، لیکۆلینه‌وه‌یه له سهر ئه‌فسانه‌ی سۆمه‌ریه‌کان.

- پیناسه‌ی ئه‌فسانه

له لایه‌نی تیورییه‌وه چه‌مکی ئه‌فسانه چه‌ندین پیناسه‌ی جیاوازه‌یه، بۆیه لیره‌دا چه‌ند پیناسه‌یه‌کی جیاوازه‌یه‌وه‌وه و دواتر له کۆی ئه‌وه پیناسه‌یه‌کی گشتی و هه‌رده‌گرین بۆ ئه‌م توێژینه‌وه. پینش ئه‌وه‌ی پیناسه‌کان باس بکه‌ین، ده‌بی واتای وشه‌ی «ئه‌فسانه» له رووی زمانه‌وه لیک بده‌ینه‌وه. «وشه‌ی ئه‌فسانه (متولۆجیا - Mythology) له زمانی یونانییه‌وه هاتوه که له دوو برگه پیکهاتوه: میتۆس، واته چیرۆکی خواوه‌ند و پاله‌وان، هه‌روه‌ها به‌شه‌که‌ی تریش له وشه‌ی لۆگی زاینه‌وه هاتوه»²⁶. هه‌روه‌ها له پال ئه‌وه‌ی ئه‌فسانه چیرۆکی خواوه‌ند و پاله‌وانه‌کانه هاکات به‌سهرهاتی میژوویی و باس له چیرۆکی دروستبوونی جیهان و مرۆفه له گه‌ردوندا²⁷. له‌به‌رئه‌وه ئه‌فسانه بریتیه له هه‌ولئ مرۆف بۆ تیکه‌یشتن له گه‌ردوون و دیارده‌کانی و پاشان لیکدانه‌وه‌یان لۆ فورمیک تاییه‌ت دا که چیرۆک و گیرانه‌وه‌یه له داستانه‌کاندا.

هاوکات ده‌توانین بلیین ئه‌فسانه «ده‌رپرینی خولیا و ئه‌ندیشه‌ی په‌ستاتوو (په‌نگخواردوو) ده‌روونی مرۆفه له شیوه‌ی بابه‌تیکدا که ئامانج لئی که مکرده‌وه‌ی ترس و دوودلی مرۆفه له جیهانیک پان و به‌ریندا به‌رامبه‌ر هه‌ر هه‌ره‌شه و مه‌ترسییه‌ک که به‌ره‌و رووی ده‌یته‌وه»²⁸. ئینجا ئه‌و دیاردانه یا هه‌ره‌شه سروشتیه‌کان بن وه‌ک هه‌وره بروسه و زریان و باوباران، یا به‌هۆی مرۆفه‌وه بی وه‌ک برسیتی و قاتوقری هه‌تا جه‌نگ و شه‌روشۆر. که‌واته مرۆف ئه‌فسانه‌ی وه‌ک «جۆریک له رافه‌کردن و درککردن به نه‌ینی گه‌ردوون و جیهان به‌کاره‌یناوه، بۆ نموونه کاتیک مرۆف له تاریکی ترساوه، رووناکی خۆشویستوه و په‌رستویه‌تی»²⁹.

ئه‌مه ئه‌و راستیه ده‌رده‌خات که مرۆف هه‌میشه ئه‌فسانه‌ی وه‌ک وه‌لامیک داناوه بۆ پرسیاره‌کانی سه‌باره‌ت به‌ ژیان و گه‌ردوون، له‌به‌ر ئه‌وه‌ی زانست له سه‌رده‌مه میژوویییه دیرینه‌کاندا هینده پینش نه‌که‌وتبوو، بۆیه ئه‌فسانه وه‌لام بووه بۆ مرۆف. لیره‌وه ده‌کرئ بوتری ئه‌فسانه جۆریکه له هۆشیاری کۆمه‌لایه‌تی مرۆف که باس له نه‌ینییه‌کانی ژیان و جیهان ده‌کات³⁰. ئیدی له‌پیناوتیکه‌یشتن له دیارده و جیهان مرۆف باوه‌ری کردوه به لیکدانه‌وه‌ی ئه‌فسانه‌کان. ئه‌مه کاتئ بووه که زانست له‌وه سه‌رده‌مه‌دا سهره‌تایی و نه‌یتوانیوه وه‌لامی

24. لاش، ۱۶، ده‌وک، اب، ۲۰۰۱، مجله ثقافیه دوریه بصندر ها، مرکز لاش بال‌عینین الکوردیه والعربیه - 24.

25. هجیل، تاریخ الفلسفه، الجلد الاول، ترجمه: ا.د. امام عبدالفتاح امام، الناشر مکتبه مدبولی-القاهره ۱۹۹۷ - 25.

26. د. جمال رشید: «ظهور الکورد فیالتاریخ»، ج: الثاني، اراس ۲۰۰۵، ص: ۵۶۱ - 26.

27. د.س. ل. ۵۶۲ - 27.

28. د. مه‌لود حه‌سین پیکهاته‌ی نه‌فسانه کوردی، ل، ۶۷ - 28.

29. ه.س. ل. ۷۶ - 29.

30. د. جمال رشید: ل. ۵۶۳ - 30.

دلەراوکیکانی مرۆف بداتەوه (۵۶۳)³¹. لەبەر ئەوە مرۆف هانای بردۆتە بەر بیرکردنەوهی ئەفسانەیی، ئەگەرچی لە ئیستادا زانست ئەو وەلامانە بە سەرەتایی و سادە دادەتیت.

لە فەرھەنگی فەلسەفی «رۆزنتال» دا بەو جۆرە پێناسە ی ئەفسانە کراوه: «فۆلکلۆری میلیلی، کارل مارکس پێ وایە ئەفسانە زال بوە بە سەر ھێزەکانی سروشت کە دواتر زال بوونە ھەقیقەتە (زانست) بە سەر ئەفسانەدا دروست نەبێ». پێوەری رەوشتی «ئەفسانە نمایش کردنی ھۆنەری شیعر ئاستە بۆ سروشت»³². ھەروەھا لە فەرھەنگی فەلسەفی جمیل سلیبا وا پێناسە کراوه: «قسە یەک کە بێ بنەماو بناغە بێ»³³. ھەلبەت لە ئینسیکلۆپیدیای «لاند» دا ھەمان بۆ چوون ھەییە سەبارەت بە چەمکی ئەفسانە.

بەرای «فراس سەواح» توێژەر بواری ئەفسانەناسی، ئەفسانە بریتییە لە «چیرۆکیکی کۆن کە تێیدا بوونەوەرە سەر و سروشتییەکان (واتای ئەوانە ی ھێزیان لە بوونەوەرە سروشتییەکان زیترە) پۆلی سەرەکی تیدا دەبینن. کەواتە ئەفسانە چیرۆکیکی پیرۆزە کە ھەلگری قوولییە کە پەییوەستە بە گەردوون و ژانی مرۆفەوه»³⁴. بە مانایەکی تر مرۆف پەنای بردۆتە بەر ئەفسانە وەك جۆریک لە رافە کردن و دەرک کردن بە نھێنی گەردوونی بە کارھێناو، بۆیە دەتوانین بڵیین ئەفسانە بریتییە لە «داستانی گەلیک بەبێ بیرکردنەوہ یەکی قول سەرھەل دەدات تێاندا ھێزیکی سروشتی فۆرمی کە سێک وەر دەگریت، رەفتار و ھەلسوگەوتی ئەو ھێزە سروشتییە مانایەکی تاییەتی بەو گەلە ئەبەخشیت»³⁵. ھەلبەت بەرای ھەندیک لیکۆلەری تر، ئەفسانە ھیچ نییە جگە لە چیرۆکیکی خورافی کە مرۆفی سەرەتایی لە چاخە کۆنەکاندا ھۆنیویەتەوہ بەپیتی خەیاڵ و ئەندیشە لاوازەکانی ویستوویەتی شروقی بوون و جیھان بکات»³⁶.

کەواتە لەبەر رۆشنایی ئەو پێناسە جیاوازانەوہ بۆ ئەفسانە دەتوانین بڵیین، ئەفسانە بریتییە لە ھەولێ مرۆف بۆ تێگەیشتن لە گەردوون و دیاردەکانی تێو سروشت کە دواچار لیکدانەوہ یان لەو رووی چ کاریگەری لەسەر ژانی ھەبێ»³⁷. لێرەوہ راستە ئەگەر ئەفسانە جۆریکە لە ھۆشیاری و ئاگایی کۆمەلایەتی مرۆف کە باس لە نھێنی بوونەوہ و جیھان و گیتی مان بۆ دەکات لە شیوہی داستان و چیرۆکدا»³⁸. بۆیە ئەفسانە یەکەم شیوازی رۆشنیبری و ئاگایی رۆحی مرۆفە»³⁹. بۆیە دەکرێ لە کۆی پێناسەکان بگەینە ئەو پێناسە ئیجرائیانە کە ئەفسانە بریتییە «لە تێگەیشتن و رافە کردنی مرۆف بۆ سروشت و جیھان. کەواتە ئەفسانە قسە کردنە لەسەر نھێنی ئەو شتە شاراوہ و ھەندیک جاریش قەدەغە کراوانە کە خەلکی ئاسایی ناتوانی بیکات و ھەمیشە لە خەیاڵ و بیرکردنەوہ یدا یە. مەرج نییە شتە قەدەغە کراوانەکان ھەر ھەز و ئارەزووہ کانێ مرۆف بن، بەلکو جاری واش ھەییە شتە تێکدەرەکانە».

- جۆرەکانی ئەفسانە

1. د. جمال رشید: ل ۵۶۳ - ۵۶۴.

2. رۆزنتال: المعجم الفلسفی، ل ۲۳ - ۲۴.

3. جمیل صلیبا: الموسوعۃ الفلسفیة، ل ۱۰۰ - ۱۰۱.

4. فراس السواح: الا سطورہ والمعنی، ل ۱۳ - ۱۴.

5. نازاد رە و ف قەزاز: خودا لە نەفەنگەرییەوہ بۆ ھەستگەری، ل ۱۴۰ : ۲۰۱۱ - ۲۰۱۲.

6. د. قسە الحسین: انشو بولوجیا الادب، ل ۱۱۳ - بیروت ۲۰۰۹.

7. د. کامران موکری: نەدەبی فۆلکلۆری کوردی، بەشی یەکم ۱۹۸۴ - کتێبخانە ی نیشتمانی بەغدا، ل ۳۹ - ۳۷.

8. د. مەرلود حسن: پێکھاتە ی نەفسانە ی کوردی، ل ۷۶ - ۷۷.

9. د. جمال رشید: «ظهور الكورد فیالتاریخ»، ج: الثانی - اراس ۲۰۰۵، ص ۵۶۳ - ۵۶۹.

ئەگەرچى ئەفسانەكان لە ناوەرۆكدا باسى داستانى پالەوانىتى و كىشەيەك دەكەن، بەلام جۇراوجۇن لە شىواز و گىرانەوہى بەسەرھاتەكاندا. لەبەر ئەو دەتوانىن بەم شىوہ جۇرەكانى ئەفسانە دەستىشان بکەين:

يەكەم: ئەفسانەى نەرىت و بۆنە ئاينىيەكان: ئەم جۇرە ئەفسانەيە برىتییە لە دەرپرینىكى زارەكى بۆ نەرىت و بۆنە ئاينەكان لە كاتى گىرانى رپورەسم و سروتەكاندا. بۆ نموونە لە بۆنەيەكى ئايندا مرۆف بە سۆز و كاریگەر باسى دەكات و دەیگریتەوہ بۆ چەسپاندن و بەھیزکردنى باوہر سەبارەت بە دياردەكانى بوونەوہر⁴⁰. ديارە ئەم جۇرە ئەفسانەيە پيوستە تا مرۆف بۆنە ئاينىيەكان لەبىر نەكات و ھەميشە يادىان بکاتەوہ.

دووہم: ئەفسانەى گەردوونى: ھەميشە مرۆف ھەولیداوہ لە چۆنەتى و سەرەتای دروستبوونى گەردوون تىيگات. بۆ نموونە ئەفسانەى بابلى باس لە چۆنەتى دروستبوونى گەردوون، واتە ئاسمان و ئەستىرە و ھەسارە و زەوى دەكات. ھەرەھا باسى لە چۆنەتى دروستبوونى مرۆف لە زەوى و دونیادا باسکردوہ. ئەمەشە لەبەرئەوہى مرۆف بەردەوام ھەولیداو بەدواى شتە نەزانراو و نەناسراوہ كاندا بگەریت. كەواتە ئەم جۇرە ئەفسانە باس لە مەتەلى ژيان دەكات.

سپيەم: ئەفسانەى ھىمايى: ئاشكرايە كە مرۆف زیندەوہرىكى كۆمەلايەتییە، بۆيە بەھوى ئەفسانەوہ دەبەویت باس لە ژيانى كۆمەلايەتى رۆژانەى خۆى بکات⁴¹، لەبەرئەوہى ئەم جۇرە ئەفسانەيە لە جۇرەكانى تری ئەفسانە پيشكەوتووترە، چونكە خۆى نابەستیتەوہ، تەنھا بە باسکردنى گەردوون و سروشتەوہ نيیە، بەلكو باس لە مرۆف و ژيانى و پەيوەندییە كۆمەلايەتییەكانى دەكات. لەبەر ئەوہ بە ئەفسانەيەكى كۆمەلايەتى دەژمىردرى. چوارەم: ئەفسانەى قارەمانىتى خواوہندەكان: جياوازی ئەم ئەفسانەيە لەگەل ئەفسانەكانى تر لەوہدایە كە لەم ئەفسانەدا خواوہندەكان ئادەمیزادن. واتە لە بەرگ و شپوہى مرۆفدان⁴². جياوازی ئەم جۇرە لە ئەفسانەكانى تر لەوہدایە كە لەم ئەفسانەدا كە پالەوانەكانى ئادەمیزادن ھاوكات ئاوپتەن بە خوداوەندى، بەلام لە چەشنەكانى تردا پالەوانى سەرەكى خوداوەندەكانن، چونكە لە ئەفسانەكانى تردا خوداوەندەكان خەرىكى بەرپوہبردنى كاروبارى جیھان بوون، لە كاتىكدا لیرەدا قارەمان و پالەوانەكە لە لایەكەوہ سىفەتى خواوہند و لەلایەكى ترەوہ مرۆفە لەسەر زەوى. بۆنموونە: ئەفسانەى گلگامیشى پاشای بابل.

لە كۆتايى ئەم بەشە تيۆريیەدا، دەتوانىن بلىين ئىمە ھەولمان دا چەند لایەنىكى تيۆرى، ئەفسانە لە پوانگەى پىناسە جياوازەكانى و جۇرەكانیەوہ شروقه بکەين و ك سەرەتا و پيشەكییەك بۆ ناوەرۆكى توپژینەوہكە. ئامانج لەمەش تەنھا دەرختنى رۆلى خواوہندى مینە لە ئەفسانە بەگشتى و ئەفسانەى كوردى بە تايبەتى.

ئەفسانەى كوردى:

ئەفسانە میراتىكى كولتورى و نەتەوہی بەھادارە كە لەناو زۆربەى ھەرە زۆرى ميللەتانى جیھاندا بايەخى پىندراوہ. كورد وەكو ميللەتتىكى دىرپىنى سەر گۆى زەوى خواوہ كولتور و شارستانىيەتتىكى بەكجار كۆنە و بەشىوہى جياجيا ھەولى تۆمارکردن و گواستەوہى ئەم شارستانىيەتەى بۆنەوہكانى دوارۆژ داوہ. پاراستنى دەسكەوتە نەتەوہی و ميژوویى و

40. س.ل. ۴۳ - ۴۰

41. س.ل. ۴۲ - ۴۱

42. س.ل. ۴۳-۴۲ - ۴۰

کولتوریه‌کانی هه‌موو میلیه‌تیک له جیهانی پێش شارستانییه‌تا، له ڕێگه‌ی تۆمارکردنی به‌سه‌رهات و رووداوه‌کان بووه. یه‌کیک له ئامرازه‌کانی تۆمارکردنی ئهم سه‌برده‌ میژوویه دێرینه‌نه ئه‌فسانه‌ بووه.

ئه‌فسانه‌ی کوردی به‌شیکه‌ له میراتی کولتووری و نه‌ته‌وه‌یی گه‌لی کورد که هه‌ندی ئهم میراته کولتوریه‌ به‌ درێژایی میژوو به‌شیه‌ی سه‌رزاری و دواتریش به‌شیه‌ی نووسراو پارێزراوه. ئه‌فسانه‌ و ئایین په‌یوه‌ندییه‌کی دوور و قوولی میژوویمان له‌گه‌ل یه‌کتیییدا هه‌یه و وه‌ها له‌ناو یه‌کدا تیاوه‌ته‌وه‌ که زۆرجار هه‌ر به‌ یه‌ک داده‌نرێن، بۆیه ئایین - مه‌به‌ست ئایینی کورده‌ - به‌ یه‌کیک له‌ چاوه‌گه‌ گه‌رنه‌گه‌کانی ئه‌فسانه‌ی کوردی داده‌نریت. کۆتیرین ئایین که به‌ شیه‌یه‌کی روون پێشاندهری بیروباوه‌، کولتور، تیروانین و جووری بیرکردنه‌وه‌ و میژوو و جوگرافیا‌ی کورد بێت، بێگومان ئایینی زه‌رده‌شتیه‌. ئه‌مه‌ سه‌ره‌رای ئه‌وه‌یه‌ که زۆر ئایینی تر له‌ پێش ئایینی زه‌رده‌شتی له‌ناو کورددا باو بوونه، به‌لام هیچ کامیان به‌ پاده‌ی ئهم ئایینه‌ پێشاندهری ژبانی ئه‌فسانه‌یی، ئایینی و میژوویی کورد نین. ده‌قه‌ پێرۆزه‌کانی ئایینی زه‌رده‌شتی له‌ناو کتیبی ئاقیستا و ده‌قه‌ په‌له‌ویه‌کاندا پارێزراون. به‌ نووسینه‌وه‌ و کۆکردنه‌وه‌ی به‌شه‌کانی ئاقیستا له‌ سه‌رده‌مه‌ جیا جیاکاندا، بۆ یه‌که‌مه‌جار به‌شیک له‌ ئه‌فسانه‌ی میلیه‌تی کورد له‌ شیه‌ی سه‌رزاریه‌وه‌ گۆرا و شیه‌ی نووسراویان وه‌رگرت.⁴³

ئه‌فسانه‌ی کوردی خاوه‌ن تابه‌مه‌ندی خۆیه‌تی و به‌هۆی ئهم تابه‌مه‌ندیانه‌وه‌یه‌ که ئه‌فسانه‌ی کوردی شوناسیکی تابه‌ت و سه‌ربه‌خۆ وه‌رگرده‌گریت. ئهم تابه‌مه‌ندیانه‌ له‌ چوارچێوه‌ی پێکهاته‌ی ئه‌فسانه‌ی کوردیه‌وه‌ ده‌ستینشان ده‌کری‌ن. سه‌رجه‌م ده‌قه‌ ئه‌فسانه‌یه‌کانی کوردی به‌سه‌ریه‌که‌وه‌، پێکهاته‌ی ئه‌فسانه‌ی کوردی پێکدێن که په‌گ و ریشه‌یان له‌ میژووی شارستانییه‌تی کورددا داگوتاهه. ئهم ده‌قه‌ ئه‌فسانه‌ییانه‌ له‌ قۆناغه‌ جیا جیاکانی ژبانی مرۆفی کورد په‌یدا بوونه و په‌یوه‌ستن به‌ جووری بیرکردنه‌وه‌ و ژبانی مرۆفی کورده‌وه‌.

تیروانینی مرۆفی کورد له‌ سه‌رده‌مه‌ زووه‌کان، سه‌باره‌ت به‌ جیهان، بوون، خودی مرۆف خۆی و سرووشتی ده‌وروپه‌ری، تیروانینیکی ئه‌فسانه‌ییانه‌ بووه، له‌ تیروانینی ئه‌فسانه‌ییدا (جیاوازی له‌ نیوان خه‌یال و واقیعه‌دا به‌دی ناکرێ). له‌ بیرکردنه‌وه‌ی ئه‌فسانه‌ییدا هه‌موو ئه‌و شتانه‌ی که بشین رووبده‌ن به‌ بابه‌تیکه‌ی واقیعی داده‌نرێ⁴⁴ ئهم تیروانینه‌ ئه‌فسانه‌ییانه‌ له‌ سه‌رده‌می خۆیان به‌ واقیعه‌ دانراون؛ ئهم واقیعه‌نه‌ی ناو کۆمه‌لگه‌ش له‌ ڕێگه‌ی ئه‌فسانه‌بێژییه‌ تۆمار ده‌کران و له‌ نه‌وه‌یه‌که‌وه‌ بۆ نه‌وه‌یه‌کی تر ده‌گواستراوه‌. که‌واته‌ به‌ دیارده‌که‌وێ له‌ سه‌رده‌مه‌ کۆنه‌کانی زانینی - معریفه‌ی - مرۆفایه‌تیدا (جیاوازیه‌که‌ له‌ نیوان بیرکردنه‌وه‌ و ئه‌فسانه‌سازیدا به‌دی ناکریت و مرۆف له‌ ڕێگه‌ی هه‌زری ئه‌فسانه‌یه‌وه‌ بیری کردۆته‌وه‌).⁴⁵ له‌ قۆناغه‌ جیا جیاکانی میژووی مرۆفایه‌تیدا مرۆفی کورد توانیویه‌تی به‌ هه‌زری ئه‌فسانه‌یی که هه‌لقولای خه‌یال و تیروانین و جیهانینی ته‌بووه‌، له‌ رووداوه‌کانی سه‌رده‌می خۆی بدوێ و هه‌ولێ ڕاڤه‌کردنیان بدات؛ له‌م کاته‌دا ئه‌فسانه‌سازیی کردووه‌ و به‌ په‌رۆشه‌وه‌ چیرۆکی به‌سه‌رهاتو ئه‌زموونی ژبانی خۆی به‌ سینگه‌ نه‌وه‌کانی و دواتر سپاردووه‌، لێره‌وه‌یه‌ که ئه‌فسانه‌ ڕۆلی میژوو ده‌بینیت، ئه‌ویش میژوویه‌کی پیرۆز.

43. نه‌خستمان ماری که‌رملی، جیلوه‌ و ماسحه‌فی ره‌ش (کتیبی پیرۆزی نێزیدییه‌کان)، و نه‌جاتی عه‌ بدولا، ده‌زگای ناراس، چاپی یه‌که‌م، هه‌ولێر ۲۰۱۲ - 43.

44. محمد رضا ارشاد، گه‌ستره‌ اسطوره‌، انتشارات ه‌رمس، چاپ سوم، ص ۲۱، ته‌هران ۱۳۹۰ - 44.

45. نجف دریا بندری، افسانه‌ی اسطوره‌، نشر کارنامه‌، چاپ اول، ص ۱۹، ته‌هران ۱۳۸۰ - 45.

کهواته پیکهاتهی ئەفسانەیی کوردی خۆی لە قۆناغە جیا جیاکانی تێپروانیی ئەفسانەیی و ژيانی میژووویی کورددا دەبینیتەوه، بۆیە (د. مەلۆد ئیبراھیم) قۆناغەکانی ئەفسانەیی کوردی بە ژيانی میژووویی مرقۆفی کوردەوه دەبەستیتەوه و بەم پێیە ئەفسانەیی کوردیی دابەشی سەر ئەم سێ قۆناغە جیاوازی خوارەوه دەکات:

۱- قۆناغی ئەشکەوت

۲- قۆناغی گوند

۳- قۆناغی شار⁴⁶ ئەم دابەشکردنە تا پادەیهکی زۆر زانستییە، چونکە تێپروانین و خواست و شیوازی دابینکردنی خۆراک، کار دەکەنە سەر شیوازی تێپروانیی ئەفسانەیی. دواجار جیاوازی تێپروانیی ئەفسانەیی، جیاوازی ئەفسانەسازیی ئیدەکهوئیتەوه و بەم پێیە جۆری ئەو ئەفسانەیی لەم سێ قۆناغەدا دروست دەبن لەگەڵ یەکتەری جیاواز دەبن؛ بەلام نابێ ئەوهش لەبەر بکەین کە هەر کام لەم قۆناغانە لە پڕیک کۆتاییان پێنەهاتوو و قۆناغەکی تر دەستی پێنەکردوو. مرقۆفی کورد هاوکات لەگەڵ ئەوهی لەناو ئەشکەوتدا ژیاوه رەنگە لە ناوچەیهکی تری کوردستان یان لە هەمان شوێن لە گوند یان لە شاردا ژیاویت. «ئەوهش بەو واتایە نێیە کە ئەم قۆناغانە تەواو لیکجیان و دیوارێک لە ئیوانیاندا هەیە، نا... نەخێر بەلکو بەر دەوامییهک لە قۆناغەکاندا هەیە و لە گەرمەیی هەر قۆناغیکدا، کەم و زۆر قۆناغەکانی تر ئامادەن»⁴⁷ کهواتە دەکرێ قۆناغەکانی ئەفسانەیی کوردی بە گۆپەری تێپروانینە ئەفسانەییەکانیش دابەش بکری. لەم توێژینەوهیەدا هەولداراوه ئەفسانەیی کوردی دابەشی سێ قۆناغی جیاواز بکری کە بریتین لە:

۱- ئەفسانەیی قۆناغە بەراییهکان

۲- ئەفسانەیی قۆناغی ناوهراس

۳- ئەفسانەیی قۆناغی نوێ

لە قۆناغە بەراییهکانی ئەفسانەیی کوردیدا، مرقۆفی کورد بەپێی پێویستی و ژینگە و خواستی دەروون و تێپروانینە ئەفسانەییەکانی، کۆمەڵێک ئەفسانەیی ئەفراندوو. وردە وردە ئەم ئەفسانە جێگیر بوونە و دۆخیک پیرۆزیان وەرگرتوو. ئەفسانەکان سالانە لە رۆژی تاییەت لە شوێنیک پیرۆز و لەلایەن خەلکەوه، لە قالبی رپۆرەسمی جۆراوجۆر دووبارە دەکرێنەوه و بەرز و پیرۆز پادەگیرین. دواجار هەر لەم کاتەدا یە کە جۆرە ئایینیک سەرەتایی دروستبووه. بۆ مۆونە ناشتنی مردوو لە سەردەمە دێرینەکانی میژوووی مرقۆفایەتی و لە قۆناغی ژيانی ناو ئەشکەوتدا پیشاندەری جۆرە ئایینیک و باوهر بە دووبارە زیندوو بوونەوه- رەنگە لە جیهانەکی تریان لە ژيانیک تەردا- لە شیوه و دۆخی ناشتنی مردوو رادەست دەکات. (کارن ئەرمسترانگ) ئاماژەیی بە دۆزینەوه شوێنەوارناسییەکان داوه و پێی وایە لەناو گۆری مرقۆفی نیاندرتالدا، چەک و ئیسکی ئازەلی قوربانیکراو دۆزراوه تەوه و ئەمەش پیشاندەت، مرقۆفی کۆن باوهری بە جیهانیک تری هەیە کە لە جیهانی ئیستای خۆیان دەچیت. رەنگە نیاندرتالییهکان سەبارەت بە ژيانی کەسی مردوو کۆمەڵە چیرۆکیان بۆ یەکتەری گێراییتەوه. گۆری مرقۆفی نیاندرتال پیشاندەت کاتییک ئەم مرقۆفە کۆنانە زانیوانە رۆژیک دەبێ مەرن، جۆرە ئەفسانەیهکیان بۆ خۆیان دروستکردوو تاکو رووبەرۆوی ئەم کارەساتە ترسینەرە

د. مەلۆد ئیبراھیم خە سەن، پیکهاتهی ئەفسانەیی کوردی، چاپخانەیی رنج، چاپی یەکەم، ۶۶-۶۹، سلیمانی ۲۰۰۷ - 46

د. مەلۆد ئیبراھیم خە سەن، پیکهاتهی ئەفسانەیی کوردی، چاپخانەیی رنج، چاپی یەکەم، ۷۰، سلیمانی ۲۰۰۷ - 47

بینهوه.⁴⁸ لهوانهیه بیریان لهوه کردیتهوه، ئهگهر ئهم مرۆفه زیندووپیتهوه چه پرودهدات؟ ئینجا به خه یالی خویان لهناو هۆشیاندا شوپتیکیان خولقاندوهو تاکوو مردوووه که دووباره تیتیدا زیندووپیتهوه. ناویک، یان ئاماژهیه کیان بو ئهم شوپته داناه. له کاتی ناشتنی مردوو که لوپهله و خوراکیان بو داناه. رهنکه لهگهله بهروپیش چوونی کات و گۆرانی سهردهم کۆمهله رپوره سمیکه تایبه تیان بو ناشتنی مردوو ئه نجام دابن که دواتر له ئه نجامی زور دووباره بوونهوه، خوی له قالیکه نووی بهناوی ئایین دابیت.

به پیتی دابه شکردنی میژوو، به کهم قوناغ واتا قوناغی به راییه ئه فسانه ی کوردی بو سهردهمی ژیا نی مرۆقی کورد لهناو ئه شکهوت و کۆتاییه کانی ئهوه سهردهمه ده گهرپتهوه. ئه فسانه کانی ئهم قوناغه له بهر ئه وهی په یوه ندییان به ژیا نی راسته وخوی مرۆف به سروشته وه هه بووه، زور گرنگ، ههر بویه به شیکه ئهم ئه فسانانه له بهریان گپراوه ته وه و بو قوناغه ئه فسانه ییه کانی دواتر گواستراونه ته وه. له به لگه نامه میژوو ییه کانداه سهارهت به میژوو و جوگرافیا ی کوردستان، ئه شکهوتی شاندر و هه زار میرد به ئه وونه یه کی دیاری ئهم قوناغه داده نرین. «شوپته وارناسی ئه مریکی، مولیکی له کاتی هه لکۆلینه شوپته وارناسیه کانی له ئه شکهوتی شاندر تیسکه بندی مرۆقی نیاندرتالی دۆزیه وه که میژوو که ی بو دوروبه ری شهست هه زار سال بهر له ئیستا ده گهرپته وه و ههروه ها (گارود) له هه لکۆلینه وه کانی له ئه شکهوتی هه زار میرددا شوپته واری ئاده میزادی دۆزیه وه که میژوو که ی بو دوروبه ری په نجا هه زار سال بهر له ئیستا ده گهرپته وه.»⁴⁹ ئه فسانه ی قوناغی به راییه کورد له چوارچیه ی رپوره سمه کانی ریزگرتن له (خواخه ندی دایک) دا خوی ده نوینتی و دواتر له ناو ئه فسانه ی ئایینییه کانی قوناغه کانی ترده شوپته واریان ده دۆزیته وه، به تایبه تی ئایینی زه رفانی.

له ئه نجامی گۆرانی شیوازی ژیان و دابینکردنی پیوستیه کانی ژیان، مرۆقی کورد پی ده ئیته ناو قوناغیکه نوپی میژوو ییه وه. له م قوناغه دا به هوی گۆرانه بنه رته ییه کانی ژیان، تپروانین و بیریه ئه فسانه ییش گۆرانیان به سهردا دیت. دوا جار ئه فسانه ی نوپی دیته ئاراه و ئه فسانه ی سهردهمی کۆن جینگه ی خویان به ئه فسانه ی نوپی ده سپیرن، ئه گهرچی ههروهک پیتشه ئاماژه ی پیدرا، هه ندی له بنه ما سهره کییه کانی بو قوناغه کانی دواتر ده گوازرینه وه.⁵⁰

قوناغی ناوه راستی ئه فسانه ی کوردی هاوکاته له گه ل قوناغی میژوو یی گوندنشین و شارستانیدا. له سهره تای ئهم قوناغه دا مرۆف هه ولی دروستکردنی گوند و مایکردنی گیانه به رانی داوه و به مه به ستی دابینکردنی خوراک و پیوستیه کانی ژیان، ده ستی به کشتوکال کردوه. ههروه وه ی و کۆرپه ستی شه وانی بهرئاگردان، له تایبه ته ندییه کانی ئهم قوناغه ن.

ئه فسانه ی قوناغی ناوه راست کۆمه لیک په یامی نوپی بو مرۆف دیتته ئاراه. په یوه ست بوونی ژیا نی مرۆف به خواهنده جوربه جوره کان و ده رکه وتنی رپوره سمی جوراوجور به مه به ستی رازیکردنی خواهنده کان له م قوناغه دا، به شیکه گرنگ له ژیا نی مرۆف دایگر ده که ن. ئه فسانه له ناو ئهم کۆمه لگه نویانه ئه وه نده به هیزه که به ته وای پۆلی ئایین ده بینتی. بو ئه وونه ئایینی زه رفانی ته واهه شه ده کات و له زیدانی ئهم ئایینه وه، ئایینی زه رده شتی، مانه وه ی و ئیزه دی له دایک ده بن. گه شه ی بیریه ئه فسانه یی مرۆقی کورد له قوناغی ناوه راستی ئه فسانه ی کوردیدا، هۆکاریکه بو دروستبوونی ئایین به واتا

کارن ارمنسترانگ، تاریخ مختصر اسطوره، ترجمه عباس مخبر، نشر مرکز، چاپ اول، ص ۱۲۹۰ - ۴۸.

عبدالقیوم یوسف، حدود کردستان الجنوبية تاريخيا و جغرافيا، مطبعة شقان، الطبعه الثانيه، ص ۱۷، السليمانيه ۲۰۰۵ - ۴۹.

نخستاس ماری کرملی، جیلوه و مسحه ی رهن (کتیبه ی پیرۆزی نزیديه کان)، و نه جاتی عه بدولا، ده زگای ناراس، چاپی به کهم، - ۵۰
لا (۱۳۶۱، ۱۷، ۱۳۵، ۱۰، ۱۵۸، ۱۰، ۱۰۴، ۷۵) هه لئیر ۲۰۱۲.

هه‌نووکه‌بیه‌کە‌ی و ده‌روازه‌یه‌ک بوو بۆ هه‌نگاونان به‌ره‌و یه‌کتا به‌رستی که له‌ ئایینی زه‌رده‌شتیدا هه‌ولە سه‌ره‌تاییه‌کان، بۆ به‌دی هاتنی ئەم ئامانجه‌ به‌رچاو ده‌که‌ون. گرنگترین هۆکار له‌م قۆناغه‌دا له‌ بواری گه‌شه‌ و گوێران و گواستنه‌وه‌ی ئەفسانه‌کان، داهێنانی نووسین بوو. له‌ ڕیگه‌ی ئەم داهێنانه‌وه‌ بوو که ئالوگۆڤری کولتووری له‌ ئیوان مروڤی کۆمه‌لگه‌ نوێیه‌کان هاته‌ئاراوه‌؛ به‌هۆی نووسین میله‌ته‌کان لیکتر نزیك بوونه‌وه‌ و ئەزموونی میله‌ته‌ جیاوازه‌کان بوونه‌ که‌ره‌سه‌یه‌کی خا‌و بۆ گه‌شه‌پێدانی فیکری و له‌ نه‌جامدا ئەفسانه‌ی میله‌ته‌کان کاریان لیک کرد و گوێرانکارییان تی‌ که‌وت.

سێیه‌مین قۆناغ هه‌روه‌کوو پێشتر ئاماژه‌مان پێدا، قۆناغی ئەفسانه‌ی نوێی کوردیه‌ به‌ له‌ دوای ڕووخانی ده‌وله‌تی ساسانییه‌وه‌ تا کوو ئیستای ئەمڕۆ ده‌گرێته‌وه‌. له‌م قۆناغه‌دا ئیتر مروڤ خاوه‌ن ئەزموونێکی له‌بن نه‌هاتووی ژبان له‌سه‌ر ڕووی زه‌وییه‌. شارستانییه‌ته‌ پێشکه‌وتوووه‌کان تیکه‌ل به‌ یه‌که‌تری بوونه‌. ئالوگۆڤری بازرگانی و سیاسی هۆکاریکن بۆ زیاتر تیکه‌ل‌بوونی میله‌ته‌کان. ئەفسانه‌ی کوردی که له‌ قۆناغه‌کانی پێشوو ورده‌ ورده‌ سیمایه‌کی ته‌واو و روونی به‌خۆیه‌وه‌ گرتوو و به‌شیکێ گرنگی ئەفسانه‌کانی له‌ناو ئایینه‌ جوړاوچۆره‌کانی وه‌کو زه‌رقانی، میهر به‌رستی، زه‌رده‌شتی، مانه‌وه‌ی و... هتد جیگیر بپوون، ئیتر ده‌بوایه‌ خۆی له‌گه‌ل تێروانینه‌ نوێ باوه‌که‌ی سه‌رده‌می تازه‌دا بگونجێتی که له‌گه‌ل هاتنی ئایینی ئیسلامدا ب‌لاو و باو ببوو.

له‌م قۆناغه‌دا دوای ب‌لاو بوونه‌وه‌ و گه‌شه‌ی ئایینی ئیسلام، ئەفسانه‌ی کوردی وه‌کو به‌ره‌مه‌پکی پیرۆزی نه‌توه‌یی ئیتر به‌ یه‌کجاری به‌ولاوه‌ نه‌نرا، به‌ل‌کو ئەمجاره‌یان به‌ سیمای و ڕواله‌تیکێ نوێ و له‌ژێر ناوونیشانی نوێ و له‌ قالی ئەفسانه‌ی نوێ له‌ کۆمه‌لگه‌ی کورده‌واریدا درێژێ به‌ بوونی خۆی دا. ناوه‌ڕۆکی ئەفسانه‌کانی قۆناغی پێشوو ئەوه‌نده‌ گرنگ بوون که خۆیان خزانده‌بووه‌ ناو ئەفسانه‌ی نوێی کوردیه‌وه‌ و ئەگه‌ر به‌ وردی سه‌رنجی ئەده‌بی سه‌رزاری کوردی به‌دین ده‌توانین به‌ ده‌یان ئەفسانه‌ی قۆناغه‌کانی پێشوو ئەفسانه‌ی کوردی ده‌ستنیشان بکه‌ین که له‌ژێر ناوونیشانی نوێ و پاله‌وانی نوێ- له‌ ڕووی ناوی پاله‌وانه‌وه‌- باسی میهر به‌رستی و خواوه‌ندی پیت و به‌ره‌که‌ت و خواوه‌نده‌کانی تر ده‌که‌ن.

هه‌روه‌کو ئاماژه‌مان پێدا له‌ ئەجمامی ئەم سێ قۆناغه‌ ده‌توانین په‌ی به‌ پیکهاته‌ی ئەفسانه‌ی کوردی به‌ین. کاتیگ ئاشکرابوو ئەفسانه‌ی کوردی له‌ کوپه‌ دیت و پیکهاته‌که‌ی چۆنه‌ و به‌ چه‌ند قۆناغدا تێپه‌ریوه‌، ئینجا ده‌کرێ تابه‌مه‌ندییه‌کانی ئەفسانه‌ی کوردی ده‌ستنیشان بکه‌ین.

هه‌موو ئەفسانه‌ و ئایینیگ هه‌لگری تابه‌مه‌ندییه‌کانی شوێنی ده‌رکه‌وتنیه‌تی، واتا جوگرافیا ده‌ورێکی سه‌ره‌کی هه‌یه‌ له‌ دیاری کردنی تابه‌مه‌ندییه‌کانی ئەفسانه‌دا. هه‌موو جوگرافیا یه‌کێش ناوه‌ندی ژبانی کولتووری و میژوویی میله‌ته‌که‌. بۆ هه‌وونه‌ کوردستان له‌ دێر زه‌مانه‌وه‌ له‌سه‌رده‌می ئەشکه‌وته‌وه‌ تا کو ئەمڕۆ جوگرافیا و مه‌ل‌به‌ندی ژبانی میله‌ته‌ی کورد بووه‌. هه‌موو میله‌ته‌تیکێش خاوه‌نی زمانی تابه‌ته‌ به‌ خۆیه‌تی. زمانی کوردی ئەو زمانه‌یه‌ که میله‌ته‌ی کورد له‌ قۆناغه‌ جیا جیاکانی میژوویی و ئەفسانه‌یی. پێی دواوه‌ و ئەفسانه‌کانی خۆی پێ دارشتوووه‌ و له‌ نه‌وه‌یه‌که‌وه‌ بۆ نه‌وه‌یه‌کی تر گواستوو یه‌تیه‌وه‌. به‌مه‌ش کورد وه‌کو نه‌ته‌وه‌یه‌کی کۆن میژووییکی دووردرێژی بۆ خۆی تۆمار کردوو، ئاشکرایه‌ ئەفسانه‌ سه‌رچاوه‌یه‌کی گرنگه‌ بۆ ساغ کردنه‌وه‌ی ڕووداوه‌ میژوویییه‌کان، بۆیه‌ ده‌بینین په‌یوه‌ندییه‌کی

پته و له نیوان ئەفسانە و میژوودا بەدی دەکریت. شایەنی ئاماژە پێدانە که (د. مه‌ولوود ئیبراهیم) له ئەنجامی توێژینه‌وه‌ی بەرده‌وام تاونیوێه‌تی تایبەتەندیەکانی ئەفسانە‌ی کوردی له‌م خالانە‌ی خواره‌وه‌دا کۆ بکاته‌وه، به‌ جۆریک که تارا‌ده‌یه‌کی زۆر جیگه‌ی زیاتر توێژینه‌وه له‌م بابەته به‌م توێژینه‌وه‌یه نادات:

۱- تایبەتەندی زمان

۲- تایبەتەندی میژوویی

۳- تایبەتەندی ئایینی

۴- تایبەتەندی جوگرافی

۵- تایبەتەندی دابونەریتی کۆمه‌لایه‌تی⁵¹

به‌پێی ئەم تایبەتەندیانە‌ی سەر‌وه‌ هەر ئەفسانە‌یه‌ک به‌ زمانی کوردی داڕێژا‌ییت جا چ به‌ زمانی کوردی کۆن، یان کوردی ئیستا و سەر‌جه‌م شپۆ‌زه‌کانی زمانی کوردی بێت، ئەفسانە‌یه‌کی کوردییه‌. هەر ئەفسانە‌یه‌ک به‌سەر‌هاتێکی میلله‌تی کورد بگێرێت‌ه‌وه، یان گۆشه‌یه‌ک له‌ میژووی کورد پێشان بدات، ئەفسانە‌یه‌کی کوردییه‌. هەر ئەفسانە‌یه‌ک له‌ جوگرافیای کوردستان له‌ دایکبوویت و باس له‌ دابونەریت و کولتوری کورد بکات، ئەفسانە‌یه‌کی کوردییه‌. سەر‌جه‌م ئەو ئەفسانانە‌ی له‌ قالبی ئایینی کورددا باس له‌ چۆنیه‌تی دروستبوونی زه‌وی و ئاسمان، مرۆف و رووه‌ک و نیشتمانی کورد بکه‌ن، ئەوه ئەفسانە‌یه‌کی کوردییه‌.

به‌شی دووه‌م

رۆلی ئەفسانە و تایبەتەندیی زمانه‌وانی

وه‌ک پێشتر وتمان، ئەفسانە هه‌ولێکە بۆ رافه‌کردنی جیهان و تیگه‌یشتن له‌ رووداوه‌کانی سروشت، به‌ تایبەتی له‌ قۆناغه‌ میژووییەکانی پێش سەر‌هه‌لدانی «ئایین» و «فەلسە‌فه» و هونه‌ر و زانست، له‌بەر ئەوه ئەفسانە کۆمه‌لێ رۆل و ئەرکی تایبەتی هه‌یه به‌ بۆچوونی بیرمه‌ند و زاناکان. ئەفسانە لای «هێگل» ئەرکی ئایینی سروشتی ده‌بینی⁵²، واته‌ رۆلی ئایینی بینیه‌ له‌ قۆناغه‌ دێرینه‌کانی میژوودا. واته‌ ئاینیکی سەر‌ه‌تایی و سروشتی بووه‌ بۆ مرۆف. هه‌روه‌ها «گیوسدۆرف» باوه‌ری وایه ئەفسانە جۆریک له‌بیر‌کردنه‌وه‌ بووه، له‌پێش فەلسە‌فه و کاری پیکراوه، واته‌ رۆلی بیر‌کردنه‌وه‌ی بینیه‌. له‌گه‌ڵ ئەمه‌شدا ئەفسانە له‌ بنه‌ره‌تدا زمانیکی نامیژوویییه‌. واته‌ له‌ ده‌ره‌وه‌ی میژووه‌ و له‌ واقیعی ئەزمونی رۆژانه‌دا نییه، به‌لکو سەر به‌ جیهانی فانتازیایه⁵³. بۆیه له‌ رووی به‌کاره‌ێنانی زمانه‌وه ئەفسانە چەند تایبەتەندیی خۆی هه‌یه:

* زمان وه‌ک خه‌ون ساکار و سه‌راسه‌ر جیهان ده‌گرێته‌وه. واته‌ گشتییه‌.

* لۆجیکی تیا نییه. واته‌ بێ سەر‌وبه‌ر و تیکه‌ڵ و پیکه‌ڵی پێوه‌ دياره هه‌ندیک جاریش واتاکه‌یدژ به‌ه‌که⁵⁴.

د. مه‌ولود ئیبراهیم حه‌سه‌ن، گه‌هران به‌ دوا‌ی نه‌مه‌رییدا، ده‌زگای ناس، چاپی یه‌که‌م، لا ۲۵-۲۴، هه‌ولێر ۲۰۰۲. 51

د. عبد الحمید الحنفی: المعجم الفلسفی، ل-۶۰. 52

د. عبد الحمید الحنفی: المعجم الفلسفی، ل-۰۰۰. 53

د. کامه‌ران موکری: نه‌ ده‌بی فۆلکلۆری کوردی، به‌شی یه‌که‌م ۱۹۸۴-کتێبخانه‌ی نیشتمانی به‌غدا، ل-۴۲-۴۳. 54

گه‌ران به‌دوای نه‌مریی له ئەفسانه کوردییەکاندا

کین ئەوانەى به‌دوای نه‌مرییدا ده‌گه‌رین؟

ئەگەر به‌ وردی سەرنجی ژيانى هه‌موو ئەو که‌سانه‌ بده‌ین که به‌دوای نه‌مرییدا گه‌روان و له‌ده‌ست مه‌رگ هه‌لاتوون، چ له‌سه‌ر ئاستی جیهانی چ له‌سه‌ر ئاستی نه‌ته‌وه‌کان به‌تایه‌ته‌ی (کورد) و (فارس)دا ده‌بینین هه‌موو که‌سایه‌تییه‌کان چهنده‌ خائیک کۆیان ده‌کاته‌وه که به‌شپۆه‌یه‌کی گشتی ئەو خالانه له هه‌موواندا هه‌یه، ئەگەر (گلگامش) وه‌ک کۆنتین که‌سایه‌تی و جیهانیترین که‌سایه‌تی، به‌ ئه‌وه‌وه‌ر بگرین، ئەوا سه‌یر ده‌که‌ین له که‌سایه‌تی گلگامش دا ئەو خالانه‌ی خواره‌وه به‌رچاوان.

۱- گلگامش پال‌هوانیکی لێهاتوو که‌م وێنه و ئازا بوو، چهنده‌ین کاری پال‌هوانانه‌ی کردبوو که هه‌ر له‌ خۆی ده‌هات. ئەوه‌یش چ له‌ میژوووی ژيانى گلگامش و چ له‌ ئەفسانه‌کاندا باس کراوان.

۲- گلگامش پاشا و کوره‌ پاشا بووه، له‌ میژوودا به‌ پینجه‌مین پاشای سوّمه‌ری داندراوه.

۳- که‌سایه‌تییه‌کی ئایینی بووه، چ له‌وه‌ی که له‌و سه‌رده‌می میژوووه‌دا پله‌ی ئایینی و ده‌سه‌لاتی پاشایه‌تی یه‌کیان ده‌گرتوه، چ به‌وه‌ی که له‌ روه‌ ئەفسانه‌ییه‌که‌ی که‌سایه‌تی یه‌ک بوو، دوو له‌سه‌ر سی‌ی خوداوه‌ندبوو.

۴- له‌ ژيانیدا وه‌ک پال‌هوان و کوره‌ پاشا و پاشا زۆر خۆش ژیا‌بوو، ئەوه‌ش ژيانى لا خۆشه‌ویست کردبوو، نه‌یده‌ویست له‌ ژیان دابیرێ.

۵- له‌ ژيانیدا هه‌رچی پێی خۆش بووه و دلی ویستوو‌یه‌تی کردوو‌یه‌تی، ئەوه‌ش پێگای ئەوه‌ی بۆ خۆش کردبوو، که‌وا بیر بکاته‌وه که ده‌توانی (نه‌مریی)ش به‌ده‌ست بێتی.

۶- که‌ لاشه‌ی مردوو‌ی هاو‌پێه‌که‌ی (ئهنکی‌دۆ) ده‌بینی بۆ یه‌که‌مجار ترسی مردن دای ده‌گرێ.

ئەگەر له‌ژێر رۆشنایی ئەو خالانه‌ی گلگامش سه‌یری ژيانى ئەو که‌سایه‌تیانه بکه‌ین که له ئەفسانه کوردییه‌کاندا به‌دوای نه‌مرییدا گه‌راوان له‌گه‌ل جیاوازی ده‌قه‌کان و ئەو گۆرانا‌نه‌ی که به‌ درێژایی رۆژگار به‌سه‌ر-روداو- و - ده‌ق-ه‌کان دا هاتوو، هێشتا خاله‌ هاوبه‌شه‌کان به‌ ئاسانی ده‌دۆزێنه‌وه و خۆماندوو‌کردنیک‌ی زۆریان ناوی⁵⁵.

پیره‌ژنیک!

ئەوه‌ یه‌که‌مین ده‌قه له‌نێو ده‌قه کوردی و فارسییه‌کان که پال‌هوان یان ئەو که‌سه‌ی به‌دوای نه‌مرییدا ده‌گه‌رێ که‌سایه‌تییه‌کی (ئافه‌رت) بێ! تپه‌رینی رۆژگار له‌ درێژی ئەم ده‌قه‌شی که‌م کردوو‌ه‌ته‌وه و ته‌نیا کرۆکی کیشه‌که‌ی هێشتوو‌ته‌وه، ئەو‌یش هه‌لاتنه له‌ ده‌ست مردن و گه‌رانه به‌دوای شوینیک که‌ مردنی لێ نه‌بێ، چونکه له‌م ده‌قه‌شدا وه‌ک ئەوه‌ی پێشوو بونی ئەوه ده‌که‌ین که ئەو پیره‌ژنه که‌سایه‌تییه‌کی ئاسایی نییه! که به‌ دووری نازانم که‌سایه‌تییه‌کی سه‌رکرده‌یی، یان کۆمه‌لایه‌تی، یان ئایینی بووبی، سه‌ره‌پای سوۆزی دایکایه‌تی، که ئەمانه‌ پیکه‌وه له‌گه‌ل ترس له‌مردن و خۆشه‌ویستی ژیان بوونه‌ته هۆی ئەوه‌ی که ئەم (پیره‌ژن!) له‌ ده‌ست مردن هه‌لێ و به‌دوای ئەو شارو ولاته‌دا بگه‌رێ که‌ مردنی لێ نییه!

د.مه‌لۆد نیه‌راهم حه‌سه‌ن، گه‌ران به‌ دوای نه‌مرییدا له‌ نه‌فسانه‌ی کوردی و فارسی دا، ده‌زگای ناراس، چاپی یه‌که‌م، ۱۷-۱۷هه‌، ۱۷هه‌، ۲۰۰۲ - 55

چونکه گه‌پان بۆ کارپکی وا گران و شتیکی وا ئەستەم هیز و سه‌رمایه‌ی پاشاو له‌شکری سه‌رکردانی ده‌وی، به‌ دووری نازانم، که ئەم (پیره‌ژن!) له‌ ئەم هۆیانە‌ی هه‌موو له‌بەر ده‌ست بووین، به‌ لگه‌ش بۆ ئەمه‌ گه‌پان و رۆیشتنه‌که‌یه، هه‌ربۆیه‌ ده‌توانین ب‌لین: - جگه‌ له‌وه‌ی ئەم که‌سایه‌تییه‌ ئافره‌ته، ئافره‌تیکی ده‌سه‌لاتدار و سه‌رکرده‌ش بووه، گه‌پانه‌که‌شی وه‌ک زۆربه‌ی که‌سایه‌تییه‌ (پیاو!) له‌کان له‌ سایه‌ی هیز و سه‌رمایه‌ و ده‌سه‌لاته‌وه‌ خواسته‌که‌ی خۆی خستووته کار و رێگای دوور و جیگای پر ئەستەمی بۆ بریوه⁵⁶.

جیاوازی و تاییه‌قهن‌دی ئەفسانه‌ کوردییه‌کان:

- له‌نیۆ ئەفسانه‌ کوردییه‌کاندا یه‌کێ له‌و که‌سایه‌تیانه‌ی که‌ له‌ده‌ست مردن هه‌ڵدێ و به‌دوای نه‌میریدا ده‌گه‌رێ (پیره‌ژنیک) له، واته‌ که‌سایه‌تییه‌کی (ژن) له، که‌چی له‌ ده‌قه‌ فارسییه‌کان که‌سایه‌تییه‌کان هه‌موویان پیاون که‌ هۆی نه‌میریان هه‌یه، یان به‌دوایدا ده‌گه‌رێن، یان ئەوه‌ته‌ به‌ جوړیک له‌ جوړه‌کان ده‌ستیان ده‌که‌وێ.

- له‌ یه‌کێ له‌ ده‌قه‌ کوردییه‌کان که‌ باسی ئاوی حه‌یات ده‌کات ده‌لێ: هه‌ر که‌سی بیخواته‌وه‌ راسته‌ نه‌میری ده‌ست ده‌که‌وێ! به‌لام، له‌نیوان کرم و مندال و جه‌وان و لاو و جوامیر و بیره‌که‌تره‌ییدا ده‌سوڕپه‌وه‌ و به‌رده‌وام له‌نیۆ ئەم بازنه‌یه‌دا، له‌ هه‌یج یه‌کێ له‌ ده‌قه‌ فارسییه‌کان باسی ئاوی حه‌یات به‌م شپۆیه‌ ناکات و هه‌یج که‌س وای به‌سه‌ر نه‌هاتووه‌.

- له‌ ده‌قیکی کوردیدا (زه‌لامیک) که‌ خۆی ئاوی نه‌میری خواردوووه‌ته‌وه‌ و نه‌میری به‌ده‌ست هه‌تاوه‌ - چونکه‌ جوړی نه‌میرییه‌که‌ی به‌دل نییه‌! ئاموژگاری ئەوه‌ی تر ده‌کات که‌ تازه‌ به‌دوای ئاوی نه‌میریدا ده‌گه‌رێ، که‌ ئەو ئاوه‌ نه‌خواته‌وه، چونکه‌ وه‌کو ئەوه‌ی به‌سه‌ردێ، ئەو خۆی له‌م ئاوه‌ خواردنه‌وه‌ و ئەم شپۆه‌ نه‌میرییه‌ په‌شیمانە، نایه‌وێ ئەویش تووشی ئەو په‌شیمانیه‌ ببێ! له‌نیۆ ده‌قه‌ فارسییه‌کان ئەم جوړه‌ نه‌میری و ئەم که‌سایه‌تییه‌ نیه‌! تا ئاوا ئاموژگاری خه‌لک بکا!

- له‌ ده‌قه‌ کوردییه‌کان به‌ تاییه‌ت له‌ (میرمخ) و (ئه‌سه‌حابه‌) دا، که‌میرمخ ده‌چێته‌ نیۆ (قوبافه‌له‌کێ) و (پیاوی ئاغا) ده‌چێته‌ کن ئەسه‌حابه‌ی، بۆ هه‌ردووکیان زه‌مه‌نیککی په‌کجار زۆر تێده‌په‌رێ، میرمخ هه‌زار و پینج سه‌د ساڵ، پیاوی ئاغای هه‌فتا هه‌زار ساڵ - وه‌ک ده‌قه‌کان باس ده‌که‌ن - واته‌ دوو جوړ (زه‌مه‌ن) له‌ یه‌ک کاتدا هه‌ست پێ ده‌کرێ، که‌چی له‌ ده‌قه‌ فارسییه‌کاندا ئەم زه‌مه‌ن تێپه‌رین و دووکاتییه‌ به‌رچاو ناکه‌وێ.

- له‌ ده‌قه‌ کوردییه‌کان به‌ تاییه‌ت (میرمخ) ی کوردی له‌ سه‌ره‌تا نازانێ (مردن!) چیه‌ و هه‌یج له‌ باره‌ی مردنه‌وه‌ نازانێ، به‌لام، که‌ ژنه‌که‌ی ده‌مری و دواچار تێده‌گات که‌ ئەویش رۆژیک دێ ده‌مری، ئینجا ده‌یه‌وێ بچێته‌ جیگایه‌ک که‌ مردنی لێ نه‌بێ! به‌لام له‌نیۆ ئەفسانه‌ فارسییه‌کان که‌سایه‌تییه‌که‌ به‌م شپۆیه‌ نییه‌!

- له‌ ئەفسانه‌ کوردییه‌کان چه‌ند کارو رووداوێک هه‌ن هه‌تا ته‌واو نه‌بن و روو نه‌ده‌ن، که‌سایه‌تییه‌کان نامرن، واته‌ هه‌ندێ شت هه‌ن رێگه‌ له‌ مردن ده‌گرن، یان راستتر مردن دوا ده‌خه‌ن بۆ میرمخ نه‌مانی سپۆه‌کان، بۆ جوتیار و بالنده‌ و مارو پیره‌مێریش، وشک بوونی ده‌ریا و ته‌واو بوونی گه‌لێ یه‌ زورپات و پرپوونه‌وه‌ی گه‌لێ یه‌ به‌ (کراس - کاژ) ی مارو پر بوونه‌وه‌ی گه‌لێ یه‌ به‌ سبیل و له‌خۆلی گرده‌که‌ و له‌ ئەسه‌کندهر ژیر پێی بێته‌ په‌ساس و سه‌ری بێته‌ تاس، به‌لام له‌ ئەفسانه‌ فارسییه‌کان باسیک له‌م جوړه‌ مردن راگرتنه‌ نییه‌! - له‌

56. د.م.مولود نبیرا هیم حه‌سەن، گه‌مران به‌ دوای نه‌میریدا له‌ نه‌ه‌سته‌ی کوردی و فارسی دا، ده‌زگای ناراس، چاپی یه‌که‌م، ۱۷۷-۱۷۸، هه‌م‌لێز ۲۰۰۲ - 56.

ئەفسانە كوردییەكان- بە تاییەت میرمخ و ئەسكەندەر- باس لەووە دەكات، جگە لە میرمخ خووی، ئەسپ و تازییەكانیشی نەمریی بە دەست دێنن، لە ئەسكەندەری چار قورنەت داری و وشك و جوانووی مردوو بە ئاوی حەیات زیندوو دەبنەو، لە دەقە فارسییەكان ئەم جۆرە نەمرییە بۆگیاڵنەبەران بەم شیوێیە نییە!

- لە ئەفسانە كوردییەكان- بە تاییەت میرمخ و ئەسكەندەر- دواچار خودا تاك و تەنیا بۆ خووی (جبرائیل) ئاگادار دەكەنەووە كە نابێ میرمخ بگاتەو و قوببافە لەكی، چونكە ئەگەر بگاتەووە ئەو، ئەو بە یەكجاری نامری! دەبێ پێش ئەوێ بگاتەووە ئەو جیگایە كە مردنی لێ نییە! شیوێیەكانی لە دەست دەربێ و بمری. ئەسكەندەریش نابێ لە ئاوی نەمری بخواتەو، چونكە مرۆفە! نەمریش هەر بۆ خوداوەندەن و ئەوانەییە كە لەرێزی مرۆف دا نامێنن، ئەمەش هەر لەسەر فەرمانی (خودا) یە و بەهووی دەنگی لە غەیبەوێیە، بەلام لە ئەفسانە فارسییەكان (خودا) بەم شیوێ راستەوخوویە دەست لەكارەكان وەرنادا.⁵⁷

بەشی دوو

ژن لە ئەفسانە بەگشتی و ئەفسانە كوردیی بە تاییەت

۱- ژن لە ئەفسانەكاندا

پێش ئەوێ باس لە خواوەندی مێینە بکەین لە ئەفسانە كوردی دا، پێویستە سەرەتاییەك لەسەر ژن لە ئەفسانە بەگشتی باس بکەین. هەلبەت وەك پێشتر باس لە ئەفسانە كرا، ئەفسانە دیویکی ئەندێشەیی یا خەیاڵی واقعی ژیان و خولیاکانی مرۆفە. بۆیە وەك چۆن لە ئەفسانەكان دا دیوو درنج و گیانلەبەر و ئازەلی تێدایە، ئاوەهاش مرۆف بە هەردوو رەگەزەو لە مێژوووی مرۆفایە تێیدا رۆلی بەرچاویان هەبوو لە قارەمانی ئەفسانەكاندا. بۆ راستی ئەم گۆتەییە دەتوانین ئاماژە بە دوو دەقی «حەماسی» هیندویی بەدین بە ناوونیشانی مەهاباتا و رامایانا كە لە دەورەبەری (400) سالی پێش زاین تا (200) ی پاش زاینش كە چەند سیمایەك لە ژنی قارەمان بە ناوەكانی «سیتا» و «ساویتری» و «درویدی» باس دەكری⁵⁸. هەلبەت لە فەرھەنگ و كۆلتورەكانی خۆرھەلاتدا هەمیشە باس لە قارەمانی و پاكیزەیی و جوانی و سیحری ژن كراو، رۆلی ژن تێیاندا وایكردوو پایە و پێگەیی مێینە بۆ ئاستی خوداوەند بەرزبیتەو و بێنە كەسیتیەکی نمونەیی لەو كۆمەلگایانەدا.

هەروەها لە میتۆلۆجیا یۆنانییەكانیشدا كە لە «ھۆمیرۆس» و «ھیزیۆد» گێراویانەتەو وێنەیی ئافرەت بە جۆریك كراو كە جیگای سەرسوورمانە، چونكی یۆنانییەكان وێنەیی خواوەندی ئافرەتییان بەو شیوێ وێناكردوو كە لەسەر زەویدا هەبوو⁵⁹. بۆیە ئەفسانەیی خواوەندی مێینە گوزارشتییکی راستبوو لە خەون و خەیاڵەكانی مرۆفی ئەو سەردەمە و چۆنیەتی تێكەشتن و روانینی لە رەگەزی مێینە. پێدەچیت كە سیتی «ئافروڈیت» هەر هەمان كەسیتی خواوەندی «ئەشتار»ی خۆرھەلات بیت كە دواتر باسی دەكەین⁶⁰. بۆیە دەكری هەمان شتیشتی راستبێ كە لە فەرھەنگ و ئەفسانەیی كوردیدا چەندین رۆلی گرنگ و سەرنجراكێش دراو بە ژن تا رادەیی بەرزكردنەوێ بۆ پلەیی خوداوەندیكی ئەفسانەیی.

57. د. مەلۆد نیبراھیم حەسەن، گەمراڤ بە دواي نەمرییدا لە ئەفسانە ی كوردی و فارسی دا، دەزگای ناراس، چاپی یەكەم، ۲۰۰۶، ۲۰۰۲. ۲۰۰۲.

58. جین هولم و جا پوكر، ژن در ادیان بزرگ جهان، ۱۲۳-۱۲۹، ۱۹۹۹.

59. د. نیما عە بەدولفەتاح، نەفلاتون و نافرەت، ۲۳. ۲۰۰۲.

60. زیوس، ئەفسانەیی خواكان، ۲۴، ۲۰۰۵.

رهنگه هۆکاری ئهوهی بۆچی ژن یا ئافرهت وهك خواوهندی سهر كراوه له سهردهمه دیرینه كاندا؟ له راستیدا له بهر ئهوهی مهسهلهی مندال بوون و زاوژی ئافرهت بۆ خۆی جۆریكه لهو نهنینهی كه مرۆقاییهتی لهو سهردهمانه دا به چاوی سهرسوهرمان و له ئاسایی به دهه سهر كراوه. كه بۆچی ژن ده توانی سكي هه بی و مندالی بی، به لام پیاو ناتوانی؟ ههروهها له بهر ئهوهی به دایکی مرۆق و دایهن و پهروه ده كهر شیردهه و به خۆكهری مندال و سه چاوهی ژیان داده نری چونکی له سكي خۆیدا مرۆقێك به زیندووی دههینته نیو جیهانه وه، ئهوه بووه هۆی وهك پیرۆزی رابگیری و بهرز بیته وه بۆ پلهی خواوهند له كۆمه لگهی قوئای دایكسالاری دا⁶¹. كهواته په رستنی خواوهندی ژن واته په رستنی زیندوویه تی و ژیان كه دایكه.

۲- خواوهندی مینیه و جۆره كانی

دیاره له میتۆلۆجیا (ئهفسانه ناسی) دا چهند جۆر خواوهندمان ههیه، هه م به پێی ره گه ز واته تیرو می، هه م به پێی ره گه زێکی تاییهت وهك ئافرهت. بۆیه ده بینین له میتۆلۆجیا دا، دوو جۆر خواوهندی ئافره تانمان بۆ باس ده كات كه هه ره كه بیان به پێی ئه رك و رۆلیان گرنگیان ههیه:

جۆری په كه م: ئه و ئافره تانه ده گرێته وه كه لاواز و بی هیز نین، به لكو به هۆی ئازایه تی و توانایانه وه خواوه نی ریزی تاییه تی خۆیان. ئه وان هه ش سی خواوهندی ژن كه له «ئه سینا» و «هیتا» و «ئارتمیس» پێك دین. شایانی باسه ئه و سی خواوهنده كچ بوون وهك خواوهنده كانی تر مێردیان نه كرده وه، بۆیه «ئه سینا» بۆته خواوهندی نیو مال كه پیشه ی چینی و دوورمان و رستی و كابانی بووه. «هینا» بۆته خواوهندی ئاگردان كه ده توانی هه موو ئه و كه سانه بپاریزی كه په نا بۆ ئاگردانی پیرۆز ده بن له نیو مال دا. «ئارتمیس» ده بیته خواوهندی ئاژه له بچووكه كان كه مندالان له هه موو قهزا و به لایه ك ده پاریزی⁶².

جۆری دووه م: خواوهندی نیو كۆمه لگهی خواوهنده نه مره كانه كه بریتیه له «ئه فرۆدیت» كه هه م كچ و هه م خۆشه و یستی خواوهنده «زیۆس» بووه. له هه مان كاتیشتا خواوهندی ئافره ته سۆزانیه كانی شاری ئه سینا بووه. مێژوونووسان پێیان وایه دوو «ئه فرۆدیت» ههیه: په كێکیان ئه فرۆدیتی سهر زهوییه و ئه ویتیشیان ئاسمانیه⁶³.

كهواته ئه مانه ئه وه ده سه لمینن كه ئافرهت له ئهفسانه كاندا باسكارون و بایه خیان پێدراوه له بهر ئه وهی له كۆمه لگه كانی خۆیاندا پله و پایه کی تاییه تیان هه بووه، به لام له ئهفسانه ی كوردیدا چۆن باس له ئافرهت كراوه؟ پێش ئه وهی وهلامی ئه م پرسیاره بدهینه وه، ده بی باسی كورتی ئهفسانه ی كوردی بکهین، تاكو بتوانین له و روانگه وه رۆلی مینیه ده ستنیشان بکهین. چونکی ئهفسانه ی كوردی جیاواز و تاییه ته مندی خۆی ههیه له ئهفسانه ی گه لانی تر. هاوكات لێكچوون و ئاوێته یه ههیه له گه ل ئهفسانه ی ئه و گه ل و تیره و هۆزانه ی له سهر خاکی كوردستان ژیاون.

بۆیه له كۆتیرین و سه ره تایتیرین به رجهسته كردنی خواوهند له مێژووی ئایینی مرۆقدا له سه ر شپۆه ی دایك- دایه گه وه- دایكه خواوهند وینه كراوه. ئه مه ش ده گه رێته وه بۆ ئه وهی دایك وهك به خسه ری ژیان و هینانه بوونی مرۆقی بۆ ناو دونیا دانراوه، بۆیه له میتۆلۆجیا كاندا خواوهندی

تلیسمان عقراوی، المرأة تورها و مكنها فی وادی الرافدین، بغداد، ۱۹۷۸، ۱۹، به سود وهرگرتن له كتیبی «ئافرهت له هۆزراوی كوردیدا» - 61. نوسینی فواد حسین نهمه دهل ۱۳-۱۴.

د. نهمام عه بدولفهناح، نهفلاتون وئافرهت، ل. ۲۳ - 62.

س. ل. ۲۳ - 63.

دايك وهك سه رچاوهی ژيان و هاوكات چاودێركردنی گیان و به خێوكردنێ مندال سه بر كراوه. له بهر ئه وه شه كه له مێژووی مروفايه تيبدا قوناغێك ههيه پێ دهوتری قوناغی دايكسالاری⁶⁴.

3- سه ره هلدانی ئه فسانه ی كوردی

له راستیدا سه ره هلدانی ئه فسانه ی كوردی هاوشانی ده ستپێكردنی ئایینی كورده له مێژوودا، چونكه ئایین و ئه فسانه پێكه وه سه ریان هه لداوه له مێژوودا. ههروه ها ئایینه كوون و سه ره تايبه كان بو خویان كه ره سه یه کی ده وه له مهن دی ئه فسان. پاشان ئه وه هویانه ی كه ئایینان (ئایینی زه مینی) دروستكرد هه ر هه مان ئه وه هوكاران ه كه به زوری ئه فسانه یان دروستكرد، بۆیه له زور قوناغی مێژوویدا ئایین و ئه فسانه یه ك ناگرێنه وه. بۆ نموونه له سه رده می سو مه ریبه كان و دواتر له سه رده می ئایینی میترا نی و زه رده شه ت دا پانتایه کی گه وه ری له هزری خه لکی دا داگیركردبوو. له لایه کی دیکه شه وه به رده وام ئه فسانه ی كوردی خو ی له گه ل گۆرانكاریه كانی سه رده م و ها تنی ئایینه كان دا گونجان دووه⁶⁵.

4- ئه فسانه ی كوردی و تايبه ته ندیه كانی

به پێی ئه وه پاشماوه ئه ركیۆلۆجی (شوینه وارناسیانه وه) و شایه تحاله مێژوویه كانه وه كه ماونه ته وه و له به رده سته لیكو له ره وانان، ده توانین كۆلتور و فه ره هه نگی مروقی كورد به چه ند قوناغێك دا بنین: هه ر له مروقی سه ره تایی و پێش مێژووه وه كوردستان به چه ندین سه رده م و قوناغی میرنشین و ده و له ت و شارنشین وه تپه ریوه كه ره نگدانه وه ی هه بووه له بێر كرده وه ی ئه فسانه ی گه لی كورد و به تايبه ت به روانین و پله وه پایه ی ژن تیبدا. بۆیه له گه ل شه ره كانی «میزۆپۆتامیا» و له ژێر كاری گه ری دیالێكته كانی هیندو ئاریه كان دا تا سه رده می بالاده سته ئه خمینی و هیلینی و ساسانی و ئیسلام دا، ده بینین چه ندین ئه فسانه ی جیاواز له ناوچه كانی كوردستان دا هه بووه⁶⁶. ئه مه به لگه یه کی مێژوویه كه كورد خاوه نی ئه فسانه ی هاو به شه له گه ل گه ل و نه ته وه كانی تر دا له وه سه رمایه یا خود پاشماوه شوینه واری و مێژوویه كانه دا⁶⁷. به لگه ی دووه ئه وه یه كه كورد وه ك گه لیك و به وه پێه ی له جوگرافیا ی خۆ ره لاتای ناوه راسته، یه كێكه له وه گه له دێرینه نه ی كه له میزۆپۆتامیا دا ئاشنا یه تی له گه ل گه لانی ئێران و سو مه ر بابل و ناوچه كانی تر دا هه بووه و كه م تا زور وه رگرتن و ئالوگۆری بیری ئه فسانه ی روویدا وه، له بهر ئه وه كورد هاو به شه له داستانه ئه فسانیه كان و مو لکی كوردیشی تیبدا یه، هه ر بۆیه لیكچوون هه یه له گه ل ئه وه گه ل و تیرو هۆزان ه ی له وه ناوچه نا دا ژیاون وه ك مێژوونووس دكتۆر جه مال ره شه د ده لێ⁶⁸.

ههروه ها كورد وه ك گه ل و میله تێك هه و لێ داوه له كێشه و گرتی ژیا ن و بوون و جیهان و دیارده سروشتیه كان تیبگات و هوكار و ئه نجامی دیارده و گۆرانكاریه كان له ژیا ن دا ده ستنیشان بكات، بۆیه نا كری بلێین كورد خاوه نی ئه فسانه نییه، چونکی وتنی ئه وه قسه وه ك ئه وه یه بلێین گه لی كورد خاوه نی پرسیار و ئه قلیتی بێر كرده وه نییه. كه وا ته كوردیش هه ره وه ك هه موو گه ل و نه ته وه كانی تری دنیا خاوه نی مێژوویه کی دێرین و ده وه له مهن ده له رووی كه له پوور و فۆلكلۆره وه و له ئه فسانه كانیش دا ره نگدانه وه ی ژیا ن و كێشه و ململانی

د.مهولود نوبراهیم، حاسن، پێكهاته ی نه فسانه كوردی، ل، ۷۶، وه فواد حسین نهحه م: د: ناهره ت له هۆنراوی كوردیدا، ل، ۱۰۳-۱۰ - 64

د.مهولود نوبراهیم، حاسن، پێكهاته ی نه فسانه كوردی، ل، ۷۷ - 65

د. جمال رشید، ظهور الكورد فی التاريخ، ص، ۲۱۸-۲۰۰۴ - 66

د. كامه ران موكری، نه ده می فۆلكلۆری كوردی، ل، ۴۰-۴۱ - 67

د. جمال رشید، ظهور الكورد فی التاريخ، ص، ۲۱۸-۲۰۰۴ - 68

سه‌خته‌کانی بووه له‌گه‌ل ده‌وره‌به‌ر و گه‌لانی تردا^{۶۹}. بۆیه لامان سه‌یر نه‌بئ ئە‌گه‌ر بلیتین کولتووری کوردی له‌ رووی ئە‌فسانه‌وه‌هه‌چی له‌ نه‌ته‌وه‌کانی دراوسێ که‌متر نییه‌ وه‌ک چۆن له‌ رووی ئە‌ده‌ب و شیعره‌وه‌ شانی خۆی ئە‌هدات له‌ شانی میلیله‌تانی تری دونیا.

له‌به‌ر ئە‌وه‌ و ئە‌گه‌ر مه‌انه‌وی بزاین ئە‌فسانه‌ی کوردی چیه‌، پێویسته‌ پێشتر باس له‌ تایبه‌تمه‌ندییه‌کانی بکه‌ین:

* یه‌کیک له‌ تایبه‌تمه‌ندییه‌کانی ئە‌فسانه‌ی کوردی به‌گشتی ئە‌وه‌یه‌ که‌ به‌ روونی شه‌رپێکی سه‌خت له‌ نێوان به‌ره‌ی چاکه‌ (روناکی) و به‌ره‌ی خراپه‌کاری (تاریکی) دا هه‌یه‌ که‌ دواجار به‌ره‌ی چاکه‌ سه‌رده‌که‌وی و خراپه‌ش شکست دێنێ^{۷۰}.

* هه‌روه‌ها یه‌کیکی تر له‌ تایبه‌تمه‌ندییه‌کانی ئە‌فسانه‌ی کوردی، باسکردن و وه‌سفکردنی هه‌یزی چاکه‌ و خراپه‌یه‌ له‌ وینه‌ی دێو و درنج و هه‌ندیک جاریش له‌ شیوه‌ی ئاده‌میزاد دا به‌رجه‌سته‌کراوه‌، بۆیه‌ هه‌میشه‌ دیو و درنج وینه‌ی مرو‌قی خراپه‌، وه‌ک چۆنیش پیره‌ژن و ئە‌ژدیه‌ها و ماریش مومونه‌ی ئە‌وه‌ بوونه‌وه‌ره‌ خراپانه‌ن که‌ ئە‌فسانه‌ی کوردی وه‌ک جو‌رپێک له‌ په‌ندو ئامۆژگاری ئاراسته‌ی مرو‌قی کوردی کردووه‌ له‌ مێژوودا. هه‌میشه‌ هه‌یزی چاکه‌ به‌ به‌ره‌ی رووناکی ده‌ژمێردری و هه‌یزی خراپه‌یش به‌ به‌ره‌ی تاریک داده‌نری که‌ ئە‌ره‌یمه‌نه^{۷۱}. بۆیه‌ به‌ره‌ی باش و نوینه‌ره‌کانی بریتین له‌ په‌ریه‌کان و فریشته‌ و په‌له‌وه‌ر و بالنده‌کان^{۷۲}.

* پاشان یه‌کیکی تر له‌ تایبه‌تمه‌ندییه‌کانی ئە‌فسانه‌ی کوردی ئە‌وه‌یه‌ چه‌ندین بیروباوه‌ری ئایینی و نه‌ریتی کۆنی پێش ئیسلامی وه‌ک زه‌رده‌شتی تێدایه‌: وه‌ک پیرۆزی ناگر، خراپی و به‌دی مار، وه‌ک له‌ ئە‌فسانه‌ی کاوه‌ی ئاسنگه‌ردا هاتوووه‌ رووده‌دات، شه‌رپێکه‌ که‌ تێیدا مرو‌ق به‌گشتی به‌لابه‌نه‌ چاکه‌که‌ ده‌ژمێردری^{۷۳}.

شایانی باسه‌ له‌ ئە‌فسانه‌ی کوردیدا دواي ململانی و شه‌رپێکی سه‌خت له‌ نێوان هه‌ردوو به‌ره‌ی چاکه‌ و خراپه‌ دا، هه‌میشه‌ لایه‌نی چاکه‌ و روناکی سه‌رده‌که‌وی، بۆیه‌ ده‌توانین بلیتین له‌ ئە‌فسانه‌ی کوردیدا باسی چاکه‌کاری و سه‌رکه‌وتنی به‌سه‌ر خراپه‌کاریدا تایبه‌تمه‌ندی و خالی جیاکه‌ره‌وه‌یه‌تی له‌ ئە‌فسانه‌کانی تر، چونکی گێرانه‌وه‌ی داستانه‌ ئە‌فسانه‌یه‌یه‌کان له‌ فۆلکلۆری کوردا بۆ په‌ند و ئامۆژگاری و رێنیشاندانی مرو‌قه‌. وه‌ک چۆن جو‌رپێکه‌ له‌ مێژوو، به‌لام مێژوویه‌کی زانستی نییه‌، ئە‌مه‌ش ده‌گه‌رپه‌وه‌ بۆ ئە‌وه‌ی که‌ ئە‌فسانه‌ «له‌ناو گه‌لی کوردا په‌له‌وپایه‌یه‌کی به‌رزی هه‌یه‌ و ئاوپه‌یه‌کی بالامایه‌ بۆ شیکردنه‌وه‌ی چه‌شنی ژایانی کورد. ئە‌فسانه‌کان به‌گشتی هه‌ی رۆژگارپێکی زۆر کۆنه‌ و کاره‌ساتی ئە‌شکه‌وته‌کان و ژایانی ساویلکه‌یی ئە‌وه‌ ده‌مه‌ی کورده‌کامان بۆ ده‌گێرپه‌وه‌»^{۷۴}.

۵- ده‌ستپێکردنی مێژوویی ئە‌فسانه‌یی مێینه‌ له‌ کوردستان

ئە‌گه‌ر بگه‌رپه‌وه‌ بۆ مێژوو که‌ باس له‌ خواوه‌ندی ئافه‌رت کراوه‌، واته‌ ئە‌وه‌ کاته‌ی تازه‌ نووسین دا‌هه‌ت‌راوه‌ و ده‌ستپێکردوو و یاساکان نووسراونه‌ته‌وه‌، هه‌ر له‌ سه‌رده‌مانه‌شدا ژن خوداوه‌ند

69. د. کامهران موکری، نه‌ده‌بی فۆلکلۆری کوردی، ل. ۴۶-۴۸ - 69.

د. عیزه‌دین مسته‌فا رسول، نه‌ده‌بی فۆلکلۆری کوردی- به‌غدا، ۱۹۷۰، ل. ۱۳، ۱۴- ۱۳. کهریم شاره‌زا: ئە‌فسانه‌ له‌ شیعری هاوچه‌رخ کوردیدا- هه‌ولێز، ۲۰۰۵ - 70. ۱۳، ۱۰.ل.

کهریم شاره‌زا، نه‌فساته‌ له‌ شیعری هاوچه‌رخ کوردیدا- هه‌ولێز، ۲۰۰۵، ل. ۱۳، ۱۰. د. کامهران موکری: نه‌ده‌بی فۆلکلۆری کوردی، ل. ۴۰، ۴۱ - 71.

د. کامهران موکری، نه‌ده‌بی فۆلکلۆری کوردی، ل. ۴۲-۴۳ - کهریم شاره‌زا: نه‌فسانه‌ له‌ شیعری هاوچه‌رخ کوردیدا- هه‌ولێز، ۲۰۰۵، ل. ۱۳، ۱۰ - 72.

د. مه‌رلۆد نیه‌یرا هه‌یم، حه‌سین، پێکهاته‌ی نه‌فساته‌ کوردی، ل. ۴۸، ۴۹ - کهریم شاره‌زا: نه‌فسانه‌ له‌ شیعری هاوچه‌رخ کوردیدا- هه‌ولێز، ۲۰۰۵، ل. ۱۰ - 73.

سیدق بۆرمه‌کی، مێژووی نه‌ده‌بی کوردی، ل. ۱۹۹ - 74.

بووه که به قوناغی کۆمه‌لگه‌ی ژن سالاری ده‌ناسری، به‌لام ئەم سەردەمه درێژە‌ی نه‌کیشاوه، چونکی دواتر که ژن بۆته مولکی پیاو قوناغی پیاوسالاری له میژوودا سەری هەڵداوه. چونکی به‌پیتی به‌لگه شوینە‌واریه‌کان- ناسه‌واره‌کان- له هه‌موو دونیا له‌گه‌ڵ شوینە‌واری مروّقایه‌تی بیست هه‌زار سال له‌مه‌وبەر که به‌ ده‌ورانی به‌رد یا چاخ‌ی به‌ردین ده‌ناسری، په‌یکه‌ری دۆزراوه‌ت‌ه‌وه که پێیده‌وتری «په‌یکه‌ری دایکی مه‌زن» که هه‌ر له‌ خاکی کوردستان که نزیك ۱۵ کیلۆمه‌تر له «کرماشان» هه‌ که به‌ فینۆسی سه‌راو ناو ده‌برێ^{۷۵}. دياره‌ ئەو په‌یکه‌رانه له‌ گە‌ڵ یا به‌رد یا له‌ ئیسک و عاج دروستکراون، بۆیه هه‌موویان په‌ک تابه‌مه‌ندی و سیه‌تیان هه‌یه. له راستدا جیی سەرنجه که ئەو په‌یکه‌رانه ژنان بۆ خۆیان دروستیانکردوو و خۆشیان په‌رسته‌شیان کردوه. هه‌ربۆیه ئەمه سەره‌تای په‌یدا‌بوونی خوداوه‌نده‌کانه که په‌که‌میان «ژن خودایه»^{۷۶}.

ده‌توانین بلیین به‌گشتی په‌یکه‌ره بۆ ده‌مچاوه‌کانی که له‌ دایکی مه‌زن «فینۆسه‌کان» دروستکراون، ژن خودا‌کانن که به‌نیو خودای باردار‌ی و هه‌لگری مندال له‌ سه‌رانسه‌ری دونیادا هه‌بوون و وه‌کو نیشانه‌یه‌کی ئایینی نه‌ک ته‌نها بۆ ژنان به‌لکو بۆ پیاوانی په‌که‌م هیم‌ا و په‌مزی زاوژی و په‌ناگا و خۆراک‌ده‌ر و په‌نا‌ده‌ر بووه^{۷۷}.

ئیدی ئەو کاته‌ی نووسین ده‌ستی پێ‌کردوو، ژن خوداش هه‌بووه به‌هۆی ئەو په‌یکه‌رانه که دۆزراوه‌ت‌ه‌وه که فینۆس په‌یکه‌ره له‌و په‌یکه‌رانه‌ی که له‌ کوردستانی رۆژه‌لات دۆزراوه‌ت‌ه‌وه. ئەمه‌ش ئەوه ده‌سه‌لمی‌ن که له‌ کۆمه‌لگه‌ کشتوکالیه‌کاندا (وه‌ک کۆمه‌لگه‌ی کورده‌واری خۆشمان) هه‌میشه نه‌پیتی به‌پیتی زه‌وی به‌سه‌تراوه‌ت‌ه‌وه به‌ پیتی ژنه‌وه. هه‌ر له‌به‌ر ئەوه‌ش زه‌وی په‌سه‌تراوه له‌ سه‌رده‌مانیکدا و به‌ پیرۆز ته‌ماشاکراوه به‌و پێیه‌ی که دایکه^{۷۸}. شابه‌نی باسه هه‌میشه له‌ هزر و بیری نیشتمان په‌روه‌ریدا دایک هیم‌ایه بۆ نیشتمان که ده‌کری ئەم هیم‌ایه له‌ ئەفسانه‌ی ئەو گه‌لانه‌وه هاتبێ که کۆمه‌لگه‌یه‌کی کشتوکالیین و خا‌ک و زه‌وی و ئاو سه‌رچاوه‌ی ژیان پێ‌کده‌هێنن.

6- خواوه‌ندی مینیه له‌ ئەفسانه و کولتوری کوردیدا

به‌و پێیه‌ی که ئەفسانه رهنگ‌دانه‌وه‌ی هۆشیاری کۆمه‌لایه‌تییه‌وه پێ‌شته‌ر له‌ پیناسه‌ی ئەفسانه‌دا ئامازە‌ی پێ‌دا، ده‌توانین باس له‌ رۆلی ئافره‌ت بکه‌ین و بزاین پێ‌گه‌ و پایه‌ی له‌ کولتوری کوردیدا چۆنه، چونکی ئەفسانه‌کان ئاوپنه‌ی ژیان و خه‌پال و ئەندێ‌شه‌ی مروّقن، بۆیه هه‌رچۆتیک ئافره‌ت له‌ ئەفسانه‌ی کوردیدا باس بکری، ئەوه نیشانه‌ی ئەوه‌شه‌ چۆن کۆمه‌لگه‌ی کوردی له‌ ئافره‌تانی روانیوه، بۆیه پێ‌ویسته‌ پێ‌ش هه‌موو شتێ سەرنجی ئایینه‌ کۆنه‌کان بده‌ین له‌ کوردستاندا که چۆن له‌ ئافره‌تیان روانیوه. دياره‌ ئەمه به‌ دوو شتدا ده‌زانری:

یه‌که‌م: چه‌ند له‌ خواوه‌نده‌کان یا فریشته‌کان ره‌گه‌زی ژیان هه‌یه.

دووهم: وتاره‌ ئایینه‌کان به‌ چه‌ شێ‌وه‌یه‌ک ناوی ژن دینن. بۆ هه‌وونه له‌ به‌رده‌نوو‌سی ئانوپایینی (۲۶۷۰-۲۵۰۰) دا پادشای «لۆلۆیی» ژن خودا که ناوی نی نینی (nini) ده‌بیندري که بازنه‌ی پادشاهی ده‌دا به‌ ئازوو و دوودلی پێ‌شکه‌ش ده‌کات^{۷۹}.

ژيلا و تەيفور، خواوه‌ندی مینیه له‌ کولتوری کوردیدا، گۆفاری گزنگ، ژماره ۷، سویدیل ۱۹۹۳، ۳۴ - 75

ه.س.ل ۳۴ - 76

ه.س.ل ۳۴ - 77

د.قصلحسین، انثوبولوجيا الانب، بیروت ۲۰۰۹، ص ۱۱۳ - 78

ژيلا و تەيفور، خواوه‌ندی مینیه له‌ کولتوری کوردیدا، گۆفاری گزنگ، ژماره ۸، سویدیل ۱۴ - 79

۷- خواوهنده میننه‌کان له ئەفسانەیی کوردیدا

خواوهنده «هیرا» که به شازنی ئاسمان دەناسریت. ئەم ژن خواوهنده له رووی ئەفسانەیییەوه بەهێزترین خواوهندی ژنه. بۆیه بەخوای هه‌موو ژنان دەناسرا^{۸۱}. هه‌روه‌ها هاوسه‌ری هه‌میشه‌یی «زیۆس»ه که رۆمیه‌کان پێیانده‌وت «یۆنوو». شایه‌نی باسه «هیرا» خواوه‌نی چاره‌نووسی هه‌موو ژنان بوو هه‌ر له‌سه‌رتای ژيانه‌وه تا مردن له‌ده‌ستی ئەودا بوو، چونکی هیرا وه‌ك هه‌موونه‌ی ژنیک‌ی ژيرو وه‌فادر و بالاجوان و ریکوپیك هاوکات روخساری جیددی و به‌هێز دەناسرا^{۸۱}.

هه‌روه‌ها له‌شاخه‌کانی ده‌وری (عیلام- له‌خۆره‌لاتی کوردستان)دا دیمه‌نی ژن خودای فراوانکردنی رزق و رۆزی ده‌بیندری که نێوی کیریشیا (kirirsha) بووه و ده‌یان سه‌ده‌هه‌رستراوه. هه‌روه‌ها ژن خودایه‌ نانا که به (nanaja ناسراوه تا ده‌ورانی پارتیه‌کان درێژه‌ی هه‌بوه و ئیستاش په‌یکه‌ره‌که‌ی له‌گۆرستانی پارتیه‌کاندا دۆزراوه‌ته‌وه. نێوی ئەم ژن خودایه‌ ئیستاش له‌نێو ئیمه‌دا به‌تایه‌ت دایه‌ گه‌وره‌کانی کورد که به «نه‌نه» بانگ ده‌کرێ هه‌ر ماوه‌ته‌وه^{۸۲}. ژن خواوه‌ندیکی تریش هه‌بووه به‌ناوی «ئیشنو شیناک» (shushinak In) که په‌یکه‌ی له‌خواوه‌نده‌ گه‌وره‌کان که هه‌م به‌خواوه‌ندی نه‌ته‌وه‌یی ناسراوه و بۆ خۆی ژنی «شالا» گه‌وره‌ خواوه‌ندی ناوچه‌ی عیلام بوو^{۸۳}. بێجگه‌ له‌وش خواهند «سامورات» له‌سالی (811 - 088 پ.ز) دا شازنی دایک بووه که سێ سالی ته‌واو تاج و ته‌ختی ئاشووری به‌ده‌سته‌وه‌ بووه، شایانی وتنه‌ ئەم شازنه‌ سه‌رچاوه‌ی ئەفسانەیی میژوویی «سه‌میر ئەمیس»ه له‌یۆناندا. به‌پێی ئەم ئەفسانەیه‌ش بێ، سه‌میر ئەمیس نیه‌وی خودا و نیه‌که‌ی تریشی شا و فه‌رمانده‌ی به‌جه‌رگ و ئەندازاریکی شیوا و حاکمیکی هۆشیار و به‌ته‌کییر بووه^{۸۴}.

دیاره‌ خواوه‌ندی ژن له‌ کوردستان زۆر بوون که ره‌مز و هیما‌ی خۆشه‌ویستی و نازایه‌تی بوون. ئەمه‌ جگه‌ له‌وه‌ی که په‌یکه‌ری شازن ناپیر ئاسو (asu Napir) ژنی شا «ئوتاش» که له‌ماده‌ی برۆنز داریژراوه و کیشه‌کی (۱۷۵۰) کیلۆیه. له‌سه‌ر داوینی ئەم په‌یکه‌ره‌ نووسراوه: هه‌ر که‌س نازاریک به‌م په‌یکه‌ره‌ بگه‌یه‌نێ، توشی هه‌موو جوژه‌ به‌لایه‌کی ئاسمانی ده‌بێ». سه‌ره‌رای ئەوه‌ش که‌سه‌ری ئەم په‌یکه‌ره‌یان په‌راندوووه^{۸۵}. هه‌روه‌ها له‌ئایینی سۆمه‌ریدا چه‌ندین خودا هه‌بوون که به‌ره‌گه‌ز ژن بونه‌ وه‌کو «نانایه» که خودای پاکیزه‌یی بووه و (باکهره‌ی) زه‌وی بووه و خودای تایه‌تی ئاری «ئۆر» بووه. خودای شاری کیش لاگاش «ئینگیر سک»(دایکی خه‌خمۆر) بووه، که‌پێیان وابوووه خه‌می خه‌لک ده‌خوا و له‌لای خودا‌کانی دایک بۆیان ده‌پاریته‌وه. هه‌روه‌ها په‌یکه‌ی له‌سێ خودای هه‌ره‌مه‌زن ژنه‌ به‌ناوی «ئه‌دا» له‌ئه‌که‌دا (۵۰۰۰) خودای گه‌وره‌ و بچووک هه‌بووه که به‌شیکی زۆریان ژن خودا بوون. بۆ وینه «ئه‌شته‌ر» و «نانا» دووان له‌و خودا هه‌ره‌گه‌وره‌ و خۆشه‌ویسته‌کانن. هه‌روه‌ها ژن خودا «نی» (نا نا) به‌ده‌ستیک دوژمنه‌کانی په‌تکردوووه و به‌ده‌ستیک بازنه‌یی پادشاهی ده‌دا به‌ئانوباتی پادشای لولوی (به‌رده‌نووس- سه‌رپل زه‌هاو)^{۸۶}.

۸۱- نەفلاتون و نافرەت، ل ۲۳، هەرودها نەفسانەیی خواکان، ل ۲۶ - 80

۸۲- نەفسانەیی خواکان، (زیوس)، ل ۲۴، ۲۰۰۵، هەرودها د. نیمام ع. بدولفەتاح، نەفلاتون و نافرەت، ل ۲۳ - 81

۸۳- ژیل و تەبفۆر، خواوه‌ندی میننه‌ له‌ کۆلتوری کوردیدا، «گۆقاری گزنگ» ژماره‌ ۸، سویدیل ۴۳ - 82

۸۴- ل ۴۳ - 83

۸۵- ل ۱۸ - 84

۸۶- ل ۳۶ - 85

86- ل ۱۷ - 86

یه کیکێ تر له خواوهنده مێینه بهناوبانگ و زۆر ناسراوهکان که بهخواوهندی دایک دهناسرێ ناوی «شاوشکا» یه که له شاری «شموخا» نزیك شاری ئامهد (دیاربهرهگر) ه. تا ئێستەش وێنهکانی لهسەر مۆری ههندی شوینی تر وهک تهپه له نههاوهند ههر ماوه^{۸۷}. له راستیدا «شاوشکا» خواوهندی دایک یه کیکه له کۆنترین پهراوهکانی ناوچهی «میزوپۆتامیا» (که نیوان دوو روبره که - دجله و فورات دهناسرێ) نیشانیه بو پیت و فهپ و بهره کهت و بهردهوامی ژیان. ئەم خواوهنده له شیوهی بۆکه لهی گهوره دا که قهباره یه کی زه به لاج و دهست و ئەندامهکانی لاشه شی گه ورهن. هاوکات له شارستانیته تهکانی کۆن دا ئەم خواوهنده هێمای مێینهیی و پاکیزهی و داوینپاکی ژن بووه.^{۸۸}

ئهمانه و چهندان ههونهی تر که دهريده خهن بو ههونه ناوچهی «جهرمو» یه کیکه له ههره چهشنه کۆنهکانی رۆژه لاتى ناوه راست که دهکه و پته کوردستان ئیراقی ئیستا، بتی بچووکی له قور دروستکراو دۆزراونه تهوه که بو په رستن به کارهاتوون. له راستیدا ئەم بتانه شیوهی ئافره تیان هه بووه. بۆیه به پای زانایانی شوینه وارناسی. ئەمانه ده بی خواوهندی دایک بووین وه سه ر به کولتووری چه رخی نوین له میژوودا. ئیدی خواوهندی دایک په یوهندی به په رستن خاگ و پیت و بهرکه وته وه هه بووه که له ناو میلله تانی ئەو چاخه دا با بووه. ههروه ها تایبهت به شاعیران و ئەو رۆره سمه ئاینیانه ی که بو بهر یۆه بهردنی کاروباری کشتوکالی ئەنجام ده دران په رستراوه.^{۸۹}

یه کیکێ تر له خواوهنده بهناوبانگه کان ئەناهیتا (عه شتار - ISHRAR) یا ئەشخارا ده ناسرێ. دیاره ئەناهیتا (عه شتار) خواوهندی پیت و بهره که ته لای سۆمه ریه کان ههروه ها ئەکه دی و بابلیه کانیش په رستوویانه، ئەمه ش خواوهندی دایکه که سه رچاوه ی پیت و بهره که ته و خواوهندی خۆشه ویستی و جوانی و سیکس و خواوهندی شه ره، له دهقه میخه کییه کاند به سه رۆک و خاوهنی شه ر ناوئراوه (شمشیرکی که وانه یی و داری دوو سه ره ی هه لگرتووه و له سه ر پشتی شیر یا دوو شیر وه ستاوه) وێنه ی دوو پشیک که له سه ر گلێنه کانێ شارستانیته تی سامه را (۹۰۰-۵۵۰ پ.ز) دۆزراوه ته وه که هێمایه ک بووه له هێماکانی خواوهند عه شتار له سه ما ئاینیه کاند. ههروه ها له سه ر مۆره کان و وێنه کانێ بۆکینی پیرو ز و له سه ر هه ندیک به ردی سنووره کان که هێمایه ک بوو بۆ مولکایه تی ئەم زه ویانه که له لایه ن پادشاه به خشراوه^{۹۰}. بۆیه ئەناهیتا له شاری ئەریل- هه ولێری ئیستا- لای ئاشووریه کان زۆر ناسراو بوو.

ههروه ها ئەو خواوهنده ی که به (مامی) خواوهندی له دایکبوونه له کاتی ژانی له دایکبوون. واته ئەو ژانه ی تووشی ئافرهت ده بیته بهر له کرداری مندالبوون له سکیدا، سه رپه رشتی و ئاگاداری و پارێزگاری له ژن ده کات. شایانی باسه تا ئیستا له زمانی کوردیدا به و که سه ی که له مال ده چیته یارمه تی ژنی سکپه ده دات بو مندال بوون. پێی ده وتریت مامان که ده گه رپته وه بو ناوی ئەو خواوهنده^{۹۱}.

له کۆتایی دا ئاماژه به خواوهندیکی مێینه ئه دهین که لای زۆربه مان له بیرماوه ته وه، ئەویش خواوهند «شاماران» (SAHMARAN) ه که به خواوهندی دایک ده ناسرێ. ئەم

د. جمال رشید، ظهور الكورد فی التاريخ، ص ۲۳۶- ۲۰۰۴. اراس 87 -

ص. ل ۲۳۷ - 88

د. رشاد میران برهوشی نا بیینی و ناتهوهیی له کوردستان، ل ۲۰، ۱۹ - ۲۰۰۰. اراس 89 -

د. جمال رشید، ظهور الكورد فی التاريخ، ص ۵۷۰- ۲۰۰۴. اراس 90 -

د. جمال رشید، ظهور الكورد فی التاريخ، ص ۵۷۰- ۲۰۰۴. اراس 91 -

خواوهنده له شیوهی مار دایه. ئەمەش سەیر نییە، چونکی مار له ئەفسانەیی گەلی کوردا دا زۆر باسی لێدەکرێ. هەر بۆیە لە بەناوبانگترین ئەفسانە لە هەندێک ناوچەیی کوردەواریدا ئەفسانەیی شامارانە، واتا شای مارەکان. ئەم خواوهنده تیوێ نافرەت و نیوێکەیی تریشی مارە. بۆیە زۆرێک لە ئەفسانە ناس و پەڕەکان پێیان وایە ئەمە بناغەیی ئەفسانەیی کوردییە، چونکە بەرای ئەو پەڕەکان ئەم ئەفسانەیی راستیە دەردەخات، ئەویش ئەوێکە کە کۆمەڵگەیی کوردی لە چاخە دێرین و کۆنەکان دا، کۆمەڵگەییەکی دایکسالاری بوو، هەر بۆیە لە زۆر ناوچەیی کوردستاندا، کە لەناو نەختینە و زێری مارەیی کچان دا کاتی شوکردنیان وێنەیی خواوهنده شاماران دادەنرێ^{۹۲}. یا لە ژووری نووستنی بووک و زاوا دادەنرێ بە مەبەستی هێنانی پیت و فەر و خۆشەختی. بەرز راگرتنی ئەم خواوهنده لەوێشەو هاتووێ کە نیشانەیی نەمرییە و تەمەندریژی دەهێنێ، وەک چۆن مار کاژی خۆی فری ئەدات و خۆی نوێ دەکاتەو، ئاوهاش نەمری و مانەوێ لە پاش مێوونیی لە ژانی مارد، جارێکی تر دەگەریتەو بۆ ژیان، سەرەرای ئەوێ خواوهندهی مار هێمای هەژموون و کاریگەری فریودانی سیکسی و فیل و تەلەکشە کە دواجار پەيوەندی بە ئەفسانەیی «ئادەم» و «هوا» شەو هەیه.

لە راستیدا لە ئەفسانەیی ناوچەیی «میزۆپۆتامیا» دا خواوهندهی مار لە دەستیدا و هاوکات پرچە درێژە قورسەکانی دەبنە مار، ئەمەش مانای هێزی سیکسی و فریودانە. لەگەڵ ئەوێشدا دووانەیی -دولیزم-ی چاکە و خراپە لایەنی درۆینەیی سامان و سەرمايە دەردەخات، چونکی لەلایەک مار لایەنی خراپە و لایەنی چاکەیی، بۆیە تائێستاش لە کوردستان ئەفسانەیی سامان و دەولەمەندی و پیت و بەرەکەت هەر هەیه، چونکی وا باوێ لە هەندێ شوێن کە ئەگەر مار بکوژرێ، فری دەدەنە ناو ئاو، ئەگەر باران کەم بوو، خەلکی دیههوی باران باری وەک ئەوێ جارێکی تر مارە کە بگەریتەو بۆ ژیان^{۹۳}.

لێرەو دەتوانین ئەو راستیە بسەلمین کە خواوهندهی «شاماران» خواوهندهی دانایی و پارێزەر و پاسەوانی نەپنییەکانە لە ئەفسانەیی کوردیدا^{۹۴}. ئەمەش جیگەیی سەرسورمان نییە، چونکی هاوشیوێ ئەم خواوهنده لە ئەفسانەیی یۆنانییەکانیشدا هەیه کە بەناوی مێرمید (Mermei) دەناسرێ کە لەگەڵ خواوهندهی ماری زهویی ئاپی (Api) ه^{۹۵}. هاوکات ئەمەش بەلگەییەکی ترە لە هاوبەشی و لیکچووون لەتوان ئەفسانەیی کوردیی و ئەفسانەکانی گەلانی تردا.

ئەنجام

داستان و چیرۆک میلی و فۆلکلۆرییەکانی کورد پێن لە مەوونەیی بەرز و دیار کە باس لە خواوهندهی مێنە دەکەن. ئەمە جگە لەوێ ئەو لیکۆلینەو شۆینەوارایانەیی بۆ زۆر ناوچەیی کوردستان کە ئاسەواری کۆنی تیدا ماوه کراون. بەلگەیی باش هەن لەسەر ئەفسانە و رۆلی مێنە، بەلام هێشتا شوێنی تر هەن کە لیکۆلینەوێیان لەسەر دەکرێ و دەکرێ لە داهاوویدا شتی نوێ دەرکەوێ.

ئامانج لە گەرانهو و باسکردنی خواوهندهی مێنە لە ئەفسانەیی کوردیدا بە پلەیی یەکەم، باسکردنی پێگە و پلە و پایەیی نافرەتە لە کۆمەڵگەیی کوردیدا، چونکی بەپێی ئەو ئەفسانانە

92 - A.colins. 2000: 15-92

د. عزیز دیم مستەفا رسول، ئەمەیی فۆلکلۆری کوردی، بەغدا، ۱۹۷۰، ل ۱۳، ۱۳۰.

94 - <http://www.andrewcolins.com/page/articles/Kurdistan.htm>

95 - <http://landofkard.blogspot.com2010/05/scythican-methology-and-yazdanism>

بهرز راگرتنی ئافرهت و نوانان و وهسفرکردنی خواوهندهکان به خواوهندی مینه، راستیهکی و امان بۆ دهردهخات که چۆن سهیری ئافرهت کراوه، رۆلی ئافرهت له کۆمه‌لگه‌ی کوردیدا به تایهت له قۆناغه دپړین و سه‌ره‌تاییه‌کاندا دهرده‌خه‌ن، که کۆمه‌لگه‌ی کوردی دایکسالار بووه، بۆیه نزیکابه‌تی و ئالوگۆری فهره‌نگی له‌گه‌ل نه‌توه و گه‌لانی تری ناوچه‌که بۆته هۆی ده‌وله‌مه‌ندرکردنی ئه‌فسانه‌ی کوردی و وه‌مانه‌وه‌ی زۆر بۆچوون سه‌بارهت به ئافرهت که هه‌مووی یا زۆربه‌ی له‌و ئه‌فسانه‌وه‌هاتوون تا ئه‌مڕۆ. که‌واته تیگه‌یشتن له ئافرهت پێویستی به‌گه‌رانه‌وه‌ش هه‌یه بۆ مێژوو و ئه‌فسانه‌کان به‌تایهت.

به‌رای ئیمه له هه‌مووی گرنگتر، زیندووترین هه‌وونه بۆ خواوهندی مینه له کولتوووری کوردا «شاماران»ه که به نزیکتین و باشترین هه‌وونه دژمێردی که ئیمه له‌رێی ئه‌م توێژینه‌وه و گه‌رانه‌وه بۆ سه‌هرچاوه‌کان دۆزبو‌مانه‌ته‌وه. به‌تایهت تائیس‌تاش له کۆمه‌لگه‌ی خۆماندا وینیه‌که هه‌یه بۆ ئافرهت وه‌ک فریودهر و سه‌رنجراکیشه‌ر و نه‌رم، به‌لام پێچاوپێچ و سرت و خیرا و ژه‌هراوی. زمانی تیژ و درێژ، کاتی وه‌سفی ئافره‌تانی زۆرزان و به‌ده‌موزمان ده‌کری، که ده‌لین خۆت له ده‌می بیاریزه! ئه‌مه‌ش ئه‌و راستیه دهرده‌خات که په‌یوه‌ندی پیاو و ژن چۆنه له کۆمه‌لگه‌ی خۆماندا. زۆرچار پیاو ترساوه له ژن چونکی سیر و مه‌کر و ناز و توانایه‌کی تایه‌تی هه‌بووه له سه‌رنجراکیشه‌نی پیاو، پیاوه‌کانیش به‌راسته‌وخۆ یا ناراسته‌وخۆ ئه‌م بۆچوونانه‌یان له ئه‌فسانه‌ی کوردی خۆیه‌وه وه‌رگرتووه، هه‌روه‌ها گرنگی دان به ئافرهت و باسکردنی له ئه‌فسانه‌کاندا بایه‌خ و گرنگی ئافره‌تیش دهرده‌خات، ئینجا وینیه‌ی ئافرهت له‌ویدا باش بێ یا خراپ.

لیستی سه‌رچاوه‌کان

- 1- ئازاد ره‌وئوف قه‌زاز، خودا له ته‌قلگه‌ریه‌وه بۆ هه‌ستگه‌ری: خۆیندنه‌وه‌یه‌کی ئه‌نترۆپۆلۆژی بۆ ناسینی خودا لای مڕۆڤ، ل 140، 2012.
- 2- ئارشاک سا‌فراس‌تیان، کورد و کوردستان، وه‌رگێرانی: ئه‌مین شوانی، بلاو کراوه‌ی (ئاراس) چاپی دووهم، هه‌ولێر: 2005.
- 3- ئاماژجاف، سیخۆری به‌ ئامیری سیخۆری و لیکۆلینه‌وه له‌ میشک و پاراسایکۆلۆجی، به‌رگی یه‌که‌م. چاپخانه‌ی ئۆفیس‌تی کار، سلێمانی 2002.
- 4- ئه‌ندازه‌ویزی، نیگار کردنه‌وه‌ی ئاقیستا، نامه‌ی مه‌ینه‌تی زه‌رده‌شت، به‌شی یه‌که‌م، شوینی چاپ (؟) سالی چاپ (؟).
- 5- ئه‌نستاس ماری که‌رمه‌لی، جیلوه و مه‌سه‌حه‌فی ره‌ش (کتییی پیرۆزی ئیزیدیه‌کان)، و نه‌جاتی عه‌ بدولا، ده‌زگای ئاراس، چاپی یه‌که‌م، هه‌ولێر 2012.
- 6- د. ئیمام عه‌بدولفه‌تاح ئیمام: ئه‌فلاتون و ئافرهت، وه‌رگێرانی بۆ کوردی، ئه‌ژین عه‌بدولخالق، پێداچوونه‌وه‌ی رییین ره‌سول: ل 31-32، 2008.
- 7- د. مه‌لود ئیبراهیم حه‌سه‌ن، گه‌ران به‌ دواي نه‌مریدا، بلاو کردنه‌وه‌ی (ئاراس)، چاپی یه‌که‌م، هه‌ولێر 2002.
- 8- دین له‌ هه‌وراماندا؟
- 9- مه‌وه‌ش واحد دوست، رویکرده‌های علمی به‌ اسطوره‌شناسی، (سروشت انتشارات صدا وسیما) چاپ اول تهران- 1381.
- 10- موسا محمد خدر، ئایینی زه‌رده‌شتی له‌ سه‌ره‌تای ئیسلام تا سه‌رده‌می بوه‌بیه‌یه‌کان، زانکۆی سه‌لاحه‌ددین کۆلیجی ئه‌ده‌بیات، به‌شی مێژوو، هه‌ولێر: 2004.

- ۱۱- اسماعیل یورد شاهیان، تبار شناسی قومی و حیات ملی، نشر پژوهش فرزبان روز، چاپ اول تهران: ۱۳۸۰.
- ۱۲- د. مه‌لود ابراهیم حه سه‌ن، پیکهاته‌ی ئەفسانه‌ی کوردی، چاپخانه‌ی رهنج، چاپی یه‌که‌م، لا ۶۶-۶۹، سلیمان: ۲۰۰۰.
- ۱۳- محمد رضا ارشاد، گستره اسطوره، انتشارات هرمس، چاپ سوم، ص ۲۱۵، تهران: ۱۳۹۰.
- ۱۴- نجف دریا بندری، افسانه‌ی اسطوره، نشر کارنامه، چاپ اول، ص ۱۹، تهران: ۱۳۸۰.
- ۱۵- کارن ارمنستانگ، تاریخ مختصر اسطوره، ترجمه عباس مخبر، نشر مرکز، چاپ اول، ص ۱، تهران: ۱۳۹۰.
- ۱۶- د. کامهران موکری، ئە دەبی فۆلکلۆری کوردی، به‌شی یه‌که‌م ۱۹۸۴-کتیبخانه‌ی نیشتمانی به‌غدا، ل ۴۲-۴۲.
- ۱۷- د. مه‌لود ئیبراهیم حه‌سه‌ن، گهران به‌ دوای نه‌میرییدا له‌ ئەفسانه‌ی کوردی و فارسی دا، ده‌زگای ئاراس، چاپی یه‌که‌م، ل ۱۷۴-۱۷۵، هه‌ولێر: ۲۰۰۲.
- ۱۸- د. ره‌شاد میران، ره‌وشی ئایینی و نه‌توه‌یی له‌ کوردستان دا، چاپی دووهم، بلاوکردنه‌وه‌ی سه‌ننه‌ری براهه‌تی زنجیره 7، 2000.
- ۱۹- د. عیزه‌ددین مسته‌فا ره‌سول، ئە دەبی فۆلکلۆری کوردی، به‌غدا، ل 14-13، 1970.
- ۲۰- که‌ریم شاره‌زا، ئەفسانه‌ له‌ شیعی‌ی هاوچه‌رخ‌ی کوردیدا، هه‌ولێر 2005، ل 13-10.
- ۲۱- د. که‌مال مه‌زه‌ره‌، ئافره‌ت له‌ میژوودا، به‌غدا، 1984.
- ۲۲- د. کامهران موکری، ئە دەبی فۆلکلۆری کوردی، به‌شی یه‌که‌م 1984-کتیبخانه‌ی نیشتمانی به‌غدا، ئە دەبی میلی کورد، ل 56-39.
- ۲۳- د. مه‌لود ئیبراهیم حه‌سه‌ن، پیکهاته‌ی ئەفسانه‌ی کوردی، لیکۆلینه‌وه‌به‌کی به‌راوردکاری شیکاریبه‌ له‌ نیوان ئەفسانه‌ و میژوو و ئایین و فه‌لسه‌فه‌ و زانستدا، 2007 سلیمان.
- ۲۴- محمد سدیق بۆره‌که‌یی، میژووی و ژه‌ی کوردی، چاپ اول 1375، چاپخانه‌ی میهر ته‌بریژ.
- ۲۵- فواد حسین ئەحه‌مه‌د، ئافره‌ت له‌ هۆنراوه‌ی کوردیدا، دارالحریه‌ للکباج به‌غدا، ب 15-13.
- ۲۶- زیوس، ئەفسانه‌ی خواکان، وه‌رگێرانی بۆ فارسی شجاع الدین شفا، وه‌رگێرانی بۆ کوردی: عومه‌ر ره‌سول خدر، ل 24: چاپی یه‌که‌م- سلیمان 2005.
- سهرچاوه‌ عه‌ریبه‌کان:
- ۲۷- د. جمال رشید، ظهور الكورد فی التاريخ، ص 336-337، اراس 2005.
- ۲۸- فراس السواح، الاسطوره والمعنی دراسات فی المیتولوجیا و الدیانات الشرقيه، الطبعه‌ الثانيه‌- دار علائین، دمشق ۲۰۰۱.
- ۲۹- نورثروب افرای، الماهیه‌ والخرافه‌، دراسات فی المیتولوجیا الشعریه‌، ترجمه‌، هیفاء هاشم، مراجعه‌: عبدالکریم ناصیف، منشورات وزاره‌ الثقافه‌ الطبعه‌ الاولی، دمشق: ۱۹۹۲.
- ۳۰- خزعلماجدی، الدین السومری، دار الشروق للنشر والتوازیع، الطبعه‌ العربیه‌ الاولی، عمان: ۱۹۹۸.
- ۳۱- ماجد عبدالله الشمس، الحضاره‌ والمیتولوجیا فی العراق القدییم، منشورات دار علائالدین، الطبعه‌ الاولی، دمشق: ۲۰۰۳.

- ۳۲- فاضل عبدالواحد على الدكتور، الطوفان المراجع المساويه الاهالى، الطبعة الاول، دمشق: ۲۰۰۳، ۱۹۹۹.
- ۳۳- هيجل، تاريخ الفلسفه، الجلد الاول، ترجمه: د.ا. امام عبدالفتاح امام، الناشر مكتبه مدبولى-القاهره ۱۹۹۷.
- د. عبد الحميد الحنفى، المعجم الفلسفى، ل- ۶۰.
- ۳۴- عبدالرقيب يوسف، حدود كردستان الجنوبيه تاريخيا وجغرافيا، مطبعه شفان، الطبعة الثانيه، ص ۱۷، السليمانيه: ۲۰۰۵.

گۆنار:

- ۱- ژيلا و تهيفور، خواه ندى ميينه له كولتوورى كورديدا، گۆنارى گزنگ سويد سالى 1993، ژماره 8: ل 14، ژماره ل 32-3.
- ۲- پامان-ژماره (۹۹)، ههولير-۲۰۰۵.
- پامان-ژماره (۱۰۱)، ههولير-۲۰۰۵.
- پامان-ژماره (۱۰۲)، ههولير-۲۰۰۵.
- پامان-ژماره (۱۰۷)، ههولير-۲۰۰۵.
- پامان-ژماره (۱۰۸) ههولير-۲۰۰۶.
- ۳- ههزار ميژد، ژماره (۲۵) سالى ههوتهم، ۲۰۰۴.
- ۴- لالش، ۱۶، دهۆك، اب، ۲۰۰۱، مجله ثقافيه دوريه يصندرها مركز لالش باللغتين الكورديه والعربيه.

ئينتهريت:

* نه ندرۆ كۆلينز:

<http://www.andrewcollins.com/page/articles/kurdistan.htm>

*<http://landofkard.blogspot.com/2010/05/scythican-methology-and-yazdanism>.

*<http://landofkarda.blogspot.com/2009/02/shameran.html>.